



K.T.

ZANÎNGEHA BÎNGOLÊ

ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ

BEŞA MAKEZANISTA ZIMAN Û WÊJEYA KURDÎ

TEZA LÎSANS A BİLİND

DENGÊN DEVOKA TORÊ

(GUNDÊ XERABÊ BENA WEKÎ NİMÛNE)

GÜLBEDDİN GÜLMEZ

131302103

ŞÊWIRMEND

DOÇ. DR. MEHMET ZAHİR ERTEKİN

BÎNGOL, 2019



T.C.

BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ

YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ

KÜRT DİLİ VE EDEBİYATI ANABİLİM DALI

YÜKSEK LİSANS TEZİ

TOR AĞZI SESLERİ
(SEKİ KÖYÜ ÖRNEĞİ)

GÜLBEDDİN GÜLMEZ

131302103

DANIŞMAN

DOÇ. DR. MEHMET ZAHİR ERTEKİN




BİNGÖL, 2019

BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Gülbeddin Gülmez tarafından hazırlanan **Dengên Devoka Torê (Gundê Xerabê Bena Wekî Nimûne)** başlıklı bu çalışma, **29.07.2019** tarihinde yapılan tez savunma sınavı sonucu Kürt Dili ve Edebiyatı Anabilim Dalı'nda Yüksek Lisans Tezi olarak kabul edilmiştir.

Tez Jürisi Üyeleri (Unvanı, Adı ve Soyadı)

Başkan: : Doç. Dr. **Hayreddin KIZIL**
Üye : Doç. Dr. **Mehmet Zahir ERTEKİN**
Üye : Dr. Öğr. Üyesi **Hêmin Omar AHMAD**

İmza: 
İmza: 
İmza: 

ONAY

Bu tez, Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Yönetim Kurulunun/...../ 201.. tarih ve sayılı oturumunda belirlenen jüri tarafından kabul edilmiştir.

Doç. Dr. Abdulnasır SÜT
Enstitü Müdürü

NAVEROK

NAVEROK.....	III
KURTE.....	XII
ÖZET.....	XIII
ABSTRACT.....	XI
PÊŞGOTIN.....	XV
KURTEBÊJE.....	XVI
SEMBOLÊN KU DI BEŞÊN LÊKOLÎNÊ DA HATINE BIKARANÎN.....	XVII
NÎŞANÊN TRANSKRÎPSÎYONÊ.....	XVII
DESTPÊK.....	1
1.Mijara xebatê.....	1
2.Çarçoveya xebatê.....	2
3.Girîngî û armanca xebatê.....	3
4.Rêbaza lêkolînê.....	4
5.Çavkanîyên xebatê û xebatên ku li ser dengnasîya devokê hatine kirin.....	7
6.Kêşeyên xebatê.....	11

1.BEŞA YEKEM

HERÊMA TORÊ, ZIMANNASÎ Û DENGNASÎ

1.1.Herêma Torê û Gundê Xerabê Bena.....	12
1.1.1.Herêma Torê.....	12
1.1.2.Kercos.....	17
1.1.3.Gundê Xerabê Bena.....	19
1.2. Zimanê Kurdî û Devoka Torê.....	20
1.2.1.Zimanê kurdî û cihê wî di nav zimanên cihanê da.....	20
1.2.2.Zaravayên kurdî û zaravayê kurmancî.....	22
1.2.3.Devokên kurmancîyê û devoka Torê.....	24
1.3.Zimannasî û Dengnasî.....	28
1.3.1.Zimannasî.....	28
1.3.1.1. Ji Alfîyê Rêbazê ve Cûreyên Sereke yên Xebatên Zimannasîyê.....	28
1.3.1.1.1.Zimannasîya hevdemî (synchronic grammar).....	29

1.3.1.1.2.Zimannasîya şayesî (descriptive)	30
1.3.1.2.Zimannasîya kurmancî:	31
1.3.2.Dengnasî	33
1.3.2.1.Cûreyên rêbazên dengnasîyê.....	35
1.3.2.2.Cûreyên fonetîkê.....	36
1.4.Deng û pêkhatina wî	37
1.4.1.Deng û hin termên têkildarê wî.....	37
1.4.1.1.Alfabe	39
1.4.2.Pêkhatina Deng	41

2. BEŞA DUYEM

DENGAZÎYA (FONETÎK) HERÊMA TORÊ

2.1.Dengdêr di Devoka Torê da	44
2.1.1.Dengdêra /a/yê (li gor sîstema IPAyê: [ɑ])	47
2.1.1.1.Dengdêra [á]yê.....	48
2.1.2.Dengdêra /e/yê (li gor sîstema IPAyê [æ]).....	51
2.1.3.Dengdêra /ê/yê (li gor sîstema IPAyê:[e])	52
2.1.4.Dengdêra /i/yê (li gor sîstema IPAyê:[ɪ]).....	54
2.1.5.Dengdêra /î/yê (li gor sîstema IPAyê:[i:]).....	56
2.1.5.1.Dengdêra [î'ya kurt] (li gor sîstema IPAyê:[i])	59
2.1.6.Dengdêra /o/yê (li gor sîstema IPAyê:[o])	59
2.1.7.Dengdêra /u/ yê (li gor sîstema IPAyê:[u]).....	61
2.1.8.Dengdêra /û/yê (li gor sîstema IPAyê:[u:])	64
2.2.Nedengdêr di devoka Torê da.....	66
2.2.1.Nedengdêra /b/yê (li gor sîstema IPAyê:[b])	72
2.2.1.1.Nedengdêra [b]yê	73
2.2.2.Nedengdêra /c/yê (li gor sîstema IPAyê:[d̥ʒ]).....	74
2.2.3.Nedengdêra /ç/yê (li gor sîstema IPAyê:[t̪ʃ] / [t̪] / [t̪ʃ]).....	75
2.2.4.Nedengdêra /ç/yê (li gor sîstema IPAyê:[t̪ʃ])	76
2.2.4.1.Nedengdêra [ç]yê.....	78
2.2.5.Nedengdêra /d/yê (li gor sîstema IPAyê:[d])	78
2.2.5.1.Nedengdêra [d]yê	80

2.2.6.Nedengdêra /f/yê (li gor sîstema IPAyê:[f]).....	81
2.2.6.1.Nedengdêra [f]yê	82
2.2.7.Nedengdêra /g/yê (li gor sîstema IPAyê:[g])	83
2.2.8.Nedengdêra /h/yê (li gor sîstema IPAyê:[h])	84
2.2.9.Nedengdêra /h̄/yê (li gor sîstema IPAyê:[h̄])	85
2.2.10.Nedengdêra /j/yê (li gor sîstema IPAyê:[ʒ])	87
2.2.11.Nedengdêra /k/yê (li gor sîstema IPAyê:[k])	88
2.2.12.Nedengdêra /k̄/yê (li gor sîstema IPAyê:[k̄])	89
2.2.13.Nedengdêra /l/yê (li gor sîstema IPAyê:[l])	90
2.2.13.1.Nedengdêra [l]yê:	92
2.2.14.Nedengdêra /m/yê (li gor sîstema IPAyê:[m]).....	93
2.2.14.1.Nedengdêra [m]yê.....	94
2.2.15.Nedengdêra /n/yê (li gor sîstema IPAyê:[n])	95
2.2.15.1.Nedengdêra [n]yê (li gor sîstema IPAyê:[ŋ]).....	96
2.2.16.Nedengdêra /p/yê (li gor sîstema IPAyê:[b])	97
2.2.17.Nedengdêra /p̄/yê (li gor sîstema IPAyê:[p̄])	98
2.2.17.1.Nedengdêra [p̄]yê	99
2.2.18.Nedengdêra /q/yê (li gor sîstema IPAyê:[q])	100
2.2.19.Nedengdêra /r/yê (li gor sîstema IPAyê: [r]).....	101
2.2.20.Nedengdêra /i/yê (li gor sîstema IPAyê: [r]).....	102
2.2.21.Nedengdêra /s/yê (li gor sîstema IPAyê:[s])	104
2.2.21.1.Nedengdêra [s]yê.....	105
2.2.22.Nedengdêra /s̄/yê (li gor sîstema IPAyê:[ʃ])	106
2.2.22.1.Nedengdêra [s̄]yê.....	108
2.2.23.Nedengdêra /t/yê (li gor sîstema IPAyê:[t])	108
2.2.24.Nedengdêra /t̄/yê (li gor sîstema IPAyê:[t̄])	110
2.2.24.1.Nedengdêra [t̄]yê.....	111
2.2.25.Nedengdêra /v/yê (li gor sîstema IPAyê:[v])	112
2.2.25.1.Nedengdêra [v]yê	114
2.2.26.Nedengdêra /w/yê (li gor sîstema IPAyê:[w])	114
2.2.27.Nedengdêra /x/yê (li gor sîstema IPAyê:[x])	115
2.2.28.Nedengdêra /x̄/yê (li gor sîstema IPAyê:[χ])	116

2.2.29.Nedengdêra /y/yê (li gor sîstema IPAyê:[j])	118
2.2.30.Nedengdêra /z/yê (li gor sîstema IPAyê:[z]).....	120
2.2.30.1.Nedengdêra [z]yê.....	121
2.2.31.Nedengdêra / ^ç /yê (ç) (li gor sîstema IPAyê:[ʔ]):	122
2.2.31.1.Nedengdêra [ʔ]yê (hemze)	125
2.2.32.Dîftongên devoka Torê	125
2.2.32.1.Gw	126
2.2.32.2.Íw	126
2.2.32.3.Qw.....	126
2.2.32.4.Xw	126

3. BEŞA SÊYEM

BÛYERÊN DENGAN (PHONETIC PROCEDURES) DÎ DEVOKA TORÊ DA

3.1.Guherînen dengen	129
3.1.1.Guherîna dengên di dengdêran da:.....	131
3.1.1.1.Guherîna a>e.....	132
3.1.1.2.Guherîna a>ah/eh.....	133
3.1.1.3.Guherîna a>ê:.....	133
3.1.1.4.Guherîna a>i.....	133
3.1.1.5.Guherîna e>a.....	133
3.1.1.6.Guherîna e>á.....	134
3.1.1.7.Guherîna e>ê.....	135
3.1.1.8.Guherîna e>i.....	136
3.1.1.9.Guherîna e>î.....	137
3.1.1.10.Guherîna e>u	137
3.1.1.11.Guherîna ê>î.....	137
3.1.1.12.Guherîna i>e.....	138
3.1.1.13.Guherîna i>î.....	138
3.1.1.14.Guherîna i>ê.....	139
3.1.1.15.Guherîna i>u/û.....	139
3.1.1.16.Guherîna î>e.....	139
3.1.1.17.Guherîna î>ê.....	139

3.1.1.18. Guherîna î>i.....	140
3.1.1.19. Guherîna î>u	141
3.1.1.20. Guherîna î>û	141
3.1.1.21. Guherîna î>y.....	141
3.1.1.22. Guherîna u>i	141
3.1.1.23. Guherîna u>û	142
3.1.1.24. Guherîna u>wi/wî	143
3.1.1.25. Guherîna û>i	143
3.1.1.26. Guherîna û>î	144
3.1.1.27. Guherîna û>u	144
3.1.1.28. Guherîna û>w/uw	145
3.1.1.29. Guherîna o>û	145
3.1.1.30. Guherîna o>w.....	146
3.1.1.31. Guherînen ku tenê di rewşa tewandî da pêk ten.....	146
3.1.1.32. Zedengîbûn (diphthongization)	147
3.1.1.32.1. Gw	147
3.1.1.32.2. Kw	147
3.1.1.32.3. Qw.....	147
3.1.2. Guherîna dengan di nedengdêran da	147
3.1.2.1. Guherîna b>p	147
3.1.2.2. Guherîna b>v/w	148
3.1.2.3. Guherîna c>d.....	148
3.1.2.4. Guherîna c>j.....	149
3.1.2.5. Guherîna ç>ş	149
3.1.2.6. Guherîna d>t/t	149
3.1.2.7. Guherîna g>k.....	150
3.1.2.8. Guherîna h>ê	150
3.1.2.9. Guherîna h>w.....	150
3.1.2.10. Guherîna h>y.....	150
3.1.2.11. Guherîna j>c.....	150
3.1.2.12. Guherîna j>ş	151
3.1.2.13. Guherîna k>g.....	151

3.1.2.14. Guherîna l>r	151
3.1.2.15. Guherîna m>b	151
3.1.2.16. Guherîna n+g>y.....	152
3.1.2.17. Guherîna n>l	152
3.1.2.18. Guherîna n>m	152
3.1.2.19. Guherîna s>z	152
3.1.2.20. Guherîna p>b	152
3.1.2.21. Guherîna r>l	152
3.1.2.22. Guherîna t>d	153
3.1.2.23. Guherîna v>f	153
3.1.2.24. Guherîna w>û.....	153
3.1.2.25. Guherîna w>y.....	153
3.1.2.26. Guherîna w>o:	153
3.1.2.27. Guherîna x>q.....	153
3.1.2.28. Guherîna y>h.....	154
3.1.2.29. Guherîna y>ê.....	154
3.1.2.30. Guherîna z>ş	154
3.1.2.31. Guherîna /c/ (ç)>a	154
3.1.2.32. Guherîna /c/ (ç)>h.....	154
3.1.2.33. Guherîna /c/ (ç)>y	155
3.2. Ketina dengan (dissapearance, segment delation).....	155
3.2.1. Ketina Dengdêran	156
3.2.1.1. Ketina /a/yê	156
3.2.1.2. Ketina /e/yê	157
3.2.1.3. Ketina /i/yê	158
3.2.1.4. Ketina /î/yê	160
3.2.1.5. Ketina /o/yê:	160
3.2.1.6. Ketina /u/yê:	160
3.2.1.7. Ketina /û/yê	160
3.2.1.8. Ketina Kîteyan	161
3.2.2. Ketina Nedengdêran.....	162
3.2.2.1. Ketina /b/yê	162

3.2.2.2.Ketina /c/yê.....	163
3.2.2.3.Ketina /d/yê	163
3.2.2.4.Ketina /g/yê	164
3.2.2.5.Ketina /h/yê	164
3.2.2.6.Ketina /j/yê	165
3.2.2.7.Ketina /k/yê	166
3.2.2.8.Ketina /l/yê	166
3.2.2.9.Ketina /m/yê	167
3.2.2.10.Ketina /n/yê	167
3.2.2.11.Ketina /r/yê.....	168
3.2.2.12.Ketina /s/yê.....	169
3.2.2.13.Ketina /t/yê.....	169
3.2.2.14.Ketina /v/yê	171
3.2.2.15.Ketina /y/yê	171
3.2.2.16.Ketina /z/yê.....	172
3.3.Dengdêrbûn (vocalisation).....	172
3.4.Lêzêdebûna dengan (apearence, segment addition, anaptyxis, adventitious sound)	173
3.5.Kewîyana nedengdêran (contraction)	177
3.6.Dengên kelijandinê (nedengdêrên alîkar/ intervocalic euphonic conconant)	177
3.7.Cêwîbûn (gemination).....	178
3.8.Cihguherîna/veguhêzîya dengan (metathesis)	179
3.9.Pevbestin (liaison).....	180
3.10.Lêkdana dengdêran (hiatus)	181
ENCAM	182
ÇAVKANÎ.....	187
PÊVEK 1: Nexşeya Çiyayê Tûr Abdînê	196
PÊVEK 2: Nexşeya cih û eşîretên herêmê.	196
PÊVEK 3: Nexşeya topoxrafyaya Kercos û derdora wê.....	197
PÊVEK 4: Nexşeya bilindahî û nizmahîyên Kercos û derdora wê.	197
PÊVEK 5: Nexşeya gundên Kercosê û cihê Gundê Xerabê Bena 1.	198
PÊVEK 6: Nexşeya gundên Kercosê û cihê Gundê Xerabê Bena 2.	198
PÊVEK 7: Wêneyê gundê Xerabê Bena (ji jor ve û nizm)	199

PÊVEK 8: Wêneyê gundê Xerabê Bena (ji jor ve û bilind)	199
PÊVEK 9:Wêneyê gundê Xerabê Bena (ji pêş ve)	200
PÊVEK 10: Wêneyê Xerabê Bena (ji Dîyarê Reza ve)	200
PÊVEK 11: Wêneyê erdnigarîya gund û riwekên derdora wî.	201
PÊVEK 12: Wêneyê kavilekî ji Xerabê Bena	201
PÊVEK 13: Wêneyên benên gundê Xerabê Bena	202
PÊVEK 14: Dengên Kurdî li gor Alfabeya Fonetîk a Navneteweyî	203
PÊVEK 15: Metnên ku di çarçoveya vê xebatê da hatin berhevkirin	204
PÊVEK 16: FERHENGOK.....	254

KURTE

Zimanê kurdî xwedî gelek zarava û devokên cuda ye. Di nav zaravayên kurdî da kurmançî xwedîyê cihekî taybet e. Ev zarava li erdnîgarîyeke berfireh tê axaftin. Di bin zaravayê kurmançî da gelek devok û bindevok hene ku devoka Torê jî yek ji wan devokên vê zaravayî ye.

Di vê xebatê da ku navê wê *Dengên Devoka Torê* ye, li ser dengên devoka Torê û prosesên fonolojîk yên vê devokê lêkolîn hatiye kirin. Xebat ji destpêkekê û sê beşan pêk hatiye. Di destpêkê da derbarê xalên wekî mijar, armanc, rêbaz, çarçove û kêşeyên xebatê û xebatên ku derbarê dengsazîya deverê da hatine kirin agahî hatine dayîn. Beşa yekem ji bo ziman û dengnasîyê hatiye veqetandin ku di vê beşê da di bin sernavê ziman da termên ziman, zarava û devokê hatine ravekirin û hewl hatiye dayîn ku cihê devoka Torê di vê dabeşkirinê da bê tesbîtkirin. Di vê beşê da danasîna herêma Torê, navçeya Kercosê û gundê Xerabê Bena jî hatiye kirin. Di beşa yekem da termên têkildarî deng hatine nasandin û pêkhatina dengên hatiye vegotin. Beşa duyem ji bo ravekirina taybetîyên dengên devoka Torê hatiye veqetandin. Ji bo fonemên ku di alfabeya kurmançî ya bi tîpên latînî da tune ne grafîm hatine dayîn. Herwiha ji bo alofon jî bîna naskirin nîşanên taybet hatine bikaranîn. Di beşa sêyem da prosesên fonolojîk ên ku di devoka Torê da rû dane hatine vekolan û tesbîtên derbarê van bûyerên dengên da hatine parvekirin.

Di van beşan da metnên ku di çarçoveya vê xebatê da hatine berhevkerin li ser esasên fonolojîyê hatine şîrovekirin. Herwiha cudahîyên fonetîk û fonolojîk yên devoka Torê û kurmançîya nivîskî/nîvstandard hatine amajekirin. Di xebatê da rêbazên zimannasîya hevdemî (senkronîk) û şayesî (deskriptîv) wekî rêbaz hatine bikaranîn. Di dawîya xebatê da encamên giştî ku di lêkolînê da hatine bidestxistin hatine dayîn. Piştî encama lêkolînê metnên ku hatine transkrîbekirin cih girtiye ku xebatê ji alîyê mînak û tesbîtan ve pala xwe daye van metnan.

Peyvên sereke: fonolojî, fonetîk, devoka Torê, dengdêr, nedengdêr, fonem.

ÖZET

Kürtçenin birçok lehçe ve ağzı vardır ve lehçeleri arasında Kurmanci özel bir yere sahiptir. Bu lehçe geniş bir coğrafyada konuşulmaktadır. Kurmanci lehçesinde birçok ağız ve alt ağız yer almaktadır. Tor ağzı da bu lehçe içinde yer alan ağızlardan bir tanesidir.

Tor Ağzı Sesleri isimli bu çalışmada Tor ağzındaki sesler ve fonolojik süreçler araştırılmıştır. Çalışma, giriş ve üç bölümden oluşmaktadır. Giriş bölümünde çalışmanın konusu, amacı, çalışmada kullanılan yöntem ve teknikler, çalışmanın zorlukları ve yörenin fonetiği üzerine yapılan çalışmalar gibi noktalara değinilmiştir. Birinci bölüm dil ve fonolojiye ayrılmıştır. Bu bölümde dil başlığı altında dil, lehçe ve ağız terimleri açıklanmış ve bu sınıflamada Tor ağzının yeri belirlenmeye çalışılmıştır. Bu bölümde Tor bölgesinin, Gercüş ilçesi ve Xerabê Bena köyünün tanıtımı da yapılmıştır. Yine bu bölümde sesle ilişkili terimler tanıtılmış ve seslerin oluşumu anlatılmıştır. İkinci bölüm Tor bölgesinin seslerinin özelliklerinin tanıtılmasına ayrılmıştır. Latin kökenli Kurmanca alfabede bulunmayan fonemler için grafimler verilmiştir. Aynı şekilde alofonların ayırt edilmesi için de özel işaretler kullanılmıştır. Üçüncü bölümde Tor ağzında gerçekleşen fonolojik süreçler araştırılmış ve ses olayları ile ilgili tespitler paylaşılmıştır.

Bu bölümlerde, bu çalışma kapsamında derlenmiş olan metinler fonolojik esaslara göre yorumlanmıştır. Aynı şekilde Tor ağzının yazılı / yaristandard kurmanca ile fonetik ve fonolojik açıdan farklılıklarına işaret edilmiştir. Çalışmada eşzamanlı ve betimsel dilbilimi yöntemleri uygulanmıştır. Çalışmanın sonunda, çalışma sonucu elde edilen genel sonuçlar verilmiştir. Çalışmanın sonucundan sonra bu çalışmanın örnek ve tespitler yönünden dayandığı transkribe edilmiş metinler yer almıştır.

Anahtar kelimeler: fonoloji, fonetik, Tor ağzı, ünlü, ünsüz, fonem.

ABSTRACT

Kurdish has many dialects and regional accents. Among the dialects, Kurmanji has a special place. This dialect is spoken in a wide geography. There are many dialects and sub-dialects in Kurmanji dialect. Tor accent is one of the dialects in these ones.

In this study, named The Sounds of Tor Accent, the sounds and phonological processes in the Tor accent were investigated. The study consists of an introduction and three parts. In the introduction part, the subject, aim, methods and techniques used in the study, the difficulties of the study and the studies on the phonetics of the region are mentioned. The first part is devoted to language and phonology. In this section, language, dialect and regional accent terms are explained under the title of language and the location of Tor dialect is tried to be determined. In this section, the Tor region, Kercos district and Xerabê Bena village were introduced. In this section again, the terms related to sound are introduced and the formation of sounds is explained. The second part is devoted to introduce the characteristics of the Tor region. Graphs are given for phonemes that are not available in Latin Kurmanji alphabet similarly, graphs were used to understand olophones. In the third chapter, sounds in Tor are investigated and findings about these sounds' events are presented.

In these chapters, the texts compiled within the scope of this study are interpreted according to phonological principles. Likewise, the differences between the written / semi-standard kurmanjî dialect and the phonetic and phonological aspects of the dialect were pointed out. In this study, synchronic and descriptive linguistic methods were applied. At the end of the study, the general results obtained from the study were given. After the conclusion of the study, transcribed texts based on the sample and the findings of this study were included.

Key words: phonology, phonetic, Tor mouth, vowel, consonant, phonem.

PÊŞGOTIN

Beşên zimannasîyê watenasî (semantic), teşenasî (morphology), hevoksazî (syntax), peyvnasî (etymology) û dengnasî (phonology) ne. Di nav xebatên zimannasîyê da dengnasî cihekî girîng digire. Lewra di zimanek, zaravayek yan jî devokekê da taybetîyên karakterîstîk ên herî berçav wekî taybetîyên fonolojîk xwe didin der. Ji bo xebatên li ser fonolojîya devokekê û herwiha ji bo zimannasîya wê devokê karên berhevkirina zimannasîyê pir girîng in. Bi saya van xebatan mîrata çanda gelêrî ya ku bi rêya ziman tê veguhestin, îmkana xweparastinê dibîne û ji xetereya tunebûnê xelas dibe. Ji ber ku her devok û bindevok di nav xwe da dewlemendîyeka mezin dihewînin, divê rojek berî rojekê ji her derê welat dengên axêverên wan devokan bîn qeydkirin ku ev xetereya windabûna wan dewlemendîyan ji holê rabe. Heke na ew dewlemendî dê bîn jibîrkirin. Lewra nûnerên wê çand û dewlemendîyê roj bi roj bêdeng koç dikin û wê dewlemendîya çandî bi xwe ra dibin.

Me jî bi vê mebestê deng berhevkin û ji ber ku taybetîyên karakterîstîk yê devokî berî her tiştî xwe di dangan da didin der ev xebat li ser dengnasîyê kir. Xerabê Bena jî yek ji gundên welat e û devoka herêma Torê xwe li vî gundî jî nîşan dide ku bi Kercosê ve girêdayî ye. Kercos navçeyeka Batmanê ye. Bi vê xebatê taybetîyên dengên devoka Torê û prosesên fonolojîk yê wê devokê hatine tesbîtkirin. Bi rêbaza senkronîk a şayesî taybetîyên dengên devoka Torê hatine nirxandin.

Di dema transkrîbekirina qeydîyan da gelek peyvên herêmî bal kişandin ku li gor nêrîna me ev peyv bi xwe dibin mijara lêkolîneka din. Ji wî alîyî ve tekstên ku hatin berhevkin li benda lêkolîneran in. Hêvîdar im ev xebat di pêş da dê piştgirîyê bide lêkolînên berfirehtir yê fonolojîya devokî û bi taybet ya devoka Torê.

Di dawîyê da ji wan hemû kesan ra spas dikim ku keda wan li ser vê xebatê çêbûye. Bi taybetî divê ez spasîya xwe ji şewirmendê wê xebatê Doç. Dr. M. Zahir Ertekin ra bikim ku di hemû merheleyên xebatê da di alîkarîyê da teksîr nekir. Digel mamosteyê min ji lijneya parastinê ra, Doç. Dr. Hayreddin Kızıl û Dr. Öğr. Üyesi Hêmin Omar Ahmad ra spas dikim.

KURTEBÊJE

- amd.** : amadekar
b. : baneşan
B.Z. : berî zayînê
bnr. : binêre
c. : cild
c.n.d. : Cihê çapê nediyar e.
cî. : cînavk
d. : daçek
d.n.d. : Dîroka çapê nediyar e.
ed. : edîtor
h. : hejmar
h.b. : heman berhem
ho. : hoker
hwd. : her wekî yên din
l. : lêker
n. : navdêr
niv. : nivîskar
r. : rûpel
rd. : rengdêr
Vgh. : veguhêzer
wer. : wergêr

SEMBOLENA KU DI BEŞÊN LÊKOLÎNÊ DA HATINE BIKARANÎN

() : numereya metna berhevkerî

// : dengê fonem

[] : dengê alofon

“ ” : minaka ku ji metnên berhevkerî hatiye wergirtin.

...<... : forma devoka Torê < forma kurmancîya nivîskî

...>... : forma kurmancîya nivîskî > forma devoka Torê

Ø: nîşaneyê bûyera ketina deng

NÎŞANÊN TRANSKRÎPSIYONÊ

˘ : Nîşaneyê pevbestinê. Wekî “ mi˘dbir” > min dibir.

(?): devera ku nehat famkirin.

: : Nîşaneyê bilêvkirina dirêj. Wekî “ pê dakî:r” > pê dakir

‘: wekî “ na” > na

...: hevoka netemamkerî.

á: wekî “Haṭiná.” < Hatine.

b: wekî “banî” < banî

ç̣: wekî “ç̣al” < çal

ç̣: wekî “ç̣em” < çem

^e: wekî “^eewte^eewṭ” < ewteewt

^{ch}: wekî “ç^{ch}a^v” < çav

d: wekî “derew” < derew

f̣: wekî “f̣iṭne” < fitne

ḥ: wekî “beḥr” < behr

ḳ: wekî “ḳul” < kul

ḷ: wekî “p̣iḷing” < piling

ṃ: wekî “ṃeẓiṇ” < mezin

ṇ: wekî “ṃeẓiṇ” < mezin

p̣: wekî “p̣ar” < par

p̣: wekî “p̣î” < pî

ṛ: wekî “ṛasṭ” < rast

ṣ: wekî “ṣed” < sed

ş̣: wekî “ş̣eṛṭ” < şert

ṭ: wekî “ṭeniḳ” < tenik

ṭ: wekî “ṭinaẓ” < tinaz

ṿ: wekî “ṭaṿ” < tav

x̣: wekî “x̣eṛiḅ” < xerîb

ẓ: wekî “ẓiṛne” < zirne

DESTPÊK

Herêma Torê di dîrokê da gelek çand di nav xwe da hewandine û ev der di serdemên cuda da ketiye bin desthilatdarîya gelên cûrbicûr. Vê peywendî û hevnasînê elbet li ser zimanên ku li herêmê tên bikaranîn û li ser devokên van zimanan tesîr kiriye. Devoka Torê jî gelek peyv û bikaranînên din yên van zimanan wergirtine. Îro li herêma Torê di bin baskên devoka Torê da bindevokên herêmî jî hene û carinan navçe bi navçe, gund bi gund ev taybetîyên devokî yên herêmî xwe nîşan didin. Hetta carinan taybetîyên ziman yên xweser li gor malbatan jî diguherin. Ji ber ku her herêm û devok û bindevokên wê dewlemendîyên bêhempa dihewînin, divê li her çar alîyê welat xebatên devokî yên şayesî bêhtir bên kirin. Divê neyê jîbîrkirin ku zimanê nivîsê di heman demê da dibe zimanê edebî jî û ev yek ji alîyekî din dibe sedema xwe nîşannedana taybetîyên devokî yanê yên axaftinê yê wî zimanî. Ji bo ku zanista zimannasîyê bi awayekî bêkêmasî bê kirin divê xebat pala xwe bidin dewlemendîyên zîman ku ew dewlemendî bêhtir di devokan da xwe nîşan didin.

1.Mijara xebatê

Navê xebatê “Dengên Devoka Torê” ye û ev lêkolîn li ser tekstên ku di çarçoveya vê xebatê da ji kesên gundê Xerabê Bena hatine berhevkirin, hatiye kirin. Di xebatê da hewl hatiye dayîn ku ji alîyê fonetîk û fonolojîyê ve bi mînakê gundê Xerabê Bena li dengên devoka Torê bê nêrtin û taybetîyên wê, ji alîyê van zanistan ve bên tesbît kirin. Digel dengên ku di alfabeyê da temsîliyeta wan hene fonem û alofonên ku xweserê devoka Torê ne jî di vê xebatê da hatine tesbît kirin.

Tesbît kirina deng û taybetîyên wan dengên devoka Torê yên ku li gundê Xerabê Bena di axaftinê da tên bikaranîn û rûdanên bûyerên dangan yên di devoka Torê da mijara teze pêk tînin. Di vê xebatê da dema bikaranîna “devoka Torê” derbas bibe, divê bê zanîn ku tesbîtên derheqê vê devokê da bi tekstên ku ji vî gundî hatine berhevkirin ra girêdayî ne. Ji bilî dengên ku di alfabeya kurdîya latînî da cih ji xwe ra dîtine, yên ku -çi fonem çi alofon- di devoka Torê da hene dibin mijara vê xebatê.

2.Çarçoveya xebatê

Kurdî zimanekî Hindo Ewropî ye û çend zaravayên wê hene. Yek ji wan zaravayan jî kurmançî ye û çend devokên vî zaravayî hene. Devoka Torê yek ji wan devokên vî zaravayî ye. Ev xebat hewl dide ku taybetîyên dengên devoka Torê bi mînakê gundê Xerabê Bena vekole. Dema ev yek hat kirin jî xebat, pal da tekstên ku di sala 2018an da bi awayê dengqeydkirinê ji kesên gundê Xerabê Bena hatine peyda kirin. Ji ber hin zerûriyetan ku di binbeşa “kêşeyên xebatê” da dê bîn ravekirin ji nav çavkanîyên ku axaftinên wan hatibûn berhevkirin hejmar daket 4 kesan. Qeydîyên van çar çavkanîyan ji bo bikaranîna vê xebatê hatin hilbijartin. Sehayê dengqeydkirinê gundê Xerabê Bena ye û ev gund hem wekî dîrokî û hem wekî sîyasî bi navçeya Kercosê* ve girêdayî ye.

Ev xebat li gor tekstên ku ji kesên gundê Xerabê Bena hatine berhevkirin agahîyên ku derbarê fonetîk û fonolojîya devoka Torê da ne di nav xwe da dihewîne. Yanê kozmosa¹ vê xebatê ji alîyê tekstên berhevkirî ve Gundê Xerabê Bena ye.

Ji ber ku ev xebat tenê behsa dengên devoka Torê dike, neketiye beşên din yê zimanasîyê yê wekî sentaks, morfolojî û semantîkê. Vê xebatê ji alîyê deranînên derheqê devokê da pala xwe daye tekstên ku ji kurmançîaxêvên vî gundî hatine berhevkirin. Tekstên ku ji gundîyên Xerabê Bena hatine berhevkirin ji alîyê fonetîka şayesî (descriptive) ve hatine nirxandin.

Sedema hilbijartina vî gundî ne ew e ku bi hin taybetîyên xwe ji devoka Torê vediqete, bereksê wê hemû taybetîyên devokê di xwe da dihewîne. Ev gund jî gundek ji welatê me ye û wekî gundên din çavkanîyê temendirêj roj bi roj ji vî gundî jî kêr dibin.

* Kercos, bi navê xwe yê fermî “Gercüş”, navçeyeka bajarê Batmanê ye.

¹ Ev peyv di termînolojîya tirkî da wekî “evren”ê derbas dibe. Ji bo vê termê bnr. Işıl Kabakçı Yurdakul, “Evren ve Örneklem”, *Bilimsel Araştırma Yöntemleri*, (niv. Suzan Duygu Bedir Erişti, Abdullah Kuzu, Işıl Kabakçı Yurdakul û yê din), (ed. Adile Aşkın Kurt), Anadolu Üniversitesi, Ankara 2013, r. 77.

Karasaar jî “evren”ê wekî “hemû endamên ku tên xwestin ku bîn gelemperîkirin” terfî dike. Ji wî alîyî ve jî ji ber ku kozmosa xebatê wekî kozmosa ku mirov dikare xwe bigihîjinê hatiye terfîkirin, Xerabê Bena ji bo vê xebatê dibe “kozmosa xebatê”. Bnr. Niyazi Karaasar, *Bilimsel Araştırma Yöntemi*, Nobel, Ankara 2009, r. 109.

3. Girîngî û armanca xebatê

Hemû zimanên nivîsê serê pêşî wekî zimanê axaftinê tên bikaranîn û dû ra li gor şert û merc û rewşan dibin zimanê nivîsê. Di vê merheleyê da her yek ji devokên ziman jî ji bo peyv û vegotin û taybetîyên vegotinê dibin çavkanîyeka zimanê nivîsê. Devok, bi heyîna xwe zimanê nivîskî dewlemendtir dikin. Devoka Torê jî di kurmancî da ji alîyê erdnîgarîya xwe ya ku tê da tê axaftin ve gelekî berfireh e. Ji wî alîyî ve hêjayî lêkolînê ye. Nebûna lêkolînên xweser û têrker yên li ser dengsazîya herêmê û di heman demê da xwedîbûna dewlemendîyeka mezin ya herêmê bû sedema peydabûna fikra xebatê.

Bi mînaka gundê Xerabê Bena bi rêbaz û rêgezên zanistî tesbîtkirina dengên devoka Torê û şîrovekirina taybetîyên wan dangan û herwiha tesbîtkirin û şîrovekirina bûyerên dangan yên ku di vê devokê da diqewimin armanca teze pêk tînin. Ji alîyê din armanca din ya talî jî ew e ku peyvên herêmî yên ku di tekstên di vê xebatê da hatine berhevkirin, piştgirîyê bidin dewlemendîya hebana peyvan ya di kurdîya nivîskî da.

Armanca û hêvîyeka din ew e ku dibe ku di pêşerojê da nexşeya devokî ya kurdîya kurmancî bê derxistin û ev xebat alîkarîyê bide wê nexşeyê. Lewra ji bo nexşeyê divê berî ku ew taybetîyên devokî bi kesên axêverê wê dewokê ra koç bikin xebat bînin kirin. Ev rastîyek e ku zimanên ku daneyên wan bi awayekî nivîskî berê nehatine berhevkirin û niha jî wekî “zimanên mirî” tên binavkirin niha baş nayên famkirin û mixabin êdî ew îmkana jêfamkirinê jî ji holê rabûye.² Hêvîyeka din ew e ku ev xebat piştgirîyê bide lêkolînên devokî yên ku li bakur dê di pêş da bînin kirin.

Nivîskarê teze jî axêverê vê devokê ye û wekî axêverê surîştî (native speaker) û herwiha wekî çavkanîyekî surîştî jî dikare bê qebûl kirin. Di analîzan da ji bo tesbîtên taybetîyên devokê ev taybetî pir bi kêrî xebatê hat.

² Wekî mînak zimanê Tazmanyayî piştî ku axêverên wî zimanî neman, dora sala 1875an bi timamî mir û îmkana hînbûna taybetîyên wî zimanî ji ber kêmbelgekirina wî, îro jî pir kêr e. Bnr. Jean Perrot, *Dilbilim*, Dost, Ankara 2006, r. 34.

Tekstên lêkolîna devokî dibin kereste ji bo lêkolînên edebiyata gelêrî, sosyolojî û qadên bi wan re têkildar. Di lêkolînên devokî da ji bo ku mirov bi awayekî têr û tije bikaribe taybetî û hebana peyvên devokê bide, divê metnên berhevkirî yên têrdar hebin. Yanê zêdebûna hejmara metnên ku li ser tînan xebitî pir girîng e. Ji ber ku metnên vê lêkolînê bi tevahî 21.425 peyvên berhevkirî dihewînin û bi qasî çil û pênc rûpelan in, ji wî alîyê ve ev yek dibe sedema bihêzbûna girîngiya xebatê.

Ji ber pêşveçûnên teknîkî û gelemperîbûna amûrên ragihandinê tahlûkeya qelsbûn an jiholêrabûna hin taybetîyên devokî rû dide. Sedemeka din ya qelsbûn an jiholêrabûna van taybetîyan ew e ku çiqas diçe koçberîya ji gundan zêdetir dibe. Dema gundîyên ku taybetîyên devoka xwe ya sînardar di axaftinên rojane da bi kar tînin koç dikin û ji warên xwe diqetin bibe nebe ev yek bandor li axaftina wan dike û taybetîyên lokal qels dibin û bi bajarvanîyê ra ew jî dibin yek ji wan kurdîaxêvê bajarî ku êdî kurdîya wan ber bi kurdîyeka hevpar ve diçe. Ji ber vê jî divê ev taybetîyên devokî bê derengî bînin tesbîtkirin da ku nîfşên bînin jê bêpar nemînin.* Ev xebat ji bo tesbîtkirina senkronîk ya xweserê vî gundê Torîaxêv bû belgeyeka qeydkirî.

4.Rêbaza lêkolînê

Ji ber ku me dizanîbû çavkanîyên serbixwe yên derheqê gundê Xerabê Bena da tunebûn ji bo rêbaza devokî û dengnasîyê ji serî da me giranî da ser xebatên tirkî û kurdî yên ku derheqê devoknasî û dengnasîyê da bûn. Ji ber ku gundê Xerabê Bena wekî kozmosa xebatê hatibû hîlbijartin, ji axêverên ji vî gundî di sala 2018an da lê di demên cuda da bi rêbaz û amûrên berhevkirina sehayî, qeydîyên dangan hatin bidestxistin. Ev qeydkirin di formata MP3yê da bûn.

Piştî qeydîyan bi demeka dirêj transkrîbekirina qeydîyên dangan dest pê kir ev yek derfeta bi gelek çarçûnên guhdarîkirina qeydîyan da destê me. Ji bo derbaskirina ser kompîterê ya bi awayekî bêkêmasî/bi kêmasîya esxerî, evyek pir girîng bû.

* Li vir hêjayê behskirinê ye ku Aykoç di pirtuka xwe da bal kişandibû ser bilêvkirina peyvên û cudabikaranîna ziman û digot ku gund bi gund eger ji yek bavîkî ji hev qetiyabin jî axaftina mirovan cûda ye û eger em li derûdora xwe binêrin em dê çavdêrîya vê rewşê bikin. Bnr. Fergîn Melîk Aykoç, *Kurdîzan Rûberîna Zaravên Kurdî*, Weşanên Înstîtûta Kurdî, Berlin 1996, r. 21.

Dema ev qeydî derbasî kompîterê hat kirin nîşaneyên transkrîpsîyonê hatin bikaranîn. Nîşaneyên veguhestinê li gor lêkolîna me ya di çarçoveya vê xebatê da û perwerdehîya me ya ku me di xwendekarîya lîsansê de dîtibû ji pergala transkrîpsîyona lîteratura tirkî hat bikaranîn. Berî ku metin bîn dayîn bi gelemperî behsa hin taybetîyên kesên çavkanî û naveroka metnan hat kirin. Dû ra ji bo her metnekî hejmarek hat diyarkirin û ev hejmar li ser metin hat dayîn. Her metnek di nav xwe da ji lê dest pê kir û pêncênc li serê her rêzê numere hat dayîn. Bi vî awayî hat xwestin ku hem tevlihevî çênebe û hem jî wekî dîtbarî jî metn zêde bi reqeman giran nebe.

Metnên ku hatin transkrîbekirin û derbasî nivîsê bûn, ji aliyê fonetîk û fonolojîyê ve hatin vekolan. Di beşên vekolînê da mînakên ku ji vê tekstê hat wergirtin di nav dunikê da hat dayîn. Dû ra nîşaneyê “xalecotê*(:)” hat bikaranîn û wateya wê bi awayê kurmancîya nivîskî êdî bê dunik hat dayîn. Dû ra di nav kevanekê da li gor rêzê pêşî numereya tekstê û dû ra numereya rêza ku mînak jê hatiye wergirtin hat bikaranîn. Di navbera her du numereyan da jî ji nîşanên xalbendîyê nîşaneyê “xwarexêz (/)” hat danîn da ku cihê minaka ku jê hatiye wergirtin bi hêsanî bê dîtin. Çawa ku Bedirxan jî bal kişandîye ser³ di nivîsê da pîrbûna nîşanan wê nivîsê kirêt dike. Lewma heta ji dest hat di deverên ku li gor ixtiyarê bûn da nîşane ji bo her tiştî nehatin teyînkirin.

Dema beşên xebatê hatin dayîn li gor rêgeza “ji giştî ber bi taybet ve (general to private)” agahî hatin honandin. Ji bo mijar baş zelal bibe hat dîqetkîrin ku ji bo her binbeşê an her rewşa ku hat tesbîtkîrin bi têdarî mînak bîn dayîn. Di beşa yekem da dema dengên devoka Torê hatin dayîn nîşaneyê wan ya li gor Alfabe ya Fonetik ya Navneteweyî (IPA)^{*} jî hat dayîn. Di dawîya beşa lêkolînê da encamên hatin bidestxistin xal xal hatin dayîn. Du ra çavkanîyên ku di prosesa nivîsandina tezê da ji wan hatiye sûd wergirtin li gor rêza alfabetîk cih digire. Ji aliyê din di dema vekolînê

* Di beşa duyem da xalecot hatiye dayîn. Di beşa sêyem da ji bo şiklê dawî ango awayê wê yê kurmancîya nivîskî nîşaneyê “>”yê, ji bo awayê wê ya di devoka Torê da jî nîşaneyê “<”yê hatiye bikaranîn.

³ C. Bedirxan wiha dibêje: “Boşbûna nîşanan nivîsandinê kirêt dike.” Bnr. Celadet Alî Bedirxan, *Alfabeya Kurdî & Bingehên Gramera Kurdmancî*, Nefel, Stockholm 2002, r. 15.

* International Phonetic Alphabet

da hat dîtin ku hin peyvên ku di nav gel da dijîn lê di zimanê nivîsê da xwe nîşan nedane jî hene. Ev peyv di beşa ferhengokê da di gel wateyên wan hatine dayîn, da ku nivîskar, xwendevan, kurdîaxêvên niha û nifşên bê jê sûd wergirin. Di ferhengokê da cûreya peyva ku hatiye ravekirin jî hatiye diyarkirin. Piştî ferhengokê pêvekên xebatê cih digirin ku piştevanî didin famkirina xebatê.

Mijarên qeydîyên dangan bi gelemperî bîranînên kesên çavkanî, adetên sersalê, çîrok, zeyat, kesax, qaçaxçîtî û hwd. ne. Di pêşerojê da ev metin ji bo lêkolînên sehayî yên ku derheqê ziman, çand û rewşa mirovên herêmê ya di dema qeydîyan da ye didin dest, guncaw e. Di dema qeydgirtinê da heta ji dest hat li çavkanîyan mudaxele nehat kirin. Lewma jî carinan axaftin li ser mijarekê dest pê dikir, di dawîyê da dibû mijareka din. Ji ber wê yekê dû ra qeydîyên dangan û herwiha metin jî hatin parçekirin.

Ev xebat ji aliyê rastnivîsê ve li gor rêgezên *Rêbera Rastnivîsînê Komxebata Kurmancîyê** hatiye nivîsandin ku xizmetê ji bo standardîzasyona kurmancîya nivîskî bike. Bi gelemperî heta îmkanan izin da di pêvajoya tezê da em ji şopa vê komxebatê dûr neketin.

Di xebatên zimannasîyê da du cûreyên sereke yên rêbazan hene: 1. Rêbaza dîyakronîk ango dîrokî. 2. Rêbaza senkronîk ango hevdemî. Ev xebat, ji ber ku li dû rewşa taybetîyên deng û bûyerên dengên devoka Torê ya di dema îroyîn da dikeve, li ser esasê rêbaza senkronîk meşiyaye. Rêbaza senkronîk tim bi rêbaza şayesî (descriptive) ve têkildar e. Di xebatên şayesî da çavdêrî tim serdest e. Ji ber ku di dema qeydgirtinê da ji bo vî karî mirov eger rewşa tê da biguherîne dibe kêmasîyek⁴ û diviyabû ku wekî lêkolîner li çavkanîyan neyê mudaxelekirin heta ji destê me hat me dîqet kir ku qeydî di rewşa xwezayî da bîn bidestxistin. Di dema xebatê da me hewl da ku em ji daneyan gelemperîbûnan derxin ku heta ji destê me hat me ew gelemperîbûn şîrove kirin û encam û deranînên giştî tesbît kirin. Kesên ku di nav

* Bnr. Bahîz Omar Ehmed, Bahoz Baran, Behrûz Şucaî û yên din, *Rêbera Rastnivîsînê Komxebata Kurmancîyê*, Weqfa Mezopotamyayê, Stenbol 2019.

⁴ Erişti balê dikişîne ser vê pêşsertê. Bnr. Bedir Erişti û Suzan Duygu, "Bilimsel Araştırma Yöntemleri", *Bilimsel Araştırma Yöntemleri*, (niv. Abdullah Kuzu, Suzan Duygu Bedir Erişti, Işıl Kabakçı Yurdakul û yên din), (ed. Adile Aşkı Kurt), Anadolu Üniversitesi, Ankara 2013, r. 10.

kozmosa xebatê da cih girtin xwedî temsîliyeta taybetîyên devoka Torê bûn. Jixwe ne mumkin bû ku ji hemû axêverên⁵ devokê qeydî bên girtin. Çavkanîyên ku hatin hilbijartin temsîla devoka Torê dikin. Ji bo temsîliyeteka wan ya xurt hebe, di nav çavkanîyan da jin jî hene, mêr jî.

Di vê xebatê da wekî rêbaza tomarkirina daneyan, hevdîtina niv-formel⁶ û ya surîştî⁷ hatiye bikaranîn. Yanê carinan mecbûrî hin pirs ji wan hat kirin ku heta ji dest hat mudaxele li çavkanîyan nehat kirin. Axleb me mîkrofon vekir û me xwest ew biaxivin û sohbet di mecra ya xwe de bidome. Pirsên me pir sînordar bûn.

Analîzkirina dokumanên vê xebatê di pênc sefheyên da pêk hat. 1. Bidestxistina dokumanan. 2. Kontrolkirina resenîya dokumanan. 3. Fêhmkirina dokumanan. 4. Analîzkirina dokumanan. 5. Bikaranîna daneyan.⁸ Ji ber ku xebat li ser analîza şayesî dimeşîya esasen merheleyên sereke yên xebatê ev bûn: şayesandin, analîz û şîrove. Jixwe analîza xebatê bi hevdîtina çavkanîyên xebatê dest pê kiribû. Ji ber ku proseya analîza wesfînî ne wekî ya çendanîyî ye ku piştî derbaskirina daneyan ya li ser kompîterê dest pê bike. Ev analîz hêj bi destpêka tomarkirinan dest pê dike.⁹

5. Çavkanîyên xebatê û xebatên ku li ser dengnasîya devokê hatine kirin

Ji bilî çend projeyên lîsansa bilind ya bêtez yên ku li ser rêjeya dengên Torê hatine kirin derheqê dengnasîya devoka Torê da heta îro di asta master û doktorayê da lêkolîneka xweser û berfireh nehatiye kirin. Ji xwe dengnasî û dengsazîya kurmancîyê bi gelemperî di pirtûkên rêziman da wekî beşeka piçûk cih ji xwe ra

⁵ Di lêkolînê bi vî rengî da dibe ku her car mirov nikaribe xwe bigihîjîne kozmosa ku encamên lêkolînê tê da gelemperî dibin. Wê demê mirov dikare li kes, bûyer an diyardeyên ku hêza wan ya temsîliyeta kozmosê heye, bikole. Ev yek çareserîyeka pratîk e û di vê pêvajoyê da mirov serî li mînakkirinê dide. Bnr. Kabakçı Yurdakul, h.b., r. 75.;

Ji bo hilbijartina kesên ku temsîliyeta wan ya kozmosa xebatê heye bi tirkî “örneklem” tê gotin ku em dê jî jê ra “mînakkirin” bibêjin. Mînakkirin, prosesa pêkanîna endamên grûbê ye ku ew grûb xwedî temsîliyeta kozmosê ye. Bnr. Kabakçı Yurdakul, h.b., r. 80.

⁶ Karaasar ji bo vê termê, terma “yarî yapılanmış görüşme”yê bi kar anîye. bnr. Karaasar, h.b., r. 168.

⁷ Ji bo vê termê bi tirkî “yapılanmamış” (informal) jî tê gotin. Karaasar, h.b., r. 168.

⁸ Ev rêbaza analîzê li derecekirina analîza zanistî ya Kuzu rûdine. Bnr. Abdullah Kuzu, “Veri Toplama Yöntem ve Araçları”, *Bilimsel Araştırma Yöntemleri*, (niv. Suzan Duygu Bedir Erişti, Abdullah Kuzu, Işıl Kabakçı Yurdakul û yên din), (ed. Adile Aşkı Kurt), Anadolu Üniversitesi, Ankara 2013, r. 93-115.

⁹ Bnr. Yavuz Akbulut, “Verilerin Analizi” *Bilimsel Araştırma Yöntemleri*, (niv. Suzan Duygu Bedir Erişti, Abdullah Kuzu, Işıl Kabakçı Yurdakul û yên din), (ed. Adile Aşkı Kurt), Anadolu Üniversitesi, Ankara 2013, r. 139-162.

dîtine. Li bakur di asta lîsansa bilind da di warê fonolojîya devokî da ta niha du xebat hatine kirin ku di pêş da dê behsa wan bê kirin. Ji bilî van xebatan makaleyeka Gündoğdu* jî heye ku li ser dengdêr û nedengdêrên kurmançîya ku li Mûşê tê axaftin hatiye nivîsîn.

Bi qasî ku di vê lêkolînê da hat dîtin derheqê fonolojî û fonetîka devoka Torê da di asta master û doktorayê da tu tez nehatine nivîsîn. Berhemeka ku wekî pirtûk hatiye amadekirin jî tune ye. Berhemên ku derheqê dengnasîya kurdî da agahîyê didin ji berê ve ne wekî berhemên serbixwe lê di nav pirtukên rêziman da wekî beşek ji berhemê cî dane dengnasîyê.

Wekî dengnasîya kurmançî berhemeka berfireh ji aliyê Husein Muhammed ve hatiye nivîsîn ku di xebata me da jê baş sûd hat wergirtin. Navê berhemê “*Dengnasî di Kurdî de*” ye û çapa elektronîk e. Bi tevahî 432 rûpel e. Nivîskar di warê dengnasîya kurmançî da agahîyên berfireh dane lê ev berhem ne berhemeka devokî ye. Tê da deng û pêkhatina dengan, taybetîyên dengan û cudahîyên wan, têkiliyên dengan û hin bûyerên dengan cî digirin. Nivîskar di berhema xwe da di warê dengnasîyê da pir caran soranî, kirdkî û kurmançî digel mînakan hevber kirine.

Berhemeka girîng ji bo termên dengnasîya kurdî ji aliyê Talîb Husên Elî ve hatiye nivîsîn û li li Hewlêrê çap bûye. Termên dengnasî û dengsazîyê bi sê zimanan dide: îngilîzî, erebî û kurdî. Lê mixabin termên ku bi kurdî dide jî tenê bi zaravayê soranî dane. Lewma ji bo kurmançîya van terman di vê xebatê da jê zêde sûd nehat wergirtin. Navê berhema wî, *Ferhengî Zarawekanî Dengsazî*** ye.

Berhemên ku di asta teza masterê da di warê dengnasîya devokên kurmançî da li bakur hatine kirin ev in:

Di sala 2015an da li Zanîngeha Bîngolê di Enstîtuya Zimanên Zindî da ji aliyê Zafer Açar ve teza lîsansa bilind hatiye nivîsîn ku navê tezê “*Devoka Devera Filistanê*” ye. Di vê berhemê da Açar bi giranî li ser dengsazî û dengnasîya devoka

* Songül Gündoğdu, Remarks on Vowels and Consonants in Kurmanji, Anemon Muş Alparslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi, c.4, h. 1, Muş 2016, r. 57-70.

** Talib Huseyn Elî, *Ferhengî Zarawekanî Dengsazî*, Zencîrî Belawkirekanî Kovarî Asoyî Perwerdeyî-28, Hewlêr 2005.

Filistanê disekine. Tê da agahîyên herêma filistanê, dengên devoka devera Filistanê û taybetîyên wan, bûyerên dangan yên ku di devoka Filistanê da diqewimin cî digirin. Di dawîya tezê da Açar cî daye ferhengokeka ku ji peyv û bikaranînên devokê pêk tê.

Di heman salê da li Zanîngeha Mardîn Artukluyê di Enstîtuya Zimanên Zindî Yên Li Tirkiyeyê da ji alîyê Çetîn Taş ve teza lîsansa bilind hatiye nivîsîn ku navê tezê “Dengsazîya Devoka Çaldiranê” ye. Taş di vê berhemê da li ser dengsazî û dengnasîya devoka Çaldiranê disekine. Tê da agahîyên devoka Çaldiranê, dengên devoka devera Çaldiranê û taybetîyên wan, bûyerên dangan yên ku di devokê da diqewimin cî digirin. Di dawîya tezê da ferhengokeka ku ji peyv û bikaranînên devoka Çaldiranê pêk tê daye.

Da sala 2016an da li Zanîngeha Mardîn Artukluyê di Enstîtuya Zimanên Zindî Yên Li Tirkiyeyê da Barzo Omar Mahmoud teza lîsansa bilind nivîsiye. Navê teza Mahmoud “Şîrovekirineke Dengsazî û Fonolojî di Kurdiya Kurmancî de” ye. Mahmoud di teza xwe da li ser teorîya fonolojîyê, termên wê û dengên kurdiya kurmancîyê sekinîye. Mahmoud di teza xwe da ji bo temsîliyeta hin dangan di warê alfabe-yê da jî hin grafîm pêşniyaz kirine. Ev berhem her çiqas derbarê fonolojîyê da agahîyên berfireh bide jî ne li ser devoknasîyê ye. Lê ji bo dengsazîya devokan dibe çavkanîyeka girîng ya teorîya dengsazîyê.

Di warê rêjeya dengên devoka Torê da hin projeyên lîsansa bilind ya bêtez hatine nivîsîn ku hin ji wan ev in:

Gulçin Arslan Aydın, *Rêjeya Bikaranîna Dangan Di Herêma Torê de*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkiyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn 2013.

Behiye Bilgiç, *Rêjeya Bikaranîna Dangan Di Devoka Tor Abîdîn De (Wek Mînak Şeş Çîrokên Herêma Tor Abîdîn)*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Mêrdîn 2014.

Mehmet Bakır Güneş, *Rêjeya Bikaranîna Dangan Di Devoka Tor Abdîn De*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Mêrdîn 2013.

Lokman Kartal, *Rêjeya Bikaranîna Dengan Di Devoka Tûr Abdîn/Torê De (Kercos/Gundê Xerabêna)*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Mêrdîn 2013.

Mahsum Kaya, *Rêjeya Bikaranîna Dengan Di Devoka Tor Abidîn de*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Mêrdîn 2013.

Ahmet Şimşek, *Rêjeya Bikaranîna Dengan Di Devoka Kercosê De (Weku mînak Şeş Çîrokên Herêma Kercosê)*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Mêrdîn 2013.

Di warê teorîya zimannasî, dengnasî û dengsazîyê da berhemên ku di vê xebatê da ji wan herî zahf sûd hat wergirtin ev bûn:

Jean Perrot, *Dilbilim*, Dost, Ankara 2006.

Kaken Ahanov, *Dil Biliminin Esasları*, Türk Dil Kurumu, Ankara 2013.

Ferdinand De Saussure, *Genel Dilbilim Yazıları*, İthaki, İstanbul 2014.

Doğan Aksan, *Her Yönüyle Dil Ana Çizgileriyle Dilbilim*, C.1-2-3, Türk Dil Kurumu, Ankara 2015

Necip Üçok, *Genel Dilbilim (Lengüistik)*, Multilingual, İstanbul 2004.

Di ravekirina termên dengnasîyê da berhema ku di vê xebatê da jê herî sûd hat wergirtin ev bû:

Günay Karaağaç, *Dil Bilimi Terimleri Sözlüğü*, Türk Dil Kurumu, Ankara 2018.

Berhemên tirkî yên ku di prosesa dengqeydgirtin û transkrîbekirinê da di vê xebatê da ji alîyê teknîkê ve ji wan zêde hat sûd wergirtin ev bûn:

Ahmet Caferoğlu, *Anadolu Ağzlarından Toplamalar*, Ankara Üniversitesi, Ankara 1994.

Nurettin Demir, *Ankara Örneğinde Ağızların Belgelemesi*, Türk Dil Kurumu, Ankara 2013.

Leylâ Karahan, *Anadolu Ağızlarının Sınıflandırılması*, Türk Dil Kurumu, Ankara 2017.

6. Kêşeyên xebatê

Di warê qeydkirina dangan da amûrên teknîkî îmkana grafîzekirina axaftinê dide lêkolîneran¹⁰ û pê îmkana teqezkirina agahîya dengî peyda dibe lê mixabin em ji wê derfêtê bêpar bûn. Ji ber bêparbûna derfêta laboratuareka fonetîkî, di merheleya derbaskirina ser kompîterê da tenê ji guh sûd hat wergirtin. Bibe nebe ji ber vê yekê ihtimala şaşfamkirinê dê hebe lê ji bo ew ihtimal vekişe asta herî kêr, di pêvajoyê da ew îfade bi dehan caran ji nû ve hatin guhdarîkirin û di encamê da eger hêj jî ew teredid dewam kiribûna ji gundîyan hat pirsîn. Bi wî awayî ev kêşe hat çareserkirin. Lê dîsa jî di du cihan da îfade bi tu şiklî nehat famkirin. Lewma ji bo wan cihan di nav kevanekê da pirsnişanek hat danîn û deqîqe û saniyeya wê peyv an komepeyvê hat nişankirin.

Wekî din hin qeydî ji kesên ciwantir û xwende hatin kirin lê mixabin hat dîtin ku tesîra zimanên din li ser devok û bikaranîna devokê çêbûye. Ev jî bû sedema destjêberdan û fedakirina wan qeydîyan.

Belkî kêşeya herî zêde ev bû ku di warê dengnasî û dengsazîyê da her çiqas berhemên îngilîzî yên pir bikêr hebûn jî ji ber ku îngilîzîya me ne baş bû di dema lêkolînê da me kêmasîya nezanîya xwe ya ji bo vî zimanî pir kişand.

¹⁰ Bnr. Perrot, h.b., r. 37.

1.BEŞA YEKEM

HERÊMA TORÊ, ZIMANNASÎ Û DENGNASÎ

1.1.Herêma Torê û Gundê Xerabê Bena

1.1.1.Herêma Torê

Li herêma Torê ji bilî kurdîya kurmancî bi zimanên wekî siryanî, ermenî, erebî, domî jî hatiye/tê axaftin. Helbet çawa kurmancîya bi devoka Torê bandor li ser van zimanan kiribe û hin peyv dabin wan, van zimanan jî peyv dane devokê û gelek tesîr lê kirine. Di wîkîtionary da komepeyva “herêma Torê” wekî “devereka Mêrdînê” hatiye ravekirin û hatiye gotin ku peyv ji “Tor Abidîn” ê tê ku di zimanê aramî da tê maneya “Çiyayê Abidan”. Her du peyv ango “tor û abid” ketine erebî jî. Peyva “abid”ê wekî “evd” derbasî kurdî jî bûye.¹¹ Tor Abdîn parçeyeka Mezopotamyaya jorîn e û sînorên vê herêmê li rojhilat digihîje heta Cizîrê, li Rojava heta Mêrdînê, li bakur heta Heskîfê û li başûr jî heta Nisêbînê. Firehîya herêmê li dora 10.000 km² ye.¹² Keskin, herêma Tor Abdînê wekî “Tûr-Abdîn-Turoyo-Torê” dide û dibêje ku ev herêm Mêrdîn û derdora wê ye.¹³

Tor Abdîn navê zozaneka çiyayî ye ku navçeyên wekî Midyad, Stewr, Kercos û Heskîfê di nav xwe da dihevine. Çiyayên rêzîn yê vê herêmê di serdema klasîk da wek “Masius” û di serdema navîn da jî wekî “Tûr Abidîn” hatine binavkirin. Di çavkanîyên bizmarî da ev herêm wekî “Çiyayê Kaşyarî”^{*} derbas dibe. Ji parçeyê navîn yê vê zozanê ra “Nîrbû” û ji aliyê Mêrdînê ra jî “Îzala” dihat gotin.¹⁴ Li gor ku Kavak gotiye di çavkanîyan da navendên ku di nav herêma Torê da derbas dibin ev in: Tûr Abdîn (Midyad e ku wekî serbajarê Tûr Abdînê derbas dibe), Cizîr, Nisêbîn,

¹¹ <https://ku.wiktionary.org/wiki/Tor> (Pêgehîn: 26.03.2019).

¹² Şükran Yaşar, “Mor Loozor Manastırı”, *Mukaddime*, h. 2, Mardin 2010, r. 121.

¹³ Necat Keskin, “Tûr Abdîn’de bir kimlik ve anlatım biçimi: mıtırblar ve mıtırplık”, *Folklor / Edebiyat*, h. 84, Lefkoşa 2015, r. 57.

^{*} Di hevdişina me ya taybet da Farouq İsmail (Profesorê paleografyayê ye.) got ku navê vê herêmê di çavkanîyan da bi nivîsa mîxî wekî “kî-îş-îa-rî” hatiye nivîsîn. Hevdişina taybet, Batman, 07.05.2019

¹⁴ Hüseyin Güneş, “Tûr Abdîn Yöresinin İslamlaşma Süreci”, *Şırnak Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi*, h. 6, Şırnak 2012, r. 72-73.

Mêrdîn, Heskîf, Dara û Duneysir (Qoser). Ev navend di nav herêma Tûr Abdînê da ne û perçeyek ji Diyarê Rabîyê ne.¹⁵


Piştî ku mezopotamya ji alîyê misilmanan ve tê fetihkirin li gor navên qebîleyên ereban tê binavkirin: Diyarê Mudar, Diyarê Bekir û Diyarê Rabîe. Di nav sînorên Diyarê Rabîyê da Mûsil, Cizîr, Sincar, Nisêbîn û Dara hene.¹⁶ Yanê Tûr Abidîn di vê binavkirinê da dikeve nav qada “Diyarê Rabîe”yê. Di demên cuda da ji navendên vê herêmê navên hinan di nav herêmên din da jî derbas bûne. Li gor Kavak ev yek dibe ku ji cudabûna metodên binbeşkirina herêm û bajarên yê muellifan peyda bûbe.¹⁷ Tan, dema sînorê Tor Abdînê dide nasîn wê ji derveyê Mêrdînê dide destpêkirin û herêmên eşîreta Omerîyan tevî dixê nav. Qismekî mezin yê navçeya Stewrê di nav da heta nêzî Hezexê, –lê navenda Hezexê ne di nav da- Heskîf, Kercos, Kerboran, Mehser, Midyad û heta bi navenda Nisêbînê jî li gor terîfa Tan dikeve nav herêma Tor Abdînê.¹⁸ Li gor nexşeya jêrîn a herêma Torê hidûdê bakurê Torê hime bibêje çemê Dijleyê ye. Ev çem di heman demê da dibe sînorê herêma Botan û herêma Torê jî.

¹⁵ Mehmet Kavak, *Fetihten Selçuklu Hâkimiyetine Kadar Tur Abdin Bölgesi Tarihi*, Teza Lîsansa Bilind, İstanbul Üniversitesi, İstanbul 2013, r. 3.

¹⁶ Güneş, h.b., r. 73.

¹⁷ Kavak, h.b., r. 2.

¹⁸ Altan Tan, *Turabidin'den Berrîyê'ye Aşiretler, Dinler, Diller, Kültürler*, Nûbihar, İstanbul 2015, r. 17.



Nexşe 1¹⁹: Nexşeya Herêma Tûr Abdînê.

Di çavkanîyên dîrokî da derbas dibe ku Matîate (Mîdyad) -ku navendeka herêma Torê ye- dem bi dem bûye dikê şerê kralên Asûrîyan. Kralê asûrî Assurnasirpalê II. (B.Z. 884-858) bi berfirehî behsa sefera xwe ya ser vê navçeyê dike.²⁰ Herêma ku di kitabeyên Asûrîyan da wekî çiyayên Kaşîarî derbas dibe, mintiqeya Tûr Abdînê ye. Navê ku dû ra di metnên Asûrîyan da wekî Nîrbû derbas dibe, tê texmînkirin ku ji Tûr Abdîna Navîn ra hatiye gotin.²¹

Piştî hikumranîya Asûrîyan herêm li gor rêzê dikeve bin desthilatdarîya Îskît (B.Z. 653–625), Med (B.Z. 625–550) û Persan (B.Z. 550–331).²² Dû ra di sala B.Z. 331î da Îskenderê Makedonî vê herêmê distîne lê piştî mirina wî îcar herêm dikeve bin hikmê Selevkosan. Piştî ku Partî bi giştî êrîşî Mezopotamyayê dikin B.Z. di navbera salên 85–69an da herêm dikeve bin desthilatdarîya Tîgranê Mezin yê ku kralê ermenîyan bû. Piştî ermenîyan ev herêm dibe qada têkoşîna Persî û Romeyîyan

¹⁹ Altan Tan, h.b., pêvek.

²⁰ Güneş, h.b., r. 72-73.

²¹ Ahmet Demir, *İslam'ın Anadolu'ya Gelişi, (Doğu ve Güneydoğu İlleri)*, Kent, İstanbul 2008, r. 59.

²² Güneş, h.b., r. 73.

ya li dijî hev. Bîzentî û Sasanîyan jî vê kevneşopîyê didomînin û vê herêmê ji bo mucadeleya li hemberî hev bi kar tînin.²³

Piştî zayînê di sala 507an da ji bo rê li ber êrîşên Persîyan bê girtin Împarator Anastasiyê Romeyî bajarê Darayê ava dike. Piştî wî jî Justinianus (527–565) ji ber heman sedemê vî bajarî tehkîm dike. Di vê dewrê da gelek keleh tên avakirin. Piştî mirina Justîniyanus, Sasanî Dara û Mêrdînê bi dest dixin û bi wê dereceyê ku ji Tûr Abdînê derbas dibin û heta bi Farqînê diçin. Piştî sedsala VI'an Împarator Herakleios di sala 622yan da êrîş dibe ser Sasanîyan û êdî Bîzentî li ser herêma Tûr Abdînê dibin xwedî deng.²⁴

Piştî ku Îslam li ser rûyê dinyayê belav dibe li gelek cihan fethên misilmanan rû didin. Herêma Torê jî ji van fethan bêpar namîne. Xelîfe Emer, Îyaz b. Xenim wezîfedar dike ku li pêş leşkerên Îslamê be û fetha Cezîreyê bike. Ebû Mûsayê Eşarî digel leşkerên xwe êrîşî Nisêbînê dike û Îyaz b. Xenim jî bi ser Darayê ve diçe. Li Nisêbînê piştî şer peyman tê îmzekirin û ew der dikeve destê misilmanan. Dû ra Tûr Abidîn û keleha Mêrdînê tê fetihkirin.²⁵

Di dîrokê da gelek dewletan li vê herêmê desthilatdarî kiriye. Mesela ji bo Nisêbîna ku bajarekî herêma Torê ye ji B.Z. salên 4500an û bi vir ve dikare behsa desthilatdariya Sûmerîyan, Akadî, Babîlî, Asûrî, Mîtanî, Medî, Persî, Makedonî, Romeyî, Sasanî, Erebên misilman, Merwanî û Osmanîyan bê kirin.²⁶

Di dema fethên misilmanan da li vê herêmê Kurd, ereb, aramî (ku suryanî di bin vî navî da hatine dayîn), rûm, fars û ermenî û cihû hebûn.²⁷ Ev herêm di heman demê da bûye jêderka çand û dîroka Suryanîyan. Bi taybetî li Mêrdîn, Midyad û derdorên wan gelek şûnwarên Suryanîyan hene. Deyruzzaferana ku nêzî 640 salan

²³ Güneş, h.b., r. 74.

²⁴ Güneş, h.b., r. 75-76.

²⁵ Güneş, h.b., r. 84.

²⁶ Nezîrê Cibo, *Hevêrkan Sultanları-1*, Komal, İstanbul 2010, r. 24.

²⁷ Güneş, h.b., r. 86.

bûye navenda suryanîtiya ortodoks, li vê herêmê ye.²⁸ Li çiyayên Tûr Abidînê Êzidî jî hebûne.²⁹

Ji sala 857yê heta 894an ev herêm -bi taybetî jî Mêrdîn û derdora wê- 59 salan di bin desthilatdarîya Hemdanîyan da dimîne ku hevkarên Ebasîyên desthilatdarê Mûsilê ne. Dû ra di sala 990an da Merwanî -Mêrdîn û derdora wê jî di nav deherêmên ku di destê Hemdanîyan da bûn yek bi yek ji wan distîninin û ev herêm dibe axek ji axa dewleta Merwanîyan.³⁰

Herêm dû ra dikeve bin desthilatdarîya Artûqîyan. Piştî dagirkerîya Moxolan demeka dirêj derbas dibe û pêşî Karakoyunî û dû ra jî Akkoyunî (sedsala XV.) vê derê îdare dikin. Piştî sala 1501ê herêm dikeve bin bandora Safewîyan. Piştî şerê Çaldêranê (1514) û sefera Misrê ya Yavuz Selîm tevli Heskîf û Mêrdînê herêm êdî dikeve bin hikimdarîya Osmanîyan.³¹ Piştî avabûna Komara Tirkîyeyê jî herêma Torê li gor pergala fermî ya siyasî ya komarê wekî bajar, navçe, nahiye û gundan cî digire û heta niha bi vî şiklî tê.

Di dîrokê da herêma ku kurd lê ne tim bûye cihê şerên dewletan. Di nav van şerên dewletên mezin da kurd bi şiklekî xwe parastine û li gor şert û mercan terefê xwe hilibijartine û hewl dane ku li gor mercan berjewendîyên xwe biparêzin an hine din bi dest bixin. Ev helwesta terefbûn û xweparastin û carinan erîşbirina li ser hine din, li gor biryarên eşîretan rû daye. Wekî ku Bruinessen îşaret kiriye di nav kurdan da sedeqeta li malbatê, eşîretê û li serokeşîr ji bo peywendîyan bûye hêmaneka girîng.³²

Eşîret/eşîretbûn, hem bûye hêmana esas ya berxwedanên pîralî li nav kurdan û hem jî bûye sedema pevçûna navxweyî ku tê da pîr xwîn rijiyaye. Di vê hevsengîyê da, ji bo bi ser bikevin, eşîretên kurdan gelek caran alîkarî ji hêzên serdest jî standine. Ev dualîbuna binyada eşîretbûnê li Tor Abdînê jî xwe nîşan dide. Hevêrkî û

²⁸ Ayşe Güç Işık, "Süryani Cemaatinde Toplumsal Dönüşüm ve Siyasete Dâhil Olma." *İnsan ve toplum Bilimleri Araştırmaları Dergisi* c. 3, h. 4, İstanbul 2014, r. 740.

²⁹ Martin van Bruinessen, *Ağa, Şeyh, Devlet*, (wer. Banu Yalkut), İletişim, İstanbul 2013, r. 45.

³⁰ Demir, h.b., r. 87.

³¹ Güneş, h.b., r. 96.

³² Bruinessen, h.b., r. 19.

Dekşûrî bûne du hêzên dijberî hev.³³ Gundê Xerabê Bena jî her çiqas li gor nexşeya ku di berhema Altan Tan da ye di nav herêmên Dekşûrîyan da derbas bibe jî wekî ku ji axaftinên gundîyan hat derxistin tim di navbera her du teşekulan da maye û ji her du terefan jî alîgirên van teşekulan di gund da çêbûne. Lê dîsa ji axaftinên gundîyên ixtiyar tê derxistin ku di dema dualîbunê bêhtir alîgirên Hevêrkan³⁴ hebûne. Lê mirov nikare bibêje ku di nav herêma Hevêrkan da jî bûye.

Peyva Hevêrka hem bûye navê konfederasyona eşîrî û hem jî yê herêma ku ev konfederasyona eşîrî tê da cî girtiye.³⁵ Di nav kurdan da ji Midyad, Kercos û Nisêbînê ra -ku jê ra Tora Piçûk jî tê gotin- “Hevêrka” jî tê gotin. Ji alîyekî din ji ber platoya Tor Abidînê, jê ra ‘Tor’ û ji niştecihên herêmê ra jî ‘Torî’ hatiye gotin.

1.1.2.Kercos

Li gor nexşeya Nîşanyan peyva Kercosê ji “Kfargawsô” (gundê stargeh, penageh) ya siryanîkî tê û ev nav ji gundê Kelehê* hatiye girtin û bûye navê navçeyê.³⁶ Ji ber ku li Midyadê û derdora wê ku berê suryanî lê pir dijîn mirov rastî pir gundên ku bi peyva “kefer (bi siryanîkî: gund)”ê dest pê dikin tê, nêrîneka ku dibêje ev peyv ji guherîna “Kefercews”ê pêk hatiye jî heye. Di gundên wekî Qirqatê, Hesarê da şûnwarên ku rehên wan heta berî zayînê diçin, hene.³⁷

Kercos, berê gundekî navçeya Midyadê bû. Wê demê Mêrdîn jî “senceq” bû.³⁸ Di Salnameya Diyarbekir (Diyarbakır Salnamesi) ya sala 1869an da navê navçeyê wekî ‘Kercews’ derbas dibe û tê famkirin ku Kercos wê demê nahiyeyeka midûriyeta

³³ Cibo, *Hevêrkan Sultanları-1*, r. 18-19.

³⁴ Derheqê navê Hevêrka da hin riwayet hene. Li gor wan riwayetan ev nav ji peyva “hevîr, hevîrkir an hevûrî (nêrîyê yek salî)”yê tê. Li gor M. Emîn Zekî Beg jî ev nav ji Kurdên Hevîrî tê ku ev kurd li başûr di navbera Zaxo û Şengalê da dijîn. Bnr. Nezîrê Cibo, *Midyat'tan Baltık Kıyılarına Hevêrkan Sultanları-2*, Lîs, Ankara 2013, r. 13.

Konfederasyona Hevêrka ji 24 eşîretan pêk dihat. Ji van eşîretên ku di nav konfederasyonê da bûn hin misilman, hin êzîdî bûn. Di nav da mesîhî jî hebûn. Hevêrkî bi Mîrektîya Botanê ve girêdayî bûn. Bnr. Bruinessen, h.b., r. 163

³⁵ Bnr. Bruinessen, h.b., r. 163

Li herêma hevêrkan êzîdî, suryanî, ermenî û misilman bi hev ra dijîn. Ji nivê sedeya XX'an ve Federasyona Hevêrka hebû. Navenda konfederasyonê Midyad bû. Bnr. Cibo, *Hevêrkan Sultanları-1*, r. 59.

* Navê fermî yê vî gundî “Akburç Köyü” ye.

³⁶ <https://nisanyanmap.com/?y=gerc%C3%BC%C5%9F&t=&lv=1> (Pêgehîn: 26.03.2019).

³⁷ <http://www.gercus.gov.tr/ilcemizin-tarihcesi> (Pêgehîn: 24.05.2019, 23.45).

³⁸ <http://www.gercus.gov.tr/ilcemizin-tarihcesi> (Pêgehîn: 24.05.2019, 23.45).

Zazê* bûye û digel Zazê bi qezaya Midyadê ve girêdayî bûne. Di wê tarîxê da 9 gund bi nahiyeya Kercosê ve girêdayî ne. Piştî wê demê di sala 1900î da ji nahiyetiyê dikeve û bi nahiyeya Heskîfê ve tê girêdan.³⁹ Kercos, di 16ê Gulana 1926an da dibe navçeyeka Mêrdînê. Dû ra dema ku di 16ê Gulana 1990î da Batman dibe bajar, Kercos jî pê ve tê girêdan û dibe navçeyeka Batmanê.⁴⁰

Deşteka Kercosê bi navê “Çola Hesarê” heye ku di navbera Batman, Bismil, Kercos, Heskîf, Midyad û Stewrê da cihekî stratejîk e. Loma jî ev deşt gelek caran ji aliyê hêzên wekî Asûrî, Romeyî û Bîzentî ve di seferên eskerî da wekî cihê rawestanê hatiye bikaranîn. Derbarê dîroka navçeyê da xebatên têr û tije nehatine kirin.⁴¹ Kercos di quntara bakurê rêzeçiyayên navbera Mêrdîn û Midyadê da cî digire. Bilindahîya van rêzeçiyayan digihêje 1100 metreyan. Bilindahîya platoya Kercosê 950 metre ye. Navçe, dikeve başûrrojhilata Batmanê. Ji Batmanê 59 km dûr e. Li başûrê navçeyê Midyad, li bakurê wê Heskîf, li rojhilata wê Kerboran û li rojavayê wê Stewr û Bismil dimîne.⁴²

Aqarê Kercosê 1070 km² ye û germahîya hewayê salane li dora 20 C°yî ye. Navînîya barîne salane 500-600 kg e.⁴³ Li navçeyê û derdora wê iqlîma bejayiyê heye. Lê ev iqlîm ne wekî ya herêmên Rojhilat û Başûrê Rajhilata Anatolyayê ye. Ji ber taybetiyên barîn û germayiyê mirov dikare bibêje iqlîma “Behra Spî ya Xerabbûyî” li vir pêk tê.⁴⁴ Ji ber bilindahiyê nêzî nîvê erdên Kercosê ji bo çandinîyê ne guncaw in.⁴⁵ Ji ber iqlîma ziwa û nîv-ziwa û texrîbkirina daristanan, li navçeyê û derdora wê axleb devî û tûmik mane. Her çiqas hindik bin jî cî bi cî çilo jî hene.⁴⁶ Li navçeyê ajeldarî, çandinî û rezvanî çavkanîyên aborî ne.

* Navê wê yê fermî “İzbrak Köyü” ye.

³⁹ Mehmet Emin Yakut, *Gercüş İlçesinin (Batman) Beşeri ve Ekonomik Coğrafyası*, Fırat Üniversitesi, Teza Lisansa Bilind, Elazığ 2013, r. 54.

⁴⁰ <http://www.gercus.gov.tr/ilcemizin-tarihcesi> (Pêgehîn: 24.05.2019, 23.45).

⁴¹ Zülküf Kışanak, *Bajarê ku Dîroka Xwe Hembêz Dike Batman*, (wer. Mehmet Çakmak), Gerinendehîya Çandê Ya Batmanê, Batman 2013, r. 217.

⁴² <http://www.gercus.gov.tr/ilcemizin-tarihcesi> (Pêgehîn: 24.05.2019, 23.45).

⁴³ <http://www.gercus.gov.tr/ilcemizin-tarihcesi> (Pêgehîn: 24.05.2019 23.45).

⁴⁴ Yakut, h.b., r. 3.

⁴⁵ Mahmut Tekik, *Batman Şehrinin Ekonomik ve Beşeri Coğrafyası*, Fırat Üniversitesi, Teza Lisansa Bilind, Elazığ 2013, r. 246.

⁴⁶ Yakut, h.b., r. 10.

Şeş taxên navçeyê hene. Taxa ku nifûsa wê herî zêde ye taxa Bağlarbaşı ye. Nifûsa kesên navenda navçeyê 4.341, ya gundên wê 15.07 e. Bi tevahî nifûsa Kercosê 19.412 ye. 58 gûnd û beldeyeka navçeyê hene. Tevli beldeyê û gundên xwe nifûsa navçeyê 20.484 e. 10.167ê wan jin in û 10.317 jî mêr.⁴⁷

Li navçeyê hilberînên çandinîyê li gor rêza pirbûna xwe tirî, genim, nîsk û ce ne. Ji bilî van, di bestan da çandinîya sebzeyan jî tê kirin.⁴⁸ Ji ber ku axa ku li ser tebaqeya kilsê ye ji bo rezan guncaw e û pêdivîya wê bi ava pir tune ye û ji bo firotanê jî pirsgirêkan dernaxe⁴⁹ li Kercosê û gundên wê (Xerabê Bena jî di nav de) rezvanî pir tê kirin. Li gor Yıldırım li derdora Batman û Mêrdînê herî zêde rezvanî li Kercosê tê kirin. Ji bilî tirî çandinîya gûz û hejîran jî ji bo navçeyê girîng e.⁵⁰

1.1.3.Gundê Xerabê Bena

Li gor ku Yakut dibêje dibe ku navê gund yê bi tirkî (Sekî Köyü) ji ber erdnigarîya wî ya fizîkî hatibe dayîn.⁵¹ Dema em li gund dinêrin dibînin ku li derdora gund benê rezan hene. Lewma dibe ku dema navê tirkî lê hatiye dayîn ev lêhatin pêk hatibe. Di jimartina dawî da gelheya gundê Xerabê Bena 178 jê jin, 161 mêr bi tevahî 339 e.⁵² Di sala 2011î da nifûsa vî gundî 389 bû. Ev hejmar di sala 1980yî da bêhtir bû: 862.⁵³ Tê dîtin ku her sal nifûsa gundê Xerabê Bena kêmîtir dibe. Helbet di vê kêmbûnê da rola koçê pir e.

Koordînatên gundê Xerabê Bena 37° 37' 22" rojhilat, 41° 30' 37" bakur e.⁵⁴ Bilindahîya Gundê Xerabê Bena li dor 1060 metreyî ye.⁵⁵ Li bakurrojavayê Xerabê Bena gundê Dêrdîlê, li bakurrojhilatê wî gundê Êsê, li başûrê wî gundê Binkêlbê, li rojavayê wî Bihilê dimîne. Li rojhilatê Xerabê Bena du gund hene: Xibê Mercîya û

⁴⁷ <http://www.gercus.gov.tr/ilcemizin-tarihcesi> (Pêgehîn: 24.05.2019 23.45).

⁴⁸ Yakut, h.b., r. 109.

⁴⁹ Yakut, h.b., r. 118.

⁵⁰ Ahmet Yıldırım, *Hasankeyf-Gercüş ve Yakın Çevresinin Fiziki Coğrafyası*, Ankara Üniversitesi, Teza Lîsansa Bilind, Ankara 2004, r. 230.

⁵¹ Yakut, h.b., r. 67.

⁵² <http://www.gercus.gov.tr/ilcemizin-tarihcesi> (Pêgehîn: 24.05.2019 23.45).

⁵³ Yakut, h.b., r. 32.

⁵⁴ <https://nisanyanmap.com/?yer=24714&haritasi=seki> (Pêgehîn: 25.05.2019, 13.55).

⁵⁵ Yakut, h.b., r. 56.

Mercîya.* Di sala 1980yî da di gundê Xerabê Bena da 150 mal hebûn.⁵⁶ Li gor îstatîstîkên sala 2011an di vê tarîxê da hejmar dadikeve, dibe 60.⁵⁷

Li gor çavdêrî û mûlaqetên me yê ku bi gundîyan ra hatin kirin li gundê Xerabê Bena bêhtir darên tûyan, spîndar mişmiş, hejîr, behîv û darên berû hene. Ji ber ku mewjî û dims çêdikirin û ew difirotin Tora Banî û Bişêrîyê, berê mêw ji bo debara gundîyan xwedî cihekî taybet bû lê niha girîngîya rezvanîyê ne wekî ya berê ye, kêr bûye. Di van salên dawî da ji ber polîtîkayên teşwîqê yê midûrîyeta çandinîyê bêhtir darên fîstîqan tî çandin. Wekî din ji ber ku çiloyên darên mazî ji bo heywanên xwe jêdikin û zivistanê didin heywanên xwe, ajeldarî ji çandinîyê bêhtir tê kirin.

Li ser gund re Diyarê Reza heye. Gund di quntara vî çiyayî da ye. Li gor derdora xwe gund di cihekî rast da ye. Cihên avî yê nêzî gund jî rast in. Jê û pê de edî çiya dest pê dikin. Li wan çiyayan rezên gundîyên Xerabê Bena hene. Li aliyê din yê gund çiyayek bi navê Çiyayê Fadelî heye ku bilind e û di neqeba Xerabê Bena û gundê Dêrdîlê da ye. Li derdora gund çiyayên Neqeba Belalok û Neqeba Kurê hene ku gundîyan ev nav li wan kirine. Ji xeynî van çiyayan navên taybet li hin mewqîên din jî hatiye kirin. Binê Bereha, Deştîkê, Gelîyê Pişolal, Newalê û Çiyayê Milê Xanê hin ji wan cihan in.

1.2. Zimanê Kurdî û Devoka Torê

1.2.1. Zimanê kurdî û cihê wî di nav zimanên cihanê da

Zimannasê alman August Schleicher (1821-1868) dema ziman terîf dîke dibêje ku ziman jî ji dayîk dibin, mezîn dibin, pîr dibin û dimirin. Wekî organîzmayên din ên jîndar ew jî dikevin sinifa heyînên bîyolojîk.⁵⁸ Ev terîf ji ber vê tê ku ziman bi kesên ku wî bi kar tînin ra jîndar in û bi qasî hejmara kesên ku pê diaxivin dê jîndar bin. Lewra eger zimanê wî hebe gel heye, ji ber ku çawa ku Ahmad gotiye: “Ziman

* Navên fermî yê Dêrdîlê *Gönüllü*, yê Êsê *Gökçepinar*, yê Binkêlbê *Çukuryurt*, yê Xirbê Mercîya *Ardîç* û yê Mercîya jî *Serinköy* in. Bihilê mezrika *Binkêlbê* ye.

⁵⁶ Yakut, h.b., r. 58.

⁵⁷ Yakut, h.b., r. 59.

⁵⁸ Kaken Ahanov, *Dil Biliminin Esasları*, (ed. Murat Ceritoğlu), Türk Dil Kurumu, Ankara 2013, r. 15.

di nav gelan de deyardeyeke xwezayî ye û ti gel bê ziman nayê naskirin. Dema gel peyda dibe ziman jî pê re peyda dibe.”⁵⁹

Ji bo jêderka kurdî nêrîneka wisa heye ku dibêje hemû zar û binezarên bicihmayî yên kurdî ji zimanê madî zêde bûne.⁶⁰ MacKenzie jî ji bo koka gelê kurd dibêje ku hemû belgeyên pozîtîv nîşan didin ku kurd gelekî Medî ne.⁶¹

Zimanên cihanê li gor binyad û jêderkê dabeş dibin. Li gor binyadê wekî zimanên yekkîteyî, zimanên qertafgir û zimanên tewangbar dibin sê beş. Kurdî di vê dabeşkirinê da hem zimanekî qertafgir û hem jî tewangbar e. Ji aliyê jêderkê ve malbatên zimanan hene. Ji bo xizimîya malbatên zimanan Ahanov îşaret dike ku dema em behsa malbatên zimanan dikin ew nayê maneya ku ev xizimî xizimîyêka bîyolojîk e. Ji ber ku ziman heyberên sosyo-dîrokî ne, divê em xizimîya zimanan wekî têgeheka dîrokî û zimannasî fêhm bikin.⁶² Lê Karaağaç malbata zimanan wekî grûbên zimanan yên xizm yên ku ji heman rayekê hatine terîf dike û dibêje ku zimanên ku ji heman malbatê ne di heman demê da ji heman zimanî hatine dariştin.⁶³

Ji aliyê jêderkê ve malbatên zimanan dibin pênc beş: Zimanên Ural-Altayî, Hamî-Samî, Çîn-Tîbetî, Bantûyî û Hind-Ewropî. Grûba malbata zimanên Hind-Ewropî jî dibin du beş:

1. Zimanên Asyayî

2. Zimanên Ewropî.

Grûba Zimanên Asyayî ku kurdî jî di nav vê komê da ye, dibe du beş:

1. Zimanên hindî

⁵⁹ Subhî Ahmad, *Pirtûka Rêziman*, MOST-Verlag, c.n.d., d.n.d., r. 3.

⁶⁰ Ev fikr, ya Minorsky e. Cehanferd di meqaleya xwe da cih dide vê fikra Minorsky. Bnr. Secad Cehanferd, “Zimanê Kurdî û Zaravayên Wî”, (ed. Ziya Avci), *Zend*, h. 23, İstanbul 2015, r. 81.

⁶¹ D.N. Mackenzie, *Koka zimanê kurdî*, Çapa elektronîk, 08.02.2006, r. 1. Malper: http://www.nefel.com/articles/article_detail.asp?RubricNr=10&ArticleNr=941 (Pêgehîn: 23.04.2019).

Yıldırım jî ev fikr weguhastiye û gotiye ku “Li gor piraniya zimanzanan kurdî bingeha xwe ji mediya avestîk distîne.” Bnr. Kadri Yıldırım, *Temel Alıştırma ve Metinlerle Kürtçe Dilbilgisi (Kurmanci Lehçesi)*, Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü, Mardin 2012, r. 22.

⁶² Ahanov, h.b., r. 454.

⁶³ Günay Karaağaç, *Dil Bilimleri Terimleri Sözlüğü*, Türk Dil Kurumu, Ankara 2018, r. 283.

2. Zimanên îranî.

Kurdî digel zimanên farisî, peştuyî, belûcî, tacikî û osetî dikeve nav koma duyem ango koma zimanên îranî.⁶⁴ Ji Zimanên îranî jî dikeve nav grûba zimanên bakurrojavyê⁶⁵ aryanî (îranî).⁶⁶ Di kurdî da tewang heye lê ev tewang tenê di dîyarkirina hin navan û cînavan da heye. Di heman demê da kurdî zimanekî qertafgir,⁶⁷ niv-ergatîv,⁶⁸ niv-aqûzatîf û zayendî ye.⁶⁹

1.2.2.Zaravayên kurdî û zaravayê kurmancî

Zarava ew şaxa taybet e ku ji aliyê deng û binyadê ve wekî yekeya xweser ji zimanekî derketiyê lê ji wî zimanî bi tamamî veneqetiyaye.⁷⁰ Aksan ji bo zaravayê pênaseyeka wiha tîne: “Şêweyên cuda yên axaftina zimanekî ne ku di dewlet û herêmên cûrbicûr da lê ji aliyê kesên ku mensûbên heman yekîneya ziman in ve tînin bikaranîn.”⁷¹ Helbet di navbera zaravayan da cîyavazî jî hene lê cîyawazîyên nisbî yên di navbera zaravayên zimanekî da, di çarçoveya bingehên rêzimanî da dimînin.⁷²

Eger em li berhemên ku behsa dîyalektên kurmancî dikin binêrin, serê ewil em dê rastî Şerefnameya Şerefxanê Bedlîsî bînin ku tê da behsa çar dîyalektên kurmancî tê kirin: kurmanc, lor, kelhûr û goran.⁷³ Dû ra di Seyahetnameya Ewliya Çelebî da dîyalektên kurmancî derbas dibin ku Çelebî şazdeh dîyalekt jimartine. Lê xuya ye ku wî, ew dîyalekt bi navê eşîrên kurdan tevlihev kirine. Eşîrên kurdan ku wî wekî

⁶⁴ Samî Tan, *Rêzimana Kurmancî*, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, İstanbul 2015, r. 17.

⁶⁵ Gerçî Bruinessen dibêje ku MacKenzie daye nîşandan ku dibe ku kurdî nêzîktirê zimanên başûrrojavyê yên îranî be. Bnr. Jêrenota Bruinessen. Bruinessen, h.b., r. 41.

Li aliyê din Cehanferd di meqaleya xwe da cihê kurdî di gruba Hind Ewropî da lê di nav bakurê rojhilatî yên îranî da dide. Bnr. Cehanferd, h.b., r. 81.

⁶⁶ Bahoz Baran, *Rêzimana Kurmancî*, Belkî, Diyarbakır 2012, r. 19-20.; Samî Tan, *Rêzimana Kurmancî*, r. 18.

Herwiha Ciwan jî cihê kurdî di nav zimanê din da wekî “ji malbata Hindo-Ewropî, di şaxa Hindo-Îranî da zimanekî Îranî û ji koma bakurrojavyê îranî” dide. Bnr. Mûrad Ciwan, *Türkçe Açıklamalı Kürtçe Dilbilgisi*, Zekisan Matbaa, Diyarbakır 2014, r. 12.

⁶⁷ Her çiqas di pênaseya Baran da wiha hatibe gotin jî qertafên kurdî ne tenê paşgir in. Yê pêşgir û navgir jî hene. Bnr. Samî Tan, *Rêzimana Kurmancî*, r. 32.

⁶⁸ Sağnıç jî dema kurdî terîf dike dibêje “Zimanekî tewandî û tîpguher e.” Bnr. Feqî Huseyn Sağnıç, *Hêmana Rêzimanê Kurdî*, Melsa, İstanbul 1991, r. 15.

⁶⁹ Baran, h.b., r. 19-20.

⁷⁰ Kadri Yıldırım, h.b., r. 25.

⁷¹ Doğan Aksan, *Her Yönüyle Dil Ana Çizgileriyle Dilbilim*, c. 1, Türk Dil Kurumu, Ankara 2015, r. 141.

⁷² Bnr. Azad Zal, *Zimanê Kurdî*, J&J, Diyarbakır 2015, r. 35.

⁷³ Şeref Han, *Şerefname*, (wer. Mehmet Emin Bozarslan), c. 1, Ant, İstanbul 1971, r. 20.

zarava dane ev in: Mehmûdî, Avnikî, Zazayî, Loloyî, Cîloyî (Hekkarî), Şîrvanî, Cîzrewî, Pisanî, Sincarî, Harîrî, Erdelanî, Soranî, Xalitî, Çekvanî, Îmadî, Rojkî.⁷⁴

Cehanferd, Kurdî kiriye du beş 1. Kurmancî. 2. Goranî/zazakî.⁷⁵ Kurmancî jî di bin sê xalan da binbeş kiriye: 1. kurmancîya jorê. 2. kurmancîya navîn. 3. kurmancîya xwarê. Ji bo kurmancîya jorê gotiye ku ji bilî bajarên zazanişîn li hemû bajarên kurdistana bakur tê axaftin. Li Kurdistana rojhilat li Êrmîye, Mako, Selmas, Xoy û Xoresanê tê axaftin. Li Kurdistana başûr jî li duhok, Zaxo, Mûsil û Amedî tê axaftin.⁷⁶

Dabeşkirina zaravayên kurdî, li gor tesnîfa Sağnıç wiha ye: 1. soranî(sorî) 2. lorî 3. zazayî (dmlî,dilmî) 4. kurmancî (kurdmançî, kurdmanî).⁷⁷ Torî jî di ferhenga xwe da ji Tewfîq Wehbî dabeşkirina zaravayên kurdî û devokên wî weguhastiye. Li gor wê dabeşkirinê zaravayên kurdî û devokên kurmancî wiha ne: 1. zazakî 2. goranî 3. lurhî 4. kurmancî⁷⁸

Li jêr ji berhema Bruinessen nexşeya cihên ku zaravayên kurdî tîk bikaranîn hatiye wergirtin.


⁷⁴ Martin van Bruinessen, *Studia Kurdica, Onyedinci Yüzyılda Kürtler ve Dilleri: Kürt Lehçeleri Üzerine Evliya Çelebi'nin Notları*. Enstituya Kurdî ya Parîsê, Paris 1985, r.18.; Vgh. Saîd Veroj, *Veracêkerdena Gramerê Zazakî û Kurmancî: Dîyalekt, Alfabe û Fonetîk, Morfolojî*, Teza Lîsansa Bilind, Mêrdîn 2014, r. 23.

⁷⁵ Cehanferd, h.b., r. 88.

⁷⁶ Cehanferd, h.b., r. 88.

⁷⁷ Sağnıç, h.b., r. 16.

⁷⁸ Torî, *Ferheng*, Berfîn, İstanbul 1999, r. 7.



Nexşe 2⁷⁹: Nexşeya îzoglosa zaravayên kurdî

1.2.3.Devokên kurmancîyê û devoka Torê

Beşeka zimanekî niviskî ya ku li herêmekê tê axaftin, dibe devokeka wî zimanî.⁸⁰ Devok, awayê ziman ya axaftina herêmekê yan bajarekî yan gundekî ye.⁸¹ Aksan, devokan wiha pênase dike: “Şêweya axaftinê ne ku di heman zaravayê da ci digirin lê xweserê herêmên piçûktir in û li ser esasên ciyawazîyên piçûktir in.”⁸²

Di axaftinê da gelek caran bilêvkirin û bikaranîna peyv û komepeyvên me, ne li gor zimanê me yê nivîsê ne û ev cudahî dibe sedema bikaranîna gelek imkanên ziman jî. Jixwe li gor Ahanov jî hevqirtina peyv û komepeyvvan û telefuzaya wan her car ne şert e.⁸³ Wekî mînak, di devoka Torê da di axaftinê da em rastî bikaranîna “Tu dê bê?”yê nayên. Di devokê da bikaranîna vê hevoka pirsê ev e: Tê ê? Eger kesê

⁷⁹ Bruinessen, h.b., r. 40.

⁸⁰ Karaağaç, h.b., r. 75.


⁸¹ <https://ku.wiktionary.org/wiki/devok> (Pêgehîn: 26.03.2019).

⁸² Aksan, *Her Yöniyle Dil Ana Çizgileriyle Dilbilim*, c. 1, r. 143.

⁸³ Bnr. Ahanov, h.b., r. 267.

sêyem yê yekjimar be hêj jî kurttir e: Ê ê? Hemû axêverên devokê jî ji vê hevokê fam dikin û ev bikaranîn herikbartir e. “Min digot, nexwe!” di jiyana rojane da bi rehetî wekî “Midgo nexwa!”yê tê bikaranîn.

Devoka Torê bindevokeka devoka sincarî ye. Ev tesbît helbet li gor kesan diguhere. Lê li gor tesbîtên kesên ku dê li jêr ji wan agahî bîn parvekirin ev nêrin xurt dibe. Her çiqas Ebdulfettah di nav kurmançîya jorîn da bayezîdî, hekarî, botanî, şemdînanî, behdînanî, koçerî, xerpûtî, efrînî, cizîrî jimartibe û devoka Mêrdînê jî xistibe nav devoka Cizîrê jî⁸⁴ gelek jî ev devok xistine nav devoka sincarî. Mesela Aşîna û Demirhan di gotara xwe da şemayek daye. Li gor şemayê cihê devoka Torê di bin beşa kurdîya bakur da dikeve bin baskên kurmançîya sincarî. Şemaya li jêr li gor agahiyên meqaleya Aşîna û Demirhan hatiye amadekirin.⁸⁵



Tablo 1: Tabloya Zarava û devokên kurdî.

⁸⁴ Bnr. Deham Ebdulfettah, *Mistek ji Hêvî û Arîşeyên Zimanê Kurdî (Kurmançî)*, Lis, Ankara 2018, r. 23.

⁸⁵ Misefa Baqîrî Aşîna û Umîd Demîrhan, “Kurdên Kêmnas, Lek Lêkolînek li ser Reh, Erdnigarî, Çand û Zaravayê Lekî”, *Zend*, İstanbul 2014, r. 12.

Farqînî di meqaleya xwe da dibêje ku bi piranî zimanzan devokên kurmancî dikin sê beş ku di heman demê da ev dabeşkirin ya Ehmedê Xanî⁸⁶ ye jî : botî, silîvî û mihemedî. Farqînî di meqaleyê da devoka Torê jî dixê nav “devokên herêmî” yên ku jî bilî van devokan hene.⁸⁷

Zerdeşt Haco di maqaleya xwe ya di “Konferansa li ser Zmanê Kurdî” da di tîrmeha 2002yan⁸⁸ da pêşkêş kirî da, Kurmancî dike du beş:

1. Kurmancîya jor

2. Kurmancîya naverast

Li gor ku Haco daye, xeta Urmîye, Rewandûz, Hewlêr, Mûsil di navbera kurmancîya jor û kurmancîya naverast⁸⁹ da dibe sînor û ji bilî Bîngol û Dêrsimê kurdên ku li bakurê vê xetê ne, bi kurmancîya jor diaxivin. Başûrrojhilata vê xetê jî bi kurmancîya naverast diaxivin. Devokên herêmî yên kurmancîya naverast sineyî,

⁸⁶ Di heman demê da Feqî Hiseyn Sağniç jî ev dabeşkirin kiriye ku bi dabeşkirina Ehmedê Xanî ra wekhev e. Bnr. Sağniç, h.b., r. 16.

Xanî di Mem û Zînê da devokên kurmancî wiha daye: “Bohtî û Mehmedî û Silîvî / Hin le'il û hinek ji zêr û zîvî” Bnr. Perwîz Cîhanî, *Şiroveya Mem û Zîna Ehmedê Xanî*, Nûbihar, İstanbul 2013, r. 778.

⁸⁷ Zana Farqînî, “Di Kurmancî de Pevguherîna Dengan” *Zend*, h. 19, İstanbul 2012, r. 57.

Yıldırım jî senifandina Cemal Nebez daye ku li gor dabeşkirina wî cihê devokên kurdî wiha ye:

1. Kurmancîya jorîn: Devokên botanî, hekarî, badînanî, aşteyî, bayezîdî 2. Kurmancîya naverast: Devokên soranî, silêmanî, sineyî, erdelanî, germiyani, hewlêrî, kerkûkî, mukrî, şarbijêrî, pişderî 3. Kurmancîya jêrîn: Devokên feylî, kirmaşahî, lekî, kelhorî, xaneqînî, lorî 4. Goranî û zazakî: Devokên goranî, hewramî, zazakî. Bnr. Kadri Yıldırım, h.b., r. 26.

⁸⁸ Her çiqas di pêşgotina berhemê da û ji maqaleya navborî, dîroka lidarxistina konferansê nediyar be jî ji maqaleyeka din, makaleya Kizilhan, diyar dibe ku dîroka lidarxistina konferansê 2002 ye. Bnr. İlhan Kizilhan, “Bandora psikolojî ziman li ser civakê” *Konferansa li ser Zmanê kurdî*, (ed. Ünal Yardımcı), Komkar, Köln, d.n.d., r. 88.

⁸⁹ Muhammed di gotara xwe da devokan tesnîf dike. Li gor tesnîfa wî devokên kurmancî wekî kurmancîya rojhilat, kurmancîya rojava û kurmancîya naverast in. Dihok, Hekarî, Urmîye, Bazîd, Wan û deverên nêzîkî wan dixê nav kurmancîya rojhilat. Jê bi rojavatir ve jî kurmancîya navendî dide destpêkirin ku Mêrdîn, Qamişlo, Diyarbekir û hin deverên din yên nêzîkî wan wekî herêmên axêverê vê devokê dide binavkirin. Kurmancîya rojavayî jî “devoka ku li deverên herî rojava yên bakur û başûrrojavayê Kurdistanê tê peyivîn” bi nav dike û Riha, Efrîn, Mereş, Meletî, Elbistan, Semsûr, Qonya, Xorasan û herêmên derdora wan wekî bajarên ku herêmên axêverên vê devokê ne, tesbît dike. Li gor ku nivîskar dibêje taybetiyên devoka navendî axleb yên herêma Mêrdînê ne. Eger em xetekê bi hêla başûr- bakur ve bikişînin jî Mûş, Bedlîs, Sêrt, Cizîr û Zaxo dê bikevin aliyê rojhilatê ku hin taybetiyên devoka navendî jî di xwe da dihevin. Ji vê xetê ber bi rojavatir ve êdî devokên rojhilatî hene ku Agirî, Bazîd, Dihok, Hekarî, Urmîye, Wan dikevin vê grûbê. Koma devokan ya ku li rojavayê xetê dimînin jî koma navendî ye û li bajarên Mûsil, Qamişlo, Mêrdîn, Batman, Diyarbekir û derdora wan tê axaftin. Bnr. Husein Muhammed, *Parvekirina devokên kurmancî*, Çapa elektronik, 2013, r.1-4. Malper: http://nefel.com/kolumnists/kolumnist_index.asp?MemberNr=33 (Pêgehî: 11.02.2019, 13.34).

silêmanî, mukrî, erdelanî, kerkûkî, germiyanî, hewlêrî, soranî, şarbajêrî û pijderî ne. Li gor vê dabeşkirinê, Haco devokên kurmançîya jor di bin sê xalan da binbeş dike:

1. Devoka Botanî: Kurmançîya herêmên Dîlok, Hekarî, Cizîr û Şernexê ye ku wekî badînanî, bayezidi û botanî tên binavkirin.

2. Devoka Şingalê: Devoka herêmên Ûrmîye, Şingal, Sêrt, Amed, Batman, Mêrdîn, Hisiçe, Riha, Agirî, Efrîn, Erzerûm, Qers û devera kurdên kafkasyeyê ye.

3. Devokên Dîlok û Mereşê: Devoka herêmên Mereş, Sêwas, Erzînganê û kurmançîya kurdên Xoresanê ye.⁹⁰ Ji vê dabeşkirinê jî tê famkirin ku li gor Haco jî devoka Torê dikeve bin sîwana “devoka Şingalê” û em dikarin bibêjin devoka Torê bindevokeka devoka “Şingalî/Sincarî” ye.

Bûlbûl, digel ku navçeyên ku bi vê devokê diaxivin ne homojen bin jî di nav navçeyên herî homojen ên ku vê devoka Torê diaxivin da Kercosê jî dijimêre. Navçeyên din ên ku herî homojen in Hezex û Kerboran in. Heskîf, Midyad, Stewr û Nisêbînê jî di nav “navçeyên ku qismî yan jî bi giranî bi vê devokê diaxivin” da dijimêre.⁹¹

Kercosî û kesên derdora Kercosê bi devoka Torê diaxivin. Gundê Xerabê Bena jî gundekî Kercosê ye û Xerabenî di axaftina xwe da taybetîyên vê devokê bi gîştî dihewînin. Muheqeq çawa ku di her tiştî da di navbera herêman, gundan, malbatan, endamên malbatan da taybetîyên cuda hene* dibe ku hin taybetîyên devokî yên xweserî vî gundî jî dê hebin.

⁹⁰ Zerdeşt Haco, “Bipêşveçûna Dîrokî Ya Zimanê Kurdî Hin Taybetmendiyên Wî Yên Xweser” *Konferansa li ser Zimanê kurdî*, (ed. Ûnal Yardımcı), Komkar, Köln, d.n.d., r. 49.

⁹¹ Mikail Bûlbûl, *Sazkirina Riste û Frêzan û Peyvrêzîya Wan (Dî Dîyalekta Jorî Ya Zimanê Kurdî Da - Devoka Mêrdînê)*, Zankoya Zaxo, Zaxo 2017, r. 9.

* Aykoç ji balê dikişîne ser bilêvkirina peyvan û cudabikaranîna ziman û dibêje ku gund bi gund eger ji yek bavikî jî ji hev qetiyabin axaftina wan mirovan cûda ye û eger em li derûdora xwe binêrin em dê çavdêriya vê rewşê bikin. bnr. Aykoç, h.b., r. 21.

1.3.Zimannasî û Dengnasî

1.3.1.Zimannasî

Xebatên herî kevin yê zimanzanîyê li Hindê pêk hatine ku ev xebat ji bo famkirina “vedayên pîroz” in. Ji van xebatan ya pêşîn xebata Yaska ye ku B.Z. di sedsala V’an da nivîsiye û navê wê Nîrukta ye. Piştî vê berhemê B.Z. di sedsala IV’an da Panînî, derheqê rêzikên sanskrîtî da nivîsiye.⁹²

Zimanê Sumerên Mezopotamyaya kevin ji Akadîyan ra -ku ji zimanê Samî hatibûn- wekî zimanê dîn û edebiyatê xizmet kir. Wan jî ji bo ku ev zimanê zanîne bê hînbûn, rêziman amade kir. Ew fragmanên ku ji wan bi dest me ketine, di heman demê da dibin belgeyên herî kevn ên rêziman. Pêdivîya pratîk ya bi hînbûnê dû ra pêdivîyeka din derxist holê: nivîs. Tesbîta ziman ya bi awayekî sêvra gafîkî, di heman demê da pêdivîya fikirîna li ser ziman jî bi xwe ra anî. Pêdivîya pratîk ya ku ji bo famkirina metnên arkaîk mecbûrî bû, di salên B.Z. sedsala III’yan da li Hinda Kevn û Iskenderiyeyê rê li ber hûrnêrînên zimannasîyê vekir.⁹³

Di zimanzanîyê da rûdanên herî girîng di sedsala XX’an da bi Ferdinand de Saussure dest pê kiriye. Agahîyên ku Saussure dane, dû ra ji alîyê kesên din ve hatine rave û şîrovekirin. Di encamê da mektebên zimanzanîyê xwe nîşan dane. Ya yekem Mekteba zimanzanîyê ya Pragê ye (1926) û serkeftinên wan yê herî berçav di qada dengzanîyê da ne. Dû ra mekteba Kopenagê (1932) tê. Dû ra jî mekteba Amerîkan (1950) tê.⁹⁴

1.3.1.1. Ji Alîyê Rêbazê ve Cûreyên Sereke yê Xebatên Zimannasîyê

Xebatên zimannasîyê ji alîyê bikaranîna rêbaza sereke ve dibin du bir:

1.Zimannasîya dîrokî (diachronique grammar): Di vê rêbazê da bûyer ji alîyê rûdanên xwe ve tîne vekolan. Ji ber wê ye ku ji bo ku li ser rûdanekê lêkolîn bê kirin divê agahîyên di navbera demên cûda da hebin. Da ku mirov bikaribe

⁹² Mehmet Aydın, *Dilbilim El Kitabı*, Akademik Kitaplar, İstanbul 2014, r. 23.

⁹³ Perrot, h.b., r. 14-15.

⁹⁴ Aydın, h.b., r. 29.

hevberkirinan û çavdêrîyê li guherînan bike. Lewma jî lêkolîner agahîyên çax û êwrên cuda dişopîne.⁹⁵

2.Zimannasîya hevdemî (synchronique): Zimannasîya hevdemî pirsgirêkên ziman yên di demeka diyar da û ji rûdan û guherînan azadane vedikole.⁹⁶ Ji ber ku ev xebat dê li ser esasê vê rêbazê bimeşe li jêr derbarê rêbaza senkronîk da agahî dê bên dayîn. Ji alîyekî din xebatên senkronîk û şayesî (descriptive) têkildarê hev in û ji hev zêde zêde sûd werdigirin. Wekî ku Aksan jî dibêje zimannasîya şayesî (descriptive) ji zimannasîya hevdemî (synchronique) zahf nikare bê cudakirin. Jixwe ji rêbaza senkronîk ra –ji ber ku rûdanan li derveyê lêkolîne dihêle- “rêbaza sekan û şayesî” jî hatiye gotin.⁹⁷ Lewma jî li jêr dê bi berfirehî li ser zimanzaniya şayesî jî bê rawestin.

1.3.1.1.1.Zimannasîya hevdemî (synchronic grammar)

Zimannasîya ku forma ziman ya ku di dema jîndarîya wê da ye vedikole û şîrove dike, wekî “zimannasîya hevdemî (synchronic)” tê binavkirin. Dê di pêş da jî bê gotin ku ev pênase di heman demê da bi zimannasîya şayesî (descriptive) ra jî têkildar e.⁹⁸ Zimannasîya hevdemî yan şayesî hewl dide ku rewş, binyad û xebitîna ziman yan zaravayekî ya di demeka diyar da -lê bêyî ku têkeve nav rûdanên tarîxî-tesbît bike û rave bike.⁹⁹

Eger li rewşa niha ya zimanekî û têkilîyên di navbera hêmanên wî da bê nêrtin û li ser bê xebitîn, ev xebat dibe xebateka senkronîk.¹⁰⁰ Xebatên senkronîk ew xebatên zimanzaniyê yên hevdemî ne ku hewl didin ku ziman û bûyerên zimanî bi awayê ku pêk hatine bişayesînin.¹⁰¹

⁹⁵ Aksan, *Her Yöniyle Dil Ana Çizgileriyle Dilbilim*, c. 1, r. 38.

⁹⁶ Aksan, *Her Yöniyle Dil Ana Çizgileriyle Dilbilim*, c. 1, r. 38.

⁹⁷ Aksan, *Her Yöniyle Dil Ana Çizgileriyle Dilbilim*, c. 1, r. 39.

⁹⁸ Ahanov, h.b., r. 271.

⁹⁹ Karaağaç, h.b., r. 290.

¹⁰⁰ Ümran Altınkılıç, “Dîakronî û sînkronî di zimannasiya Saussure de” *Gotarên Zimannasiyê*, (niv. Barzo Mahmoud, Ferhat Yılmaz, Güneş Kan Yukuş û yên din), (ed. Kenan Subaşı ve Resul Geyik), Nûbihar, İstanbul 2017, r. 183.

¹⁰¹ Karaağaç, h.b., r. 190.

1.3.1.1.2. Zimannasîya şayesî (descriptive)

Zimannasîya şayesî (descriptive linguistics) -rûdanên dîrokî ne di nav da- hewl dide ku keyfîyetên zimanekî diyar ku di demeka diyar da rû dane, raxe ber çavan. Dema ku vê yekê dike jî ji prensîpdanînê bêhtir hewl dide ku rewşa ziman ya wê rojê bide dest.¹⁰²

Ev xebat her çiqas li gor rêbaza synchronique bimeşe jî ji alîyekî din dikeve qada zimannasîya şayesî (descriptive linguistics). Banguoğlu vê cûreya zimannasîyê wekî “Cûreya gramerê ye ku hewl dide digel teferutên wê, rewşa ziman an lehçeyekê ya di demeka diyar da vebêje.”¹⁰³ pêname dike. Li gor Aksan ev zimannasî berê xwe dide heyîna zinde ya ziman û hewl dide ku rastî û rewşên ku di nav ziman da ru didin bişayesîne. Zimannasîya şayesî nakeve dû sedema van rastî û rewşên ku di ziman da ne.¹⁰⁴ Bereks, rewşê tesbît dike.

Xebatên li gor zimannasîya şayesî di cihanê da esasen di sala 1427an da bi Schilderberg dest pê dikin. Schilderberg bi zimanên ermenî û tatarî du versiyonên “*Pater Noster*”ê vediguhêze. Du ra ev veguhestin ji bo berhemên şayesî (descriptive) dibe mînak zimannasîyê. Di sala 1555an da Conrad Gesner, “*Mithridate*”yê; di sala 1575an da André Tevet, “*Cosmographie Universalle*”ê; di sala 1613ê da Claude Duret, “*Thrésor de l’histoire des langues*”ê bi mînakgirtina vê berhema Schilderberg dinivîse. Di salên sedeya XVIII’an da belgekirina rêzimanî xurt dibe. Petroyê Mezin di nav axa împaratorîya xwe da xebata anketê dide meşandin.¹⁰⁵ Di dawîya vê sedsalê da di dema Katerinaya II. da Peter Simon Pallas berhemek bi navê “*Linguarum totius orbis vocabularia comparativa Augustissimae cura collecta*”yê di sala 1787-1789an da diweşîne. P. Hervàs “*Catalogo de las lenguas de las naciones conocidas*”ê amade dike. Diaya yekşemê ya mesîhîyan di zêdetirî 300 ziman û zaravayan da di vê berhemê da tê pêşkêşkirin. Piştî van hewldanên bi vî rengî di destpêka sedeya XIX’an da berhema ewilîn ya berhemên şayesî tê dayîn ku ji aliyê J. Chr. Adelung, J. S. Vater û şopînerên wan ve hatiye

¹⁰² Aksan, *Her Yöniyle Dil Ana Çizgileriyle Dilbilim*, c. 1, r. 23.

¹⁰³ Tahsin Banguoğlu, *Türkçenin Grameri*, Türk Dil Kurumu, Ankara 2011, r. 21.

¹⁰⁴ Aksan, *Her Yöniyle Dil Ana Çizgileriyle Dilbilim*, c. 1, r. 38.

¹⁰⁵ Perrot, h.b., r. 20.

nivîsîn (1806-1817). Navê berhemê *Mithridate* ye û ev berhem çar cild e.¹⁰⁶ Di dawîya sedsala XIX'an serê sedsala XX'an da, ji aliyê zimanzanên navdar ên wekî Ferdinand Saussure, F.F. Fortunatov û I. A. Baudouin de Courtenay esasên zimannasîya şayesî (descriptive linguistics) tê danîn.¹⁰⁷

Di sedsala XX'an da li Amerîkayê Boas bi rêya lêkolînên zimanên çermsoran û yên din yên ku nayên naskirin, zimannasîya şayesî (descriptive linguistics) xurt kir. Xwendekarên wî, Sapir û Bloomfield, rîya wî şopand.¹⁰⁸ Li Amerîkayê hin zanyaran, bi taybet jî Bloomfield, kir ku zimannasîya şayesî (descriptive linguistics) xwe rabigre.¹⁰⁹ Li gor ku Aksan dibêje, tê qebûl kirin ku bi berhema “Language” (1933) ya Bloomfield êdî hîmê zimannasîya şayesî hatiye avêtin.¹¹⁰

1.3.1.2. Zimannasîya kurmancî:

Yekemîn pirtûka rêziman ya li nav qada kurmancan di sala 1591ê da ji aliyê Elîyê Teremaxî ve* hatiye nivîsandin. Lê yekem xebata rêzimanî ya derbarê zimanê kurdî da pirtûka Maurizio Garzoni ye¹¹¹ û wekî ku Tan di meqaleya xwe da ji Ernest N. McCarus agahîyan girtiye di sala 1787an da bi navê “*Grammatica e vocabolario della lingua curda*” li Romanyayê hatiye çapkirin. Piştî wî, A. Chodzko di sala 1857an da bi navê “*Etudes philologiques sur la langue kurde*” li Parîsê berhemek çapkiriye.¹¹² Pirtûka sêyem derbarê gramera kurdî da ji aliyê Peter Lerch ve di sala 1857-58an da hatiye nivîsîn. Navê vê pirtûka ku bi almanî hatiye nivîsîn “*Forschungen über die Kurden und die iranischen Nord Chaldaer*” e.¹¹³

¹⁰⁶ Perrot, h.b., r. 21.

¹⁰⁷ Ahanov, h.b., r. 70.

¹⁰⁸ Aksan, *Her Yöniyle Dil Ana Çizgileriyle Dilbilim*, c. 1, r. 23.

¹⁰⁹ Aksan, *Her Yöniyle Dil Ana Çizgileriyle Dilbilim*, c. 1, r. 22.

¹¹⁰ Aksan, *Her Yöniyle Dil Ana Çizgileriyle Dilbilim*, c. 1, r. 39.

* Her çiqas ev pirtûk gramera zimanê erebî bi kurdî vegotibe jî, Newayîyî, Teremaxî wekî “danerê rêzimana kurdîya kurmancî” bi nav kiriye û di berga berhema xwe da jî ji bo Tesrîfa Teremaxî “yekemîn gramera kurdîya kurmancî” nivîsîye. Bnr. Merdan Newayî, Tesrîfa Teremaxî, Nûbihar, İstanbul 2018, r. 13.

¹¹¹ Ev nirxandin ji pêşgotina pirtûkê hatiye wergirtin. Bnr. Qenatê Kurdo, *Rêzimana Kurdî Kurmancî-Soranî*. (amd. Zülküf Ergün), Nûbihar, İstanbul 2013, r. 17.

¹¹² Samî Tan, “Der Barê Zimanê Kurdî de Sazî û Xebatên Akademîk”, *Zend*, h.18, İstanbul 2012, r. 61.

¹¹³ Samî Tan, “Der Barê Zimanê Kurdî de Sazî û Xebatên Akademîk”, r. 62.

Di van salên dawî da hat dîtin ku Mela Mehmûdê Bazidî di sedsala 19an da rîsaleyek bi navê “*Tuhfetu’l-Xîlan fî Zimanê Kurdan*” nivîsiye. Ev rîsale pirtûkeka rêzimana kurmançî ye û ji sê beşên sereke pêk tê: Di beşa yekem da behsa rêzikên rêzimana kurmançî tê kirin. Di beşa duyem da ferhengok heye. Di beşa sêyem da jî bi awayê pirs û bersivan diyalog hene.¹¹⁴

Ferdinand Justi di sala 1880yî da bi navê “*Kurdische Grammatic*” pirtûkeka rêzimana kurdî nivîsiye. Ev pirtûk ji du beşên mezin pêk hatiye. Beşek ji bo dengnasîyê hatiye veqetandin.¹¹⁵ Misyonerekî din, Samuel A. Rhea di sala 1880yî de derbarê kurdîya herêma Colemergê da bi navê “*Brief Grammar Vocabulary of the Kurdish Language of the Hakari District*” pirtûkeka rêziman nivîsiye.¹¹⁶ Piştî wî bi 17 salan Hugo Makas di sala 1897an da bi navê “*Dialekte Aus Der Gegend Von Mârdîn*” dinivîse ku ev berhem li ser devoka Mêrdînê ye.¹¹⁷ Di sala 1898an da Albert Socin derbarê zimanê kurdî da binavê “*Die Sprache der kurden*” pirtûkek dinivîse.¹¹⁸ Hugo Makas di sala 1900î da bi navê “*Eine Probe Des Dialektes Von Diarbekir; Ein Gedicht Aus Gäwar; Jezidengebete*” li ser devoka Diyarbekir pirtûkek çap kiriye.¹¹⁹

Di sala 1913an da E. B. Soane bi navê “*Elementary Kurmanji Grammar*” pirtûkeka rêzimana kurmançî nivîsiye. Di sala 1919an da mîsyonerek, Ludvig Olsen Fossum, bi navê “*A Practical Kurdish Grammar*” pirtûkaka rêziman çap kiriye. Di sala 1926an da Abdé Paul Beidar bi navê “*Grammare Kurde*” bi zimanê frensî pirtûkek çap kiriye.¹²⁰

¹¹⁴ Mîkaîl Bilbil û Mistefa Oztirk, *Tuhfetu’l-Xîlan Fî Zimanê Kurdan*, Weqfa Mezopotamyayê, Stenbol 2019, r. 4.

¹¹⁵ Husein Muhammed, *Dengnasî di kurdî de*, Çapa elektronîk, 2016, r. 4. Malper:

<https://zimannas.wordpress.com/2016/08/18/dengnasiya-zimane-kurdi-kiteb/>, (Pêgehîn: 12.04.2019).

¹¹⁶ Samî Tan, “Der Barê Zimanê Kurdî de Sazî û Xebatên Akademîk”, r. 63.

¹¹⁷ Bûlbûl, h.b., r.12.

¹¹⁸ Samî Tan, “Der Barê Zimanê Kurdî de Sazî û Xebatên Akademîk”, r. 63.

¹¹⁹ Bûlbûl, h.b., r.13.

¹²⁰ Samî Tan, “Der Barê Zimanê Kurdî de Sazî û Xebatên Akademîk”, r. 63.

Di sala 1976an da Margeret Kahn bi navê “*Borrowing and variation in a phonological description of Kurdish*” doktoranameya xwe nivîsiye. Di berhemê da tenê li ser peyvên wergirtî sekiniye.¹²¹

1.3.2. Dengnasî

Kesên ku bi ziman re têkildar bûne ji berê ve, hêj ji Hinda Kevn û Yûnana Kevn ve li ser dengên ziman û çawanî û taybetiyên wî sekinîne.¹²² Ji wî aliyê ve ji berê ve di pirtûkên rêziman da wekî beşa yekem, deng, guherînen dangan û rêzikên wan cî girtine.¹²³ Hema bibêje ev yek bûye adet. Ji ber ku ji bo axaftinê berî her tiştî deng lazim in.

Dengnasî ji bo darijandina peyvan, rêbazên bihevvekirina dengên ku di wî zimanî da hene di nav xwe da dihevine.¹²⁴ Ahanov mijarên qada lêkolîna dengnasîyê wiha dide: Dengên ziman, binyada dengên ziman û rêzikên dangan û rêzikên guherîna dangan.¹²⁵ Nikolay Trubetskoy dengzanîyê wekî “zanista hêla şênber ya dengên di zimanê mirov da” pêname dike.¹²⁶ Fonolojî, dengên ziman ji aliyê peywira dangan ve dinirxîne.¹²⁷ û dibe du beş:

1. Dengnasîya giştî (phonetics): Wekî şaxeka dengzanîya giştî, organên deng, binyada dangan, cîderk û awayên dangan vedikole û esasên senifandina dengên ziman diyar dike. Ji bo dengnasîya giştî Aksan peyva “fonetîka binyadî” jî bi kar tîne.¹²⁸ Ev dengnasî wekî “dengnasîyeka ku hemû qadên fonetîkê di xwe da dihevine” jî dikare bê dîtin.¹²⁹

¹²¹ Muhammed, *Dengnasî di kurdî de*, r. 5.

¹²¹ Samî Tan, “Der Barê Zimanê Kurdî de Sazî û Xebatên Akademîk”, r. 62-63.

¹²² Aksan, *Her Yöniyle Dil Ana Çizgileriyle Dilbilim*, c. 1, r. 25.

¹²³ Aksan, *Her Yöniyle Dil Ana Çizgileriyle Dilbilim*, c. 1, r. 25.

¹²⁴ A. Sumru Özsoy, “Sesbilim”, *Genel Dilbilim-I*, (niv. A. Sumru Özsoy, Ayla Balcı û Ümit Deniz Turan), (ed. A. Sumru Özsoy û Ümit Deniz Turan), Anadolu Üniversitesi, Eskişehir 2017, r. 9.

¹²⁵ Ahanov, h.b., r. 220.

¹²⁶ Nikolay Trubetskoy, *Sesbilim ve Sesbilgisi*. c. 2, *XX. Yüzyılda Dilbilim ve Göstergibilim Kuramları*, (niv. Mehmet Rifat), (amd. Korkut Erdur), (wer. Sema Rifat û Mehmet Rifat), YKY, İstanbul 2014, r. 42.

¹²⁷ Aksan, *Her Yöniyle Dil Ana Çizgileriyle Dilbilim*, c. 1, r. 26.

¹²⁸ Aksan, *Her Yöniyle Dil Ana Çizgileriyle Dilbilim*, c. 1, r. 28.

¹²⁹ Ev nixandin nêrîna Aksan e. bnr. Aksan, *Her Yöniyle Dil Ana Çizgileriyle Dilbilim*, c. 2, Türk Dil Kurumu, Ankara 2015, r. 11.

2. Dengnasîya taybet (phonology): Binyada dengên zimanekî diyar, guherîn û rêzikên dengên wî zimanî vedikole.¹³⁰ Ji vê dengnasîyê ra “fonetîka erkî” jî hatiye gotin.¹³¹ Di vê xebatê da ji bo dengzanîya giştî (phonetics) peyva “dengsazî”yê û ji bo dengzanîya taybet (phonology) jî peyva “dengnasî”yê jî dê bê bikaranîn.

Dengsazî(fonetîk),¹³² li pey şopa wê pirsê ye ku deng çawa û ji ku dertê. Wekî din dengesazî ji derketina ji dev va ta bihîstinê -prosesa bihîstinê jî di nav da- li pey şopa deng e. Üçok dema fonetîkê pênase dike dibêje ku ev şaxa lînguîstîkê di tedkîkên ziman da behsa dengên ku bêjeyê pêk tînin, dike.¹³³ Fonetîk dengên zimanê mirov ji van alîyan vedikole: Çawa pêk tînin, keyfîyetên wan çi ne, ev deng bi kîjan pêlên dengî çawa veguhêzî muxateb dibin û muxateb çawa têdigihîje van dangan?¹³⁴ Yanê bi kurtasî dengesazî hêla dengî ya pevragihandinê vedikole¹³⁵ ku Aksan jî ew wekî “zanista ku dengên zimanên mirovan, hêla dengên zimanan vedikole” pênase kiriye.¹³⁶ Fonetîk, alîyê deng ya axaftinê vedikole û ji alîyê ve li taybetiyên fizîkî yên deng dinêre, ji alîyê din fonetîka telefûz û guhdarîkirinê berê xwe dide vekolana hurgilîyên herî piçûk yên van miemeleyan.¹³⁷

Fonetîk¹³⁸ taybetiyên fizîkî yên kiryar û pevragihandinên ku di dema axaftinê da di axêver û guhdar da peyda dibin, datîne ber çavan. Lê fonolojî bandora dangan ya ku di pevragihandinê da peyda dibe, vedikole. Digel wê, dixwaze raxe ber çavan ku ew deng tê da kîjan cîyawazîyên wateyê peyda dikin.¹³⁹ Ji alîyê din ji bo ferqa

¹³⁰ Karaağaç, h.b., r. 645.

¹³¹ Aksan, *Her Yönüyle Dil Ana Çizgileriyle Dilbilim*, c. 2, r. 9.

¹³² Yule di maqaleyê da ji bo fonetîkê peyva “dengnasî”yê bi kar anîye: “Ji ber vê rewşa teorîk jî, dengnasî bêtir ji awayê fizîkî yên derxistina dangan, li ser dirûvê razber û hişmendî yê dengên zimanî disekine... Dengnasî dîzayineke bingehîn û pêşnûmaya her şeweya dengêki ye ku bi awayekî sabit tevahiya cudahiyên dengjenîne yên dangan di naverokên cuda de dinimine.” Bnr. George Yule, “Dengnasî: Dirûvên Dangan di Zimanî de”, (amd. Dilyar Amûdî), *Kanîzar*, h. 2, 2015, r. 63. Malper: <https://zimannas.wordpress.com/2015/10/04/kanizar-naveroka-hejmara-2/> (Pêgehîn: 05.01.2019).

¹³³ Necip Üçok, *Genel Dilbilim (Lengüistik)*. Multilingual, İstanbul 2004. r. 104.

¹³⁴ Tan jî dema qada xebatê ya fonetîkê rave dike dibêje ku dengesazî ew zanist e ku li pêkhatin, pevgihaştin, ravekirin û pêşkêşkirina dengên ziman dikole. Bnr. Samî Tan, *Rêzimana Kurmancî*, r. 36.

¹³⁵ Aksan, *Her Yönüyle Dil Ana Çizgileriyle Dilbilim*, c. 1, r. 26

¹³⁶ Aksan, *Her Yönüyle Dil Ana Çizgileriyle Dilbilim*, c. 2, r. 9.

¹³⁷ Aksan, *Dilbilim ve Türkçe Yazıları*, Multilingual, İstanbul 2004, r. 126.

¹³⁸ Kurdo jî ji bo fonetîkê peyva “dengsazî”yê bi kar anîye lê peyva fonetîkê wekî “fonetîka”yê bi kar tîne. Çarçoveya fonetîkayê jî wiha xêz dike: “Fonetîka şîrove dike bi çi teherî (cûreyî) û bi arîkariya kîjan endamên (organên) axaftinê (xeberdanê) sewt (deng) çê dibin yan jî peyda dibin.” Bnr. Qenatê Kurdo, *Gramera Zmanê Kurdî*, Roja Nû, İstanbul 1990, r. 10,13.

¹³⁹ Aksan, *Her Yönüyle Dil Ana Çizgileriyle Dilbilim*, c. 1, r. 28

fonetîk û fonolojîyê Aksan dibêje ku dengsazî fonetîk e û fonolojî jî dengnasîya erkî ye ku rasterast li ser zimanê devkî, li ser zimanê axaftinê disekine.¹⁴⁰ Digel ku wek prensîb her du xweser in jî divê di navbera dengnasî û dengsazîyê da têkiliyek hebe ku ev têkilî jixwe mecbûrî ye.¹⁴¹

Di dawîya sedsala XIX'an da (1895) bi pirtûka M. Grammont "*Dissimilation consonantique dans les langues indo-européennes et dans les langues romanes [Di zimanên Îndo-Ewropî û Romanî da cudabûna nedengdêran]*" hîmên fonetîkê hatiye avêtin.¹⁴² Piştî wî, Roman Jacobson, tevî Nîkolay Trubetskoy ked daye damezrandina fonetîkê. Jakobson ji bo senifandina zimanan ya ji aliyê fonetîkê ve pergala dijberîyên dumend pêşwazî dike û vê yekê diparêze ku mirov hemû taybetîyên veqetîner yên fonetîk, bi pergalên dijberîyên dumend dikare bide. Hin ji wan pergalan ev in: dengdêr/nedengdêr, şidandî/sist, bilerz/bêlerz. Vê rêbazê ji aliyê şayesên fonetîk ve rêbazeka hevgirtîr* anîye.¹⁴³ Ji bilî Trubetskoy li Ewropayê di sedsala XX'an da bi taybetî Ferdinand de Saussure û Roman Jacobson ji bo teorîyên dengsazîyê pêşengî kiriye û êdî fonetîk, ji aliyê teorîyê ve bi bingeş bûye.¹⁴⁴ Mekteba Pragê di sala 1926an da derdikeve holê ku vê mektebê ji nêrîna Saussure sûd wergirtiye. Ji nêrîna ku dibêje "Di lêkolîna hêmanên ziman da peywîrên her yek ji foneman hene." hereket dike û dengên ziman ji aliyê van peywîran ve vedikole û ji bo vê zanistê terma "phonologie"yê bi kar tîne.¹⁴⁵

1.3.2.1. Cûreyên rêbazên dengnasîyê

Çawa ku di behsa rêbazên zimannasîyê da derbas bû, di xebatên dengnasîyê da jî du rêbazên sereke hene: Rêbaza dîrokî (diachronique) û rêbaza hevdemî (synchronic). Xebatên ku bi rêbaza dîyakronîk hatine honandin di nav xwe da hevberkirina rewş û guherînên ku li gor deman in, dihewînin. Xebatên ku bi rêbaza senkronîk hatine nivîsîn hewl didin ku rewşa dengnasîya zimanekî diyar ya di

¹⁴⁰ Aksan, *Her Yöniyle Dil Ana Çizgileriyle Dilbilim*, c. 2, r. 9.

¹⁴¹ Trubetskoy, h.b., r. 44.

¹⁴² Perrot, h.b., r. 110.

* Peyva "hevgirtî" ji bo peyva "tutarlı"ya tirkî hatiye bikaranîn.

¹⁴³ Mehmet Rifat, *XX. Yüzyılda Dilbilim ve Göstergebilim Kuramları-1*, YKY, İstanbul 2017, r. 39.

¹⁴⁴ Barzo Mahmoud "Dengsazî û Fonolojî", *Gotarên Zimannasîyê*, (ed. Kenan Subaşî û Resul Geyik), İstanbul 2017, r. 21.

¹⁴⁵ Aksan, *Her Yöniyle Dil Ana Çizgileriyle Dilbilim*, c. 1, r. 28

demeka diyar da rave bikin. Di dengnasiya senkronîk da hevberkirina du demên cuda tune ye.

Ahanov dema dengnasiyê rave dike, çawa ku li jor derbas bû, ew jî dengnasiyê wekî “dengnasiya giştî” û “dengnasiya taybet” dike du şax. Dengnasiya taybet jî dike du şax: Dengnasiya hevdemî (senkronîk) û dengnasiya dîyakronîk (dîrokî). Li gor ku Ahanov rave dike dengnasiya senkronîk binyada dengên jîndar yên zimên tedkîk dike. Sistemên dangan yên ku di wî zimanî de hene û girêdanên dangan yên bi hev ve vedikole.¹⁴⁶

Zimannasên ku agahiyên şayesî (descriptive) di berhemên xwe de dane, qesda dana agahiyên hundirkirî yên axêverê zimanê zikmakî kiriye.¹⁴⁷ Di dengnasiya şayesî da tesbîta rewş û taybetiyên ziman ya di demeka diyar da esas e. Dengzanîya senkronîk binyada ziman ya jîndar vedikole. Pergalên dengî û pevgirêdanên dangan yên di nav wî zimanî da, dibe qada lokolîna vê zanistê. Her çiqas diroka dangan berçav bike jî ev yek jê ra wekî dengnasiya dîyakronîk nabe armanceka taybet. Tenê ji bo ronîkirina pergala dengî ya zimanê jîndar dibe wekî amûrekê.¹⁴⁸

Li gor Perrot karê ewilîn yê zimannasîyê, şayesandîna hemû dîyardeyên ziman yên ku dikarin bên çavdêrîkirin e.¹⁴⁹ Naxwe wezîfeya zimannas, çavdêrîkirina wan taybetiyên ziman e ku di şert û merc û rewşa xwe ya xwezayî da tînan bikaranîn.

1.3.2.2. Cûreyên fonetîkê

Pênc binqadên fonetîkê hene:

1. Fonetîka akustîk (acoustic phonetics): Taybetiyên fizîkî yên wekî frekans û lezbûna pêlên dangan vedikole.¹⁵⁰

2. Fonetîka bihîstbarîyê (auditory phonetics): Qada vê dengsazîyê ew proseya têgihîştina peyamê ye ku ji perdeya guh deng vedihugêze û diçe navenda

¹⁴⁶ Ahanov, h.b., r. 222.

¹⁴⁷ Özsoy, h.b. r. 10.

¹⁴⁸ Ahanov, h.b., r. 223.

¹⁴⁹ Perrot, h.b., r. 19.

¹⁵⁰ Aksan, *Her Yöniyle Dil Ana Çizgileriyle Dilbilim*, c. 2, r. 12.

bihîstinê û di encamê da mêjî tédigihîje ku ev peyam çi ye.¹⁵¹ Carinan di vê pêvajoyê da qutbûn jî çêdibin û pirsgirêk jî derdikevin. Armanceka dengnasîya bihîstbarîyê jî ew e ku çawanîya wê pirsgirêkê tesbît bike.

3. Fonetîka telefuzê (articulatory phonetics): Qada lêkolîna vê dengsazîyê jî çawanîya hereketên fîzîkî ne ku di dema axaftinê da dengan pêk tînin. Ev cûre dengsazî dikeve pey tesbîta wan tevgerên organên wekî ziman, diran û lêvan ku di dema bilêvkirinê da dikevin çi rewşê.¹⁵²

4. Fonetîka fîzyolojîk (physiological phonetics): Ji alîyê hin zanyaran ve di nav dengsazîya telefuzê da hatiye nixandîn. Di vê cûreya fonetîkê da organên hilmijînê û deng û fonksîyon û awayên xebitîna wan ya di dema pêkhatina dengê mirovan da, tê vekolan.¹⁵³

5. Fonetîka ceribandinê/azmûnî (experimental phonetics): Ev cûreya ponetîkê hewl dide ku pirsgirêkên bi deng ve têkildar, bi saya amûrên laboratuwaran bê ceribandin û bi vê rêyê bê ravekirin.¹⁵⁴

Ev xebat jî serê ewil dê têkeve dû fonksîyona van organan ku di dema bilêvkirina dengan da di çi rewşê da ne. Lewma deng û pêkhatina deng di çarçoveya dengnasîya telafuzê da wekî sernavek hatiye dayîn û di beşa duyem ya vê xebatê da di pêkhatina dengê ku tê ravekirin da ji bo wî dengî erka organên şikefta dev hatiye ravekirin.

1.4.Deng û pêkhatina wî

1.4.1.Deng û hin termên têkildarê wî

Ziman pal didin dengan û jîyana xwe bi saya dengan didomînin. Eger deng nehatibûna cem hev û peyv pêk neanîbûna, ziman wî wextî nedibû amrazê ragihandinê. Lewra deng “di navbera nifşan da veguhêzîyê temîn dike.”¹⁵⁵ Tevahîya

¹⁵¹ Aksan, *Her Yöniyle Dil Ana Çizgileriyle Dilbilim*, c. 2, r. 57.

¹⁵² Özsoy, h.b., r. 26.

¹⁵³ Aksan, *Her Yöniyle Dil Ana Çizgileriyle Dilbilim*, c. 2, r. 10.

¹⁵⁴ Aksan, *Her Yöniyle Dil Ana Çizgileriyle Dilbilim*, c. 2, r. 10.

¹⁵⁵ Ahanov, h.b., r. 220.

dengên ku di zimanekî da hene, dibin dengek (phone/sound) ji wî zimanî. Yanê fonem û alofon her du jî dengên wî zimanî ne.¹⁵⁶ Fonem (phoneme) dengên standard in ku temsîliyeta wan di alfabeya wî zimanî da heye û di heman demê da şêwedengên ku bi wî dengî ve girêdayî ne jî temsîl dike.¹⁵⁷ Üçok jî fonemê wiha terîf dike: “Yekeyeka girîft (tevlîhev) e ku di nav zencîra axaftinê da nabe parçeyên jê hûrtir... ev yekeya girîft her dem di zihnê me da heye û ji hesta (empresyon) akustîk û tevgera welidandinê pêk tê.”¹⁵⁸

Alofon (allophone/şêwedeng) ew deng in ku temsîla wan di alfabeyê da tune ye.¹⁵⁹ Di navbera fonem û alofonê da ferq ew e ku bi guherîna fonemê wateya peyvê diguhere yanê fonem wateguhêr (distinctive) e lê bi alofonê wate naguhere. Ahanov jî balê dikişîne ser vê taybetiyê ku fonem (phoneme), peyvan û yekeyên dengî yên peyvan ji hev vediqetînin. Fonem ew yeke ne ku nabin parçeyên ji xwe hûrtir¹⁶⁰ Yule jî ji bo fonemê dibêje ku “Her yek ji van dengên zimanî yên watedar/ watecûda, wek fonem tên şayesandin.”¹⁶¹ û alofon tenê dibe sedema cudahîya bilêvkirinê.¹⁶² Saussure ji bo nasandina wateguhêrîya fonemê û fonksiyona wê û wateneguhêrîya alofonê, bilêvkirina peyva “courage”a frensî wekî mînak dide û dibêje ku girîngîya bilêvkirina “r”ya vê peyvê tune ye. Yanê gelo ev ‘r’, ‘r’ya qirikî û negilover e an ya qirikî û gilover e an jî çî gilover çî negilover ya diranî ye, tu girîngî di frensî da ji bo vî dengê peyvê tune ye. Di vê navberê da ev deng bi temamî cûreyên ji hev cuda saz dikin jî û di zimanekî din da dibe ku di navbera van ‘r’yên ji hev cuda da ji ciyawazîyeka ku di navbera dengê ‘k’ û ‘g’yê da heye, zêdetir hebe jî.¹⁶³ Naxwe em dikarin bibêjin ku ziman li ser esasê ciyawazî û dijberîyê saz dibe lê eger rewşa ziman bi esasî neguhere ev hêmanên dijberî hev yeko yeko bi qîmeta xweyî mutleq nabin sebebê mijûlîya me, ji ber ku nabin sebebê tevlîhevîyekê.

¹⁵⁶ Barzo Omar Mahmoud, *Şîrovekirineke Dengsazî û Fonolojî Di Kurdiya Kurmancî de*, Teza Lîsansa Bilind, Mardin Artuklu Üniversitesi, Mêrdîn 2016. r. 6.

¹⁵⁷ Mahmoud, *Şîrovekirineke Dengsazî û Fonolojî Di Kurdiya Kurmancî de*, r. 6.

¹⁵⁸ Üçok, h.b., r. 106.

¹⁵⁹ Mahmoud, *Şîrovekirineke Dengsazî û Fonolojî Di Kurdiya Kurmancî de*, r. 6.

¹⁶⁰ Ahanov, h.b., r. 238.

¹⁶¹ Yule, h.b., r. 63.

¹⁶² Yule, h.b., r. 67.

¹⁶³ Ferdinand de Saussure, *Genel Dilbilim Yazıları*, İthaki, İstanbul 2014, r. 50.

Ji yên herî piçûk ta yên herî mezin hemû yekeyên ziman ji dangan pêk tên û jê piçûktir tu yekeyên rêziman tune ne.¹⁶⁴ Yekeya dengî¹⁶⁵ ne her yek ji dangan e. Yekeyên dengî, diyardeyên madî yên ziman in û berî her tiştî bi saya lebatên me yên sehekê (hisî) tên îdrakkirin û gotinekê ji yeka din, morfemê ji yeka din vediqetînin.¹⁶⁶ Mesela cudahîya di navbera peyvên ker, ber, ser, der, fer, ger, her, mer, per, şer, ter û zer dibe mînak ji bo vê babetê. Yanê wekî ku Ahanov dibêje, yekeyên dangan ew deng in ku wate û sinora peyvê û morfeman ji hev vediqetînin.¹⁶⁷

1.4.1.1. Alfabe

Dengên ziman di nivîsê da bi tîpên grafîm tên nîşandan. Koma tîpan ya ku li dû hev rêz dibin, alfabe ye. Grafîm tê wateya rêbazên tesbîtkirina dengên zimanekî diyar û pevghîştina yekeyên dengî yên wî zimanî.¹⁶⁸ Di alfabe de da rêgeza sereke ew e ku her tîpek yekeya dengê binimîne, yanê ne ku yekeyên dangan binimîne. Lê ev nayê wê maneyê ku hemû dengên di zimanekî da temsîliyeta xwe di grafîman da dibînin. Mesela her çiqas ji bo alfabe ya kurdî ya latînî wekî “Alfabe fonetîk e.¹⁶⁹” hatibe gotin jî em dinêrin ku alfabe ya kurmancî ya bi tîpên latînî hin dangan di xwe da nahewîne. Temsîlnebûna alofonan normal e lê em dibînin ku hin fonem jî tê da temsîl nebûne. Wekî mînak /î/ya lertzok di alfabe ya kurdî ya latînî da derfêta temsîlbûnê nedîtiye. Naxwe xuya ye ku hin kêmasiyên¹⁷⁰ vê alfabe de hêj jî hene. Lewra wekî rêzik divê hejmara tîpan li gor fonemên wî zimanî be ku ew alfabe bibe alfabe fonetîk. Herwiha Aydoğan jî lêzêdekirina tîpên dengên wateguhêr ango fonem li alfabe de wekî şert nixandîye.¹⁷¹

¹⁶⁴ Muharrem Ergin, *Türk Dil Bilgisi*, Bayrak, İstanbul 1998, r. 29.

¹⁶⁵ Ji bo “yekeya deng” Mahmoud peyva “takedeng” bi kar tîne. Bnr. Mahmoud “Dengsazî û Fonolojî”, *Gotarên Zimannasiyê*, r.30.

¹⁶⁶ Ahanov, h.b., r. 17.

¹⁶⁷ Ahanov, h.b., r. 239.

¹⁶⁸ Ahanov, h.b., r. 407.

¹⁶⁹ Celadet Bedirxan û Roger Lescot, *Kürtçe Dîbilgisi (Kurmancî)*, Doz, İstanbul 2004, r. 15.; Taş jî zimanê kurdî wekî zimanekî fonetîk pênasê dike. Bnr. Çetîn Taş, *Waneyên Rêziman û Rastnivîsa Kurmancî*, Diwan, İstanbul 2013, r. 18.

¹⁷⁰ Li gor Tan her çiqas “/p/, /ç/, /t/, /k/”yên nehilmî (unaspirative) û “/î/ya lertzok” jî ber ku wateguhêr in fonem bin jî ne lazim e ku hemû fonem di alfabe de da bê nîşankirin. Wî wextî jî îdiaya “Alfabe ya kurmancî alfabe fonetîk e.” qels dibe. bnr. Samî Tan, *Rêzimana Kurmancî*, r. 36.

¹⁷¹ Mistefa Aydoğan, *Rêbera Rastnivîsînê*, Rûpel, İstanbul 2012, r. 28-29.

Kurdan, ji berê da hewl dane ku alfabeyeka kurdîya kurmancî* standard bibe û bê bikaranîn. Hin ji wan hewldanan ev in:

1.Di sala 1908an da li Stenbolê komeleya “*Kurd Neşrê Me’arif*” tê damezirandin û ji aliyê vê komeleyê ve li Çemberlîtaşê yekemîn dibistana kurdî vedibe ku navê vê dibistanê “*Kurd Nimûne İbtidâisi-Meşrutiyet*” e. Di vê dibistanê da li gor alfabeya ku Xelîl Xeyalî çêkiriye perwerdehî tê kirin. Dû ra di sala 1912an da li Stenbolê komeleya “Hêvî”yê tê damezirandin û wekî organa weşanê ya vê komeleyê kovara “Rojî Kurd”ê tê derxistin. Xeyalî, di vê komeleyê û kovarê da jî xwedî roleka girîng e. Di vê kovarê da jî alfabeya Xeyalî tê weşandin û pêşniyazkirin. Navê alfabeya Xeyalî “Elifbayê Kurmancî” ye û li gor tîpên erebî ye. Ev alfabe ji 34 tîpan pêk tê.¹⁷² Hewldanên din ên ku dê li jêr bîr parvekirin dê ji maqaleya Xeznedar bîr veguhêstin.

2.Di sala 1920an da Lazo Kazaryanî li ser bîngeha alfabeya ermenî alfabekek amade dîke û pê pirtûka bi navê ‘Şems’ çap dîke.

3.Alfabeya zîmanê Kitaba Celwe û Mishefa Reş ku ji aliyê rojhilatnasên ewropî ve hatine dîtin.

4.Kurdnasên ku li ser wêjeya gelêrî xebitîne her yek li gor xwe sîstemeka alfabeya latînî danîye.

5.Kurdên ku li îsraîlê ne, li ser bîngeha tîpên îbrî alfabekek bi kar anîye. Zêdetir ji aliyê cihûyên kurdên îranê ve hatiye bikaranîn.¹⁷³

6.Pişti şerê cîhanê yê yekemîn li ermenistan û sûrîyeyê (li Iraqê jî, lê ji bo soranî) hewl hat dayîn ku li ser esasê tîpên latînî alfabekek standard bê çêkirin. Li Ermenistanê di sala 1929an da ji aliyê Îshaq Maragulov û Ereba Şamilov ve li ser esasê tîpên latînî Alfabekek kurdîya kurmancî hat avakirin û ev alfabe heta 1945an

* Esasen ji gotara hevpar ya Ali û Mosa jî em dibînin ku hîn ev mesele çareser nebûye û xuyaye li ser pirsgirêkên alfabekek di şûnda jî dê tişt bîr gotin. Di gotarê da behsa nebûna nivîseka ku ji kultura me ye tê kirin û qenaeta nivîskarên ya ku derheqê zehmetîya alfabekek standard ya hevpar di nav kurdan da bê avakirin di vê maqaleyê da tê bilêv kirin. Bnr. Bakir O. Ali û Mosa Abdulwahab Khalid, “Standard Language, Phonology and Alphabet”, *Nûbihar Akademî*, h. 3, İstanbul 2015, r. 53-74.

¹⁷² <http://kovarabir.com/mamosote-qedri-alfabeya-xelil-xeyali/> (Pêgehîn: 01.05.2018).

¹⁷³ Marif Xeznedar, “Mêjûya Danîna Alfabeza Zîmanê Kurdî”, *Zend*, h. 12, İstanbul 2010, r. 74-75.

bû alfabeya kurdên kurmanc yên kafkasyayê. Piştî vê tarîxê alfabeyeka krîlî hat avakirin. Berî alfabeya Maragulov û Şamilov di sala 1928an da li Komara Tirkîyeyê li ser esasên latînî tîpên nû ji bo tirkî hatibûn pejirandin. Vê yekê tesîr li rewşênbirên kurd kiribû û vê tesîrê di sala 1932yan da li Sûrîyeyê bi destê C. Bedirxan wekî alfabeyeka latînî ya kurdî-kurmancî xwe nîşan da.¹⁷⁴

1.4.2.Pêkhatina Deng

Dengên ku di dema axaftinê da derdikevin bi dandestpêkirina herikîna hewayê ya destpêkerekî pêk tên. Ew destpêker carinan pişik, carinan zengelor û gelpik e. Herikîna hewayê ku wekî destpêker bi rêya pişikan ve tê dahfdan, bi alîyê jor ve bi rêya zengilorê derbasî valahîya dev û bêvilê dibe û ji wir derdikeve derve.¹⁷⁵

Deng di sê pêngavan da pêk tên:

1.Piştî hilmijînê ji alîyê pişikên ku wezîfeya kûrikê dibînin ve hinek hewa bi pêş ve tê dehfdan.

2.Hewayaya ku hatiye dehfdan di qirikê ra derbas dibe. Di qirikê da têlên deng hene. Dema ku hewa di wir ra derbas dibe li gor lerizîna van têlan deng wekî ên lertzok û ên ne lertzok tên binavkirin.

3.Piştî ku hewa di gewrîyê ra derbas dibe, ji bêvil an dev derdikeve. Di dema derketinê da li gor lêketin an lêneketina organa deng tên binavkirin.¹⁷⁶

Endamên ku di proseya dengpêkanîna da tên bikaranîn ev in:

1.Pişik

2.Zengelor

3.Qirik

4.Valahîya dev


¹⁷⁴ Xeznedar, h.b., r. 76-77.

¹⁷⁵ Ciwan, h.b., r. 49.

¹⁷⁶ Jean Demy, *Türk Dili Gramerinin Temel Kuralları*, (wer. Oytun Şahin), TDK, Ankara 1995, r. 15.


5. Valahîya difin

Ciwan, endamên axaftinê wiha daye: pişik, têlên dengî (vocal folds/vocal cords), qirik, zengelor, ezmanê dev, ziman, diran û lêv.¹⁷⁷ Hilma ku ji cegerê mirov dertê, li xelekên zengilorê dikeve û wê dilerizîne. Dû ra bi alîkarîya esmanê dev, ziman, diran, bêvil û lêvan qalib digire. Dengên mirovan bi vî awayî pêk tên.¹⁷⁸ Li jêr ji berhema Muhammed dîtbarîya endamên pêkhatina deng hatiye wergirtin:



Wêne 1¹⁷⁹: Endamên pêkhatina deng.

Endamên axaftinê ji zawiyekeya din wiha dikare bê nîşandan:



Wêne 2¹⁸⁰: Endamên pêkhatina deng

¹⁷⁷ Ciwan, h.b., r. 49.

¹⁷⁸ Şêxmûs Aslan, *Lêkolînek Li ser Rêzimana Kurdî Kurmancî*, Na, Îzmir 2018, r. 47.

¹⁷⁹ Muhammed, *Dengnasî di kurdî de*, r. 10.

Frekansa dengên ziman bi dirêjahî û fişara perdeyên deng ve têkildar e. Perdeyên dengên zarok û jinan kurt in û ji ber vê jî çewisandina ku tê kirin jî xurt e. Lewma jî frekansa dengên wan zêde ye.

Pergalên dengên zimanan û keyfîyeta wan ji hev cuda ne. Hin deng ji bo hin zimanan pir girîng in û xweyî cihekî taybet in lê dibe ku ji bo zimanekî din girîngîyeka bi vî rengî tune be an jî berevajîyê zimanê din be. Di zimanekî da bandora vokalên dirêj û kin li wateya peyvê heye û wateyê diguherîne lê di zimanekî din da dibe ku ew ferq tune be.¹⁸¹

Taybetîyeka hevpar¹⁸² ya hemû zimanan ew e ku di hemû zimanan da dengdêr û nedengdêr hene. Deng, li gor fonksiyona wan ya di kîteavakirinê da dibin du bir: Dengdêr û nedengdêr. Dema ku herikîna hewayê di nav amûra deng da dimeşe ku ji nav valahîyên dev û poz derkeve derve, hin asteng derdikevin. Ew astengî, bi tevgera ziman û çeneya jêr çêdibin. Dengdêr û nedengdêr li gor keyfîyet, cî û pîleya van astengîyan tên tayînkirin.

Ketgorîzekirina dengan li gor hin taybetîyan dibe. Ji van taybetîyan ra “sîmayên cudaker¹⁸³ (distinctive features)” tê gotin. Mahmoud, wekî sîmayeka cudaker ya dengdêr û nedengdêran vê pîvanê dîyar dike: Dengên ku hewa heta dev û bêvilê bê asteng derdikeve, yên dengdêr in. Berevajîyê wê jî ango dengên ku hewa di cihekî sazgeha dengî de leqayî astengekî dibe û pêşîya wî tê girtin, ji nişka ve derdikevin, dibin dengên nedengdêr.¹⁸⁴

Di qirikê da tîlên dengî (vocal folds/vocal cords) hene û di hin dengan da ew tîl dilerizin. Dengên ku dema derdikevin wan tîlan dilerizînin, dengên lertzîner in. Berevajîyê wê ango di dema derketina wan de ew tîl nalerizin, dengên nelerzîner in.

¹⁸⁰ Çetin Taş, *Dengsazîya Devoka Çaldîranê, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Mêrdîn 2015*, r. 16.; vgh. Behrooz Shojai, Notên waneya rêzimana kurmançî 1. *Dengsazî, Enstîtuya Zimanên Zindî Unîversîteya Mardîn Artuklu*, r. 3.

¹⁸¹ Ahanov, h.b., r. 239.

¹⁸² Özsoy ji van taybetîyên hevpar ra bi tirkî gotiye “dil evrenselleri”. Bnr. Özsoy, h.b., r. 13.

¹⁸³ Me ev term ji Teza Mahmoud wergirt. Bnr. Barzo Omar Mahmoud, *Şirovekirineke Dengsazî û Fonolojî Di Kurdiya Kurmançî de*, r. 133.

¹⁸⁴ Mahmoud “Dengsazî û Fonolojî”, *Gotarên Zimannasiyê*, r. 27.

2. BEŞA DUYEM

DENGAZÎYA (FONETÎK) HERÊMA TORÊ

2.1. Dengdêr di Devoka Torê da

Kurdo ji bo dengdêran tabîra “sewtên danganî”, ji bo nedengdêran jî komepeyva “sewtên bêdanganî” bikar tîne û dengdêran wekî “Ew sewt in, yê ko deng jê der tîn, xweserî xwe ne, bê sewtên din deng ji wan tîne der.”¹⁸⁵ rave dike.

Amêdî dengdêran¹⁸⁶ wiha pênase dike: “Dengdêr, vowels ew deng in yê ku ji hatin û çûn û livlivîna bayê li serêk (berdewam) ji sihan we le nav devî û gewrîyê û difinê jî hinde caran dilivî, bê ku rêka bayî bête girtin yan jî cihê tê ra çûna bayî teng bibit.”¹⁸⁷ Bi îfadeyeka din di çêbûna dengdêran da ba di qirikê û şikefta dev da rastî tu astengîyan nayê û ev deng di bihûreka wekirî de pêk tîn, bi serê xwe dertên.¹⁸⁸ Baran, “di bilêvkirinê da li rastî tu astengîyê nehatin”¹⁸⁹ê ji bo dengdêrîyê wekî sîmayekî cudaker daye. Muhammed jî dengdêran wiha pênase dike: “Vokal ew deng in ku ji gewrîyê di nav perdeyên dengî re derdikevin û nayên sekinandin anku hewa bi serbestî dilive.”¹⁹⁰ C. Bedirxan jî dema dengdêran pênase dike “bi serê xwe ji dev derketin û dengêkî mûsîqayî pê re anîn”ê¹⁹¹ wekî sîmayekî cudaker dide pêş.

Pênaseya Torî derheqê dengdêrîyê da wiha ye: “Tîpên dengdêr tîpên dixwedeng in. Bixweser tîne xwendin û di xwendina tîpên dengdar de tîne bikaranîn.”¹⁹² Di berhemeka xwe ya din da C. Bedirxan digel “bi sere xwe ji dev derketin”ê taybetiyeka din ango “dixwedengî û alikariya derxistina dengên nedengdêr” jî li taybetîyên dengdêran zêde dike.¹⁹³

¹⁸⁵ Kurdo, *Gramera Zmanê Kurdî*, r. 14.

¹⁸⁶ Zaxoyî, Torî û Ciwan ji bo dengdêrê gotiye “dengdar” û ji bo nedengdêrê jî gotiye “bêdeng”. Îbrahîm Remezan Zaxoyî, *Rêzmana Kurdî Bo Qonaxên Seretayî û Navendî li Derveyî Welatî*, c.1, Spîrêz, Hewlêr 2009, r. 10.; Torî, h.b., r. 612.; Ciwan, h.b., r. 50.

¹⁸⁷ Sadiq Bahaeddînê Amêdî, *Rêzimana Kurdî Kurmancîya Jorî û Jêrî ya Hevberkirî*, (wer. M. Xalid Sadîni), Dîwan, Stenbol 2012, r. 48.

¹⁸⁸ Aydogan, h.b., r. 28.

¹⁸⁹ Baran, h.b., r. 31.

¹⁹⁰ Muhammed, *Dengnasî di Kurdî de*, r. 8.

¹⁹¹ Celadet Alî Bedirxan, *Bingehên Gramera Kurdmancî*, Nûdem, c.n.d., 1994, r. 16.

¹⁹² Torî, h.b., r. 611.

¹⁹³ Celadet Alî Bedirxan, *Alfabêya Kurdî & Bingehên Gramera Kurdmancî*, r. 11.

Dengdêrên ku di devoka Torê da tên bikaranîn, ev in:

/a/: *agir* (3/1)

[á]: *piçûk á* (4/3)

/e/: *kesax* (12/21)

/ê/: *êvar* (3/13)

/i/: *diwazdeh* (6/4)

/î /: *îşev* (11/13)

[î'ya kurt]: *dîya wê* (4/12)

/o/: *berano* (10/15)

/u/: *kurî* (22/74)

/û/: *bûk* (8/1)

Di dabeşkirina dengdêran da hin sîmayên cudaker (distinctive features) kartêker in. Dengdêr li gor kurtbûn û dirêjbûna wan, li gor cîderka wan, li gor awayê vebûna devê mirov di dema derketina wan da, li gor asta wan ya di jidevderketinê da dabeş dibin. Li gor van sîmayên cudaker dabeşkirina dengdêran di devoka Torê wiha ye:

Hejmara dengdêrên devoka Torê 10 e û ev dengdêr li gorî derketina ji dev ve dibin du bir:

a. Dengdêrên dirêj: /a/, [á], /ê/, /î /, /û/, /o/

b. Dengdêrên kurt: /e/, /i/ [î'ya kurt], /u/

Li gorî derûyê (mexrec/cîderk¹⁹⁴) dengdêr dibin sê bir:

¹⁹⁴ Tan, ji bo 'derû'yê peyva 'cîderk'ê bi kar anîye. Bnr. Samî Tan, *Rêzimana Kurmancî*, r. 38.

a. Dengdêrên pêşderkî: /î/, [î'ya kurt], /ê/, /e/

b. Dengdêrên navderkî: /i/, /u/

c. Dengdêrên paşderkî: /û/, /o/, /a/, [á]

Li gorî awayê vebûna dev, dengdêr dibin sê bir:

a. Dengdêrên gilover: /o/, /û/, /u/

b. Dengdêrên nîvgirtî: /î/, [î'ya kurt], /i/, /ê/

c. Dengdêrên vekirî: /a/, [á], /e/

Li gorî asta derketina ji dev dengdêr dibin sê bir:

a. Dengdêrên bilind: /î/, [î'ya kurt], /û/, /i/, /u/

b. Dengdêrên navincî: /ê/, /o/

c. Dengdêrên Nizm: /a/, [á], /e/

LI GOR AWAYÊ VEBÛNA DEV	LI GOR DERÛYÊ (MEXREC)		
	Dengdêrên pêşderkî	Dengdêrên navderkî	Dengdêrên paşderkî
Dengdêrên gilover		/u/	/o/, /û/
Dengdêrên nîvgirtî	/î/, [î'ya kurt], /ê/	/i/	
Dengdêrên vekirî	/e/		/a/, [á]

Tablo 2: Tabloya Tabetîyên Dengdêrên Devoka Torê (ji alîyê awayê vebûna dev û mexrecê ve)

LI GOR DERKETINA JI DEV	LI GOR ASTA DERKETINA JI DEV		
	Dengdêrên bilind	Dengdêrên navincî	Dengdêrên nizm
Dengdêrên dirêj	/î/, /û/	/ê/, /o/	/a/, [á]
Dengdêrên kurt	/i/, [î'ya kurt], /u/		/e/

Toblo 3: Tabloya Tabetîyên Dengdêrên Devoka Torê (ji alîyê derketin û asta derketina ji dev ve)

2.1.1. Dengdêra /a/yê (li gor sîstema IPAyê: [a])

Ev fonem ji alîyê derketina ji dev ve dengdêreka dirêj e. Ji alîyê derûyê ve paşderkî, ji alîyê asta derketinê ve dengêkî nizm e. Ji alîyê vebûna dev ve dengêkî vekirî ye. Ji bo bilêvkirina vî dengî dev hinek tê vekirin û bayekî nerm ji pişikê tê dafdan û di nav lêvê re derdikeve.¹⁹⁵ Li gor Zal ev deng paşê tev li zimanê kurdî bûye.¹⁹⁶ K. Bedirxan bilêvkirina vî dengî wekî /a/ya tirkî dîtîye.¹⁹⁷ Me jî ev yek li qada lêkolînê çavdêrî û guhdarî kiriye lê digel ferqekî: Ev deng di kurmançîya nivîskî da û di heman demê da di devoka Torê da jî berevajî ya tirkî, dengêkî dirêj e.

Baran ev deng ji alîyê teşeya lêvan ve wekî “dûz”, ji alîyê teşeya çeneyê ve wekî “dengêkî fereh”, li gor têkilîya zimên û diranan wekî “dengêkî stûr” bi nav kiriye.¹⁹⁸ Di kurmançîya nivîskî da ev deng li pêş, nav û paşîya bêjeyan dikare bê.¹⁹⁹ Di devoka Torê da jî rewş naguhere ango di serê peyvê da, li nav û di dawîya peyvê da ev deng tê bikaranîn. Çend bikaranîn ji tekstên ji herêma devoka Torê yên ku di çarçoveya vê xebatê da hatine berhevkerin li jêr in:

Di serê peyvê da:

¹⁹⁵ Aykoç, h.b., r. 41.

¹⁹⁶ Peyv û bêjeyên kurdîya kevn ku di nav da “eh, we, ehe, ehî” derbas dibin, bi /a/yê guherîne. Zal, çend heb ji peyvên îroyîn yên ku dengê “eh”ê ji nav rabûye û guherîye dengê /a/yê wekî mînak dane: kahnî-kanî, deşîk-daşîk, pehtin-patin, çehiv-çav. Bnr. Zal, h.b., r. 75-76.

¹⁹⁷ Kamuran Bedir Xan, *Kolay Kürtçe (Kurmançî)*, (wer. Yakup Karademir), Doz, İstanbul 2013, r. 9.

¹⁹⁸ Baran, h.b., r. 24.

¹⁹⁹ Zal, h.b., r. 76.

“aşêfa genima dderket”: Aşêfa geniman derdiket. (1/3)

“Heta tovê me çêdbû em î av din.”: Heta tovîkê me çêdibû me av dida. (2/2)

“Me agirê xwe tkir.”: Me agirê xwe dikir. (3/1)

“nivişta xwá biká alîyê kepê xwá”: Nivişta xwe têxe alîyê kepê xwe. (16/16)

“Te p çî qasî anîyá?”: Te bi çî qasî anîye? (18/30)

Di nava peyvê da:

“wekî dî dibû ya zelal”: Wekî din dibû ya zelal. (3/26)

“Mi hemmi gurandin”: Min hemû gurandin. (6/9)

“ji balgeha”: ji balgehan (9/33)

“bastîqa xwá”: bastîqa xwe (10/17)

“mala gavên”: mala gavan (29/20)

Di dawîya peyvê da:

“zavayê me”: zavayê me (7/49)

“ew geyá”: ew giya (12/4)

“dîse z çûme mala wa.”: Dîsa ez çûm mala wan. (14/20)

“halo misîwá yá”: halo misawî ye. (13/4)

“weraqa bûn ha.”: wereqe bûn ha. (18/7)

2.1.1.1.Dengdêra [á]yê

Ev alofon, wekî dengdêra /a/yê ji alîyê derketina ji dev ve dengdêreka dirêj e ku li devoka Torê tê bikaranîn. Berdêla vî dengî di kurmançîya nivîskî da wekî grafîm tune ye. Ev dengê xweserê devoka Torê, ji alîyê derûyê ve paşderkî, ji alîyê

asta derketinê va dengekî nizm e. Ji alîyê vebûna dev ve dengekî vekirî ye. Di navbera dengê /e/yê û dengê /a/yê de ye lê bêhtir nêzî /a/yê ye. Ji ber ku wateya peyvê naguherîne ne fonem e, alofoneka herêma Torê ye. Qada bikaranîna wê berfireh e. Di van rewşan da tê bikaranîn:

- Cînavkên tewandî yên kesane yên “me” û “te” gelek caran dibin “má” û “tá”.

“me txwarin û **má** ava bacana çêtkir.”: me dixwarin û me ava bacanan çêdikir. (2/18)

“Û **má** firaxê xwe tanîn”: Û me firaxên xwe dianîn (3/14)

“xeswa **tá**”: xesûya te (6/9)

“ewkê **tá**”: ewkê te (15/9)

- Daçeka “da”yê axleb di devokê da wekî “dá” tê bikaranîn.

“Em î pey **dá** m î kesaxê kîn.”: Me pey da kesax dikir. (1/2)

“Birayê wê çû pê **dá** xeyidî.”: Birayê wê çû pê da xeyidî. (5/33)

- “Xwe”ya ku cînavka vegerok e, di devoka Torê da wekî “xwá” tê bikaranîn.

“Em ê çin nahkê **xwá** aşêf kîn.”: Em diçûn me nokê xwe aşêf dikir. (1/4)

“Avîyê **xwá** me tajotin.”: Avîyên xwe me diajotin. (2/4)

- Di kêşana raweya fermanî da /e/ya di dawîya lêkerê da wekî /á/yê tê bikaranîn.

“Vê fitnê neká.”: Vê fitneyê neke. (5/35)

“**Hará**”: Here (4/17)

- Di devokê da carinan di dawîya lêkerên kişandî da /e/yek zêde dibe. Ev deng carinan wekî [á] tê bikaranîn.

“Em î şivista xwá diná hev”: Me şivista xwe dida hev (1/2)

“ser bana jî dihaṭá girtin”: ser banan jî dihat girtin (13/4)

• Lêkera bûnê di kesê sêyem ê yekjimar da û di pirjimarîyan da axleb wekî [á] tê bikaranîn.

“Û îşê gunda yá.”: Û îşê gundan e. (3/67)

“keçka min á piçûk á.”: keçika min piçûk e. (4/3)

“Em dido ná: m haṭine paleyîyê.”: Em dido ne em hatine paleyîyê. (27/6)

• Daçeka “ve”yê axleb wekî “vá”yê tê bikaranîn.

“cîran haṭiná b me vâ.”: cîran hatin bi me ve. (25/18)

“dfiṭilîn dora gênim vâ.”: difiṭilîn li dor genim ve. (1/38)

• Di dema borîya dûdar da /e/ya dawî di devokê da wekî [á]yê tê bikaranîn.

“Tekel haṭiná ser serê mi”: Tekel hatine ser serê min (7/5)

“Êş ji mi tenê re haṭiyá?”: Êş ji min tenê ra hatiye? (6/10)

• Li herêmê di bersivan da bi peywira peyva “erê”yê tê bikaranîn.

“ê Pişêrî dibê xarûs. Á!”: yên Bişêrî dibêjin xarûs. Erê! (23/13)

“Herkesî neṭkirî. Á!”: Her kesî nedikirî. Erê! (24/1)

• Di devokê da carinan piştî navdêr/cînavkên mê an da di şûna peyva “yeka” da tê bikaranîn.

“Xweha min á di rê de yá”: Xweha min (yeka) di rê da ye. (4/2)

“Tirkán á feqîr á.”: Tirkan (yeka) feqîr e. (4/8)

• Daçeka “ra”yê axleb wekî “rá”yê tê bikaranîn.

“Wela p Xwedê ji me *ra* çênabin.”: Wele bi Xwedê ji me ra çênabin. (26/7)

“Ez b Hemoyê Miradê Sofî wa *ra*.”: Ez bi Hemoyê Miradê Sofî wan ra. (26/8)

2.1.2. Dengdêra /e/yê (li gor sîstema IPAyê [æ])²⁰⁰

Ev dengê devoka Torê, ji alîyê derketina ji dev ve dengdêreka kurt e. Ji alîyê derûyê ve pêşderkî ye. Ji alîyê asta derketinê ve dengêkî nizm e. Ji alîyê vebûna dev ve dengêkî vekirî ye. Ji alîyê teşeya lêvan ve dûz, ji alîyê teşeya çeneyê ve fereh, li gor têkilîya zimên û diranan dengêkî zirav e. Wekî ku C. Bedirxan jî dibêje ev dengdêr dikare berî/li dû nedengdêrekî bê.²⁰¹ Dengdêra ku navborî dibêje û /e/ya devoka Torê heman deng in. Ev deng di serê peyvê da kêmanê çaran tê. Wekî din di devoka Torê da di nav û dawîya peyvê da tê bikaranin.

Di serê peyvê da:

Ji hemû metnan tenê di du peyvên da li serê peyvê derket pêşberê me. Ji xwe yek ji wan bikaranînan jî peyveke esiltirkî bû.

“*eyrî eyrî*”: (Ji tirkî) ayrı ayrı (1/26)

“kesî *ewk* netkîrin”: kesî ewk nedikirin (1/51)

Di nava peyvê da:

“dîse ma^cnî rîsî bûn, dîsa zeyat bû”: dîsa mîna rîsîyan bû, dîsa zeyat bû (10/49)

“bi rîya Deştîkê de neçin.”: bi rêya Deştîkê da neçin. (11/4)

“Û ciharê wî jî tişê kevîr kir”: Û ciharê wî jî tişê kevîr kir. (11/16)

²⁰⁰ Di berhema Tan da û di berhema hevpar ya Tarih Vakfî da ev nişane wekî “[æ]”ê derbas dibe. Bnr. Samî Tan, *Rêzimana Kurmancî*, r. 34.; Mehmet Sait Çakar, Fehim Işık, Mehmet Mehmetoğlu û yê din, *Ortaöğretim Kürt Dili ve Edebiyatı Ders Kitabı*, (ed. Fadime Polat) Tarih Vakfî, İstanbul 2010, h.b., r.10.

Lê li gor Muhammed ev nişankirin ango “[æ]” nedurist e. Bnr. Muhammed, *Dengnasi di kurdî de*, r. 256.

²⁰¹ Bedirxan û Lescot, h.b., r. 15.

“heke çiq̄a t̄e ve çû keçikê jî gotiye”: Eger çî qas t̄e ve çû keçikê jî gotiye (11/41)

“Beharî ma^lum á me kesax t̄ikir lo!”: Beharî malûm e me kesax dikir lo! (12/1)

Di dawîya peyvê da:

“Vêca p hev rá pere t̄xwarin.”: Vêca bi hev ra pere dixwarin. (18/6)

“Heke go tî axir xwe l mi eşkere nekê”: Eger tu xwe li min eşkere nekî (22/42)

“Anî, bihemle bû.”: Yanê, biheml bû. (29/1)

“zele^te me çêdikir, li nav reza me t̄xwar”: me zelate çêdikir, li nav rezan dixwar (3/32)

“Herki me çen miştaxe çêkîrin.”: Her yekî me çend miştaxe çêdikirin. (3/45)

2.1.3. Dengdêra /ê/yê (li gor sîstema IPAyê:[e])²⁰²

Ji aliyê derketina ji dev ve dengdêreka dirêj e. Ji aliyê derûyê ve pêşderkî ye. Ji aliyê asta derketinê ve dengêkî navincî ye. Ji aliyê vebûna dev ve dengêkî nîvgirtî ye. Ev deng ji aliyê teşeya lêvan ve dûz²⁰³, ji aliyê teşeya çeneyê ve fereh, li gor têkilîya zimên û diranan dengêkî zirav e. Amedî ji bo pîleya dirêjbûna vî dengî dibêje ku ev dengdêr, dengdêraka dirêj e lê ev dirêjahî ne bi qasî dengdêra /a/yê ye.²⁰⁴ Ev deng di devoka Torê da di serê peyvê da, di nava peyvê da û dawîya peyvê da tê bikaranîn:

Di serê peyvê da:

“Go ‘Yadê, êş e.’”: Got: “Dayê, êş e!” (6/10)

“E j dara ha^tim, ji êzinga”: Ez ji daran hatim, ji êzingan (25/2)

²⁰²Di berhema Tan da û di berhema hevpar ya Tarih Vakfi da ev nîşane wekî “[ə]” derbas dibe. Bnr. Samî Tan, *Rêzimana Kurmancî*, r. 34.; Çakar, Işık, Mehmetoğlu û yên din, h.b., r. 10.; Ev nîşankirin ([e]) li gor Muhammed e. bnr. Muhammed, *Dengnasi di kurdî de*, r. 270.

²⁰³Zal di senifandina xwe da ev deng wekî dengêkî “rast” daye. Bnr. Zal, h.b., r. 69.

²⁰⁴Amêdî, h.b., r. 53.

“Me dgo “ê_tûn”.”: Me digot “ê_tûn” (12/22)

“Me jê _tkirin, û ê_dî em _i co_ht k_in.”: Me jê dikirin û ê_dî me dê cot kiribûna. (12/2)

“Taxa Ê_zîdîya á l aliyê vî yalî: qesrê bû axir.”: Taxa Ê_zîdîyan li vî aliyê qesrê bû, axir. (26/11)

Di nava peyvê da:

“Dibû bihar, çê_le xilas...”: Dibû bihar, çile xelas... (1/1)

“Má aşê_f _tkir.”: Me aşê_f dikir. (1/1)

“Hema î_şê me he_tta êvarî kê_ferat bû,”: Hema î_şê me heta êvarî kê_ferat bû, (3/47)

“em _i kine, cê_rê xwá.”: me dikir cê_rê xwe. (3/67)

“We_la m nedgihan em tê_r nanê xwe _bxun.”: Wele em nedigihîştin ku em tê_r nan bixwin. (3/69)

Di dawîya peyvê da:

“Ê_ş ji mi tenê re ha_tiyá?”: Ê_ş ji min tenê ra hatiye? (6/10)

“Xweha min á di rê de _yá w ke_çka min á pi_çûk á.”: Xweha min di rê de ye û ke_çika min pi_çûk e. (4/2)

“We _dvê em _e hine bine mala birayê wê.”: We divê em dê henayê bibin mala birayê wê. (8/40)

“Ê go birine Xwedê heqê me jê re nehê_lê.”: Yê ku birine Xweda heqê me jê ra nehê_le. (9/37)

“Em sê çar cara çûn.”: Em sê çar caran çûn. (4/1)

Li gor C. Bedirxan ji ber ku mexrecên her duyan nêzî hev in, dengdêra /ê/yê jî wekî dengdêra /î/yê berî /y/yê nayê. Eger hat, êdî diguhere, dibe /e/.²⁰⁵ Ev rêzik li gor devoka Torê nederbasdar e. Ji ber ku wekî ku me lê kola û dît ku /ê/ di vê rewşê da dibe /i/ an jî [î'yeka kurt]*. Mînak:

“diya yê go welleh heṭṭa ṭ firûnê nekirê ṭi wê nabê.”: dêya wê got wele heta tu firinê nekirî tu wê nabî. (8/28)

“dîya yê”: dêya wê (5/10)

“ya ssîya bû.”: Ya sêyan bû (4/3)

“Newêrabû pîyê xwe bavêjê.”: Newêrabû pêyê xwe biavêje. (6/23)

2.1.4. Dengdêra /i/yê (li gor sîstema IPAYê: [i])

Ji alîyê derketina ji dev ve dengdêreka kurt e. Ji alîyê derûyê ve navderkî²⁰⁶ ye. Ji alîyê asta derketinê ve dengê bilind e. Ji alîyê vebûna dev ve dengê nîvgirtî ye. Zal vî dengî wekî “dengê ji bingeha dengdêriya kurdî” bi nav dixe û dibêje ku ev deng di serê peyvê da nayê. Îhtimala jiholêrabûna vî dengî jî bilêv dixe ku di pêvajoya kemilîna zimên da heye ku pêk bê.²⁰⁷ Ev dengê devoka Torê ji alîyê teşeya lêvan ve dûz, ji alîyê teşeya çeneyê ve teng, li gor têkilîya zimên û diranan dengê zirav e. Taş ev deng ji alîyê bilêvkirinê ve wekî /i/ya tirkî nirxandiyê.²⁰⁸ Lê li gor devoka Torê ev her du deng ne heman deng in. Jixwe li gor sîstema nîşankirinê ya IPAYê jî ji hev cuda²⁰⁹ tên nîşandan.

²⁰⁵ Bedirxan û Lescot, h.b., r. 24.; Çetîn Taş, *Waneyên Rêziman û Rastnivîsa Kurmancî*, Diwan, İstanbul, 2013, r. 23.

* Ji bo vî dengî dê di pêş da agahî bê dayîn.

²⁰⁶ Zal ji bo mexreca vî dengî gotiye “paşderkî”. Zal, h.b., r. 84.

²⁰⁷ Zal, h.b., r. 84.

²⁰⁸ Çetîn Taş, *Waneyên Rêziman û Rastnivîsa Kurmancî*, r. 20.

²⁰⁹ Muhammed jî derheqê van her du dangan da dibêje ku *îya* kurdî her çiqas nêzîk be jî ne wek dengê *rya* tirkî (*îya* benuqte) ye. *îya* kurdî li pêş, lê *ya* tirkî li paşîya dev peyda dibe. Wekî din dengê *rya* tirkî bi alfabeya IPAYê wek [u]yê tê nivîsîn. Bnr. Muhammed, *Dengnasî di kurdî de*, r. 280.

Wekî ku Bedirxan jî dibêje, wekî rêzik tu bêjeyên kurdî bi vê dengdêrê dest pê nakin.²¹⁰ Di metnê me yên ku ji devoka Torê hatine berhevkirin da peyvek tenê hat dîtîn ku di serê wê da ev deng hatibû bikaranîn. Ev peyv hokereka devokê bû: “iha”.

Di serê peyvê da:

“*ih* z b vê gavê ez gihamá Xwedê”: ha ez bi vê gavê gihîstim Xweda. (28/24)

Ji bilî vê bikaranînê me çar peyv dîtîn ku di serê wan da /i/ hebû, lê ew peyv jî peyvên biyanî bûn:

“çil *in*san w î serxet bê.”: çil însan dê serxet bibe. (1//5)

“nefs ji *in*sanî re çênebê xwarzê ha”: Nefs ji insan re çênabe xwarzê ha (28/2)

“em ê mala xwá werêniná *Is*kenderûnê.”: Êm dê mala xwe bînin Îskenderûnê. (20/17)

“*Il*leh *ku*riík li gun namênê”: Îlla (teqez) divê kurik li gund nemîne. (21/16)

“*Û*i *in*s î, *û*i *cin*s î”: tu ins î tu cin î (31/20)

Di nava peyvê da:

“Dibû *bi*har, çêle *x*ilas”: Dibû bihar, çile xelas (1/1)

“*H*ina goşt dibir,”: Hinan goşt dibir, (3/32)

“Anî ser cihê yî *dir*êj kir.”: Anî li ser cihê wî dirêj kir. (7/93)

“*K*arê *azi*ba bînin”: Karikê aziban bînin (8/26)

“E ji *mir*inê filitîm.”: Ez ji mirinê filitîm (8/78)

Di dawîya peyvê da:

²¹⁰ Bedirxan û Lescot, h.b., r. 20.

Di dawîya peyvê da di lêkolînê da ev deng zahf hat dîtin. Ên ku hebûn jî li gor kurmancîya nivîskî yan ji /e/yê, /û/yê û /u/yê guherîbûn an jî ji ketina dengê* pêk hatibûn. Tenê du mînakên dawî ku peyveka pirsyarîyê ne bê ketin an guherîn bûn mînak ji bo /i/ya di dawîya peyvê da:

“Deh diwazdeh mirîşkê *mi* bûn.”: Deh diwazdeh mirîşkên min bûn. (6/4)

“Me *tşî* *ava* bacana *tkîr*.”: Me tije ava bacanan dikir. (2/13)

“Hingî vêca *hemî* kesî jî,”: Hingî vêca hemû kesan jî, (4/7)

“*dî* ro sê ro ketne wê navê de.”: du roj sê roj ketin wê navê. (5/1)

“Ma ê bê *çî*?”: Ma dê bibe çî? (2/19)

C. Bedirxan ji bo vî dengî gotiye ku dengê /i/yê di dawîya tu navdêrî da nayê.²¹¹ Wekî ku me jî lê kola me di metin da nedît ku navdêrek bi vî dengî qediya be.

2.1.5. Dengdêra /î/yê (li gor sîstema IPAYê:[i:])

Ev dengê devoka Torê ji aliyê derketina ji dev ve dengdêreka dirêj e. Ji aliyê derûyê ve pêşderkî, ji aliyê asta derketinê ve dengê bilind e. Ji aliyê vebûna dev ve dengê nîvgirtî ye. Ev deng ji aliyê teşeya lêvan ve dûz, ji aliyê teşeya çeneyê ve teng, li gor têkilîya zimên û diranan dengê zirav e. Aktuğ ji bo bilêvkirina vî dengî gotiye ku “nêzî dengê /i/ya tirkî” ye.²¹² Taş jî bilêvkirina vî dengî beramberî /i/ya tirkî dîtiye.²¹³ Li gor C. Bedirxan dengê /y/yê –ku exleb bi peywira kelejandinê tê-dema piştî dengê /î/ yê bê ew dengdêr diguhere, dibe /i/ û ev yek hem di nivîsê da hem jî di telefuzê da pêk tê.²¹⁴ Aktuğ jî di wê qeneetê da ye ku ev dengdêr berî nedengdêra /y/yê tê bikaranîn û nabe /i/. Çawa ku di tirkî da ev deng berî /y/yê tê bikaranîn û naguhere.²¹⁵ Wekî vê nêrîna Aktuğ, di devoka Torê da jî ev deng berî

* Di mînaka yekem da dengê /n/yê ketiye û cînavka kesane ya tewandî bûye “mi”.

²¹¹ Bedirxan û Lescot, h.b., r. 25.

²¹² Halil Aktuğ, *Gramera Kurdî Kürtçe Gramer*, Avesta, Diyarbakır 2013, r. 18.

²¹³ Çetin Taş, *Waneyên Rêziman û Rastnivîsa Kurmancî*, r. 20.

²¹⁴ Bedirxan û Lescot, h.b., r. 24.

²¹⁵ Aktuğ, h.b., r. 30.

dengê /y/yê tê û -ne di hemû bikaranînan da- xwe diparêze, lê bi şiklekî: Dirêjbûna vî dengî dihele û dibe [î]yeka kurt. Ji xwe Ciwan jî dema ev deng daye wekî wekî “/i/ya tirkî lê bi niv dengî jê dirêjtir”²¹⁶ terîf kiriye. Naxwe di vê rewşê da /î/yeka kurt jî di devoka Torê da heye û divê taybetîyên wê li jêr bîn dayîn.

Dengê /î/yê di devoka Torê da di serê peyvê da kêr²¹⁷ tê bikaranîn. Em wekî bikaranîneka esilkurmancî axleb li rastî peyvên ku bi pêşgira “î-”yê²¹⁸ hatine çêkirin hatin ku wateya roj, dem, sal, car, an şeva ku tê da ne dide. Wekî din peyva “Êzîdî”yê hebû ku di devokê da -Tenê di hin metnan da derbas dibû ku ew metin jî Hecî Birahîm hatibûn qeydkirin (wekî mînak 26/10).- bûbû “Îzîdî”. Di peyva “êdî”yê da jî ev deng hebû ku di tekstên berhevkirî da wekî “îdî”yê hatiye bikaranîn. Ji bilî van mînanan di du peyvên esilbiyanî da (Îshaq²¹⁹ û îdare²²⁰) em di serê peyvê da li rastî vî dengî hatin. Xulase em dikarin bibêjin ku di serê peyvê da di devoka Torê da eger em forma “îdî, îşev, îsal...hwd.”li ber çavan negirin kêr tê bikaranîn lê di nava peyvê da û dawîya peyvê da tê bikaranîn:

Di serê peyvê da:

“Vêca rabû, me dayê dâ w îdî.”: Vêca rabû, me dayê û êdî (21/19)

“Á! Vêca taxekê Îzîdîya hebû.”: Erê, vêca taxeka Êzîdîyan hebû. (26/10)

“Û were îşev ti mêvanê min î.”: Û were îşev tu mêvanê min î. (11/13)

“Û w îşê gunda”: Û îşê gundan (10/47)

“Îsal me bazar nekîrîyá.”: Îsal me bazar nekiriye. (1/53)

“Îcar hemşerîkî mi hebû.”: Îcar hemşehrîyekî min hebû. (18/40)

²¹⁶ Ciwan, h.b., r. 52.

²¹⁷ Aslan derheqê vî dengî da ji bo kurmancîya nivîskî gotiye ku tu caran di serê peyvên kurmancî da nayê bikaranîn. bnr. Aslan, h.b., r. 60.

²¹⁸ Husein Muhammed ji bo vê bikaranîne dibêje ku bi avestayî *im-* + *reoç*, di farisî da dibe *em*, di kurdî da dibe *im*. Di kurmancî da dengê *myê* dikeve. Bnr. Husein Muhammed, *Rehnas Ferhenga Etîmolojiya Kurdî*, Çapa elektronîk, 2016, r. 173. Malper: <https://zimannas.files.wordpress.com/2016/11/rehnas.pdf>, (Pêgehîn: 10.04.2019).

²¹⁹ Peyveke hevpar ya îbrani û erebî ye. Bnr. <https://tr.m.wikipedia.org/wiki/%C4%B0shak>, (Pêgehîn: 10.04.2019).

²²⁰ Peyveke erebî ye. Bnr. <https://tr.m.wikipedia.org/wiki/%C4%B0shak>, (Pêgehîn: 10.04.2019).

“Melçîyê Îshaqo fileh bû.”: Melçîyê Îshaqo fileh bû.(19/21)

“Em jî idare tkin, ma em ê çi kin?”: (9/37)

Di nava peyvê da:

“Mi go “Pîreka yekî Dalînî yâ.”: Min got: Pîreka yekî Dalînî* ye. (21/26)

“Te navê Şêx Ehmed jî bihîstîye ne wlo?”: Te navê Şêx Ehmed jî bihîstîye ne wisa? (28/8)

“Hêdîka pîrikê çi kir?”: Hêdî hêdî pîrekê çi kir? (29/5)

“Hespê wî dixê hîrehîr.”: Hespê wê dike hîrehîr.(30/38)

“Berî paleyîyê rîsî dderketin.”: Berî paleyîyê rîsî derdiketin.(1/16)

Di dawîya peyvê da:

“Xwedê jê razî bê.”: Xweda ji te razî be. (21/41)

“Hecî Xelîl bû.”: Hecî Xelîl bû. (21/42)

“hewqasî xwe wilo xwe ne ddayê dá”: ewqas xwe wilo nedidayê” (22/15)

“Me dgo benî,”: Me digot “benî.” (23/12)

“yekî dî”: yekî din (23/20)

Wekî ku li jor derbas bû di devokê da [î]yeka kurt jî heye. Ji ber ku ne wateguhêr e em dê bi terma “alofon”ê vî dengî bidin ku bi qeneeta me ji ber ku tenê ciyawazî di navbera vê alofonê û dengdêra /î/yê da kurtbûna wê ye, ne hewce ye ku ji bo vî dengî grafîmeka (grapheme)²²¹ xweser bê dayîn. Ji ber vê yekê jî em dê tenê nîşaneyê alofonîyê bidin û wê wiha nîşan bidin:

* Dalîn, gundekî Nisêbînê ye.

²²¹ “Grafîm (grapheme) ew nîşan e ku di nivîsînê de jê re tîp dibêjin û di sistîma alîfba de bikar tê.”. Barzo Omar Mahmoud, *Şîrovekirineke Dengsazî û Fonolojî Di Kurdiya Kurmancî de*, r. 7.

2.1.5.1.Dengdêra [î'ya kurt] (li gor sîstema IPAyê:[i])

Hemû taybetîyên ku di serî da ji bo /î/yê hatine gotin, ji bo vê olofonê jî derbasdar in lê tenê ev deng ji alîyê derketina ji dev ve ne dirêj e, dengdêreka kurt e. Ji ber ku /î/, ji xwe di serê peyvê da pir hindik tê bikaranîn ev deng ji di nav metnên me da di serê peyvê da tune ye ango di devokê da di serê peyvê da nayê bikaranîn. Ji ber ku pedivîya bikaranîna /y/ya piştî wê heye, di dawîya peyvê da jî nayê. Tenê di nava peyvê da tê bikaranîn. Mînakên wê di devokê da pir in. Hin ji wan mînakên:

“Berî paleyîyê rîsî dderketin.”:Berî paleyîyê rêsî derdiketin. (1/16)

“Em î çine rîsîya.”: Em diçûn rêsîyan. (1/17)

“çîyayê Gêrê”: çiyayê Gêrê* (1/18)

“me avîya xwá dberda”: me avîya xwe berdida. (1/56)

“Me av dikişan ji kanîyê”: Me av dikişand ji kanîyê (3/2)

“me xwelîya xwe w kilsa xwe şanî.”: me xwelîya xwe û kilsa xwe dianî. (3/2)

“Heqaten î nihaq bû, ya ssîya bû.”: Heqeten niheq bû, ya sêyan bû. (4/3)

“Çi qewimîbê l mi qewimîyá.”: Çi qewimîbe li min qewimîye. (7/81)

“Xwe l devîyê pêça.”: Xwe li devîyê pêça. (11/9)

“l vîyê dî pirsî”: li vîyê din pirsî (11/19)

2.1.6.Dengdêra /o/yê (li gor sîstema IPAyê:[o])

Ji alîyê derketina ji dev ve dengdêreka dirêj e. Ji alîyê derûyê ve paşderkî, ji alîyê asta derketinê vê dengêkî nizm e. Ev deng ji alîyê teşeya lêvan ve gilover, ji alîyê teşeya çeneyê ve fireh, li gor têkilîya zimên û diranan dengêkî stûr e. Di devokê di serê bêjeyê da nayê. Di nav metnên me da em rastî du bikaranînan hatin ku bi vî dengî dest pê dikin, her du jî (ocax û ode) peyvên esilbiyanî bûn. Wekî din di serê

* Gêrê gundekî Kercosê ye.

bêjeyan da em li rasta peyvên ku bi eslê xwe kurdî bûn nehatin. Minakên vî dengî yên ku di nav peyvê da û di dawîya peyvê da hatiye bikaranîn, hene:

Di serê peyvê da:

“Û me ga me *ocaxa*²²² me pêxistîye”: Û gava *ocaxa* me pêxistî ye. (7/79)

“Wê jî melkesîk da *odê*”: Wê jî melkesek da odayê. (9/7)

Di nava peyvê da:

“Beranok çêtkirin. Dardarok çêtkirin”: (wan) beranok çêdikir, dardarok çêdikir. (10/15)

“Çira me pê *txist hindurwê koxê* da”: Me di hundirê *koxê* da çira pêdixist. (10/33)

“*adiz* bû û çû bi *çolê keş*”: *aciz* bû û çû bi *çolê ket*. (11/27)

“Bi *teyîra, p qazma*:, *dora mêwa me tkola*”: Me bi *tevir* û *qazmeyan* *dora mêwan* xwe *dikola*. (12/3)

“*Zarokê* mi *hebûn*”: *Zarokên* min *hebûn*. (20/44)

Di dawîya peyvê da: Li herêma Torê di dawîya peyvê da /o/ axleb di baneşanan da tê bikaranîn. Ji bilî vê bi ketina /t/ya peyva “got”ê ev deng di dawîya peyvê da hatiye bikaranîn. Yeka din ew e ku peyva “wilo”yê di şûna “wisa”yê da li herêma tê bikaranîn. Bikaranîna “halo”yê jî bi vê peyvê ve girêdayî ye. Peyveka din ya ku bi vê dengdêrê diqede peyva “du”yê ye ku hejmarek e. Li Torê peyva “du”yê bi peywira hevalnavê tê bikaranîn lê bi guherînekê. Peyv dibe “di”; lê dema peyv xweser tê ango navdêr e dibe “dido” û bi vî dengî diqede.

“Halo...”: Halo... (9/22)

“Miletwekîlî bû lo!”: Miletwekîlî bû lo! (19/22)

²²² Peyveka esiltirkî ye. bnr. Sevan Nişanyan, *Sözlerin Soyağacı Çağdaş Türkçenin Etimolojik Sözlüğü*, Everest, İstanbul 2012, r. 454.

“Hey Hecî Eħmed “Yabo filan.”: Hey Hecî Ehmed (got): Bavo, filan! (20/40)

“çi yá kuro ma ti... Amo pok!*:”: Çi ye kuro ma tu... Amo pok!(22/74)

“Em yek ddo...”: Em yek dido... (23/19)

“ti kera bajo,”: tu kera xwe biajo. (22/35)

2.1.7.Dengdêra /u/ yê (li gor sîstema IPAyê:[u])²²³

Tan vê dengdêrê wekî “dengdêreka xweserî kurdî” bi nav dike û dibêje ku bilêvkirina wê, ji bo bîyanîyan hinekî dijwar e.²²⁴ Ev /u/ya ku Tan behs dike û /u/ya devoka Torê heman deng in. Ji alîyê derketina ji dev ve ev deng dengdêreka kurt e. Ji alîyê derûyê ve paşderkî ye. Ji alîyê asta derketinê ve dengêkî bilind e. Ev deng ji alîyê teşeya lêvan ve gilover, ji alîyê teşeya çeneyê ve teng, li gor têkilîya zimên û diranan ve dengêkî zirav e.

Ev deng di devoka Torê da di destpêka bêjeyan da cih nagire. Li gor ku Taş ji bo kurmançîya nivîskî behs kiriye, dibe ku sedema wê ev be ku ji ber ku dengêkî kurt e û bilêvkirina wê hinekî bi kêşe ye mirov bi hêsanî di nav peyvê da dikare wî bilêv bike.²²⁵ Ev deng di devoka Torê da di dawîya peyvê da jî pir kêmtê:

Di nava peyvê da:

Di nava peyvê da tê bikaranîn lê dema em li mînakên ku ji metnên xwe yên ku ji axêverên devoka Torê hatine wergirtin dinêrin dibînin ku hin ji wan, peyvên erebî ne û guherîne (melûm e>malum á, kibr>kubir), hin ji wan kurdî ne; lê dengdêrên wan guherîne, bûne /u/ (sond>sund, rûyê wî> rûwê yî), hin jî di devokê da ji xwe tînan bikaranîn û li gor kurmançîya nivîskî ferqeka wan tune ye (guh, kur, hundir, gund):

“dîsa di ber guhê me rá.”: dîsa di ber guhê me ra (22/39)

* Baneşaneka herêma Torê ye û di rewşa ecêbmayînê da tê bikaranîn.

²²³ Di berhema Tan û di berhema hevpar ya Tarih Vakfî da ev nişane wekî “[oe]” derbas dibe. Bnr. Samî Tan, *Rêzimana Kurmançî*, r. 34.; Çakar, Işık, Mehmetoğlu û yên din, h.b., r.10; Lê li gor Muhammed ev nişankirin ango “[oe]” nedurist e.; Muhammed, *Dengnasi di kurdî de*, r. 304.

²²⁴ Samî Tan, *Rêzimana Kurmançî*, r. 50.

²²⁵ Çetîn Taş, *Waneyên Rêziman û Rastnivîsa Kurmançî*, r. 20.

“Rabû timmama rabû p̄ Qur’anê dane sundê.”: Rabû tamam bi Quranê dan sondê. (22/61)

“Çi yá, çi yá kuro ma ti...”: Çi ye kuro ma tu... (22/74)

“wilo ruwê yî tenî tkirin.”: wilo rûyê wî tenî dikirin. (23/1)

“Mi kubir şî xwe re girtîyá.”: Min kibr ji xwe ra girtiye. (28/4)

“Hecî ‘Elî jî mezinê gund bû ma lum á.”: Hecî Elî jî mezinê gund bû malûm e. (22/55)

Di dawîya peyvê da:

Di dawîya peyvê da jî gelekî kê m tê bikaranîn. Çawa ku di mînakên ku me ji metnên me wergirtî da gihaneka /û/yê carinan nedengdêra /w/yê berî xwe girtiye û kurt bûye, bûye /u/. Dibe ku ji ber taybetîya axêverê be -ji ber ku di metnê heman axêverê de rû daye- an jî ji ber ku axêver bilez axivîye di dema borîya diyar de lêkera ku bi dengdêra /û/yê diqedîya, guherîye û bi dengdêra /u/yê qediyaye (çû>çu, bû>bu). Di mînakeka din da bikaranîna “ji kû”yê guherîye bûye “ş **ku**” Di mînakeka din da “çikû/çinkû”ya kurmancîya nivîskî guherîye û bûye “çinku”.

“Me dhilanî wu me ddanî”: Me dihilanî û me didanî (1/42)

“Go me şîranî kir û çu birne ‘îş.”: ku me şîranî kir û çû birin îş. (5/23)

“bu sibe vêca wa jî da^{ch}wa pişta dêrî kir.”: bû sibe û vêca wan jî dawa pişta derî kir. (8/50)

“Ilaca herdu birayê min e j destê te yá.”: Ilaca her du birayê min ji destê te ye. (11/31)

“Ew ş ku zanê bê ka çawa kiriye.”: Ew ji ku dizane bê ka çawa kiriye. (19/49)

“Çinkû ê spî yá.”: Çinkû ê spî ye. (31/5)

• C. Bedirxan ji bo hînkirina vî dengî ji biyanîyan ra dibêje ku ev deng ji dengên /w/ û /i/yê pêk tê û pê ve dike ku ev bikaranîn wekî “dixwim-dixum, bixwim-bixum” nikare bê nivîsandin.²²⁶ Bereksê vê rêzikê di devoka Torê da mînakên vê bikaranînê di zimanê axaftinê da hene:

“Û m î cihê xwe deynin û şîva xwe çêkin û **xun** û”: Û me cihên xwe didanî û şîva xwe çêdikir û dixwar. (3/42)

“We la m ne dgihan em têr nanê xwe **bxun**.”: Wele em nedigihîştin ku em têr nanê xwe bixwin. (3/69)

• Carinan di bikaranînan da ev deng dirêj dibe û dibe dengdêreka din jî (/û/):

“Şîv **bixûn**.”: Şîv bixwin. (22/25)

“De bixûn yabo **bixûn**,”: De bixwin bavo bixwin, (27/2)

K. Bedirxan û Ciwan ji bo bilêvkirina vî dengî dibêjin ku wekî /ü/ya tirkî tê xwendin.²²⁷ Ev tesbît li devoka Torê nayê.²²⁸ Ev deng ango /ü/ya tirkî di devoka Torê da tune ye û dengê /u/yê tu caran wekî /ü/ya tirkî di devokê da nayê bilêvkin. Eger devoka Torê wekî rêzikên kurmancîya nivîskî meşîba li gor ku Zal û C. Bedirxan nivîsîye divîyabû ev deng (/u/), berî dengê /w/yê nehatibûna.²²⁹ Hetta eger îcab bikira ku bê bikaranîn, wî wextî divîyabû /u/ bûba /i/.²³⁰ Lê di devoka Torê da li dijî Kurmancîya nivîskî ev bikaranîn jî heye ku bi sê şêweyan pêk tê:

1. Lêkera ku di dawîya wê da dengdêra /û/yê heye dema ku di dema borîya dûdar de tê serfêkirin carinan /û/ diguhere û kurt dibe, dibe /u/ û li dû xwe dengê kelejandinê yê /w/yê û /e/yê di şûna bikaranîna “ye”yê da digire.

“Ew jî çuwe tenûrê go nê çêkê.”: Ew jî çûye tenûrê ku nan çêbike. (29/27)

“Çi nebuwe?”: Çi nebûye? (9/33)

²²⁶ Bedirxan û Lescot, h.b., r. 22.

²²⁷ Bedirxan û Lescot, h.b., r. 10.; Ciwan, h.b., r. 53.

²²⁸ Jixwe Aktuğ jî ev tesbît şaş ditiye. Bnr. Aktuğ, h.b., r. 22.

²²⁹ Zal, h.b., r. 94.

²³⁰ Bedirxan û Lescot, h.b., r. 23.

“Û çu^we avêtîyê dá”: Û çûye avêtîyê (11/53)

2. Dengdêra /i/ ya lêkerê -ku piştî wê nedengdêra /w/yê di rayeka wê da ji xwe hebû- bûye /u/. Me ev mînak tenê di bikaranekê da dît ku ew jî lêkera “biwartin/bihartin”ê bû.

“şevbihêrka xwe dibu^wêrin”: şevbihêrka xwe dibiwêrin. (9/4)

3. Navdêrên ku bi dengê /û/yê an jî /o/yê diqedin bi sedemên ji hev cuda dema ku dengê kelejandinê girtine di şûna /y/yê da ji wan dengan /w/yê girtine. Di wê demê da jî dengdêra dawî ku /û/ ye, guherîye bûye /u/.

“Dinya deyn ketne stu^wê mi dá”: Dinyayek deyn ketiye stûyê min (9/39)

“careke di kevirkî ddu^wa”: careka din kevirekî didoyan (22/39)

“wilo iu^wê yî tenî tkirin.”: wilo rûyê wî tenî dikirin. (23/1)

“Má komikê axê li hundir^wu çêdkirin.”: Me komikê axê li hundiran çedikirin. (23/18)

“Win ji kû haţina û win zar^wê me dxin.”: Hûn ji ku hatine û hûn li zarokên me dixin. (29/29)

2.1.8. Dengdêra /û/yê (li gor sîstema IPAYê: [u:])²³¹

Ji alîyê derketina ji dev ve dengdêreka dirêj e. Ji alîyê cîderkê ve paşderkî²³² ye. Ji alîyê asta derketinê ve dengê bilind e. Ji alîyê teşeya lêvan ve dengê gilover, ji alîyê teşeya çeneyê ve teng, li gor têkilîya zimên û diranan dengê stûr e. Ev deng di warê bilêvkirinê da ji alîyê Tan û Taş ve wekî “u”ya tirkî hatiye nirxandin.²³³ Di devoka Torê da di serê peyvê da ev deng nayê bikaranîn. Ên heyî jî ji zimanê biyanî ketine devokê. Di nava peyvê û dawîya peyvê da ev deng tê.

²³¹ Di berhema Tan û di berhema hevpar ya Tarih Vakfî da ev nişane wekî “[u]” derbas dibe. Bnr. Bnr. Samî Tan, *Rêzimana Kurmancî*, r. 34.; Çakar, Işık, Mehmetoğlu û yên din, h.b., r.10.; Lê li gor Muhammed divê [u:] be. Bnr. Muhammed, *Dengnasî di kurdî de*, r. 310.

²³² Zal ev deng wekî “pêşderkî” bi nav kiriye. Bnr. Zal, h.b., r. 95.

²³³ Samî Tan, *Rêzimana Kurmancî*, r. 51.; Çetîn Taş, *Waneyên Rêziman û Rastnivîsa Kurmancî*, r. 20.

Di serê peyvê da: Me sê bikaranîn tesbît kirin ku di serê peyvê da hatine. Bikaranîna yekem (ûzilmîş) ji tirkî ketiye axaftina çavkanîyê, ya duyem jî (ûtî)²³⁴ ji tirkî hatiye wergirtin. Peyva sêyem ji erebî ketiye kurdî ku eslê peyvê ibrî²³⁵ ye. Naxwe wekî encam di kurmancîya devoka Torê da dengê /û/yê di serê peyvê da nayê. Ên ku hene jî bi eslê xwe biyanî ne.

“Go “Tî nexweş î, ez *ûzilmîş* dibim.” ”: Got: Tu nexweş î, ez uzulmîş dibim. (7/53)

“Gulnaz, ka te cilê mi *ûtî* kîrine? ”: Gulnaz, ka te cilên min ûtî kirine? (7/49)

Á vêca ev, ev vêca evê xulamê *Ûsivê* Haco: Erê, vêca ev evê xulamê *Ûsivê* Haco (18/18)

Di nava peyvê da:

“Tirkîkan baka xez*ûrê* xwe, nayê? ”: Tirkîkan, bang bike xezûrê xwe, nayê? (7/31)

“Mala bavê *bûka* di go ”: Mala bavê bûka din got (8/1)

“Yadê go birayê m neyê belkî dest*ûra* mi *nedin*. ”: Dayê, ku birayê min neyê belkî destûra min nedin. (8/53)

“Dûv re vêca hê *nûka* m î çine vêca aşêfê ”: Dû ra vêca hêj ji nû ve em dê çûbûna aşêfê (10/26)

Di dawîya peyvê da:

“me ceyê xwe *tanîne hindirû*. ”: Me ceyên xwe dianîn hundir. (1/13)

“*Tîrs* nebû, *tiştîk* nebû. ”: Tîrs tunebû, tiştîk tunebû. (1/18)

“*heta* go b dest*a* me *karîbû* me b dest*a* çêd*kir*. ”: heta ku me bi destan karîbû me bi destan çêdikir. (2/9)

²³⁴ Bnr. Nişanyan, *Sözlerin Soyağacı Çağdaş Türkçenin Etimolojik Sözlüğü*, r. 651.

²³⁵ Bnr. Nişanyan, *Sözlerin Soyağacı Çağdaş Türkçenin Etimolojik Sözlüğü*, r. 680.

“Her *dû* *keçkê* min *û* zavayê min *á*.”: Her du keçikên min *û* zavayê min e. (8/46)

“*îşê* gunda wilo l *dû* hevdû quṭ nabê”: *îşê* gundan wisa li *dû* hev quṭ nabe. (10/40)

Li gor C. Bedirxan ev dengdêr dikare bi her nedengdêrê ra bê, tenê nedengdêra /w/yê dikare piştî /û/yê bê lê nikare berî wê bê.²³⁶ Lê berevajê vê nêrînê çawa ku Zal jî dibêje ev deng di nav peyvê da berî dengê /w/yê nayê.²³⁷ Me jî di metnan da dît ku di devoka Torê da li gor tekstên ku me berhev kirine ev rêzika ku Zal dibêje derbasdar e, ango /û/ berî /w/yê nayê.

Xaleka din ew e ku li gor ku C. Bedirxan gotiye /w/ nikare berî /û/yê bê. Li gor lêkolînên me ev rêzik li gor devoka Torê jî derbasdar e. Çawa ku me di gelek bikaranînan da lê ne di heman peyvê da dît ku di devoka Torê da berî gihaneka /û/yê digel ku di eslê peyvê da tune ye jî dengê /w/yê tê bikaranîn lê di wê rewşê da bi ya me bi zanebûn di navbera van herdu dangan da di bilêvkirinê da veqetandinek hatiye kirin *û* pevbestin çênebûye:

“Berá buzolabîkê w çamaşîrkê w televzonkê *w û* va ş xwe jê re bikirin.”: Bila buzdolabîyekê *û* çamaşîrekê *û* televizyonekê *û* va ji xwe jê ra bikirin. (4/30)

“mêrik baş bûye *w û* rabûye hevdû birinâ w çûnâ.”: mêrik baş bûye *û* rabûye hevdû birine *û* çûne. (11/54)

“darê xwe *w û* em diçûne”: darê xwe *û* em diçûn (3/18)

2.2.Nedengdêr di devoka Torê da

Hewa li organên dengderxistinê dikeve *û* nedengdêr pêk tên.²³⁸ Nedengdêr ew deng in ku di gotinê da rastî astengîyê tên. Ji bo bilêvkirinê pêwîstiya wan bi dengdêran heye. Torî ji bo dengên nedengdêr peyva “dengdar”ê bi kar tîne *û* nedengdêrîyê wiha pêname dike: “Tîpên nedixwedeng in. Bixweser nayêne xwendin.

²³⁶ Bedirxan *û* Lescot, h.b., r. 26.

²³⁷ Zal, h.b., r. 94.

²³⁸ Karaağaç, h.b., r. 836.

Bi arîkarîya tîpên dengdêr dengên xwe didêrin.”²³⁹ Aydogan ji bo nedengdêrê peyva “konsonant”ê bi kar tîne û dibêje ku “Di bihûreka tengkirî yan jî girtî da çêdibin û bi awayekî giştî nikarin kêteyan saz bikin.”²⁴⁰ Li gor terîfa C.Bedirxan nedengdêr dixwedeng e lê dengê wê bi serê xwe û bê alîkarîya dengdêr dernakeve.²⁴¹ Muhammed jî di pênaseya nedengdêrê da dibêje ku di dema derketina wan de rê ji hewayaya deng ra bi temamî yan jî hinekî tê girtin. Ji bo bîlêvkirin muhtacî vokalan in û di her peyvê da herî kême divê vokalek hebe.²⁴² Nedengdêrên devoka Torê ev in:

/b/: *bira* (11/1)

[b]: *bîtir* (14/13)

/c/: *çar cara* (4/1)

/ç/: *çûn* (1/30)

/ç/: *çav* (1/36)

[ç]: *çal* (11/44)

/d/: *dîsa* (3/27)

[d]: *dawet* (5/41)

/f/: *fîravîn* (3/31)

[f]: *fîleh* (19/20)

/g/: *genim* (1/3)

/h/: *hêdîka* (29/5)

/h/: *heft* (3/45)

²³⁹ Torî, h.b., r. 612.

²⁴⁰ Aydogan, h.b., r. 28.

²⁴¹ C. Bedirxan, *Alfabêya Kurdî & Bingehên Gramera Kurdmancî*, r. 11.

²⁴² Muhammed, *Dengnasî di kurdî de*, r. 8.

/j/: *jêhatî* (14/40)

/k/: *kopal* (6/20)

/k/: *keçîk* (7/81)

/l/: *limêj* (10/20)

[l]: *wel_lat* (30/22)

/m/: *mal* (9/31)

[m]: *mez_min* (2/9)

/n/: *nîsk* (1/3)

[n]: *no_nt* (22/17)

/p/: *ku_pap* (14/4)

/p/: *pênc* (6/17)

[p]: *p_pez* (5/29)

/q/: *qurm* (1/20)

/r/: *çar* (4/1)

/r/: *reş* (2/4)

/s/: *sê* (2/13)

[s]: *so_sr* (2/4)

/ş/: *şiv* (8/25)

[ş]: *çavreş_şî* (9/23)

/t/: *tiş_tt* (1/5)

/t̥/: t̥ûrik̥ (19/41)

[t̥]: t̥îrs̥ (7/75)

/v/: m̥evan (11/13)

[v]: t̥ev̥rik̥ (1/43)

/w/: hewar̥ (7/47)

/x/: xort̥ (1/37)

/x̥/: x̥ela (14/1)

/y/: yek̥ (1/28)

/z/: zêr̥ (4/26)

[z]: p̥ez̥ (5/29)

/ʰ/: ʰîş (3/43), ʰa^{ch}v (14/12)

[ʰ]: Naʰ (14/53)

Cihê çêbûna wan û awayê çêbûna wan, di dabeşkirina nedengdêran da sîmayên cudaker (distinctive futures) in.

• Nedengdêrên devokê -çi fonem û çi alofon- li gor cihê çêbûna wan (cîderk) wiha dabeş dibin:

1. Nedengdêrên lêvkî (û dulêvkî): Di bilêvkirinê da her du lêv tên ser hev û dû ra vedibin. Dengên /b/, [b], /p/, /p̥/, [p̥], /m/, [m], /w/ lêvkî ne.

2. Nedengdêrên diranî: Di bilêvkirinê da ziman li diranên jorîn dikeve. Dengên pidûyî jî di vê kategorîyê da hatine binavkirin. Dengdêrên /s/, [s], /z/, [z], /d/, [d], /t/, /t̥/, [t̥], /n/, [n] dikevin vê kategorîyê.

3. Nedengdêrên diranlêvkî: Di bilêvkirinê da lêva jorîn li pêş e. Lêva jêrîn dikeve bin diranên jorîn. Dengên /f/, [f], /v/, [v] diranlêvkî ne.

4. Nedengdêrên pêşezmandevî: Di bilêvkirinê da ziman li pêşiya ezmanê (demax) dikeve û ev deng dertên. Dengên /ş/, [s], /j/, /c/, /ç/, /ç/, [ç], /r/, /r/, /l/, [l], /y/ pêşezmandevî ne.

5. Nedengdêrên ezmandevî (demaxkî): Di bilêvkirinê da orta zimên û paşiya wî li demaxê (ezman) dikevin. Dengên /g/, /k/, /k/ ezmandevî ne.

6. Nedengdêrên qirikî (yên gewrîyê): Di bilêvkirinê da ev deng li paşîya dev di gewrîyê da çêdibin. Dengên /h/, /h/, /q/, /x/, /x/, /ʃ/, [ʃ] ên gewrîyê ne.

•Nedengdêrên devokê -çi fonem û çi alofon- li gor awayê derxistinê wiha dabeş dibin:

1. Nedengdêrên domdar (herikî): /f/, [f], /h/, /h/, /s/, [s], /ş/, [s], /x/, /x/, /j/, /l/, [l], /m/, [m], /n/, [n], /r/, /r/, /v/, [v], /w/, /y/, /z/, [z]

2. Nedengdêrên nedomdar (girtî): /p/, /p/, [p], /ç/, /ç/, [ç], /t/, /t/, [t], /k/, /k/, /q/, /b/, [b], /c/, /d/, [d], /g/, /ʃ/, [ʃ]

•Nedengdêr ji alîyê hişkbûn û nermbûnê ve jî dibin du bir:

1. Nedengdêrên hişk: /f/, [f], /h/, /h/, /s/, [s], /ş/, [s], /x/, /x/, /p/, /p/, [p], /ç/, /ç/, [ç], /t/, /t/, [t], /k/, /k/, /q/, [ʃ]

2. Nedengdêrên nerm: /j/, /l/, [l] /m/, [m], /n/, [n], /r/, /r/, /v/, [v], /w/, /y/, /z/, [z], /b/, [b], /c/, /d/, [d], /g/, /ʃ/

•Dengên “p, ç, t, k”*: wekî sîmayeka cudaker li gor bipif û bêpifbunê²⁴³ (aspirated and unaspirated / bihilm û bêhilmûn) tên binavkirin û dibin du bir:

* Em di pêvajoya lêkolînê da li rastî pirtûkeka pdf hatin. Xuya bû ya xwendingehê bû. Weşanxane nediyar bû lê li Efrînê hatibû çapkirin. Di wê pirtûkê da ji bo van dangan peyva “cêwîdeng”ê hatiye bikaranîn. Bi ya me ev binavkirin pir lê hatiye lê ji ber ku me di lîteratûrê da li cihekî din ev bikaranîn

1. Nedengdêrên bihilm (aspirative/req/pifdar): Bi van dengan ra ba ji dev xurt dertê. Dengên /p/, /ç/, /t/, /k/ bihilm in.

2. Nedengdêrên bêhilm (unaspirative/nerm): Bi van dengan ra ba ji dev xurt dernayê. Dengên /p̄/, /ç̄/, /t̄/, /k̄/ bêhilm in.

•Hin nedengdêr ji alîyê di dema derketina wan da lerizandin an nelerizîna²⁴⁴ perdeyên dengî ve dibin du bir:

1. Dengên bilerz: /ç/, /ç̄/, [ç̄], /f/, [f], /k/, /k̄/, /p/, /p̄/, [p̄], /s/, [s], /ş/, [ş], /t/, /t̄/, [t̄], /x/

2. Dengên bêlerz: /b/, [b], /c/, /d/, [d], /g/, /j/, /v/, [v], /x̄/

nedît, cih neda vê termê. Bnr. Mihemed Ebdo Elî, *Ji Bingehên Rêzimana Kurdî (Pirtûka Fêrkinê)*, c.n.d., Efrîn 2006, r. 6.

²⁴³ Taş ji bo tesbîta her du awayên van dengan dibêje ku dengên ku hişk tên xwendin, dengên hilmî (aspirative) ne ango dema mirov wan dixwîne hilm ji devê mirov derdikeve û jê dengê *hyê* tê bihîstin. Yê nerm jî nehilmî (unaspirative) ne û jê dengê *hyê* nayê bihîstin. Bnr. Çetîn Taş, *Waneyên Rêziman û Rastnivîsa Kurmancî*, r. 21.

²⁴⁴ Lertz ji bo perdeyên dengî tê bikaranîn. Perdeyên dengî li serê gewriyê ne û bi livîna xwe alîkarîya çêkirina dengan dikin. Mesela di pêkhatina dengên /b/ û /g/yê da perdeyên dengî dilerizin û ji wan ra “dengên bilerz” tê gotin lê di pêkhatina /p/ û /k/yê da nalerizin û ji wan dengan ra ji “dengên bêlerz” tê gotin. Konsonantên bilerz yê kurmancî *b, d, g, z, j, x, v, c* û varyantên wan in; yê bêlerz *p, t, k, s, ş, x, f, ç* û varyantên wan in. Bnr. Husein Muhammed, “Tesîra Lertzê li ser Guherîna Dengan” *Kanîzar*, h. 11, 2017, r. 125. Malper: <https://zimannas.files.wordpress.com/2017/03/hejmar111.pdf> (Pêgehîn: 05.08.2019).

LI GOR AWAYÊ DERXISTINÊ		LI GOR CIHÊ ÇÊBÛNA WAN (CÎDERK)					
		Lêvkî (dulêvkî)	Diranî	Diranlêvkî	Pêşezman devî	Ezmandevî (demaxkî)	Qirikî (yên gewrîyê)
Domdar (herikî)	Hişk		/s/, [s]	/f/, [f]	/ş/, [ş]		/h/, /ħ/, /x/, /ħ/
	Nerm	/m/, [m], /w/	/z/, [z], /n/, [n]	/v/, [v]	/j/, /r/, /î/, /l/, [l], /y/		
Nedomdar (girtî)	Hişk	/p/, /p̄/, [p̄]	/t/, /t̄/, [t̄]		/ç/, /ç̄/, [ç̄]	/k/, /k̄/	/q/, [ʔ]
	Nerm	/b/, [b]	/d/, [d]		/c/	/g/	/ç/

Tablo 4: Tabloya taybetîyên nedengdêrên devoka Torê

2.2.1. Nedengdêra /b/yê (li gor sîstema IPAyê: [b])

Nedengdêreka lêvîkî²⁴⁵ ye. Di derketina vî dengî da lêvên mirov li hev dikevin. Lewma wekî “cotlêvkî (bilabial)” jî tê binavkirin. Ev nedengdêr ji hêla asta deng ve dengêkî nerm û nedomdar e ango girtîya nerm e. Di dema peydabûna vî dengî da perdeyên dengî dilerizin, ango ev deng dengêkî bilerz e.²⁴⁶ Di devoka Torê da ev deng li serê peyvê û di nava peyvê da tê bikaranîn lê ji ber ku ji nav tekstên me mînakên ku di dawîyê da ev deng hatibû bikaranîn kêr derketin, wekî encam em dibêjin ku di dawîya peyvê da ev deng nayê bikaranîn. Peyvên ku di dawîya wan da ev deng hatibû bikaranîn jî esilerebî bûn (‘elb, meḡreb).

²⁴⁵ Kurdo ev deng wekî “sewta zeliqokî” bi nav kiriye. Bnr. Qenatê Kurdo, *Gramera Zmanê Kurdî*, r. 21.

²⁴⁶ Muhammed, *Dengnasî di Kurdî de*, r. 69.

Di serê peyvê da:

“Me *bacan* didanîn”: Me bacan didanîn. (1/26)

“Sîleḥ *berda* mêt, sofî derket.”: Sîleḥ berda mar, sofî derket. (11/10)

“Wî *bajarî* -ez ê *bêjim*- vî *bajarî* pirsî”: Li wî bajarî -ez dê bibêjim li vî bajarî-pirsî. (11/19)

“Wilo *berf* bû, ha wilo”: Wilo berf bû, ha wilo (13/8)

“Mi *birá* *balê*.”: Min bir balê(bal wî). (14/40)

Di nava peyvê da:

“em î axir *b* bacana ve *lebikî*:n.”: em axir bi bacanan ve dilebikîn. (1/5)

“me heyata xwe wilo *derbas* tîkir”: Me heyata xwe wilo derbas dikir. (3/68)

“Bû *qerebalixa* wê.” : bû qerebalixa wê (5/9)

“hin *bêbextîkê* pkin” : (eger) hin bêbextîyekê bikin (5/24)

“ti wû *jinbira* m” : tu û jinbira min (7/9)

Di dawîya peyvê da:

“*Sed* *elb* genim”: Sed elb genim (1/14)

“we^la bû *mexreb*.”: wele bû mexreb (19/29)

2.2.1.1.Nedengdêra [b]yê

Nedengdêra /b/yê di hin bikaranînan da wekî dengê qelew (emphatic) tê. Dengê alofon e. Li gor mînakên tekstên me em gihastin vê encamê ku ev deng di devoka Torê da bi dengê din ê stûr ra tê ango di nav peyvê da, yan berî vî dengî yan jî piştîyê dengê stûr tê bikaranîn. Her çiqas çend nimûne di metnan da derketibin jî ji ber ku ji bilî yekê (*banî*) ew peyvên hatî, peyvên esilerebî bûn (*bitir*,

sibeh, sibey, teble) em dikarin bibêjin ku di devoka Torê da ev deng heye lê pir nayê bikaranîn. Di serê peyvê û nava peyvê da kê m tê bikaranîn lê di dawîyê da nayê:

Di serê peyvê da:

“û vêca î bitir bû.”: û vêca (yek)î bitir bû. (14/13)

“Em î şyênin he^{tt}a me tanî banî.”: Me dişand, heta ku me dianî banî. (26/22)

“Me dbire va Torê Banî difro:ţ” : Me dibir van Torê Banî difiroţ (2/15)

Di nava peyvê da:

“He^{tt}a sibaha qurmê me nedbûrî.”: Heta sibehan qurmên me nedibihûrîn. (1/26)

“E çûme Serê Teb^{la}.” : Ez çûm Serê Tebleyan. (9/20)

“sibey şeveqê em î rabin” : sibehî şeveqê em radibûn (3/8)

“sibey şiranî yá,” : sibehî şiranî ye, (5/2)

2.2.2.Nedengdêra /c/yê (li gor sîstema IPAYê:[dʒ])

Nedengdêreka pêşdemaxkî ye. Di derketina vî dengî da nava zimên li pêşdemaxan dikeve. Ev nedengdêr ji hêla asta deng ve dengêkî nerm û nedomdar e, ango girtîya nerm e. Ev fonem di devoka Torê da li serê peyvê û di nava peyvê da tê bikaranîn. Di dawîya peyvê da kê m caran tê.

Di serê peyvê da:

“me k^{ay}a xwe bi ceh tîkî:r.”: me kaya xwe bi cî fikir. (1/12)

“Bi cirna me tku^{ta}.”: Bi cirnan me dikuta. (1/28)

“Em sê çar cara çûn.”: Em sê çar caran çûn. (4/1)

“Û çend coht bazin jî gotin.”: Û (wan) çend cot bazin jî gotin. (4/30)

“Ê ciranê m yekî nemirîye.”: Ên cîranên min yekî (jî) nemiriye. (6/11)

Di nava peyvê da:

“Me bacan didanîn,”: Me bacan didanîn, (1/5)

“bi destâ, ^cevciqênin, ^cevciqênin”: bi destan evciqînin, evciqînin (2/11)

“De bere bê vêca.”: De bila be vêca. (4/25)

“zincîra xwá da mi û çû.”: zincîra xwe da min û çû. (9/1)

“m kîriye nav îlacê xwe”: min kîriye nav îlacên xwe (9/29)

Di dawîya peyvê da:

“çar bûn sê bûn, pênc bûn”: çar bûn, sê bûn, pênc bûn (6/17)

“qaza^hkî qenc”: qazaxekî qenc (6/86)

“Kirêc”: kirêc (12/21)

“Û w em î teştîk birinc çêkin.”: Û me teştêk birinc çêdikir. (24/3)

“axleba ferûc bûn.”: axleb ferûc* bûn. (25/1)

2.2.3. Nedengdêra /ç/yê (li gor sîstema IPAyê: [tʃ] / [tʃ] / [tʃ]²⁴⁷)

Nedengdêreka pêşdemaxkî ye. Di dema derketina vî dengî da nava zimên li pêşdemaxê dikeve. Ev nedengdêr ji hêla asta deng ve dengêkî hişk û nedomdar e, ango girtîya hişk e. Dengêkî hilmî (aspirative/pifdar/req) ye. Di devoka Torê da li serê peyvê, li nava peyvê û li dawîya peyvê tê bikaranîn. Minakên li dawîya peyvê pir hindik in. Di metnên me da em li rasta du mînakên tenê hatin ku ev deng li dawîya peyvê hatibe bikaranîn.

Di serê peyvê da:

* Mirîşka nûgihaştî ye.

²⁴⁷ Di berhema Tan û di berhema hevpar ya Tarih Vakfî da ev nîşane wekî “[tʃ]” derbas dibe. Bnr. Samî Tan, *Rêzimana Kurmancî*, r. 34.; Çakar, Işık, Mehmetoğlu û yê din, h.b., r.10.; Lê li gor Muhammed ev nîşane berê bû. Bnr. Muhammed, *Dengnasî di kurdî de*, r. 69.

“Dibû bihar, çêle xilas...”: Dibû bihar, çile xelas...(1/1)

“Em î tovîk çênin di mişara, di meştela de dênin.”: Me dê tovîk çandibûna di mişaran da, di meştelan da me dê danîbûna. (2/1)

“Me çar teneke ddagirtin.”: Me çar teneke dadigirtin. (3/6)

“Û çend coht bazin jî gotin.”: Û çend cot bazin jî gotin. (4/30)

“Tî hatî, ma win á çilo ná, win baş in?”: Tu hatî, ma win çilo ne, win baş in? (5/4)

Di nava peyvê da:

“Bekçiyê îşatê bû.”: Bekçiyê îşeatê bû. (7/1)

“Heyra: hê me^ceşçiyê me tçin û tèn”: Heyra(n) hêj meeççiyên me diçin û tèn. (8/1)

“Û rebê alemê melkemoṭ bi qemeçira yî digirê.”: Û rebê alemê, melkemoṭ bi qemeçira wî digirê. (7/89)

“Ew çû ser bîçera.”: Ew çû ser bîçeran. (18/1)

Di dawîya peyvê da:

“Me rojê di teneke xerç tîkirin.”: M rojê du teneke xerc dikirin. (10/10)

“gerekî tî hîç tî xwelîyê na:vêjê vê çalê.”: gerek tu hîç tu xwelîyê neavêjî vê çalê. (11/39)

2.2.4.Nedengdêra /ç/yê (li gor sîstema IPAyê:[tʃʷ]²⁴⁸)

Nedengdêreka pêşdemaxkî ye. Di derketina vî dengî da nava zimên li pêşdemaxê dikeve. Ev nedengdêr ji hêla asta deng ve dengêkî hişk û nedomdar e,

²⁴⁸ Di berhema Tan û di berhema hevpar ya Tarih Vakfî da ev nişane derbas dibe. Me jî ev nişane ji wan wergirt. Bnr. Samî Tan, *Rêzimana Kurmancî*, r. 34.; Çakar, Işık, Mehmetoğlu û yên din, h.b., r. 10.

ango girtîya hişk e. Dengekî nehilmî (unaspirative) ye. Ji ber ku wateguhêr e Tan jî ev deng wekî fonem daye.²⁴⁹ Amêdî dema ev deng daye jê ra gotiye “Dengekî ziravtir û bêhtir nîzêkî /c/yê ye.”²⁵⁰ Di devoka Torê da di serê peyvê da, di nava peyvê da tê bikaranîn. Li dawîya peyvê mînak kê in. Di temamê metnên me da di dawîya peyvê da em tenê li rastî minakekê hatin.

Di serê peyvê da:

“m î çine nîzêkê Gêrê, çîyayê Gêrê wa dá.”: em diçûn (bi)çiyayê Gêrê wan ve. (1/17)

“Û çav kîl daye”: Û çav (di) kil (da) daye (1/36)

“Di dar á d bin çengê wî de bûn.”: Du dar di bin çengê wî da bûn. (6/21)

“Çêlek gura:nd û û îdî ev wela...”: Çêlek gurand û êdî ev wela... (8/71)

“Û pên çarik bûn”: Û pênc çarik bûn. (8/85)

Di nava peyvê da:

“Wextê me ay lê dkir binê wê ma paçîk dikiryê.”: Wextê me av lê dikir, (li) binê wê, me paçîk dikirê. (3/5)

“Keçka min á piçûk á.”: keçika min piçûk e. (4/3)

“Dîya wê jî aqlê wê piçkî ne yî timam á.”: dêya wê jî aqlê wê piçekî ne temam e. (5/5)

“Z çûm mi derî vekir ga mêrkê koçer karik anîyá.”: Ez çûm min derî vekir gava mêrikê koçer karik anîyê. (7/36)

“Teşta metka min e tişî kefçî w çetel bû.”: Teşta metika min tije kevçî û çetel bû. (9/34)

²⁴⁹ Samî Tan, *Rêzimana Kurmancî*, r. 40.

²⁵⁰ Amêdî, h.b., r. 68.

Di dawîya peyvê da:

“ez pêçavê tá maç kîm.”: ez pêçavê te maç bikim. (19/46)

2.2.4.1. Nedengdêra [ç|yê

Forma qelew (emphatic) ya dengê /ç/yê ye. Dengekî nehilmî û hişk û nedomdar e. Ne fonem e, ji ber ku ne wateguhêr e. Her çiqas di devokê da di peyvên wekî “çîl, çîlek û çal”ê da bên bikaranîn jî divê bê gotin ku di nav metnên me da ji van peyvên tenê “çîl” derbas dibe. Wekî ku tê dîtin ev dengê qelew jî wekî yê din di devoka Torê da bi tena serê xwe di peyvê da nayên, dema tên bikaranîn dengê qelewî din jî teqez di nav peyvê da heye. Ev deng tenê di serê peyvê da tê bikaranîn.

Di serê peyvê da:

“ti xwelîyê na: vêjê vê çalê”: tu xwelîyê naavêjî vê çalê (11/39)

“Dimeyzênê tê gava çal xera bûyá”: Dimeyizîne tê ku çal xerab bûye. (11/44)

“xwelîyê navêje vê çalê”: xwelîyê neavêje vê çalê (11/53)

2.2.5. Nedengdêra /d/yê (li gor sîstema IPAyê: [d])

Nedengdêreka dirankî²⁵¹ ye. Di derketina vî dengî da serê ziman di şikefta dev da li diranên jor dikeve. Ev nedengdêr ji hêla asta deng ve dengê nerm û nedomdar e ango girtîya nerm e. Mahmoud ev deng di nav alofonan da jimartiye.²⁵² Di devoka Torê da di serê peyvê da, li nav û dawîya peyvê tê bikaranîn.

Di serê peyvê da:

“Di be re dîlok digotin û difitilîn dora gênim vá.”: (Wan) di ber ra dîlok digotin û difitilîn (li) dor genim ve. (1/38)

“Didagirtin dîsa.”: Dadigirtin dîsa. (3/27)

²⁵¹ Kurdo ev deng wekî “ji sewtên pêşziman yê zeliqokî” bi nav kiriye. Bnr. Qenatê Kurdo, *Gramera Zmanê Kurdî*, r. 23.

²⁵² Barzo Omar Mahmoud, *Şîrovekirineke Dengsazî û Fonolojî Di Kurdiya Kurmancî de*, r. 98.

“Kêça yê *y* *dî* pê de xeyidî.”: Keça wê ya din pê da xeyidî. (5/11)

“Deh *diwazdeh* mirîşkê mi bûn.”: deh diwazdeh mirîşkên min bûn. (6/4)

“mi bîdon dagî:rt, mi *dî* hina l derîyê *d*erve da.”: min bîdon dagirt, min dît (ku) hinan li derîyê derve da. (7/35)

Di nava peyvê da:

“Go biqede, Xwedê kiribê em *ê* *ş* xwe re xwazin.”: Ku biqede, Xwedê kiribe em dê ji xwe ra bixwazin. (4/10)

“Yadê werá,”: Dayê were. (7/9)

“Rabe m *ê* çine qûndira muxtêr bine jê rá”: Rabe em dê biçin qundereya muxtar bibin jê ra. (8/55)

“Ê e jî *ş* xwe rá e çendekî şixulîbûm.”: Ê ez jî ji xwe ra ez çendekî şixulîbûm. (18/8)

“çakêtê wî ê *bedlê* wî bû ha.”: Çakêtê wî yê bedlê wî bû ha. (19/31)

Di dawîya peyvê da:

“Em naxwazin *ti* me, berê me bidê gwî:*nd*”: Em naxwazin tu berê me bidî gund. (8/39)

“bê xeyd”*d*: bê xeyd (8/15)

“ez î çend *şalî* bûm?”: ez çend salî bûm? (20/1)

“di nav *zêd* de”*d*: Di nav zad de (27/28)

“Go *te* li wa dimeyizand”*d*: ku te li wan dimeyizand (25/4)

2.2.5.1. Nedengdêra [d]yê

Ji dengê /d/yê qelewtir tê bilêvkirin. Dema em li mînanan dinêrin dibînin ku çî cihê ku ev nedengdêr hatiye bikaranîn li nav peyvê dengê din yê stûr jî hatiye bikaranîn. Bi gotineka din ji bo bikaranîna vî dengê di nav peyvê da pêwîstî bi dengê din yê stûr heye. Di mînanan da peyvên “hindîrû, derîw” binê wan nexêzkirî ne lê di wan peyvên da “r”ya lerezokî hatiye bikaranîn ango ne dengê ji rêzê ye û di binyada wê da stûrbûn heye. Ev deng di serê peyvê da kêm çaran tê. Di nava peyvê da dikare bê lê di dawîya peyvê da jî pir kême. Di hemû metnî da tenê di bikaranînekê da li dawîya peyvê derket pêşberê me. Ji ber ku tenê di bilêvkirinê da wekî nuansê ye me ew di nav alofonan da²⁵³ da.

Di serê peyvê da:

“mîlêṭ haṭ û dawetî kirin”: millet hat û dawet kirin(5/41)

“dolmîş tê”: dolmiş tê (7/1)

“na^cle l derîwê.”: lenet li derewê.(7/22)

Di nava peyvê da:

“me ceyê xwe ṭanîne hindîrû.”: me ceyên xwe dianîn hundir.(1/13)

“diwazdeh mirîşk û dîkîk.”: diwazdeh mirîşk û dîkîkek.(6/8)

“dêh pazde deqa.”: deh pazdeh deqîqeyan (7/52)

“wê winda bin.”: ew dê winda bibin (9/6)

“hevalê min î yazdeh danîne ber xwendinê.”: (ji) hevalên min yazdeh(an) danîn ber xwendinê. (14/3)

Di dawîya peyvê da:

²⁵³ Li gor jî Mahmoud jî ev deng, alofon e. Bnr. Mahmoud, *Şîrovekirineke Dengsazî û Fonolojî Di Kurdiya Kurmancî de*, r. 99.

“Sed^c elb genim”: Sed elb genim (1/14)

2.2.6. Nedengdêra /f/yê (li gor sîstema IPAyê:[f])

Nedengdêreka lêvikî ye. Di dema derketina vî dengî da lêva xwarê li diranê jor dikeve. Lewma mirov dikare wî wekî “diranlêvkî (labiodental)”²⁵⁴ jî bi nav bike. Ev nedengdêr ji hêla asta deng ve dengêkî hişk û domdar e ango fîzeka hişk e. Li devoka Torê di serê peyvê, nîvê peyvê û dawîya peyvê da tê bikaranîn.

Di serê peyvê da:

“Em î p̄ fecrê rabin”: Em bi fecrê (ra) radibûn. (1/21)

“Em î kera ênin û firaxê xwe lêkin”: Me ker dianîn û firaxên xwe lêdikirin. (3/9)

“Nîro me firavîna xwe txwar.”: Nivro me firavîna xwe dixwar. (3/31)

“Tirkân á feqîr á.”: Tirkan (yeka) feqîr e. (4/8)

“fetha xwe xwendin û m hatîna malê.”: fatîheya xwe xwendin û em hatin malê. (4/35)

Di nîvê peyvê da:

“Xel siqêfa dîkine bavê wê jî dey nakê.”: Xelk sixêfan dikin bavê wê (jî) deng nake. (4/8)

“Hema te telefûn kir em á hazir in.”: Hema (ku) te telefon kir em hazir in. (7/15)

“Û çarşefdoşek pê dakirna”: Û çarşefdoşek (çarşef) pê dakirine (7/82)

“Heft roja heşt roja em tiçûne rezekî.”: Heft rojan heşt rojan em diçûn rezekî. (3/45)

²⁵⁴ Kurdo jî ev deng û /v/ wekî “sewtên qeliştokî yên li nav lêvan-didanan” terif kirine. Bnr. Kurdo, *Gramera Zmanê Kurdî*, r. 17.

Di dawîya peyvê da:

“Má aşêf tîkir.”: Me aşêf dikir. (1/1)

“Hebû, á zahf bû.”: Hebû, zahf bû. (5/21)

“Vêca berf jî ha halo misîwa yá.”: Vêca berf jî halo misawî ye. (13/3)

“Elîf bê tê sê tê de danîn.”: Elîf bê tê sê tê da danîn. (14/42)

“Ew jî tîxwazê go telef bibê”: Ew jî dixwaze ku telef bibe. (31/1)

2.2.6.1.Nedengdêra [f]yê

Qelewbilêvkirina dengê /f/yê ye ango ev deng emphatic e. Di serê peyvê da û di nivê peyvê da tê bikaranîn. Lê me ev deng di nav metnên xwe da li dawîya peyvê tesbît nekir.

Di serê peyvê da:

“hetta tîfirûnê nekirê tî wê nabê.”: heta tu firûnê nekirî tu wê nabî. (8/28)

“Vêca ev hogic fîrotin.”: Vêca ev hogiç firotin. (19/19)

“Melçiyê Îshaqo fileh bû.”: Melçiyê Îshaqo fileh bû. (19/20)

“Vê fitnê neká.”: Vê fitneyê neke. (5/35)

Di nivê peyvê da:

“Wilo me dgo sefik.”: Wilo me digot “sefik”.(14/25)

“Vêca rabû hê bi ro perê xwá serifandin.”: Vêca rabû hêj bi roj pereyên xwe serifandin. (19/23)

“serafçî nemabûn û êvar bû.”: Serafçî nemabûn û êvar bû. (19/24)

“me zadê xwe safî kiriyá.”: me zadê xwe safî kiriye. (22/4)

“Me dbire va Torê Banî difro:ţ”: Me dibir van Torê Banî, difirot. (2/15)

2.2.7. Nedengdêra /g/yê (li gor sîstema IPAyê:[g])

Nedengdêreka demaxkî²⁵⁵ ye. Di dema derketina wê ya ji dev da dawîya ziman li paşdemaxê dikeve û pêşîya wê tê girtin. Ev nedengdêr ji hêla asta deng ve dengêkî nerm û nedomdar e ango girtîya hişk e. Ev deng li devoka Torê di serê peyvê da û li nav û dawîya peyvê tê bikaranîn lê ji temamê metnên me di çar peyvan da li dawîya peyvê hat (dereng, teng, bêjing, tiving). Tê dîtîn ku di her çar peyvan da jî ev deng berî xwe dengê /n/yê girtiye ku balkêş e.

Di serê peyvê da:

“Em î çin genimê xwá aşêf kîn.”: Em diçûn me genimê xwe aşêf dikir. (1/3)

“Ew aya girîk derket”: Ew ava girik derket (3/5)

“Gelek á.”: Gelek e. (4/31)

“Goşt û nanê sêlê jê re anîn”: Goşt û nanê sêlê jê re anîn. (7/19)

“vêca bûka me girî girî w ewk bû.”: Vêca bûka me girî girî û ewk bû. (7/80)

Di nava peyvê da:

“û me agir tîkir.”: û me agir dikir. (1/20)

“Ne wextê hingî yá.”: Ne wextê hingî ye. (5/40)

“Rîngêna dêrî zavayê m jî rabû hat.”: (li) Rîngînîya derî zavayê min jî rabû hat. (7/36)

“me jê re digot Mêrgîka.”: me jê ra digot Mêrgîka. (10/41)

Di dawîya peyvê da:

²⁵⁵ Kurdo ev deng wekî “ji sewtên paşziman yên zeliqokî” bi nav kiriye. Bnr. Kurdo, *Gramera Zmanê Kurdî*, r. 24.

“bû dereng li má.”: bû dereng li me. (8/66)

“Bêhna yî teng bû.”: Bêhna wî teng bû. (11/6)

“bêjing hebûn lo!”: bêjing hebûn lo! (12/61)

“Û tiving jî bi wa rá hebûn.”: Û tiving jî bi wan ra hebûn. (18/11)

2.2.8. Nedengdêra /h/yê (li gor sîstema IPAyê:[h])

Nedengdêreka qiriki²⁵⁶ ye. Dema hewa ji kûrayîya qirikê tê, li kenarên qirikê nakeve û derbas dibe û ev deng derdikeve. Ev nedengdêr ji hêla asta deng ve dengêkî hişk û domdar e. Di heman demê da nîvdengdêr²⁵⁷ jî tê hesibandin. Ji ber ku nîvdengdêr e dema piştî dengdêrekê tê, wê kurt dike da ku bilêvkirina peyvê hêsantir bibe.²⁵⁸

“tîrehê go quraftin, em î ên”: tirîyê ku quraftin me dianîn. (12/48) tirî>tîreh

Di devoka Torê da li serê peyvê, nav û dawîya peyvê tê bikaranîn.

Di serê peyvê da:

“Em î şivîsta xwá diná hev”: Me dê şivîsta xwe dabûna hev. (1/2)

“Hina tîkîre xetîk û hina ddanî w hina ew dikir”: Hinan dikir xetik û hinan didanî û hinan ewk dikir (1/7)

“Her sêk jî”: Her sê jî (8/16)

“sê kûrê zilamekî hebûn.”: sê kurên zilamekî hebûn. (11/2)

“Hêdîka pîrikê çi kir?”: Hêdîka pîrikê çi kir? (29/5)

Di nava peyvê da:

“Em ê çin nahê xwá aşêf kîn”: Em diçûn me nokên xwe aşêf dikir. (1/4)

²⁵⁶ Zal ev deng wekî “arîkî” bi nav kiriye. Bnr. Zal, h.b., r. 82 .

²⁵⁷ Bnr. Samî Tan, *Rêzimana Kurmancî*, r. 44.

²⁵⁸ Taş, *Waneyên Rêziman û Rastnivîsa Kurmancî*, r. 22.

“*K*ahrikê wî gurandî:n û , û ‘eyar kirî:n”: Karikên wî gurandin û eyar kirin. (7/40)

“Û vêca êdî *sibehî* em î rabin li kerê kin.”: Û vêca êdî sibehî em dirabûn me li kerê dikir. (12/29)

“Wela *rahişte* qumaşê yî dayê dá.”: Wela rahişt qumaşê wî dayê. (18/35)

Di dawîya peyvê da:

“*Sed* ‘elb genim” *tiresh* şanî.”: Sed elb genim tirî dianî. (1/14)

“Deh diwaz*deh* mirîşkê mi bûn.”: Deh diwazdeh mirîşkên min bûn. (6/4)

“Axir me bice*h* kir”: Axir me bi cî kir. (7/97)

“Heke sê çar *meh* heke çar pênc *meh*”: Heke sê çar meh heke çar pênc meh (11/5)

“*Firoşin*, dane yekî *fileh*”: Firoşin dan yekî fileh (19/19)

2.2.9. Nedengdêra /h/yê (li gor sîstema IPAyê: [h])

Dengê /ç/ya erebî dide. Stûr e û ji qirikê derdikeve. Dengê nerm û domdar e ango fizeka nerm e. Amêdî ev deng wekî “dengdareka²⁵⁹ kêmdeng” bi nav kiriye. C. Bedirxan di hejmara yekem ya Hawarê da ji bo vî dengî sê xal daniye ser grafîma (grapheme) “h”yê lê di alfabeyê da cî nedayê.²⁶⁰ Ev deng di devoka Torê da li serê peyvê, li nava peyvê û dawîya peyvê tê bikaranîn lê mînakên ku di dawî da tê kêmin. Ên ku di metnên me da derbas dibûn û di dawîya peyvê da ev deng di hewandin esilerebî bûn û hejmara wan kêmin bû (*reh*, *sîleh*, *fettah*). Jixwe ev deng bi peyvên erebî ra ketiye zimanê kurdî²⁶¹ û herwiha ketiye devoka Torê jî. Digel vê agahiyê çend peyvên ku ne erebî ne û vî dengî di nav xwe da dihevînin jî di devoka Torê da

²⁵⁹ Ev senifandin ji Dr. Ebdurrehman Hacî Merûf neqil kiriye û ji bo “nedengdêr”ê peyvya “dengdar” bi kar aniye. Bnr. Amêdî, h.b., r. 56.

²⁶⁰ Celadet Alî Bedirxan, *Hawar*. (amd. Lokman Koçan), Belkî, Stenbol 2012, r.12.

²⁶¹ Di gelek berhemana da ev agahî heye. Çend ji wan berhemana ev in: Bnr. Zal, h.b., r. 99.; Muhammed, *Dengnasî di kurdî de*, r. 69.; Barzo Omar Mahmoud, *Şirokekirineke Dengsazî û Fonolojî Di Kurdiya Kurmancî de*, r. 51.

hene. Bo numûne: "heft, hivdeh hefte". Ji ber ku mesela di bikaranînên "bêreh û bêreh" da wateguhêrî heye dê di vê xebatê da ev deng wekî fonem bê dayîn.

"Zahf ʔa^cde ddane mi": Zahf tade didan min. (15/1)

"Heft roja heşt roja em ʔiçûne rezekî.": Heft rojan heşt rojan em diçûn rezekî. (3/45)

"heftîkê hişk dibûn.": Heftîyekê hişk dibûn. (12/52)

"hivdeh roja me paleyîya wa kir.": Hivdeh rojan me paleyîya wan kir. (27/26)

Di serê peyvê da:

"Me hejîr ʔiçinîn, me hejîr hişk ʔikirin.": Me hejîr diçinîn, me hejîr hişk dikirin. (1/46)

"Ê go dxwest helîl çêtkir": Yê ku dixwest helîl çêdikir. (3/53)

"Û hemî kesî digot": Û hemû kesî digot (4/8)

"Bûka mi jî mêhkê nedîtibû, a l halkî bû.": Bûka min jî mehekê nedîtibû, li halekî bû. (7/33)

"Heyra: hê me^ceşçiyê me ʔiçin û tèn": Heyra(n) hêj meezçiyên me diçin û tèn. (8/1)

Di nava peyvê da:

"Cohtîk di coht me pîvaz didanîn.": Cotek du cot me pîvaz didanîn. (1/6)

"Mehserê de di^cesirandin.": (Di) mehserê da (me) diesirandin. (2/12)

"ez wa jî l tihêla wa deynim?": ez wan jî li tihêla wan deynim. (4/33)

"Hebû, á zahf bû.": Hebû, zahf bû. (5/21)

“Mal á maleka pahtî yá.”: Mal, maleka pahtî* ye. (9/32)

Di dawîya peyvê da:

“Sê siheṭa, çar siheṭa bêreḥ dimam”:

“Sîleḥ berda mêr, sofî derket.”: Sîleḥ berda mar, sofî derket.(11/9)

“Ya eḷḷah, ya fetṭaḥ”:

2.2.10.Nedengdêra /j/yê (li gor sîstema IPAyê:[3])

Nedengdêreka pêşdemaxkî ye. Di derketina vî dengî da ser pişta zimên nêzî pêşdemaxan dibe. Ev nedengdêr ji hêla asta deng ve dengêkî nerm û domdar e ango fîzeka nerm e. Ev deng di devoka Torê da li serê peyvê, di nava peyvê û dawîya peyvê da tê bikaranîn lê mînakên ku di nav û dawîyê da tê kêr in. Di hemû metnên berhevkirî da tenê pêncepênc peyv derketin.

Di serê peyvê da:

“em î çin bacana jêkî”:

“Telefûnî, Rayîfê, jinbira xwe kir.”: Telefonî Rayifeyê, jinbira xwe, kir. (7/57)

“Kêçê jinamê bêjinê”:

“Tî yî jêhatî yá.”: Tu jêhatî yî. (14/40)

Di nava peyvê da:

“Me rêşîyê xwe dnîjinandin.”: Me rêşîyê xwe dinîjinandin. (1/24)

“Avîyê xwá me tajotîn.”: Avîyên xwe me diajotin. (2/5)

“Nîkarîbû qevzê bavêjê.”: Nikarîbû qevzekê biavêje. (6/21)

“Bêjin da em bikin”:

* Peyva “pahtî” bi wateya “temambûyî, bêkêmayî”yê hatiye bikaranîn.

“Go bēn em ê hevdu kujin.”: Ku bēn em dê hevudu kujin. (8/72)

Di dawîya peyvê da:

“Di roj sê roja lê dan.”: Du roj sê rojan (wan) lê da. (5/42)

“Anî ser cihê yî dirêj kir.”: Anî (li) ser cihê wî dirêj kir. (7/93)

“Heta bin mēnderka paqij kim”: Heta bin minderkan paqij bikim. (9/9)

“Ew mewîj, tiştûmiştê yê me txwar.”: Ew mewîj, tiştûmiştên wê me dixwar. (10/19)

“Hema go limêj bikin”: Hema ku nimêj bikin (21/43)

2.2.11. Nedengdêra /k/yê (li gor sîstema IPAyê:[k])²⁶²

Nedengdêreka demaxî²⁶³ ye. Di dema derketina wê ya ji dev da, dawîya ziman li paşdemaxê dikeve û pêşîya wî tê girtin. Ev nedengdêr ji hêla asta deng ve dengê hîşk û nedomdar²⁶⁴ e ango girtîya hîşk e. Dengê hilmî (aspirative) ye. Ev deng di devoka Torê da li serê peyvê û di nava peyvê da tê bikaranîn. Mînakên di nava peyvê da ji tekstên me kêr derketin. Mînakên ku di dawîya peyvê da bê bikaranîn ji nav metnên me yê berhevkirî derneketin.

Di serê peyvê da:

“Em î pey dá m î kesaxê kin.”: Me (di) pey da kesax dikir. (1/2)

“Me anî, me xwelîya xwe w kilsa xwe şanî.”: Me anî, me xwelîya xwe û kilsa xwe dianî. (3/2)

“Me rabû kara xwe kî:r”: Me rabû kara xwe kir. (4/25)

²⁶² Di berhema Tan û di berhema hevpar ya Tarih Vakfî da ev nişane wekî “[k^h]” derbas dibe. Bnr. Samî Tan, *Rêzimana Kurmancî*, r. 34.; Çakar, Işık, Mehmetoğlu û yê din, h.b., r. 10.; Nişaneyê ku li vir hat bikaranîn li gor Muhammed e. bnr. Muhammed, *Dengnasi di kurdî de*, r. 133.

²⁶³ Kurdo ev deng wekî “ji sewtên paşziman yê zeliqokî” bi nav kiriye. Bnr. Kurdo, *Gramera Zmanê Kurdî*, r.24.

²⁶⁴ Ji bo domdarî û nedomdarîya nedengdêran “domdar û girtî” jî tê gotin. Bnr. Zal, h.b., r. 71.

“**K**opalê xwe, dar avêtin.”: (wî) Kopalê xwe, dar avêtin. (6/20)

“P Xwedê ha **k**ufletê mi jî j wê derê bû”: Bi xwedê ha kufletê min jî ji wê derê bû. (20/10)

Di nava peyvê da:

“Ew aya girîk der**k**et”: Ew ava girik derket. (3/5)

“Wê jî mel**k**esîk da odê,”: Wê jî melkesek da odayê, (9/6)

“We**k**e dêl**k**ewkî jî t**k**irne nav paqê wî dá,”: Weke dêlkewekî jî dikirin nav paqê wî. (23/2)

“me bîber t**k**esirandî:n”: Me bîber dikesirandin. (1/55)

2.2.12. Nedengdêra /k/yê (li gor sîstema IPAyê:[kʰ])²⁶⁵

Dengekî nehilmî (unaspirative) ye. Kurdo ev deng wekî “ji sewtên paşziman yên zeliqokî” bi nav kiriye.²⁶⁶ Fonemeka Torê ye. Ji ber ku wateguhêr e Tan jî ev deng wekî fonem daye.²⁶⁷ Di devoka Torê da ev deng li serê peyvê, li nav û dawîya peyvê tê bikaranîn.

Di serê peyvê da:

“Me ya vexwarinê j **k**anîyê tani.”: Me ya vexwarinê ji kanîyê dianî. (3/42)

“Go ne b dilê hev bin ji me re jî p **k**êr nayê.”: Go ne bi dilê hev bin ji me ra jî bi kêr nayê. (4/20)

“**K**uro ma pişta dêrî heye?”: Kuro, ma pişta derî heye? (5/32)

“**K**êçê negrî **k**êçîk!”: Keçê negirî, keçik! (7/81)

²⁶⁵ Ev nîşane ji berhema Tan û berhema hevpar ya Tarih Vakfi hat wergirtin. Bnr. Samî Tan, *Rêzimana Kurmancî*, r. 34.; Çakar, Işık, Mehmetoğlu û yên din, h.b., r.10.

²⁶⁶ Kurdo, *Gramera Zmanê Kurdî*, r. 24.

²⁶⁷ Samî Tan, *Rêzimana Kurmancî*, r. 40; Mahmoud jî ji ber heman sedemê ev deng wekî fonem daye. Bnr. Mahmoud, *Şîrovekirineke Dengsazî û Fonolojî Di Kurdiya Kurmancî de*, r. 95, 113.

“Teşta meţka min e tişî keŕçî w çeţel bû.”: Teşta metika min tişî keŕçî û çeţel bû. (9/34)

Di nava peyvê da:

“Em î bacanê xwe jêkîn, şon.”: Me bacanên xwe jêdikirin, dişuştin. (2/8)

“Em î miştaxê xwe çêkîn.”: Me miştaxeyên xwe çêdikirin. (3/10)

“Û ê kerkûş başqe yá”: Û yê kerkûş başqe ye (12/7)

“Miħemed Yeman û Peliĵman.”: Miħemed Yeman û Pelikman (29/36)

“Jin, mêr, kes tişkî anî ewkî nebû.”: Jin, mêr, kese tişteki yanê ewki tunebû. (10/45)

Di dawîya peyvê da:

“pişî wê aya giriĵ aya zelal dihat.”: pişî wê ava girik ava zelal dihat. (3/6)

“Me dgo şibrîĵ,”: Me digot “şibrîĵ” (3/21)

“Yeĵ ê sisîya nadê.”: yek ê sisêyan nade. (4/3)

“Edûla belkî perê wa á hindiĵ bûn!”: Edûla belki pereyê wan hindik bûn. (5/15)

“Ka xelîĵ?”: Ka xelîtik? (9/18)

2.2.13. Nedengdêra /l/yê (li gor sîstema IPAyê: [l])

Nedengdêreka pêşezimandevkî (palatal) ye. Di derketina vî dengî da serê zimên (apex) di şikefta dev da li diranên jor dikeve ango dengêki serzimanî (apical)²⁶⁸ e. Ev nedengdêr ji hêla asta deng ve dengêki nerm û domdar e. Li devoka Torê ev deng di serê peyvê da, di nava peyvê da û li dawîya peyvê tê bikaranîn.

Di serê peyvê da:

²⁶⁸ Karaağaç, h.b., r. 152.

“Go aşêf xilas dibû em î axir b bacana ve *lebikî:n*.”: Ku aşêf xelas dibû em dê axir bi bacanan ve lebi**kî**bûna. (1/5)

“Me *lîsê* xwe *ţani*.”: Me lîsên xwe dianî. (3/3)

“*Lingê* *zlamê* mi *şkest*.”: Lingê zilamê min şikest.(6/1)

“*Îşê* gunda, *lîmêjê* dirabûn *ţîçûne* rîsîya, *fecrê*.”: Îşê gundan, nimêjê radibûn diçûn rêsîyan, (bi) fecrê (ra). (10/20)

Di nava peyvê da:

“Me *pale* dxwestin.”: Me pale dixwestin. (1/6)

“me *xwelîya* xwe *w kîlsa* xwe *ţani*.”: me xwelîya xwe û kîlsa xwe dianî. (3/4)

“Ê go tema *mixaletî*.”: Ê got: Temam mixaletî. (4/23)

“Mêvanê *m çilo* dihatin?”: Mêvanên min çilo dihatin? (6/14)

“*Sîleh* berda mêt, *sofî* derket.”: Sîleh berda mar, sofî derket. (11/9)

Di dawîya peyvê da:

“*werhasil* *îşê* gunda ve em *uxraşmîş* dibûn.”: welhasil (bi) îşê gundan ve em uxraşmîş dibûn. (1/8)

“*wekî* dî dibû ya *zela*”: Wekî din dibû ya zelal (3/26)

“*Tekel* hatîna ser serê mi.”: Tekel hatine ser serê min. (7/5)

“*Zembîl* hebûn, *şelik* ha wilo sepet.”: Zembîl hebûn, selik, ha wilo, sepet. (12/35)

“*Nîro* m ji *mal* derketin.”: Nîvro em ji mal derketin. (7/10)

2.2.13.1.Nedengdêra [l]yê:

Di gelek devokan de ev nedengdêr heye. Ev deng di warê zimannasîyê da wekî “l’ya bişid”²⁶⁹ tê binavkirin. Nedengdêreka paşesmankî (velar lateral) ye. Muhammed ev deng wekî “l’ya qelew (emphatic)”²⁷⁰ daye. Ne wateguhêr e, lewma wekî rengedeng²⁷¹ (allophone) hatiye dayîn.

Di bilêvkirina vî dengî da serê ziman li diranê jor dikeve û binê serê ziman bi alîyê paş ve vedikişê û valahîyeka mezin di nav dev da peyda dike. Hewaya ku ji pişikê tê li avurtan dikeve û ev dengê qelew pêk tê.²⁷² Di nav metnan da dema li mînanan bê nêrtin dê bê dîtin ku di çî mînaka ku [l] hatiye bikaranîn da teqez dengê din yê stûr jî hatiye bikaranîn. Yanê stûrbûna van dengan bi hev ve girêdayî ye. Alofona [l] yê di devoka Torê da li serê peyvê, li nava peyvê û dawîya peyvê tê bikaranîn.

Di serê peyvê da:

“Jinama má”: Jinapa me (8/64)

“Rîzde bû wilo, lat bû. : Rizde bû wilo, lat bû.”: (13/6)

Di nava peyvê da:

“Zembîl hebûn, selik ha wilo sepet.”: Zembîl hebûn, selik, ha wilo, sepet. (12/35)

“Vêca gund î xilbe bû, misilman bûn.”: Vêca gund xilbe bû, misilman bûn. (26/10)

“hefê welatê xwá. : here welatê xwe.”: (30/22)

²⁶⁹ Meqaleya ku derheqê devoka kurdên Xoresanê da hatiye nivîsîn, yek ji wan meqaleyên zimannasîyê ye. Bnr. Abdullah Hajiyan û Umîd Demîrhan. “Taybetiyên Kurmanciya Xoresanê”, *Zend*, h. 20, İstanbul 2013, r. 68.

²⁷⁰ Muhammed, *Dengnasî di kurdî de*, r. 25.

²⁷¹ Tan û Mahmoud jî ev deng wekî alofon daye. Bnr. Samî Tan, *Rêzimana Kurmancî*, r. 42.; Mahmoud ji bo sedema alofonbûna vî dengî dibêje ku ji ber ku ev stûrbûn nakeve ber pêkhatina fonemêkî nû, tim dengê alofon e. Bnr. Mahmoud, *Şirovekirineke Dengsazî û Fonolojî Di Kurdiya Kurmancî de*, r. 93.

²⁷² Karaağaç, h.b., r. 152.

“zele^{te} me çêdikir. : Zelate me çêdikir.”: (3/32)

“Û ez î wilo betilî, reben...: Û ez (yekî) wilo betilî, reben...”: (27/39)

Di dawîya peyvê da:

“Îsal me bazar nekiriya.”: Îsal me bazar nekiriye. (1/53)

“Teşta me^tka min e tişî ke^fçî w çetel bû.”: Teşta metika min tije kevçî û çetel bû. (9/34)

“He^ka di sal, he^ka sê sal, he^ka çar sal.”: Heke du sal, heke sê sal, heke çar sal. (11/40)

2.2.14. Nedengdêra /m/yê (li gor sîstema IPAyê:[m])

Nedengdêreka²⁷³ lêvikî ye. Di derketina vî dengî da lêvên mirov li hev dikevin. Lewma di heman demê da cotlêvkî (bilabial) ye. Ev nedengdêr ji hêla asta deng ve dengêkî nerm û domdar û difinî ye. Di devoka Torê da di serê peyvê da, li nav û dawîya peyvê tê bikaranîn.

Di serê peyvê da:

“Mxaletî ez î pê re me.”: Mixaletî, ez pê ra me. (5/25)

“Me ew anî mehke yê qeda û qe^za kir.”: Me ew anî, meheka wê qediya û qeza kir. (6/1)

“meyizênin û haya wî j pişt nîne.”: (di)meyizînin û haya wî ji pişt nîne. (7/2)

“ewka muxtêr jî qûndira yî werênin!”: ewka muxtar jî bînin! (8/10)

“maleka pahtî yá.”: maleka pahtî ye. (9/31)

Di nava peyvê da:

²⁷³ Kurdo ev deng wekî “sewta zeliqokî” bi nav kiriye. Bnr. Kurdo, *Gramera Zmanê Kurdî*, r. 21.

“Û *hemî* kesî digot û *emela* digot.”: Û hemû kesan digot û emeleyan digot. (4/8)

“*Pey* ra ş xwe *dims* jî çêtkirin.”: Pey ra jixwe dims jî çêdikirin. (10/19)

“Qey dêmekî ew xwelî bûye *derman* ji wî ewkî ra.”: Qey demekî ew xwelî bûye derman ji wî ewkî ra. (11/42)

“*Camêr* rabû niviştîk çêki:r.”: Camêr nivişteke çêkir. (15/10)

“*Pismamê* hev bê ka çiyî hev...”: Pismamê hev bê ka çiyê hev... (19/12)

Di dawîya peyvê da:

“Me *genim* dişişt.”: Me genim dişûst. (1/5)

“*Zilam* jî hená.”: Zilam jî hene. (14/25)

“*Hesabê* xwá *timam* kirin.”: Hesabê xwe tamam kirin. (19/35)

“*Tavêjê* çem.”: Diavêje çem. (29/11)

“Me *qurm* tavêtine ser.”: Me qurm diavêtin ser. (1/20)

2.2.14.1. Nedengdêra [m]yê

Taybetîyên vî dengî wekî dengê /m/yê ne. Dengê qelew (emphatic) e. Di bikaranînê da di nav peyvê da bi dengê din yê qelew ra tê. Wekî ku me di nav metnên xwe da dît di serê peyvê da û di nava peyvê da tê bikaranîn.

“Teştê xwá: *mezî*n ê.”: (2/9)

“Ew *zemanê* go te xwestin”: Ew zemanê te xwestin (5/8)

2.2.15. Nedengdêra /n/yê (li gor sîstema IPAyê:[n])

Nedengdêreka dirankî²⁷⁴ ye. Di derketina vî dengî da serê zimên di şikefta dev da li pidûya jor ya diranan dikeve. Jixwe ji ber wê ye ku wekî paşpidûyî²⁷⁵ jî tê binavkirin. Ev nedengdêr ji hêla asta deng ve dengê nerm û domdar e. Pêşderkî û difinî ye. Di devoka Torê da di serê peyvê da, di nava peyvê da û di dawîya peyvê da tê.

Di serê peyvê da:

“Em î çin nîskê xwe aşêf kîn.”: Em dê çûbûna me dê nîskên xwe aşêf kiribûna. (1/3)

“Nîro me firavîna xwe txwar.”: Nîvro me firavîna xwe dixwar. (3/31)

“mi arî wê hirîya yê neqand”: min arî wê hirîya wê neqand (8/10)

“şeveqa ş xwe tçê nêçîrê”: şeveqan jixwe diçe nêçîrê (11/43)

“û m î çin nav rêz.”: û em diçûn nav rez. (3/9)

Di nava peyvê da:

“Go me genimê xwe dhiland”: Ku me genimê xwe dihiland (1/15)

“Kîne tenekeyê, deynine se:r.”: (em dê bi)kin tenekeyê û daynin ser. (3/10)

“Sibey şîranî yá,”: Sibey şîranî ye (5/2)

“Berê go qijîka mizgînîk digihande me.”: Berê ku qijikan mizgînîyek digihand me. (7/39)

“Xezûrê yê çûbû gund.”: Xezûrê wê çûbû gund. (8/6)

Di dawîya peyvê da:

²⁷⁴ Kurdo ev deng wekî “ji sewtên pêşziman yên zeliqokî” bi nav kiriye. Bnr. Kurdo, *Gramera Zmanê Kurdî*, r. 23.

²⁷⁵ Bnr. Yule, h.b., r. 72.

“Me bacan didanîn,”: Me bacan didanîn, (1/5)

“û em î naylor kîn.”: û me naylor dikir. (2/2)

“M ê evarî îdî şîva xwe xwin û razin.”: Me evarî êdî şîva xwe dixwar û (em) dirazan. (3/17)

“Û çend coht bazin jî gotin.”: Û çend cot bazin jî gotin. (4/31)

“Di dar á d bin çengê wî de bûn.”: Du dar di bin çengê wî da bûn. (6/21)

2.2.15.1. Nedengdêra [n]yê (li gor sîstema IPAyê:[ŋ])

Nedengdêreka dirankî ye. Di derketina vî dengî da serê zimên di şikefta dev da li pidû û banê dev dikeve.²⁷⁶ Ev nedengdêr ji hêla asta deng ve dengê nerm û domdar e. Yule ji bo dengê /n/yê gotiye paşpidûyî-bêvilî, ji bo vî dengî jî pidûyî-bêvilî.²⁷⁷ Pêşderkî û difinî ye. Mahmûd vî dengî wekî “girr, zarekî, bêvilok û zirîngok”²⁷⁸ bilêv dike. Di devoka Torê da ev deng dema tê bikaranîn bi dengê din ê qelew ra tê. Di devoka Torê da di serê peyvê da, di nava peyvê û dawîya peyvê da tê bikaranîn.

Di serê peyvê da:

“Nîfirê dinyakê l me kirinâ.”: Nîfirên dinyayekê li me kirine. (8/67)

“Sed kîlo, not kîlo yanî hebû pi xwâ”: Sed kîlo, not kîlo yanî hebû bi xwe. (22/17)

Di nava peyvê da:

“Û ma lum á ce pêşî l hindurû ddanîn.”: Û malûm e ce pêşî li hundir didanîn. (1/29)

²⁷⁶ Jixwe ji ber vê yekê ye ku Muhammed ev dengî wekî “bêvilî-bandevî” bi nav kiriye. Bnr. Husein Muhammed, “Dengê n Peydabûn û Guherîna Wî” *Kanîzar*, h. 15, 2017, r. 85. Malper: <https://zimannas.wordpress.com/2017/12/07/kanizar-hejmar-15/> (Pêgehîn: 05.08.2019).

²⁷⁷ Yule, h.b., r. 72.

²⁷⁸ Mahmoud, *Şîrovekirineke Dengsazî û Fonolojî Di Kurdiya Kurmancî de*, r. 40.

“Me dbire va Torê Banî difro:ṭ”: Me dibir van Torê banî difiroṭ (2/15)

“hingî ê miḥala banî qompîle haṭibûn”: hingî ên meheleya banî qompîle hatibûn (6/22)

“wilo ruwê yî tenî ṭkirin.”: wilo rûyê wî tenî dikirin. (23-1)

Di dawîya peyvê da:

“Teştê xwâ: mezin ênin.”: Me teştên xwe yên mezin dianîn. (2/9)

“Werḥasil me firûn nekirî.”: welhasil me firûn nekirî. (8/37)

2.2.16. Nedengdêra /p/yê (li gor sîstema IPAyê:[b]²⁷⁹)

Nedengdêreka lêvîkî²⁸⁰ ye. Di derketina vî dengî da lêvên mirov li hev dikevin. Lewma mirov dikare vî dengî wekî “cotlêvî (bilabial)” jî bi nav bike. Ev nedengdêr jî hêla asta deng ve dengêkî hişk û nedomdar e, ango girtîya hişk e. Dengêkî hilmî (aspirative) ye. Di devoka Torê da di serê peyvê da û nava peyvê da tê bikaranîn. Lê di dawîya peyvê da em rastî vî dengî nehatin. Mînakên ku di nava peyvê da vî dengî dihewînin kêmin.

Di serê peyvê da:

“Me pale dxwestin.”: Me pale dixwestin. (1/6)

“ma paçîk dikiryê de, me dderanî.”: M paçîk dikirê, me dideranî. (3/6)

“Em î wê ayê parzinî:n.”: Me ew av diparzinand. (3/64)

“Piştî Xwedê w qeweta ma”: Piştî Xwedê û qeweta me. (6/3)

“Hema jê peritîm.”: Hema jê peritîm. (7/46)

²⁷⁹ Di berhema Tan û di berhema hevpar ya Tarih Vakfî da ev nişane wekî “[p^h]” derbas dibe. Bnr. Samî Tan, *Rêzimana Kurmancî*, r. 34.; Çakar, Işık, Mehmetoğlu û yên din, h.b., r.10.; Nişaneya ku di metin da hatiye bikaranîn li gor Muhammed e. Bnr. Muhammed, *Dengnasî di kurdi de*, r. 155.

²⁸⁰ Kurdo ev deng wekî “sewta zeliqokî” bi nav kiriye. Bnr. Qenatê Kurdo, *Gramera Zmanê Kurdî*, r. 21.

Di nava peyvê da:

“Apo...”: Apo... (11/13)

“weke sapakî lo!”: Weka sêpêyekê lo! (12/16)

“Ê kurapê me w wa bûn.”: Ê kurapê me û wan bûn. (14/4)

2.2.17. Nedengdêra /p/yê (li gor sîstema IPAYê: [pʰ]²⁸¹)

Dengekî lêvkî²⁸² ye. Ji ber ku di dema derketina ji dev da lêv tîn girtin, em dikarin vî dengî wekî cotlêvkî jî bi nav bikin. Fonemeka nehilmî (unaspirative) û girtîya hişk e. Ji ber ku wateguhêr e Tan û Muhammed ev deng wekî fonem daye.²⁸³ Bi ya me jî ev deng fonem e. Lê Mahmoud, ew di nav alofonan da daye.²⁸⁴ Di devoka Torê da di serê peyvê, nava peyvê da tê bikaranîn.

Di serê peyvê da:

“keçka min á piçûk á.”: keçika min piçûk e. (4/3)

“aqlê wê piçkî ne yî timam á.”: aqlê wê piçekî ne tamam e. (5/5)

“çar bûn sê bûn, pênc bûn.”: çar bûn, sê bûn, pênc bûn. (6/17)

“Newêrabû piyê xwe bavêjê.”: Newêrabû pêyê xwe biavêje. (6/23)

“Kuro were pêlê kir, pêlê kir!”: Kuro were pê lê kir, pê lê kir. (7/6)

Di nava peyvê da:

“Em î tevrikê, á ewkê kin, xeparê kin.”: Me tevrik, ewk, xepar dikir. (1/43)

“b derpekê re neçû xwar.”: Bi derbekê ra nedîçû xwar. (12/18)

²⁸¹ Ev nişaneyê IPAYê di berhema Tan û di berhema hevpar ya Tarih Vakfî da derbas dibe. Nişaneyê li jor hatiye wergirtin. Bnr. Samî Tan, *Rêzimana Kurmancî*, r. 34.; Çakar, Işık, Mehmetoğlu û yê din, h.b., r. 10.

²⁸² Kurdo ev deng di nav “sewtên zeliqokî” da bi kar anîye. Bnr. Kurdo, *Gramera Zmanê Kurdî*, r. 21.

²⁸³ Bnr. Samî Tan, *Rêzimana Kurmancî*, r. 40.; Muhammed, *Dengnasî di kurdî de*, r. 156.

²⁸⁴ Mahmoud, *Şîrovekirineke Dengsazî û Fonolojî Di Kurdiya Kurmancî de*, r. 95.

“ez zehf şepirze bûm.”: ez zahf şerpeze bûm. (15/8)

“kepê min ji mi dizîn.”: kepê min ji min dizîn. (16/1)

“Kopalê xwe, dar avêtin.”: Kopalê xwe, dar avêtin. (6/20)

2.2.17.1. Nedengdêra [p]yê

Dengekî cotlêvkî û nehilmî (unaspirative) û girtîya hişk e. Qelew (emphatic)²⁸⁵ e. Wekî dengên din ên qelew ên devoka Torê ev deng jî di peyvê da bi dengekî din ê qelew ra cî digire. Di mînakên da di peyva “pey”ê tenê da bê dengekî din hatiye. Dema bi baldarî mirov lê guhdarî dike ferq dike ku /y/ jî heta dereceyekê qelew tê bilêvkirin lê ji ber ku ne bi qasî wan dengên din ên qelew bû me ew wekî dengekî qelew neda.

Di serê peyvê da:

“Em î pey dá m î kesaxê kîn.”: Me pey da kesax dikir. (1/2)

“Par qetîtíkîk e b dido w nîva bû.”: Par qetîtkek bi dido û nîvan bû. (1/52)

“pazde tepsî paqlewe me anîn.”: panzdeh tepsî paqlewe me anîn. (5/12)

“Me çû axir má pez kirî.”: Em çûn axir me pez kirî. (5/29)

“Em çûn û dîya yê kire pitpit.”: Em çûn û dêya wê kir pitepit. (8/44)

Di nava peyvê da:

“Û ciharê wî jî tişê kevîr kîr, ya hespe wî.”: Û ciharê wî jî tişê kevîr kîr ya hespê wî. (11/16)

“pîyê çepê ha halo kîr.”: pêyê çepê ha halo kîr. (28/21)

Di dawîya peyvê da:

²⁸⁵ Ji ber ku li gor wî derbarê wateguhertina peyvan da tesîra ziravbûn û qelewbûna “p”yê tune ye, Muhammed ev deng di nav alofonan da daye. Bnr. Muhammed, *Dengnasî di kurdî de*, r. 28 û 158.

Her çiqas di nav metnê me da li dawî derbas nebûye jî awayên bêtewang yên peyvan dibin mînak ji bo dengê li dawîya peyvê.

“Û ciharê wî jî tişê kevîr kir, ya hespê wî,”: Û ciharê wî jî tişê kevîr kir ya hespê wî. (11/16)

“pîyê çepê ha halo kir.”: pîyê çepê ha halo kir. (28/21)

2.2.18. Nedengdêra /q/yê (li gor sîstema IPAYê:[q])

Nedengdêreka qirikî/paşzimanokî (uvular) ye. Dema hewa ji kûrayîya qirikê tê, kenarên qirikê li hev dikevin û ev deng derdikeve. Ev nedengdêr ji hêla asta deng ve dengê hişk û nedomdar e ango girtîya hişk e. Li devoka Torê di serê peyvê da, di nav û dawîya peyvê da tê bikaranîn.

Di serê peyvê da:

“Me qurm tavêtine ser.”: Me qurm diavêtin ser. (1/20)

“Mî kelema çênin. Serîyê kelema qurêfin,”: Me kelem diçandin. Serê keleman diquraftin. (1/54)

“Bû qerebalixê wê.”: Bû qerebalixê wê. (5/9)

“mehkê yê qeda û qezê kir.”: meheka wê qediya û qezê kir. (6/1)

“Qederekî li piştê derî man.”: Qederekî li piştê derî man. (7/20)

Di nava peyvê da:

“Me digot daqena nanê me biwerimê.”: Me digot da nanê me biwerime. (1/15)

“Tirkên feqîr.”: Tirkan (yeka) feqîr e. (4/8)

“Heta bin mînderka paqij kim.”: Heta (ku) bin mînderkan paqij bikim. (9/9)

“Bir ew jî bi wî meqamî.”: Bir ew jî bi wî meqamî. (11/25)

“Tebeqê wilo bi dûvik hebûn.”: Tebeqeyên wilo bidûvik hebûn. (16/14)

Di dawîya peyvê da:

“Me bastîq çêtkir.”: Me bastîq çêdikir. (1/46)

“şeveqê me agirê xwe tkir.”: şeveqê me agirê xwe dikir. (3/1)

“Heqaten î nihaq bû,”: Heqîqeten niheq bû, (4/3)

“erq tene go vereşê.”: erq tene ku biverese. (7/91)

2.2.19. Nedengdêra /r/yê (li gor sîstema IPAyê: [r])

Nedengdêreka pêşezmandevkî ye. Di derketina vî dengî da ne tam serê zimên, hinekî bi paştira zimên di şikefta dev da nêzikî pidûya diranên jor dikeve. Lewma jî ji ber ku di dema bilêvkirinê da piştziman xwe bi lez di ser pidûyê ra dikişîne, wekî dengê pidûyî jî tê binavkirin.²⁸⁶ Ev nedengdêr ji hêla asta deng ve dengê nerm û domdar e. Li gor metnên vê xebe, di devoka Torê da di serê peyvê da pir kêmtê. Dema li mînakên ku me ji metin wergirtin bê nêrtin, dê bê dîtin ku ji wan peyvên du heb (rehm, rezîl) esilerebî ne, du heb jixwe “r”ya lerezokî (r) di xwe da di hewînîna lê ji aliyê axêver ve di wan nimûneyan da wiha hatiye bilêvkirin (rajê, “ra”ya daçek). Ango wekî rêbaz dikare bê gotin ku /r/ di serê peyvê da di devokê da nayê bikaranîn. Wekî din di nava peyvê û dawîya peyvê da tê bikaranîn.

Di serê peyvê da:

“Rehma Xwedê lê bê.”: Rehma Xwedê lê be. (23/3)

“Rajê qubano!”: Rahijê qurbano! (27/2)

“Bi vê gavê mi rezîl kir.”: Bi vê gavê min rezîl kir. (28/25)

“Heçî çê di be ra tîfkê ddîyê”: Heçî diçe di ber ra tîfekê didiyê. (30/48)

²⁸⁶ Newzad Hirorî, “Nihênîyên Befrê/Berfê”, 1*Kanîzar*, h. 1, 2015, r. 105. Malper: <https://zimannas.wordpress.com/2015/08/04/kanizar-naveroka-hejmara-1-2015/> (Pêgehîn: 05/08/2019).

Di nava peyvê da:

“Me beroşa xwa: yê jî dikeland.”: Me beroşa xwe ya avê jî dikeland. (3/3)

“Em sê çar cara çûn.”: Em sê çar caran çûn. (4/1)

“Nîro m ji mal derketin.”: Nîvro em ji mal derketin. (7/10)

“Werin heyra, werin!”: Werin heyra(n) werin! (8/5)

“Beranok çêtkirin. Dardarok çêtkirin.”: Beranok çêdikirin, dardarok çêdikirin. (10/20)

Di dawîya peyvê da:

“Dibû bihar, çêle xilas...”: Dibû bihar, çile xelas... (1/1)

“Me xweş tijkirîn û me tkirne mişar.”: Me xweş dikirin û me dikirin mişar. (2/5)

“Ê me tişikê jê fêm nekîr,”: Ê me tişteke jê fam nekîr, (4/4)

“Şeveqê rabûm ev der maliştî:n.”: Şeveqê rabûm (min) ev der maliştin. (7/34)

“Ser girin û em î naylon kîn.”: (Me dê) ser girtibûna û naylon kiribûna. (2/2)

2.2.20. Nedengdêra /r/yê (li gor sîstema IPAYê: [r])

Ev deng bi awayekî xurt û tund dertê. Dengê stûr û bihêz e. Kurdo ev deng wekî “sewta lertzok a hişk” bi nav dike û ji bo grafîma vî dengî du xal danîne ser tîpa “r”yê.²⁸⁷ Mahmoud jî ji bo vî dengî danîna grafîmeka cuda pêşniyaz dike.²⁸⁸ Di gelek devokan de jî ev nedengdêr heye. Ev deng di warê zimannasîyê da wekî “r”ya lertzok”²⁸⁹ jî tê binavkirin. Di devoka Torê da pir tê bikaranîn. Di serê peyvê da, di

²⁸⁷ Kurdo, *Gramera Zmanê Kurdî*, r. 21.

²⁸⁸ Bnr. Mahmoud, *Şirovekirineke Dengsazî û Fonolojî Di Kurdiya Kurmancî de*, r. 92.

Ji ber ku wateguhêr e Tan jî ev deng wekî fonem daye. Bnr. Samî Tan, *Rêzimana Kurmancî*, r. 42.

²⁸⁹ Meqaleyeka ku derheqê devoka kurdên Xoresanê da hatiye nivîsîn yek ji wan meqaleyên zimannasîyê ye ku ev term tê da derbas dibe. Bnr. Hajîyan û Demîrhan, h.b., r. 68.

nava peyvê da û di dawîya peyvê da dikare bê. Di devoka Torê da wekî ku me dît “r”ya destpêka peyvên tim²⁹⁰ stûr e.

Di serê peyvê da:

“Berî paleyîyê *risî* dderketin.”: Berî paleyîyê rêsî derdiketin. (1/16)

“Bacanê *reş* û *ê sor*”: Bacanê reş û sor (2/4)

“Em *î rabîn* bê wela *mê çine* nav *reza*”: Em dirabûn me digot wela em dê biçin nav reza. (3/8)

“Em *rabûn*, di *ro sê ro* ketne wê navê de.”: Em rabûn, du roj sê roj ketin wê navê. (5/1)

“*Ringêna* dêrî zavayê *m jî rabû* hat.”: (Li) ringînîya derî zavayê min jî rabû, hat. (7/36)

Di nava peyvê da:

“Me *gêre tkî:r*, me *ddêra*.”: Me gêre fikir, me didêra. (1/11)

“Me *tevrika* wa *tkîr*.”: Me tevrika wan fikir. (2/6)

“*piştî* wê *ava girik* *ava zelal* dihat.”: piştî wê ava girik ava zelal dihat. (3/5)

“*Çavreşî* avêtine *má*.”: Çavreşî avêtin me. (9/23)

“em *î vêca* dest bi *yê mezrûne* *kin*.”: Me vêca dest bi yê mezrone fikir. (10/13)

Di dawîya peyvê da:

“*Selik* *bû*, *tevir* *bû*,”: Selik bû, tevir bû, (3/19)

“Axirê wêna me wilo *qirar* da.”: Axirê wêna me wilo qerar da. (4/35)

²⁹⁰ Jixwe Yaman jî vê yekê di maqaleya xwe da -ne ji bo devoka Torê- bi giştî ji bo kurdî dibêje. Bnr. Raif Yaman, “Li Ser Alfaba Kurdî” *Zend*, h. 1, İstanbul 1996, r. 70.

“Hema go zêr jî nebin wer mi bibin. Bêzêr jî m bibin.”: Hema go zêr jî nebin werin min bibin. Bê zêr jî min bibin. (8/3)

“derbîk bi teyîr mi l dar txist.”: derbek bi tevir min li dar dixist. (15/4)

2.2.21. Nedengdêra /s/yê (li gor sîstema IPAyê:[s])

Nedengdêreka diranî ye. Di derketina vî dengî da serê zimên di şikefta dev da nêzîkî pidûya jor ya diranan dikeve. Nedengdêreka pêşderkî ye. Ev nedengdêr ji hêla asta deng ve dengêkî hişk û domdar e ango fîzeka hişk e. Muhammed vî dengî wekî “sya zirav” bi nav dike.²⁹¹ Ev deng di devoka Torê da di gelek peyvên da tê bikaranîn. Di serê peyvê da, di nav û dawîya peyvê da jî tê.

Di serê peyvê da:

“Em ser dirazan û me agir txîr.”: Em (li) ser dirazan û me agir dikir. (1/20)

“sê bar,”: sê bar, (2/13)

“Xel siqêfa dikine bavê wê jî dey nakê.”: Xelk siqêfan (bi) bavê wê dikin jî deng nake. (4/8)

“Sêzdeh, diwazdeh mirîşk û dîkîk.”: Sêzdeh, diwazdeh mirîşk û dîkek. (6/8)

“dirûnê wû ga sîvanoka wî dişikê.”: rûdine û gava sîvanoka wî dişikê. (7/4)

Di nava peyvê da:

“Em î çin nîskê xwe aşêf kin.”: Em diçûn me nîskê xwe aşêf dikirin. (1/3)

“me d esirandin.”: me diesirandin. (2/12)

“Û sê coht bazin û gustîl.”: Û sê cot bazin û gustîl (4/31)

“Werhasil çûn.”: Welhasil çûn. (5/26)

“ez birime qîstexanê.”: ez birim xestexaneyê. (8/73)

²⁹¹ Muhammed, *Dengnasî di Kurdî de*, r. 22.

Di dawîya peyvê da:

“Ê me_zrûne jî brakê m dibû dims.”: Yê me_zrone jî birakê min, dibû dims. (10/19)

“Tî zanê bê kils çi ye?”: Tu dizanî bê kils çi ye? (12/21)

“^cemrê mi çiqas bû.”: emrê min çiqas bû? (14/2)

“Ma kes nebû go t bidê hiná Dalîni?”: Ma kes(ekî din) tunebû ku tu bidî hinên Dalîni? (21/37)

“Wela camêr axir xeberê pîs...”: Wela camêr axir xeberê pîs... (22/88)

2.2.21.1. Nedengdêra [s]yê

Nedengdêreka diranî ye. Di derketina vî dengî da serê ziman di şikefta dev da nêzîkî pidûya jor ya diranan dikeve lê bêhtir û bihêztir bi pidûya diranên jor ve didewise. Nedengdêreka pêşderkî ye. Ev nedengdêr ji hêla asta deng ve dengêkî hişk û domdar e ango fizeka hişk e. Muhammed ev deng wekî “sya qelew”²⁹² (emphatic) bi nav kiriye. Di metnên me da devera ku hatiye bikaranîn, dengêkî din yê qelew hatiye. Di nav mînakên li vir dayî da sê peyv hene (maşok, qîşmet, kixs, rast) ku wekî elameta qelewkirinê ji bilî vî dengî binê tu dengî nehatiye xêzkirin. Lêbelê dema mirov bi baldarî li wan peyvan guhdarî dike dibîne ku /k/ya “maşok”ê ji ya normal qelewtir tê bilêvkirin, dengê /q/ û /x/yê jixwe dengên xurt in û “r”ya lertzokî (r) jî bixwe qelew e. Ev deng ango /s/, dengêkî alofon²⁹³ e. Di devoka Torê da di serê peyvê da, di nav û dawîya peyvê da tê bikaranîn. Di metnên me yên vê xebatê da tenê du bikaranîn hebûn ji bo ji dawîya peyvê ra bibin mînak.

Di serê peyvê da:

“Şed^c elb genim”: Sed elb genim (1/14)

²⁹² Muhammed, *Dengnasî di kurdî de*, r. 22.

²⁹³ Mahmoud jî wek alofon dîtiye. bnr. Mahmoud, *Şirovekirineke Dengsazî û Fonolojî di Kurdiya Kurmancî de*, r. 99.

“bacanê reş û ê gor ”: bacanê reş û ê sor (2/4)

“Selik bû, tevir bû, ”: Selik bû, tevir bû, (3/19)

“Pişta dêrî ne mi daye ne mi standîya.”: Pişta derî ne min daye ne min standiye.
(5/35)

“hê má ev safi nekiriya”: hê me ev safî nekiriye. (8/2)

Di nava peyvê da:

“Îsal me bazar nekiriya.”: Îsal me bazar nekiriye. (1/53)

“Û masokê xwá”: Û masokê xwe (2/10)

“Hema go qismetê vê keçikê çêbûbana”: Hema ku qismetê vê keçikê çêbûbûna
(4/12)

“m mêvanê xwá wilo rast kirin.”: min mêvanên xwe wilo rast kirin. (6/17)

“te wa, xwehka xwe tirsand.”: te wan, xwehka xwe tirsand. (7/75)

Di dawîya peyvê da:

“Em tiçûn me kixs didanîn.”: Em diçûn me kixs didanîn. (1/6)

“belkî deh pazdeh nefis”: belkî deh pazdeh nefis (10/53)

2.2.22.Nedengdêra /ş/yê (li gor sistema IPAyê:[f])

Nedengdêreka pêşdemaxkî ye. Di derketina vî dengî da nava zimên nêzî paşdemaxan dibe û hinekî li paşîya pêşdemaxê dikeve. Ev nedengdêr ji hêla asta deng ve dengêkî hişk û domdar e, ango fizeka hişk e. Di devoka Torê da di serê peyvê da, di nav û dawîya peyvê da tê bikaranîn.

Di serê peyvê da:

“Go me genimê xwe dhiland em î şon.”: Ku me genimê xwe dikeland me dişûst. (1/15)

“Me dbire şiqê Nisêbînê”: Me dibir şeqê Nisêbînê (2/15)

“Em dirabûn şeveqê me agirê xwe tîkir.”: Em radibûn şeveqê me agirê we dikir. (3/1)

“Lingê zlamê mi şkest.”: Lingê zilamê min şikest. (6/1)

“Şîva gundîya.”: Şîva gundîyan. (8/25)

Di nava peyvê da:

“Má aşêf tîkir.”: Me aşêf dikir. (1/1)

“Em î kine mişar.”: Me dikir mişar. (2/3)

“û me j camîyê dikişand.”: û me ji camîyê dikişand. (3/41)

“wê îşev êne ewk...”: dê îşev ên ewk... (4/29)

“Goşt û nanê sêlê jê ra anîn.”: Goşt û nanê sêlê jê ra anîn. (7/19)

Di dawîya peyvê da:

“bacanê reş”: bacanê reş (2/4)

“Pê şexş mêşin kirîn,”: Pênc şexş mêşin kirîn, (5/29)

“Êş ji mi tenê ra hatiya?”: Êş ji min tenê ra hatiye? (6/10)

“Ê par vêca dilê me xweş bû.”: Ê par vêca dilê me xweş bû. (8/82)

“mêrik baş bûye.”: mêrik baş bûye. (11/53)

2.2.22.1. Nedengdêra [s]yê

Nedengdêreka pêşdemaxkî ye. Di derketina vî dengî da nava zimên nêzî paşdemaxê dibe û hinekî li paşîya pêşdemaxê dikeve. Ev nedengdêr ji hêla asta deng ve dengêkî hişk û domdar e, ango fizeka hişk e. Di bilêvkirinê da ziman ji dema /s/yê bêhtir bi pêşdemaxê ve didewise. Dengêkî qelew (emphatic) e. Di devoka Torê da di serê peyvê da ji bilî peyvên erebî em rastî mînakên nehatin ku jixwe ji temamê metnê me mînakek tenê derket. Wekî din li devoka Torê di nava peyvê da tê bikaranîn lê di dawîya peyvê da mînakên wê hene.

Di serê peyvê da:

“Şertnâ xwá”: Şertne xwe (21/43)

Di nava peyvê da:

“Qaqilkê mişko gû rişko!”: Qaqilkê mişko gu rişko! (23/17)

“Me tîrşî çêtkir.”: Me tîrşî çêdikir. (1/55)

“û yşela tiştek nîna.”: û îşele tiştek nîne. (5/25)

“çavreşî avêtine má.”: çavreşî avêtin me. (9/23)

Di dawîya peyvê da:

“Ê reş hebû, ê sincêrî hebû”: Ê reş hebû, yê sincêrî hebû (12/8)

2.2.23. Nedengdêra /t/yê (li gor sîstema IPAYê:[t])²⁹⁴

Nedengdêreka dirankî²⁹⁵ ye. Di derketina vî dengî da serê zimên di şikefta dev da li diranên jor dikeve. Ev nedengdêr ji hêla asta deng ve dengêkî hişk û nedomdar e

²⁹⁴ Di berhema Tan û di berhema hevpar ya Tarih Vakfî da ev nişane wekî “[tʰ]” derbas dibe. Bnr. Samî Tan, *Rêzimana Kurmancî*, r. 34.; Çakar, Işık, Mehmetoğlu û yên din, h.b., r.10.; Nişaneya ku di metin da hatiye bikaranîn li gor Muhammed e. Bnr. Muhammed, *Dengnasî di kurdi de*, r. 194.

²⁹⁵ Kurdo ev deng di nav “sewtên pêşziman yên zeliqokî” da daye. Bnr. Kurdo, *Gramera Zmanê Kurdî*, r. 23.

ango girtîya hişk e. Dengekî hilmî (aspirative) ye. Di devoka Torê da ev deng di serê peyvê, di nava peyvê û dawîya peyvê da tê bikaranîn.

Di serê peyvê da:

“me *tîşt* didanîn.”: me *tîşt* didanîn. (1/5)

“Me *tirozî çêtkirin*,”: Me *tirozî çêdikirin*. (1/55)

“Me *tevlî hev tîkir*.”: Me *tevlihev dikir*. (3/2)

“Wela m ne dgihan em *têr nanê xwe* bxun.”: Wela em nedigihastin (ku) em *têr nanê xwe* bixwin. (3/69)

“ez wa jî l *tihêla* wa deynim?”: ez wan jî li *tihêla* wan daynim. (4/33)

Di nava peyvê da:

“libeke go dibelitî me *txwar*.”: libeke ku dibelitî me *dixwar*. (2/7)

“Keffîka wê jê girin û m î kelênin.”: Me *keftika wê jê digirt* û *dikeland*. (3/65)

“û m l ev hatin û *fetħa* xwe xwendin.”: Û em li hev *hatin* û me *fatiheya* xwe xwend. (4/35)

“Eytanê *ştexilî*.”: Eytanê *ştexilî*. (4/35)

“Me dgo ‘*êtûn*’.”: Me digot “*êtûn*” (12/22)

Di dawîya peyvê da:

“Îdî meha wî qeda û me *xwest*.”: Êdî meha wî *qediya* û me *xwest*. (8/73)

“Kuriîk *kwişt*.”: Kurik *kuşt*. (11/15)

“Hêrvist”: Hêrvist (13/2)

“em î rabin em î *goşt* kirin.”: Em *radibûn* me *goşt* *dikirî*. (24/1)

“Sih û heft heşt sal çêbû.”: Sî û heft heşt sal çêbû. (21/21)

2.2.24. Nedengdêra /t̥/yê (li gor sîstema IPAyê: [t̥]²⁹⁶)

Nedengdêreka dirankî ye. Nehilmî (unaspirative) ye. Di derketina vî dengî da serê zimên di şikefta dev da li diranên jor dikeve lê hinekî bi alîyê pidûya jor ve vedikişe. Ev nedengdêr ji hêla asta deng ve dengêkî hişk û nedomdar e ango girtîya hişk e. Ji ber ku wateguhêr e Tan jî ev deng wekî fonem daye²⁹⁷ lê Muhammed wekî alofon dide.²⁹⁸ Ev deng di devoka Torê da di serê peyvê da, di nava peyvê û di dawîya peyvê da tê bikaranîn. Di serê peyvê da axleb bi guherîna qertafa dema niha (di-) mînak hene.

Di serê peyvê da:

“Má aşêf fikir.”: Me aşêf dikir. (1/2)

“Dîsa çar teneká ay m î girin.”: Me dîsa çar teneke av digirt. (3/16)

“Wela xweha m têyîyê dá.”: Wela xweha min têtê. (4/4)

“Mîlet tê pê ve wî drákin”: Milet têtê pê ve wî radikin. (7/7)

“Tûrikîkî wilko torbek á.”: Tûrikekî wilo torbeyek e. (19/41)

Di nava peyvê da:

“Heta êvarî ew kixs me tkirne xetîk.”: Heta evarê me ew kixs dikirin xetik. (1/7)

“Ê go tema mixalefî.”: Ê got: “Temam mixaletî.” (4/23)

“Ew zemanê go te xwestîin roja xwestîinê bû.”: Ew zemanê ku (wan) tu xwestî, zemanê xwestîinê bû. (5/8)

²⁹⁶ Di berhema Tan û di berhema hevpar ya Tarih Vakfî da ev nişane derbas dibe. Bnr. Samî Tan, *Rêzimana Kurmancî*, r. 34.; Çakar, Işık, Mehmetoğlu û yê din, h.b., r. 10.

²⁹⁷ Samî Tan, *Rêzimana Kurmancî*, r. 40.

²⁹⁸ Muhammed, *Dengnasî di kurdî de*, r. 22.

“Teşta metka min e tişî kefçî w çetel bû.”: Teşta metika min tije kevçî û çetel bû. (9/34)

“wexfê go tçûne ewkê, tçûne zeyafê.”: wextê ku diçûn ewkê, diçûn zeyatê. (10/4)

Di dawîya peyvê da:

“Cohtîk di cohî me pîvaz didanîn. : Me cotek du cot pîvaz didanîn. (1/6)

“Piştî wê ava girîk ava zelal dihaî.”: Piştî wê ava girik ava zelal dihat. (3/6)

“paste w tişt û mişt”: paste û tişt û mişt (5/13)

“Haî derman pê dakir.”: Hat derman pê dakir. (6/5)

“mi bîdon dagî:rî.”: min bîdon dagirt. (7/35)

2.2.24.1.Nedengdêra [t]yê

Dengekî qelew²⁹⁹ (emphatic) e. Wekî wan dengên qelew ên din ên devoka Torê dema di peyvê da tê bikaranîn wekî prensîb û rêzik di gel dengê din yê qelew tê bikaranîn. Dengekî bêpif (nehilmî/unaspirated) e. Li gor ku Muhammed gotiye “dubendîya ‘zirav-qelew’ ya tyê ne diyardeyeke fonemîk e anku dengên zirav û qelew varyantên eynî dengî ne.”³⁰⁰ Ji ber wê yekê jî ev deng wekî dengên din ên qelew “alofon” e, ne fonem e. Di navbera zirav an qelewbilêvkirina vî dengê nehilmî da her çiqas ferq hebe jî ne bi wê dereceya ku wateyeka cuda bide peyvê ye. Ev dengê qelew yê devoka Torê, di serê peyvê da, di nava peyvê da û di dawîya peyvê da tê bikaranîn.

Di serê peyvê da:

“Me dbire va Torê Banî difro:t.”: Me dibir van Torê Banî difiro. (2/15)

²⁹⁹ Amêdî ev deng wekî “dengê bor û stûr” bi nav kiriye. Bnr. Amêdî, h.b., r. 66.

³⁰⁰ Muhammed, *Dengasî di kurdî de*, r. 28, 96.; Heman fikrî Mahmoud jî dide. Li gor wî jî ji ber ku wateyê naguherîne ev deng alofon e. Bnr. Barzo Omar Mahmoud, *Şirovekirineke Dengsazi û Fonolojî di Kurdiya Kurmancî de*, r. 96.

“tevrê xwe w tiştên xwe”: tevirê xwe û tiştên xwe (3/18)

“E çûme Serê Tebla.”: Ez çûm Serê Tebleyan. (9/20)

“Me tirşî çêtkir.”: Me tirşî çêdikir. (1/55)

“Evdilqadil te wa, xwehka xwe tirşand.”: Evdilqadir te ew, xwehka xwe tirsand(in). (7/75)

Di nava peyvê da:

“Vêca ev hogic firofin.”: Vêca ev hogiç firotin. (19/19)

“Ti harê vêga bê z ê çime Batmanê herá.”: Tu herî vê gavê bibêjî ez dê biçim Batmanê here. (20/8)

“helîl û melîl ji wa tsitandin”: (wan) helîl û melîl ji wan distandin. (26/29)

“Nefs û şeytan birayê hevdu ná.”: Nefs û Şeytan birayê hevudu ne. (28/33)

“Em çûn û dîya yê kire pitpit.”: Em çûn û dêya wê kir pitepit. (8/44)

Di dawîya peyvê da:

“Sed kîlo, not kîlo yanî hebû pi xwá.”: Sed kîlo, not kîlo yanî hebû bi xwe. (22/17)

“Mîlet ha^h û dawet kirin.”: (5/41)

“Em çûn û dîya yê kire pitpit.”: (8/44)

2.2.25. Nedengdêra /v/yê (li gor sîstema IPAyê:[v])

Her çiqas wekî nedengdêreka lêvikî derbas bibe jî ji ber ku di dema derketina vî dengî da lêva xwarê li diranê jorê dikeve mirov dikare wî wekî diran-lêvkî (labiodental)³⁰¹ bi nav bike. Ev nedengdêr ji hêla asta deng ve dengê nerm û

³⁰¹ Tan jî ev deng wisa bi nav kiriye. Samî Tan, *Rêzimana Kurmancî*, r. 39.

domdar e ango fizeka nerm e. Di devoka Torê da ev deng di serê peyvê da, di nava peyvê da û di dawîya peyvê da tê bikaranîn.

Di serê peyvê da:

“Vêca werhasil me jê re l êgir kîr.”: Vêca welhasil me jê ra li agir kir. (6/11)

“Z çûm mi derî vekîr.”: Ez çûm min derî vekir. (7/35)

“vîqasî sin^cetê má ev bû.”: vîqasî sinetê me ev bû. (12/49)

“Em naçin, em ê vegeřin mal.”: Em naçin, em dê vegerin mal. (17/15)

“Filan bêvan, vir de wê de...”: Filan bêvan (bi) vir da (bi) wê (derê) da. (20/17)

Di nava peyvê da:

“Em î çine şivistê.”: Em diçûn şivistê. (1/2)

“Me tevli hev tîkir.”: Me tevlihev dikir. (3/2)

“Tikevê ^cerdê,”: Dikeve erdê, (7/4)

“şibey şeveqê”: sibe şeveqê (8/60)

“îşev ti mêvanê min î.”: îşev tu mêvanê min î. (11/13)

Di dawîya peyvê da:

“Em î şivista xwá diná hev,”: Me şivista xwe dida hev, (1/2)

“Axir bû şev”: Axir bû şev (3/28)

“Were wi:r, wê îşev êne ewk...”: Were wir dê îşev bên ewk...(4/29)

“Ne m p ev çûn, ne me qerebalix kîr,”: Ne em bi hev çûn, ne me qerebalix kir, (8/6)

“dûv rá anî p^zezê xwe ddohtin.”: dû ra yanê (wan) pezên xwe didotin. (10/21)

2.2.25.1. Nedengdêra [v|yê

Her çiqas wekî nedengdêreka lêvikî derbas bibe jî ji ber ku di dema derketina vî dengî da lêva xwarê li diranê jorê dikeve mirov dikare wî wekî diran-lêvkî binav bike. Ji dengê /v/yê ferqa vî dengî, qelewbûna (emphatic) wî ye. Di bilêvkirinê da êdî lêva jêr ji /v/yê zahftir dikeve bin diranên jorîn û hinekî bi paş ve vedikişê. Diran jî bêhtir li bin lêva jêr dikeve û wê didewisîne. Dengê alofon e ango di devoka Torê da ne wateguhêr e. Di serê peyvê da em di tekstên xwe da rastî vî dengî nehatin. Lê di nava peyvê da û di dawîya peyvê da mînak hebûn.

Di nava peyvê da:

“ji nav destê hevdû rerandin.”: ji nav destên hevûdu revandin. (26/19)

“ayîne má hebûn”: avîne me hebûn. (27/1)

“Em î tevrikê, á ewkê kîn,”: me tevrikê, ewkê dikir. (1/43)

“Û me neqlekê kavîr jî má birin.”: Û me neqlekê kavîr jî birin. (19/3)

Di dawîya peyvê da:

“Tov pí tov á.”: Tov bi tov e. (27/23)

“nahêlê av werê.”: Nahêle av were. (30/5)

2.2.26. Nedengdêra /w/yê (li gor sîstema IPAYê: [w])

Nedengdêreka lêvikî ye lê di dema derketina vî dengî da lêv tam li hev nakevin. Ev nedengdêr jî hêla asta deng ve dengê nerm û domdar e. Di heman demê da nîvdengdêr³⁰² e û dengê alîkar e jî. Di devoka Torê da di serê peyvê da, di nava peyvê da û di dawîya peyvê da tê bikaranîn.

Di serê peyvê da:

³⁰² Ji bo nîvdengdêrîya vî dengî bnr. Tan, h.b., r. 44.; Çetîn Taş, *Waneyên Rêziman û Rastnivîsa Kurmancî*, r. 22.; Wekî din ev deng digel /y/yê jî di gelek zimanan da wekî nîvdengdêr tê hesabandin. Bo mînak Perrot jî /w/ û /y/yê nîvdengdêr hesabandiye. Bnr. Perrot, h.b., r. 51.

“binê wê”: binê wê (3/4)

“Wilo...”: wilo... (5/6)

“me go ‘Werênin.’”: me got: werênin. (5/21)

“Waweylê!”: Waweylê! (8/54)

“wê winda bin.”: dê winda bibin. (9/6)

Di nava peyvê da:

“Em î teyrikê, á ewkê kin,”: Me tewrikê, ewkê dikir. (1/43)

“Em ê daweta xwe kin.”: Em dê daweta xwe bikin. (5/28)

“hewarâ qansêrê l mi da.”: hewar e qansêrê li min da. (7/47)

“Xwedê Te^cala heqê me nehêlê.”: Xwedayê teala xeqê me nehêle. (9/37)

“Kurik kwişt.”: Kurik kuşt. (11/15)

Di dawîya peyvê da:

“Em hew çûn.”: Em hew çûn. (4/5)

“Ev wesîyeta min á hew.”: Ew wesiyeta min e hew. (11/5)

“Bere yaw dido j wa bêjne wa”: Bila yaho dido ji wan bibêjin wan (14/52)

“Ez razamâ, t xew ve çûmâ.”: Ez razame di xew ve çûme. (9/5)

2.2.27. Nedengdêra /x/yê (li gor sîstema IPAyê:[x])

Nedengdêreka qirikî ye. Dema hewa ji kûrayîya qirikê tê, kenarên qirikê li hev dikevin û ev deng derdikeve. Ev nedengdêr ji hêla asta deng ve dengê hişk û domdar e. Ev deng di devoka Torê da di serê peyvê da, di nava peyvê da û di dawîya peyvê da tê bikaranîn.

Di serê peyvê da:

“Dibû bihar, çêle xilas...”: Dibû bihar çile xelas... (1/1)

“Ya xorta ye w...”: Ya xortan e û... (1/37)

“Zê çimá xudbê.”: Ez dê biçim xutbeyê. (7/21)

“Xezûrê yê çûbû gwind.”: Xezûrê wê çûbû gund. (8/7)

“Ez razamá, t xew ve çûmá.”: Ez razame, di xew ve çûme. (9/6)

Di nava peyvê da:

“mi dşîşt serê bana draxîst.”: min dişûşt, (li)serê banan radixist. (1/14)

“mê çine qûndira muxtêr bine jê rá.”: em dê biçin qundereya muxtar bibin jê ra. (8/55)

“Û koxer hebû.”: Û koxer hebû. (12/10)

“Em ji Binxetê hatin.”: Em ji binxetê hatin. (17/1)

“Şêxoyê Derwêş lo!”: Şêxoyê Derwêş lo! (18/2)

Di dawîya peyvê da:

“me kesax tîkir lo!”: me kesax dikir lo! (11/34)

“Te navê Şêx Ehmed jî bihîştîye ne wlo?”: Te navê Şêx Ehmed jî bihîstîye ne wilo? (28/8)

2.2.28. Nedengdêra /x/yê (li gor sîstema IPAyê:[y])

Her çiqas tê bawerkirin ku ji erebî ketiye kurmancî jî ev ne agahîyeka teqez e. Ji ber ku ev deng di zimanên aryanî (avestayî, belûcî, farisî, peştoyî) da heye³⁰³ dibe ku di binyada kurmancî da ev deng hebe ango ne wekî tebîra Mahmoud be ku ji vî

³⁰³ Ji bo vê agahîyê bnr. Zal, h.b., r. 100.

dengî ra dibêje zirdeng.³⁰⁴ Kurdo ev deng wekî “dengê xidikê” bi nav kiriye.³⁰⁵ û ew bi nîşaneyê “G”³⁰⁶ yê daye. Dengê bilerz e. Her çiqas C. Bedirxan ji bo vî dengî gotibe ku piranîya kurdan vî dengî wekî “xeyn”ê bilêv dikin³⁰⁷ jî li devoka Torê ev deng tê bikaranîn. C. Bedirxan di alfabeyê da cî nedayê lê ji bo vî dengî bide nasîn du xal danîne ser “x”yê.³⁰⁸ Herwiha K. Bedirxan jî wekî C. Bedirxan di alfabeya xwe da ji bo vî dengî du xal danîne ser “x”yê.³⁰⁹ Di devoka Torê da ev deng di serê peyvê da, di nava peyvê da û di dawîya peyvê da tê bikaranîn.

Di serê peyvê da:

“Kêça yê y dî pê de xeyidî.”: Kêça wê ya dîn pê da xeyidî. (5/11)

“Wela mxaletî xerîbê me hatîna”: Wela mixaletî xerîbên me hatine. (5/18)

“Xem nîne.”: Xem nîne. (5/19)

“mala má p xwe á xilbe bûn”: mala me bi xwe xilbe bûn (12/29)

“Ê vêca xela bû.”: Ê vêca xela bû. (14/1)

Di nava peyvê da:

“Em î miştaxê xwe çêkin.”: Me miştaxeyên xwe çêdikir. (3/10)

“Anî xeberîk ştexalîk bê ser,”: Yanî (ku) xeberêk, ştexalîyek bê ser (5/24)

“Ew ser oxîra xwe jî çû.”: Ew (li) ser oxira xwe jî çû. (9/38)

“kaxetkê gihandine”: kaxezekê gihandine (9/40)

“Ji zixûra”: Ji zixuran (12/43)

³⁰⁴ Mahmoud, *Şîrovekirineke Dengsazî û Fonolojî Di Kurdiya Kurmancî de*, r. 51.

³⁰⁵ Kurdo, *Gramera Zmanê Kurdî*, r. 18.

³⁰⁶ Qenatê Kurdo, *Zimanê Kurdî Rêziman (gramatik)*. KOMKAR, Frankfurt 1981. r. 17.

³⁰⁷ C. Bedirxan, *Alfabeya Kurdî & Bingehên Gramera Kurdmancî*, r. 13.

³⁰⁸ Bnr. C. Bedirxan, *Alfabeya Kurdî & Bingehên Gramera Kurdmancî*, r. 25.

³⁰⁹ Alfabeya K. Bedirxan ji kitabxaneyê Hawarê bi hejmarê 11. derketiye. Bi wêneyê ye. Bnr. Kamuran Bedirxan, *Elfabeya Min*, Kitaxaneyê Hawarê, Şam, d.n.d., r. 18.; Herwiha di hejmarê yekem ya Hawarê da jî bi vî rengî hatiye dayîn ango di nav tîpan da daye lê nexistiye nav alfabeyê û sebaba wê jî gotiye: “Ji ber ku ne dengên kurdî ne.” Bnr. Celadet Alî Bedirxan, *Hawar*, r. 12.

Di dawîya peyvê da:

“Û má firaxê xwe tanîn”: Û me firaxên xwe dianîn (3/14)

“Bû qerebalixê wê.”: Bû qerebalixa wê. (5/9)

“Ew î ne yî sax bû şxwá...”: Ew ne sax bû jixwe. (8/37)

“Heṭṭa meha tebaṭê”: Heta meha tebaxê (10/4)

“Tevlu qaçax şêst weraqa j wa diṭandin.”: Tevli qaçax şêst wereqe ji wan diṭandin. (18/10)

2.2.29. Nedengdêra /y/yê (li gor sîstema IPAyê:[j])

Nedengdêreka pêşdemaxkî ye. Di derketina vî dengî da nava zimên nêzî paşdemaxê dibe. Ev nedengdêr ji hêla asta deng ve dengêkî nerm û domdar e. Dengêkî pêşderkî ye û nivdengdêr³¹⁰ (semivowel) tê hesabandin.

Di devoka Torê da di serê bêjeyê da bi hin guherînan an jî bi rêya wergirtina ji zimaneke din tê bikaranîn. Di nava peyvê û di dawîya peyvê da jî tê bikaranîn.

Di serê peyvê da:

Di peyvên “yadê” û “yabo”³¹¹ da û di peyva yek ê da -û peyvên ji vê peyvê dariştî ne da- di serê peyvê da tê. Wekî din ev deng di devoka Torê da di serê bêjeyên esilkurmancî da nayê.

³¹⁰ Bnr. Samî Tan, *Rêzimana Kurmancî*, r. 44.; Çetîn Taş, *Waneyên Rêziman û Rastnivîsa Kurmancî*, r. 22.; Mahmoud jî ji bo vê û nivdengdêreka din, /w/yê, şîroveyeke wiha tîne: “Ev herdu fonêm /y/, /w/ li gor yasayên fonetîkî dengdêr in, lê li gor peyrewkirina fonolojî dengdar in.” Bnr. Mahmoud, *Şîrovekirineke Dengsazî û Fonolojî Di Kurdiya Kurmancî de*, r. 76.

³¹¹ Aslan ji bo vî dengî dibêje ku ji bilî peyva “yek”ê û peyvên têkildarê wê tu caran di kurmancî da nayê. Ji bo agahîya Aslan ya derbarê mijarê da bnr. Aslan, h.b., r. 60.

Ev peyv jî di eslê xwe da dayê û bavo ne lê di devoka Torê da bi rêya metatezê wekî baneşanê hatiye bikaranîn. Yanê bi ya me ev rêzik digel van herdu bikaranînan ji bo devoka Torê hêj jî derbasdar e.

C. Bedirxan jî ji bo vê babetê –her çiqas peyv nedabin jî- dibêje ku hejmara peyvên ku bi vî dengî dest pê dikin wekî pêncî heban hene. Nivê wan, ên ku ji “yek”ê dariştî ne. Çaryekeek ji wan jî esilbîyanî ne û wekî dijîrêzik dengê li serê peyvê ya eslê xwe winda nekirine. Helbikî axlebê van peyvyan dema derbasî kurdî bûne ev deng winda kirine. Bnr. Bedirxan û Lescot, h.b., r. 40.

“yék li vî şiqî yék li wî şiqî”: yek li vî şeqî yek li wî şeqî (1/28)

“Yadê ez ê vêca bi ser xalê xwe yî Silîm de çim.”: Dayê ez dê vêca bi ser xalê xwe yê Selîm da biçim. (4/5)

“Yabo v se^cetkê em e l vir in.”: Bavo em saetekê em li vir in. (7/23)

“Yanî ez ketîme, bêhiş ketîme.”: Yanî ez ketime, bêhiş ketime. (9/30)

“Rabû hevalê min î yazdeh danîne ber xwendinê.”: Rabû hevalên min ê yazdeh danîn ber xwendinê. (14/3)

Di nava peyvê da:

“Em î çine paleyya nîska.”: Em dê biçin paleyîya nîskan. (1/9)

“me heyata xwe wilo derbas tîkir.”: me heyata xwe wilo derbas dikir. (3/68)

“Keça yê y dî pê de xeyidî.”: Keça wê ya din pê de xeyidî. (5/11)

“Hetta bê xeyd.”: Heta bê xeyd. (8/15)

“Dinya deyn ketne stuwê mi dá,”: Dinya(yek) deyn ketin stûyê min. (9/39)

Di dawîya peyvê da:

“Em î pey dá m î kesaxê kîn.”: Me pey da kesax dikir. (1/2)

“Ma qey her ekî me meţerekî xwe hiştîba.”: Ma qey her yekî me metereyekî xwe hiştibûna. (2/14)

“şibey şeveqê em î rabin”: sibe şeveqê em dê rabin. (3/8)

“Qe dey nakê.”: Qed deng nake. (4/9)

“Mey ji roja ev xanî heyá”: (bi)Meyizîne ji roja ev xanî heye (ve) (6/6)

2.2.30. Nedengdêra /z/yê (li gor sîstema IPAyê:[z])

Nedengdêreka dirankî ye. Di derketina vî dengî da serê zimên di şikefta dev da li nêzîkî pidûya jor ya diranan dikeve. Ev nedengdêr ji hêla asta deng ve dengêkî nerm û domdar e ango fîzeka nerm e. Di devoka Torê da /z/ di serê peyvê, di nava peyvê û dawîya peyvê da tê bikaranîn.

Di serê peyvê da:

“Me zadê xwe j ev safî tkî:r.”: Me zadê xwe ji hev safî dikir. (1/11)

“me l zarokê xwe w li mala xwe mesref tîkir”: Me li zarokê xwe û li mala xwe mesref dikir. (2/16)

“Ew ava zelal me ddagirtin, me teneke ddagirtin.”: Ew ava zelal me dadigirt, me teneke dadigirtin. (3/6)

“Em ê çin bê yê çî zêra j me xwazî:n.”: Em dê biçin bê dê çî zêran ji me bixwazin. (4/26)

“Hebû, á zahf bû.”: Hebû, zahf bû. (5/21)

Di nava peyvê da:

“m î çine nîzêkê”: em diçûne nêzîkê(1/17)

“Û çend coht bazin jî gotin.: Û çend cot bazin jî gotin. (4/31)

“Sêzdeh, diwazdeh mirîşk û dîkîk.”: Sêzdeh, diwazdeh mirîşk û dîkek (6/8)

“Ga çûye mala xezûrê kûrê xwá.”: Gava çûye mala xezûrê kurê xwe. (7/21)

“Çiloyê xwe me cêzî çêtkirin.”: Me çiloyên xwe cêzî çêdikirin. (10/32)

Di dawîya peyvê da:

“Me pîvaz didanîn.”: Me pîvaz didanîn. (1/5)

“Gwîz bûn û behîv bûn”: Gûz bûn û behîv bûn. (1/48)

“Heta: dibû payîz.”: Heta dibû payîz. (2/18)

“^cadiz bû çû bi çîyê de.”: aciz bû, çû bi çiya ve.(11/8)

“Ew aya têt bû.”: Ew ava têt bû. (12/40)

2.2.30.1.Nedengdêra [z]yê

Nedengdêreka dirankî ye û qelew e. Di derketina vî dengî da serê ziman di şikefta dev da li nêzîkî pidûya jor ya diranan dikeve lê li gor /z/yê hinekî bi paşdetir vedikişe û bêhtir bi ser pidûyê ve didewise. Ev nedengdêr ji hêla asta deng ve dengê nerm û domdar e ango fizeka nerm e. Di devoka Torê da /z/ di serê peyvê, di nava peyvê û dawîya peyvê da tê bikaranîn.

Muhammed ev dengê ku di devoka Torê da jî tê bikaranîn, wekî fonem nirxandiye³¹² lê li gor Mahmoud ev deng alofon e.³¹³ Bi ya me jî ji ber ku em di devokê da rastî wateguhêriya vî dengî nehatin, dengê alofon e.

Di serê peyvê da:

“hina bîber dibiraştin, zelete me çêdikir.”: hinan bîber dibiraştin. (3/32)

“zarokê má, keçîkê má pê re şixulîbûn.”: zarokên me, keçîkên me pê ra şixulîbûn. (4/7)

“Ew zemanê go te xwestin”: Ew zemanê te xwestin (5/8)

“Me dgo Gelîyê Zîrne.”: Me digot “Gelîyê Zirne” (25/2)

Di nava peyvê da:

“Em ser dirazahan”: Em (li) ser dirazan. (1/20)

³¹² Peyva “zana” û “zana çêlekê” wekî mînak daye û dibêje ku ji ber ku wate diguhere êdî em nikarin bibêjin alofon. Êdî ew fonem e. Bnr. Muhammed, *Dengnasî di kurdî de*, r. 24, 30, 228.

³¹³ Mahmoud, *Şîrovekirineke Dengsazî û Fonolojî Di Kurdiya Kurmancî de*, r. 99.

“Îsal me bazar nekîrîyâ.”: Îsal me bazar nekiriye. (1/53)

“m ê çine nav reza”: Em dê biçin nav reza (3/8)

“pazde tepsî paqlewe me anîn”: Pazdeh tepsî baqlewe me anîn. (5/12)

“mehke yê qeda û qeza kir.”: meheka wê qediya û qeza kir. (6/1)

Di dawîya peyvê da:

“em dirabûn tiçûne nav rêz dîsa.”: em radibûn diçûn nav rez dîsa. (3/29)

“axir má pez kirî.”: axir me pez kirî. (5/29)

“Pâyizî em bi hev re ştexilîn.”: Payizî em bi hev re ştexilîn. (8/82)

“Beraz keçe miştaxa me dá.”: Beraz ket miştaxeya me. (26/4)

2.2.31. Nedengdêra /^h/yê (ع) (li gor sîstema IPAyê:[?]):

Ev nedengdêr dengê xişikî yê qirikî ya bêlerz (voiced pharyngeal fricative)³¹⁴ e û di devoka Torê da tê bikaranîn. Kurdo ev deng di nava dengdêran da hesibandîye. Lê li gor tesbîten wî jî ev deng di nav peyvê da di gel /a/, /h/ û /e/yê tê. Wekî peyvên behr, jehr, tehl, pan, mar, nal û çav.³¹⁵

Ciwan jî ji bo vî dengî nîşaneyê /^h/yê³¹⁶ bi kar anîye û ev deng wekî /'i/, /'î/, /'u/ /'û/... hwd. nimandiye lê ji bo dengdêrî an nedengdêrîya wî tiştek negotiye.³¹⁷ Di pêşgotina berhema Amêdî da Sadinî rave dike ku ji bo transkrîbekirina vî dengî nîşaneyê /^h/yê danîye³¹⁸ lê heman nîşane ji bo hemzeyê jî bi kar anîye. Amêdî dema dengdêran dijimêre “ع” (eyn) û varyantên wê naxe nav.³¹⁹ Bilekis vî dengî di nav

³¹⁴ Muhammed, *Dengnasî di Kurdî de*, r. 98.

³¹⁵ Kurdo, *Rêzimana Kurdî Kurmancî-Soranî*, (amd. Zülküf Ergün), r. 42.

³¹⁶ Mahmoud ji bo vê nedengdêrê grafîma “ç”yê bi kar anîye û bikaranîna vê grafîmê pêşniyar dike. Lê ji ber ku li bakur di warê dengsaziyê da di xebatan da (Mesela xebata Açar yek ji wan xebatan e. Bnr. Zafer Açar, *Devoka Devera Filistanê*, Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Bîngolê, Bîngol 2015, r. 14.) me bikaranîna /^h/yê dît me xwest ev hevparî xira nebe. Ji bo bikaranîna “ç”ya Mahmoud jî bnr. Mahmoud, *Şîrovekirineke Dengsazî û Fonolojî Di Kurdiya Kurmancî de*, r. 15.

³¹⁷ Ciwan, h.b., r. 55.

³¹⁸ Amêdî. h.b., r. 10.

³¹⁹ Amêdî. h.b., r. 49.

nedengdêran da dijimêre.³²⁰ Dû ra senifandina Dr. Ebdurrehman Hacî Me'rûf dide ku di vir da jî “ع” (eyn) di nav nedengdêran da derbas dibe.³²¹ Senifandina Muhemmed Emîn Hewremanî jî bi wî rengî ye ango “ع” (eyn) di nav konsonantan da daye.³²² Gündoğdu jî di makaleya xwe da ev deng di nav nedengdêran da daye.³²³ Zal dibêje ku hêvî dike ku ev deng di nav perisîna zimanê kurdî da dê di şûnda ji holê rabe.³²⁴

C. Bedirxan ji bo jiholêrabûna “ع” (eyn)ê dibêje ku dengdêra kurt, dirêj dibe. Navborî, ev deng wekî ku /h/yeq lê zêde dibe daye.³²⁵ Ango wekî bilêvkirina “de^çwa”yê ku nêzî şiklê “dehwa”yê bê telefûzkirin. Me jî ji bo vê nuansê “h”yeka biçûk danî kêleka nîşaneyê vî dengî û me ew nuans ango “ع” (eyn)a ku “heta reddeyekê domdar” ku di devokê da tê bikaranîn û mînakî ji tekstên me hene derbarê wê da, wekî “^{ch}” nîşan da. Ev deng ango “ع” (eyn)a ku dibe domdar wekî nimûne di peyva “de^{ch}wa” da derdikeve pêşberê me. Çend nimûne yên ji metnên me yên ku me berhev kirine yên derbarê vî dengî da, li jêr in:

“Tenê ç^{ch}vê wî wilo”: Tenê çavê wî wilo (31/14)

“Wîla ç^{ch}vê mi tarî bûn”: Wele çavên min tarî bûn. (7/92)

“vêca bi ç^{ch}vî”: vêca bi çavekî (14/12)

“Hin çûne ser ca^{ch}dê”: Hin çûn ser cadeyê (8/65)

“Emîno ti da^{ch}wa îmana me l me t^çkê.”: Emîno tu deweya îmana me li me dikî. (14/17)

“ti da^{ch}wa çî l me t^çkê axir.”: tu deweya çî li me dikî axir. (14/19)

³²⁰ Amêdî. h.b., r. 55.

³²¹ Amêdî. h.b., r. 56.

³²² Amêdî. h.b., r. 57.

Ji bo vê senifandina ku me ev deng di nav nedengdêran da daye, piştrasttir bibe hêjayê gotinê ye ku herwiha di cedwela Mahmoud ya ku senifandinên Ewrehman Hacî Marif Xazî Weys û Wurya Emîn dide derbeher da tê dîtîn ku Ewrehman Hacî Marif û Wurya Emîn ev deng di nav nedengdêrên qirikî da daye. Ji bilî wan Mahmoud bixwe jî ev deng di nav nedengdêrên gerûyî (qirikî) da daye. Bnr. Mahmoud, *Şirovekirineke Dengsazî û Fonolojî Di Kurdiya Kurmancî de*, r. 35, 48.

³²³ Bnr. Gündoğdu, h.b., r. 67.

³²⁴ Zal yek ji wan kesan e ku bawer dikin dê ev deng ji nav zimanê kurdî rabe. Bnr. Zal, h.b., r. 100.

³²⁵ Bedirxan û Lescot, h.b., r. 46.

Muhammed ev deng digel “/h/, /v/, /w/ û /y/”yê wekî “nîv-dengdêr” hesibandîye.³²⁶ Ji ber ku ji bo dengdêrîyê lazim e ku hewa li rastî astengîyekê neyê em jî vî dengî wekî nedengdêr diwesfînin. Ev deng di devokê da di serê peyvê da, di nav peyvê da û di dawîya peyvê da tê. Di dawîya peyvê da em tenê li rasta mînakekê hatin: “mowqû^c” ku peyveka erebî ye.

Di serê peyvê da:

“û vêca ^cesirênin bi desta, ^cevciqênin, ^cevciqênin.”: Û vêca (me) bi desta diesirand, dievciqand, dievciqand. (2/11)

“û ^cemela digot.”: û emeleyan digot. (4/8)

“M ^cê çin xwá ^cedilênin.”: Em dê biçin xwe edilînin. (5/14)

“Sê çar meha l ^cerdê ma.”: Sê çar mehan li erdê ma. (6/3)

“Û ^cerebe ser dilê wî re têt.”: Û erebe (bi) ser dilê wî ra tê. (7/4)

Di nava peyvê da:

“Weke go me ^ceşçî werin.”: Weke ku meezçî werin. (6/14)

“Hewarâ: z be ^cecîm”:

“Rabû m Qûr ^can anî.”: Rabû min Quran anî. (9/24)

“Xwedê Te ^cala heqê me nehêlê.”: Xwedayê teala heqê me nehêle. (9/37)

“Na ^cle l ^cderiwê axir.”: Lenet li derewê axir. (14/44)

Di dawîya peyvê da:

“ew mowqû^c navê wî Xanoq bû.”: Ew mewqî navê wî Xanoq bû. (22/12)

³²⁶ Muhammed, *Dengnasî di Kurdî de*, r. 98.

2.2.31.1. Nedengdêra [ʔ]³²⁷yê (hemze)

“Ev nedengdêr dengêkî qiriqî”³²⁸ ye. Di lîteratûrê da jê ra “glottal catch, stop” tê gotin. Ev deng bi girtina zengelorê derdikeve ku di pêkhatina wî da deng ji nişka ve tê berdan. Mahmoud ji bo vî dengî “zengelorkî, dengejêyî/qirikî”³²⁹ dibêje û ew wekî “fonema bînîşane” dide.³³⁰ Di dawîya kîteyê da tê ku me di nav tekstên xwe da di du bikaranînan da mînakên vî dengî dîtin:

1. Di bersivdayîna neyênî da:

“Na’, na^{le} l deriwê.”: Na, lanet li derewê (be). (7/21)

“Na’, yek mayá.”: Na, yek mayê. (8/62)

“Na’! Xirbêmercîya.”: Na! Xirbêmerciya. (12/59)

2. Di vegotinê da wekî taybetîyeka vegotinê bi rêya bikaranîna şexsî: Di tekstan da tenê di metnên Hecî Biraîm da ev mînak hebû ku di dawîya serpehatîyên xwe da bi kar dianî. Dema ku digot: “Erê: herê’ ” wekî ku diket nav xeyalan û bi carekê ji xeyalê şiyar dibû.

“Erê: herê’.”: Erê, erê. (18/42)

“Erê: herê’!”: Erê, erê. (21/47)

“Á! Erê: herê’!”: Erê, Erê, erê! (19/54)

2.2.32. Diftongên devoka Torê

Ji cotdengên ku di heman kîteyê da tên ra diftong (diphthong) tê gotin.³³¹

Diftong ew deng e ku ji çend dengên hevedudanî pêk hatiye. Di kurdî de pevdengek tenê heye. Ew jî “xw” ye.³³² Lê bereksê agahîya ku hat gotin ku di kurdî

³²⁷ Mahmoud ev deng li dû dengê /h/yê daye. Bnr. Mahmoud, *Şirovekirineke Dengsazî û Fonolojî di Kurdiya Kurmancî de*, r. 48.

³²⁸ Mahmoud, *Şirovekirineke Dengsazî û Fonolojî di Kurdiya Kurmancî de*, r. 38.

³²⁹ Mahmoud, *Şirovekirineke Dengsazî û Fonolojî di Kurdiya Kurmancî de*, r. 39.

³³⁰ Mahmoud, *Şirovekirineke Dengsazî û Fonolojî di Kurdiya Kurmancî de*, r. 55.

³³¹ Bnr. Muhammed, *Dengnasî di kurdî de*, r. 316.

da pevdengek tenê heye, li gor metnên me li herêma Torê sê diftongên (pevdeng) din jî hene: gw, kw û qw.

2.2.32.1.Gw

Di serê peyvê da* :

“Me ê gwîza çêtkir.”: Me gûz çêdikirin. (1/47)

“û má gwêh dayê dá.”: û me guh dayê. (6/3)

“zahf gwih dayiyê.”: zahf guh dayiyê. (6/19)

“Harin ez ê gwihdarê va ra bim.”: Herin, ez dê guhdarê van deran bim. (7/32)

“Xezûrê yê çûbû gwind.”: Xezûrê wê çûbû gund. (8/7)

2.2.32.2.Kw

Di serê peyvê da** :

“Me kwindirê mîranî tçandin.”: Me kundirê mîranî diçandin. (2/3)

“Kûrik kwişt.”: Kurik kuşt. (11/15)

2.2.32.3.Qw

“devê m qwil nebû” < devê min qul nebû (8/14)

2.2.32.4.Xw

Di serê peyvê da:

“em î avîya xweş kîn.”: Me avî xweş dikirin. (2/3)

“El hemdê Xwedê re şikir.”: El hemdê Xwedê ra şikir. (3/69)

³³² Samî Tan, *Rêzimana Kurmancî*, r. 37.; Kamuran Bedir Xan jî ev agahî daye. Bnr. Kamuran Bedir Xan, h.b., r. 11.

* Ev pevdeng di devoka Torê da tenê di serê peyvê da tê.

** Ev pevdeng di devoka Torê da tenê di serê peyvê da tê.

“Xweha min á di rê de yá”: Xweha min di rê da ye (4/2)

“fetħa xwe xwendin”: fatiheya xwe xwendin (4/35)

“Xwedîyê malê”: Xwedîyê malê (11/34)

“Xwelî avêtiyê dá.”: Xwelî avêtiyê (11/44)

Di nava peyvê da:

Dijî her du diftongên li jor bi saya qertafên demê (di-,bi-), bi pêşgira neyînîyê(ne-) û kelijîna daçek û cînava vegerok (jixwe) di nav peyvê da dikare bê.

“Me dih zilam dixwestin”: Me deh zilam dixwestin. (1/29)

“me go daqena bixwin.”: me got daqena bixwin. (5/18)

“Á nexweş bû.”: Nexweş bû. (7/34)

“Şixwe e nedîtim.”: Ji xwe ez nedîtim. (8/75)

“û me txwarin.”: û me dixwarin. (2/18)

Di dawîya peyvê da:

Di dawîya peyvê da nayê bikaranîn.

3. BEŞA SÊYEM

BÛYERÊN DENGAN (PHONETIC PROCEDURES) DÎ DEVOKA TORÊ DA

Bûyerên dengan bi meylekê ve têkildar in ango ev meyl bandorê li ser pêkhatina bûyerên dengan dike ku kêr zêde ev meyl di hemû zimanan da heye. Ew jî wekî “qanûna hewla herî hindik” (least effort) tê zanîn.³³³ Jixwe berî her tiştî di ziman da ev zagon serdest e.³³⁴ Yanê ziman di proseya xebata xwe da dixwaze bi eforserfkirineka herî kêr fonksiyona xwe pêk bîne. Ev meyl dibe sedema gelek bûyerên dengan.

Ji ber ku ziman wekî jîndar tê binavkirin helbet ev jîndarî bi xwe ra guherîn û pêşveçûnê jî tine. Di nav demê da bi peydabûna hin zerûriyetan di peyvên ziman da guherîn, ketin, lêzêdebûn, kelijîn û bûyerên din ji ber sedemên ku mirov dikare û yê ku nikare şîrove bike, diqewimin. Hin ji wan bûyeran di demên kurttir da rû dane lê hinan jî di demên dirêj da hêdî hêdî cihê xwe di nav rêzikên ziman da girtiye.

Ji ber ku zimanê nivîsê êdî bi rêzikan tesbîtkirî ye, ev guherîn jîndarîya xwe bi qasî zimanê axaftinê nikarin bidomînin. Berevajê wê, zimanên axaftinê tim dînamîk in û diguherin. Bûyerên dengan di nav proseya bikaranîna axêverên herêmê da aktîftir in. Lewma jî devok di nav xwe da taybetiyên ji hev cûda dihewînin û bikaranîneka devokekê li devoka din dibe ku bi heman şiklî xuya neke. Ev jî ji aliyê dînamîzmê ve avantajeka devokan e; lewre ji ber ku sedemeka wekî nivîsê wê sînardar nake û hewl nade ku wê nêzî xwe bike û bişibîne xwe.

Malmîsanij guherînên dengan di bin sê sernavan da dabeş kirine:

1. Pevguherînên dengan
2. Guherînên dengan

³³³ Farqînî, “Di kurmancî de pevguherîna dengan”, r. 58.

³³⁴ Banguoğlu frensîya vê rêzika ku li jor derbas bû bi kar tine: “loi de moindre effort”. Bnr. Banguoğlu, h.b., r. 23.

3. Ketin û lêzêdebûnên dengan³³⁵

Bûyerên dengan yên ku di devoka Torê da pêk tên di vê xebatê da dê wiha bèn dayîn:

1. Guherînên dengan
2. Ketinên dengan
3. Lêzêdebûnên dengan
4. Dengdêrbûn
5. Kewiyana nedengdêran
6. Dengên kelijandinê
7. Cêwîbûn
8. Cihguherîna dengan
9. Pevbestin
10. Lêkdana dengdêran

3.1. Guherînên dengan

Wekî ku li jor hat behskirin ji ber ku jîndar e di ziman da guherîn çêdibin. Ev guherîn wekî esas bi du şiklan rû didin: Asîmîlasyon û dîsîmîlasyon.

Şibînî (assimilation):

Yule ji bo sedema pêkhatina vê bûyerê dibêje ku: “Dengên ku hin taybetmendiyên wan yên hevpar hene, bi giştî meyla wan heye ku ji aliyê dengnasîyê ve bi hin awayan wek hev tev bigerin.”³³⁶ Asîmîlasyon nêzîkbûna dengan ya bi bal

³³⁵ M. Malmîsanij, *Kürtçede Ses Değişimi*, Vate, İstanbul 2013, r. 11.

³³⁶ Yule, h.b., r. 64.

hev ve ye. Ev nêzîkahî, ya ji alîyê cîderk an awayê derketina dangan ve ye.³³⁷ Bi gotineka din ji alîyê cîderk an teşeyê ve şîbîna dengekî bi yekî din e.³³⁸ Di asîmîlasyonê dibe ku ev yekeyên dangan ên ku dişîbin hev bi hev ve bin an nêzî hev bin.³³⁹ Bi giştî behsa çar cûreyên asîmîlasyonê tê kirin ku di devoka Torê da jî rû didin:

- Asîmîlasyona tam (totale assimilation) : Şîbîna dengekî bi dengekî din e.

“j *livîna*” < ji *nivînan* (9/32)

- Asîmîlasyona parçeyî/nîv (partial assimilation): Ji alîyê cîderkê ve şîbîna dengekî li yê din e:

“z*embîl* hebûn” < z*enbîl* hebûn (12/35)

- Asîmîlasyona berepêşkî (progressive assimilation): Nêzîkbûna li hev ya dengên ku di yekeya zimanekî da ne. Ev nêzîkbûn ji alîyê cîderk û çawanîya vegotinê ve ye û dengê paşê diguhere, dişibe yê ku berî wî hatiye:

“d*îse*”: d*îsa* (3/40), “h*emmi*”: h*emû* (6/10)

- Asîmîlasyona berepaşkî (regressive assimilation): Nêzîkbûna li hev ya dangan e ku di yekeya zimanekî da ne. Ev nêzîkbûn ji alîyê cîderk û çawanîya vegotinê ve ye û dengê berê diguhere, dişibe yê ku dû ra tê:

“r*îsî*”: r*êsi* (1/17)

Neşîbîni/Vajîyê asîmîlasyonê (dissimilation):

Her çiqas meyla ziman li ser qanûna “hewla herî hindik” (least effort) be jî ev bûyer li dijî vê qanûnê ye ango meyla ‘hewla mezintir’ dike. Di vê bûyerê da dengên ku wekî hev in ji hev dûr dibin û yek ji wan diguhere, dibe dengekî din.³⁴⁰ Ji alîyê

³³⁷ Karaağaç, h.b., r. 190.

³³⁸ Zana Farqînî, “Cihguherîna dangan û ketina kîteyan”, *Zend*, h. 20, İstanbul 2013, r. 47-49.

³³⁹ Perrot, h.b., r. 51.

³⁴⁰ Bnr. Farqînî, “Cihguherîna dangan û ketina kîteyan”, r. 49.

cîderk yan awayê derketinê ve jihevduûrbûna dengên ku di yekeyeka ziman de ne, dibe dîsîmîlasyon.³⁴¹ Wekî mînak:

“Maleva, Hecî ‘Elî!’ < Mal *ava*, Hecî Elî! (14/26)

Ahanov jî dema asîmîlasyonê digel dîsîmîlasyonê dide, balê dikişîne ser taybetîya yekîneya dengan ku axleb ne bi tena serê xwe, bereks di nav peyvê da tèn bikaranîn û dema tèn bilêvkirin jî yekîneyek li yekîneyeka din tesîr dike. Ew tesîr jî xwe wekî hevşibîn (assimilation) û dijraberi/neşibînîyê (dissimilation) dide xuyakirin.³⁴²

Perrot jî dema vê bûyerê dide, wê bi alîkariya dîsîmîlasyonê rave dike. Dibêje ku takedengên bi hev ve an jî nêzî hev, bi bandora bilêvkirina yekî li ser yeka din, taybetîyên hevpar digirin ser xwe. Ev dibe dîsîmîlasyon. Berevajîya wê jî dibe asîmîlasyon. Peyva ‘corridor’ê wekî mînak dide ku di axaftinê da gelek caran wekî ‘colidor’ê tê bilêvkirin.³⁴³

Eger ev dîsîmîlasyon berepaşî be jê ra “regressive dissimilation” tê gotin ango “neşibîna berepaşî”. Eger ev jihevduûrbûn berepêşî be, îcar ev neşibînî dibe “progressive dissimilation”³⁴⁴ (dîsîmîlasyona perezêşî).

Çi asîmîlasyon û çi jî dîsîmîlasyon bin, guherînên dengan li gor dengdêrî û nedengdêrîya dengê ku guherîye dê di bin du binbeşan da bèn dabeşkirin:

3.1.1. Guherîna dengan³⁴⁵ di dengdêran da:

Guherîna dengdêran xwe wiha dide nîşandan:

- Bi tengbûna dengdêrê (breaking): Wekî guherîna a>e, o>u, e>i.
- Bi dûzbûna dengdêrê (vowel undrounding): wekî guherîna o, u, û>a, e, i, î, ê

³⁴¹ Karaağaç, h.b., r. 165.

³⁴² Ahanov, h.b., r. 240.

³⁴³ Perrot, h.b., r. 51.

³⁴⁴ Ji bo vê termê bnr. Karaağaç, h.b., r. 489.

³⁴⁵ Torî ji bo guherînê gotiye “bişavî”. Bnr. Torî, h.b., r. 8.

• Bi ferehbûna dengdêrê (videning): wekî guherîna i, î, u, û>a, e, ê, o

• Bi kurtbûna dengdêrê (shortening): Ev kurtbûn, kurtbuna dema derketina dengdêrekî ye.³⁴⁶ Wekî guherîna î>i

Niha jî ev guherînên (asîmîlasyon û dîsîmîlasyon) ku di devoka Torê da di axaftinê da xuya dikin li gor rêza alfabeyê digel mînakên dê bên dayîn:

3.1.1.1. Guherîna a>e

Guherîna /a/yê bi /e/yê ye. Di devoka Torê da ev guherîn xwe wekî asîmîlasyon (wekî peyva ‘werhesil’ê) û dîsîmîlasyonê (wekî peyva ‘maleva’yê) dide nîşandan. Di mînakên jêrîn da ev guherîn wekî asîmîlasyonê pêk hatine.

“werhesilî kelam” < welhasilî kelam (25/23)

“Vêce” < Vêca (25/8)

“Û dîse me dabû” < Û dîsa me dabû (8/71)

“Me hemî gêre tkirin, eyrî eyrî.” < Me hemû gêre dikirin, **ayrî ayrî** (1/26)

“fetha xwe xwendin” < fatiheyê xwe xwendin (4/35)

“we^la te^la bi^leh” < wellah, tellah, bîllah (8/32)

• Di mînaka jêrîn da ev guherîn wekî dîsîmîlasyonê pêk hatiye.

“Maleva, Hecî ‘Elî!” < Mal **ava**, Hecî Elî! (14/26)

• Carinan bi wekhevkirinê (anology) ³⁴⁷ dengê /e/yê dengdêra berî xwe diguherîne dike wekî xwe.

“Yabo v se^eetkê em e l vir in.” < Bavo ev **saetekê** (ye) em li vir in. (7/28)

³⁴⁶ Karaağaç, h.b., r. 686.

³⁴⁷ Ji bo kurmancîya bakur tesbîta Muhammed e. bnr. Muhammed, *Dengnasî di kurdî de*, r. 259.

3.1.1.2. Guherîna a>ah/eh

/a/, dikare bipijike³⁴⁸ û bi “ah/eh”ê biguhere:

“*Kahrikê wî gurandî:n*” < *karikê wî gurandin* (7/40)

3.1.1.3. Guherîna a>ê:

Di tewandina peyva nêr da ev guherîn pêk tê.

“*Sîleḥ berda mêr*” < *Sîleḥ berda mar* (11/10)

“*Em î bê em ê bine êş.*”: Me digot em dê bibin aş. (1/39)

3.1.1.4. Guherîna a>i

Di mînaka li jêr da peyva erebî ku “sa^cet” e pêşî diguhere dibe “se^cet” dûra jî dibe “sehet” û “sihet”.

“*Sê siḥeta, çar siḥeta bêreh dimam*” < *Sê saetan çar saetan bêreh dimam* (8/88)

“*çawûş û cindirme w ew hatin*” < *Çawîş û jandarma ew hatin* (18/20)

3.1.1.5. Guherîna e>a

“*go eşhedû e la îlahā îlella:*” < got: *Eşhedu en la îlahē illellah* (7/5)

“*ahlê me tev hat*” < *ehlê me tev hat* (5/41)

“*miḥala banî qompîle hatîbûn*” < *mehelleya banî qompîle hatîbû.* (6/22)

“*rojê di tenekā.*” < *rojê du teneke* (12/28)

• Navê jinan en ku di erebî da bi /e/yê qediyane di devokê da axleb dibin /a/:

“*Ḥacî “Zekîya em ê gurêni:n*” < *Hecî Zekîyye em dê bigurînin.* (25/5)

³⁴⁸ Ji bo vê bûyera dengî ev peyv ji aliyê Muhammed ve hatîbû bikaranîn. Bnr. Muhammed, *Dengnasî di Kurdî de*, r. 258.

“Edûla hare bêje wa” < Edûle here bibêje wan (5/2)

“Herbîya têne vir.” < Herbîye tên vir. (9/11)

• Di peyvên ji erebî wergirtî da dema piştî /^c/ (eyn)ê /e/ tê ev deng carinan dibe /a/:

“Em ê daweta xwe kin.” < Em dê de^cweta xwe bikin. (5/28)

3.1.1.6. Guherîna e>á

• Cînavka vegerok di devokê da axleb /e/ya xwe diguherîne:

“şivista xwá” < şivista xwe (1/2)

“ayê berdine beroşa xwá” < avê berdin beroşa xwe (3/33)

• Di cînavkên kesane yên tewandî da (te, me) axleb diguhere.

“Te wilo, te ewkê tá” < Te wilo, te, ewkê te (15/9)

“xeswa tá” < xesûya te (6/9)

“Má aşêf tîkir.” < Me aşêf dikir. (1/1)

“palekî má” < paleyekî me (27/8)

• Di daçeka “ve” da axleb diguhere.

“cîran haţinâ b me vâ.” < cîran hatin bi me ve (25/18)

• Di qertafa dema borîya domdar da axleb diguhere:

“Te dîyá?” < Te dîtiye? (21/10)

“Ya Rayfê jî me nedayá.” < Ya Rayifeyê jî me nedaye. (8/51)

“we mezin kirîyá.” < we mezin kiriye. (29/35)

- Di raweya fermanî da /e/ya dawîya lêkerê axleb diguhere:

“Erê, emîn **bá!**” < Erê, emîn bibe. (19/15)

“I gundê xwá **bá.**” < li gundê xwe be. (20/7)

- Lêkera bûnê /kopûla axleb diguhere vî dengî:

“I hespê xwe swar **á.**” < li hespê xwe siwar e. (18/15)

“p̄ p̄enc milyona **yá.**” < bi p̄enc milyonan e. (1/52)

“Kurikekî halumeselê yî ev **á**” < Kurikekî halûmeseleya wî ev e. (30/17)

3.1.1.7. Guherîna e>ê

- Di girtina qertafa “+yê”yê da /e/ya dewîya peyvê dikeve û /ê/ya qertafê dikeve şûna vî dengî.

“Evdilê Şawîş” < Evdileyê Şawîş (22/27)

“Û mi d derencê rá mi d bire banî.” < Û min di derenceyê ra dibir banî. (22/18)

“Perê mi” < Peryê min jî (18/38)

- Di kêşana dema niha de /e/ya dawîya lêkerê axleb dibe /ê/. Ev rewş di ketina qertafê da û di neyînîya dema niha da jî rû dide:

“Îlleh kurik li gun namênê” < Îlleh kurik li gund namîne (21/16)

“xwaka xwá ji mêrik distênê” < xwehka xwe ji mêrik distîne. (11/54)

“txwênê w.” < dixwîne û (21/40)

- Di raweya fermanî da /e/ya dawîya lêkerê axleb diguhere:

“da sar bibê” < da sar bibe. (3/33)

“Nikarîbû qevzkê bavêjê.” < Nikarîbû qevzekê biavêje. (6/21)

“rihê min û îmana mi bê” < rihê min û îmana min (bi)be (9/27)

• Di peyvên ji erebî wergirtî da /e/+y/ carinan dibe ê:

“^cesker wilo kêfa xwe jê r̄ tanî.” < esker wilo kêyfa xwe jê ra dianî. (20/33)

• Di tewanga navdêrên nêr da diguhere:

“Tavêjê çêm.” < Diavêje çem (29/11)

“pişta dêrî” < pişta derî (5/32)

“Pi şêv û bi r̄o” < bi şev û bi roj (26/23)

3.1.1.8. Guherîna e>i

“Hatne wê dîrkê ev çend şala.” < Hatine wê derkê ev çand salan. (21/20)

“Birine ^cIntabê.” < Birine Entabê (27/31)

“Çar mîhê wî qedan” < Çar mehên wî qediyan. (6/17)

“ji wê dirêm mala xwá bir” < ji wê derê me mala xwe bir (20/22)

“dîştê xwá” < dêstên xwe (19/16)

“tîşî ka w ce tkê” < tîje ka û ce dîke (30/36)

“Me dîh zilam dîxwestin.” < Me dêh zilam dîxwestin. (1/29)

• Di peyvên ji erebî wergirtî da axleb ev guherîn çêdibe:

“aşêf xîlas dibû” < aşêf xêlas dibû (1/4)

“şîrîkê hev bûn.” < şerîkê hev bûn. (18/16)

“hatne ba Hîzret.” < hatin bal Hezret (28/5)

• Dengdêra paşqertafa “+ek/+yek”ê axleb diguhere:

“Me kuharkîk tişî tîkir.” < Me kuharkek tije dikir. (1/49)

“Kûro çî tişîk nabê” < Kuro çî tiştek nabe. (22/40)

“heke şalîk heke çîqa” < heke salek heke çîqas (11/6)

• Di pevbestinê da carinan /e/ya cînavka kesane ya kesê yekemînê yekjimar diguhere:

“rabûm şibeyîz hatme mala we.” < rabûm sibey ez hatim mala xwe. (8/21)

3.1.1.9. Guherîna e>î

“xwarinê txîyê” < (30/31)

“dixîyê” < dixê wê (29/10)

3.1.1.10. Guherîna e>u

Di peyvekê tenê da hat dîtin:

“Wilo xwuh uw biratî” < Wilo xweh û biratî (10/45)

3.1.1.11. Guherîna ê>î

“taxekê Îzîdîya hebû.” < taxeka Êzîdîyan hebû (26/10)

• Peyvên wekî “dê, pê, rê” eger piştî xwe nîvdengdêra /y/yê bigirin ev guherîn pêk tê.

“Newêrabû pîyê xwe bavêjê.” < newêrabû pêyê xwe biavêje. (6/23)

“b vê rîyê de neçe” < bi vê rêyê da neçe (1/51)

“Em çûn û dîya yê kire pîpîpî.” < Em çûn û dêya wê kir pitepit. (8/43)

“Hêdîka dîya wê efû dikê.” < Hêdîka dêya wê wê efû dike. (31/29)

“daniye serê sê rîya” < daniye serê sê rêyan (30/47)

“Lawo *dî*ya we me” < Lawo *dê*ya we me (29/31)

3.1.1.12. Guherîna *i>e*

“wextê go *ti*reh dige*ha*.” < wextê ku *ti*rî dig*h*aşt (12/5)

“d nav *ce*ha de *ma*” < di nav *ci*han da ma (9/5)

3.1.1.13. Guherîna *i>î*

• Di devokê da wekî taybetîyeka vegotinê ne bi awayekî mayînde li ser peyvê, lê bi awayekî demkî di axaftinê da di lêkera kişandî da /i/ya kîteya dawî carinan diguhere dibe /î/ û ev deng ji /î/yên din dirêjtir tê bikaranîn.

“Me gêre *tkî*:r” < Me gêre di*ki*r (1/11)

“Em *î* ç*î*:n” < Em diçûn (1/17)

“em *î* ênin derxine derva rax*î*:n” < me dianî derdixist derva, radixist. (1/39)

“me bîber *ti*kesirand*î*:n.” < me bîber dikesirand*in*. (1/55)

“Em *î* wê ayê parzin*î*:n.” < Me ew av diparzinand. (3/64)

“Me rabû kara xwe *kî*:r” < Em rabûn me kara xwe *ki*r (4/25)

“yê çî zêra *j* me xwaz*î*:n.” < dê çî zêran ji me bixwaz*in*. (4/27)

• Peyva “dîn”a di kurmancîya nivîskî da, di devoka Torê da dibe “dî” yanê /i/ diguhere dibe /î/.

“l vîyê *dî* pirsî” < li vîyê *dîn* pirsî (11/19)

“Carke *dî* ez çûm.” < Careka *dîn* ez çûm (14/15)

“Tişkî te yî *dî* ma kurê *m*?” < Tişteki te yê *dîn* ma kurê min? (25/23)

“yêke *dî*yá.” < yeka *dîn* e. (31/1)

3.1.1.14. Guherîna i>ê

Ev guherîn di peyvekê da hat dîtin: çêle

“çêle xilas...” < çîle xelas... (1/1)

“çêle yá” < çîle ye (8/18)

3.1.1.15. Guherîna i>u/û

Ev guherîn di devokê da di lêkera “xwarin”ê da tê dîtin:

“xun li wê rê.” < dixwin li wê derê. (9/15)

“şîva xwe çêkin û xun” < şîva xwe çêkin û bixwin (3/42)

“em ê tîrhê xwe jî xun.” < Em dê tirîyê xwe jî bixwin (7/29)

3.1.1.16. Guherîna î>e

Di metnan da di sê peyvên da ev guherîn hat dîtin: geya, tîreh û eyd.

“da: m gelik geyayî biçinin.” < da em gelek giyayî biçinin. (1/19)

“me tîrehê xwá şanî” < me tirîyê xwe dianî. (1/61)

“Mi go z ê çimá eyda xwá” < Min got ez dê biçim îda xwe (18/25)

3.1.1.17. Guherîna î>ê

• Di lêkerên ku di dema borî da “-andin”ê digirin da di dem û raweyên din da /î/ya ku di kurmancîya nivîskî da heye, di devokê da dibe /ê/.

“Şevêkê bere m bi ezimênin.” < Şevêkê bila min biezimînin. (30/27)

“M ê çin xwá edilênin” < Em dê biçin xwe biedilînin (5/14)

“xwaka xwá ji mêrik distêne” < xwehka xwe ji mêrik distîne (11/54)

• Di lêkerên ku ji bilî dema borî di hemû dem û raweyan da dema tê kişandin “-în”ê digirin da jî ev guherîna ku di rewşa li jor da derbas bû, pêk tê.

“heta ti wê neyênê ti wê nabê.” < heta tu wê neyînî tu wê nabî (8/31)

“Illeh kûrik li gunamênê, illeh...” < Îlleh kurik li gund namîne, illeh... (21/16)

“Qur’ana wî d destê wî de ye txwênê” < Qurana wî di destê wî da ye dixwêne (21/40)

• Eger lêker bi qertafa “bi-”yê ra ya ku qertafa demê/ raweyê ye hatibe bikaranîn û li gor kesê duyem yê yekjimar hatibe serfkirin, wê demê /î/ya dawî diguhere, dibe /ê/. Di rewşa neyînîyê da jî heman rewş pêk tê.

“Ma t ê çê kû?” < Ma tu dê biçî ku? (21/24)

“Tê çi kê?” < Tu dê çi bikî? (25/15)

“ti l ba mi bimênê: t kûrê min î” < tu li bal min bimînî tu kûrê min î (30/21)

3.1.1.18. Guherîna î>i

“cîhê simika wî” < cîyê simika wî (26/5)

• Peyva ku bi /î/yê qediyaye eger /y/ya kelijandinê bigire ev dengdêr carinan kurt dibe û bi /i/yê diguhere.

“şayê mara t serê kanîya me de yá,” < şahê mara di serê kanîya me deye, (30/5)

• Di peyvên esilerebî da axleb ev guherîn xuya dibe.

“Illeh kûrik li gunamênê, illeh...” < Illa* kurik li gund namîne illa (21/16)

“Bilalo û dîya xwá” < Bîlalo û dêya xwe (8/72)

“wela tela bîleh, ez nayênim.” < welah tellah bîllah ez nayînim. (8/32)

* Ev peyv ji erebî hatiye wergirtin û di eslê xwe da “illa”ye.

“bismîllahîrrehmanîrrehîm” < bîsmîllahîrrehmanîrrehîm. (28/24)

3.1.1.19. Guherîna î>u

“em tiçûne mewuja” < em diçûn mewîjan (12/51)

“p kû de çû, p kuja bajarî?” < bi kû de çû, bi kîjan bajarî? (11/14)

3.1.1.20. Guherîna î>û

Di peyveka esilerebî da hat dîtin. Di erebî da “mewlîd”e lê dema hatiye wergirtin guherandin pêk hatiye.

“mewlûdeka me heya” < mewlîdeka me heye. (7/9)

3.1.1.21. Guherîna î>y

Ji ber ku /y/ nîvdengdêr e, /î/ya serê peyvê carinan diguhere dibe /y/. Di vê rewşê da berî /y/yê pevbestinek pêk tê.

“bavê wê û yşela” < bavê wê û îşela (5/25)

“Diçê u yca” < Diçe û îcar (31/10)

3.1.1.22. Guherîna u>i

• Di devoka Torê da cînavka kesane ya xwerû ya kêşê duyem yê yekjimar (tu) tim* diguhere û dibe “ti”. Ev yek ji bo “tu”ya wekî ya di bikaranîna “tu caran” de jî derbasdar e:

“Go keça m tî dibê çî?” < Got: Keça min tu dibêjî çî? (4/23)

“Ê de tî zanê.” < Tu dizanî. (7/18)

“p Xwedê tî kesî xwîya nekîr” < bi Xwedê tu kesî xuya nekîr (22/38)

* Di devoka Torê da tenê di i rewşekê da wekî “tû”yê tê bikaranîn. Ev cînavk eger bi lêkera bûnê û di dema niha da li gor kesê duyem bê bikaranîn di devoka Torê da wekî “tû”yê tê û wê demê dengdêra vê cînavkê dirêj e. Mînak: Ê kû şikand tû yî. < Yê ku şikand tu yî.

- Di devoka Torê da peyva “du”yê eger hevalnav be tim wekî “di” tê bikaranîn.

“sê bar, *di* bar, me *d*^cesirandin” < sê bar *du* bar me diesirandin (2/13)

“*Di* bar bacan” < *du* bar bacan (2/13)

- C. Bedirxan dibêje ku “ber”ên (damme) erebî yên hin peyvan bi /i/yê tên bikaranîn û vê yekê wekî şaşîyek dibîne.³⁴⁹ Lê di devoka Torê da ev guherîn pêk tê.³⁵⁰

“Hemoyê *Miradê* Sofî” < Hemoyê *Muradê* Sofî (26/8)

“Zarok jî bîra *dînyayê* dibin.” < Zarok jî bîra *dunyahayê* dibin (29/30)

- Di peyvên ji erebî wergirtî da guherîn pêk tê:

“Baş *elhemdîla*.” < Baş e *elhemdulîllah*. (21/24)

“Bêhna *Hişeynîya* têt.” < Bêhna *Huseynîyan* têt. (31/30)

“Navê wî *Mîhemmed* Yeman *á*” < Navê wî *Muhammed* Yeman e. (29/24)

3.1.1.23. Guherîna u>û

- “ku”ya cînavka pirsê, di devoka Torê da her car wekî “kû”yê tê bikaranîn:

“pên *sed î l kû* yá?” < pênc sed li *ku* ye? (8/69)

“Ma *tê çê kû*?” < Ma tu dê biçî *ku*? (21/24)

“Ma *v birayê me p kû* de çû?” < Ma ev birayê min bi *ku* da çû? (11/18)

- Peyva hejmarê “du” eger bi peyva “her”ê ra bê bikaranîn, /u/ya wê dirêj dibe:

“Sî^cîd û Emîn her *dû*.” < Seîd û Emîn her *du*. (22/77)

³⁴⁹ Bedirxan û Lescot, h.b., r. 23.

³⁵⁰ Aktuğ bal kişandiye ser taybetîyeka zimanên hindo ewropî ku di zimanên vê malbatê da /e/, /i/, /u/ û /î / di şûna hev da tên bikaranîn. Bnr. Aktuğ, h.b., r. 26.

“Derwêş her *dû* jî gurandin” < Derwêş her *du* jî gurandin (25/21)

3.1.1.24. Guherîna u>wi/wî

Ev guherîn dibe cûreyeka zodengîbûn (diphthongization)ê. Dîftongîzasyon ew e ku dengdêrek cihê xwe dide du dengdêran. Li vir divê bê zanîn ku /w/ jî wekî nîvdengdêr tê hesibandin.

“zahf *gwi*h dayiyê” < Zahf *guh* dayiyê. (6/19)

“qetîtkâ *kw*indir.” < qetitka kundir (1/52)

“p Xwedê ti kesî *xwi*ya nekîr” < bi Xwedê tu kesî *xu*ya nekîr (22/38)

3.1.1.25. Guherîna û>i

“Me hema *hemî* tkîr.” < Me hema hemû dikir. (1/64)

“Me *hemî* gêre tkîrin” < Me hemû gêre dikirin (1/26)

“Me genim dişîşt.” < Me genim dişûşt. (1/13)

• Cînavka kesane ya xwerû ya kesê yekem ya pirjimar (hûn) di devoka Torê da dibe “win”^{*}.

“Wextê *wîn* pêşî mi nekujin” < Wextê *hûn* pêşî min nekujin (31/34)

“*Wîn* ji kû hatîna” < *Hûn* ji ku hatine (29/29)

“Wê xelayê ş xwe *wîn* nînin.” < Di wê xelayê da jixwe *hûn* nînin. (14/1)

• Wekî ku C. Bedirxan dibêje, ev dengdêr eger îcab bike ku dengê kelijandinê bigire dê ji wan dangan dengê /w/yê bigire û dengê /û/yê dê biguhere bibe /i/.³⁵¹ Di devoka Torê da jî mînakên vê rewşê hene:

“halo *biye* w halo biye” < halo bûye û halo *bûye* (11/50)

^{*} Carinan jî dibe “wun”.

³⁵¹ Bedirxan û Lescot, h.b., r. 26.

“*diwazdeh mirîşk û dîkîk*” < *duwazdeh mirîşk û dîkek* (6/8)

“ketne *hindirîwê* me dá” < ketin *hundiruyê* me (9/31)

• Hin peyvên esilerebî di nava xwe da dengê /û/yê dihewînin. Di van peyvên wergirtî da carinan ev deng diguhere dibe /i/:

“*rîhê* min û îmana mi” < *rûhê* min û îmana min (9/27)

3.1.1.26. Guherîna û>î

“hestîkê wilo” < hestûkê wilo (25/8)

3.1.1.27. Guherîna û>u

• Carinan lêkera çûnê di axaftinê da dengdêra xwe kurt dîke. Di vê rewşê da yan berî wê pevbestin (liaison)* çêbûye yan jî piştî xwe nîvdengdêra /y/yê girtiye:

“E çume mala wa” < Ez çûm mala wan (4/22)

“Te çuye jina xwe...” < Te çûye jina xwe... (31/42)

• Cînavka kesane ya xwerû ya kesê yekem ya pirjimar (hûn), di devoka Torê da axleb dibe “win”. Lê carinan jî dengê /û/yê kurt dibe, peyv dibe “wun”:

“Wun çime halo” < Hûn çima halo (5/18)

“Z nahêlim wun herin.” < Ez nahêlim hûn herin. (18/37)

“Me meyza wun zarok in.” < Me meyizand hûn zarok in. (29/35)

• Gihaneka “û”yê dema piştî xwe /y/ya kelijandinê digire kurt dibe, dibe /u/:

“Diçê u yca” < Diçe û îcar (31/10)

• Gihaneka “û”yê dema peyveka qalibgirtî çêdike kurt dibe:

* Ev peyv ji bo terma “ulama”ya tirkî hatiye bikaranîn. Ji bo vê termê di îngilîzî da “connection” jî tê bikaranîn. Ev peyv (pevbestin) û îngilîzîya wê (liaison) di xebatê da bi giştî hatin bikaranîn.

“Kurikekî halumeselê yî ev á” < Kurikekî hal û meseleyê wî ev e. (30/17)

• Ji ber ku cihê cîderkên wan nêzî hev in dengê /w/yê dema piştî /û/ yê bê, wê kurt dibe û ev dengdêr dibe /u/.³⁵² Di devoka Torê da jî ev taybetî tê dîtin. Dibe ku jî bo hêsankirina bilêvkirinê ev bûyer diqewime:

“Çi neuwe?” < Çi nebûye? (9/33)

“Dinya deyn ketne stuwê mi dá” < Dinyayek deyn ketin stûyê min (9/39)

3.1.1.28. Guherîna û>w/uw

“xeswa tá” < xesûya te (6/9)

“Dinya deyn ketne stuwê mi dá” < Dinyayek deyn ketin stûyê min (9/39)

• Carinan gihaneka “û”yê bi /w/yê diguhere, carinan jî dibe “uw”:

“Neqeba Difnê w Şifêrê de bû.” < Di neqeba Difnê û Şifêrê da bû. (22/13)

“mi jê rá serî anî w” < min jê r serî anî û (6/3)

“dane wa w di roja lê dan.” < dan wan û du rojan lê dan. (5/42)

“Wilo xwuh uw biraî” < xweh û biraî (10/45)

3.1.1.29. Guherîna o>û

Ev guherîn di nav metnên me da tenê di peyveka biyanî da hat tesbîtkirin:

“Telefûnî brayê xwe kîr.” < Telefonî birayê xwe kir. (7/56)

“Hê li wê dirê telefûn kîr.” < Hêj li wê derê telefon kir. (20/22)

³⁵² Çetîn Taş, *Waneyên Rêziman û Rastnivîsa Kurmancî*, r. 23.

3.1.1.30. Guherîna o>w

Dengê /o/yê diguhere nîvdengdêra /w/yê. Di nav metnên me da tenê di mînakekê da hat dîtin. Peyva ku di kurmancîya nivîskî da wekî “zarok”ê tê bikaranîn, di devoka Torê da “zaro” ye. Guherîn jî di vê rewşê da dibe guherîna o>w.

“herdû zar^wê wê dixîyê” < her du zar^o(kø)yê wê dixiyê. (29/10)

3.1.1.31. Guherînen ku tenê di rewşa tewandî da pêk ten

Di rewşa tewandinê da di hin peyvan da dengên /a/, /e/, /î/yê diguherin, dibin /ê/:

“xistîyá ‘eyarekî berêz” < xistiye eyarekî beraz (30/47)

“çuwe tenûrê go nêⁿ çêkê.” < çûye tenûrê ku nan çêbike. (29/27)

“Ev kê zêr avêtinê dá?” < Ev kê (ji kî’yê) zêr avêtinê? (29/21)

“mala gavên tişî zêr á.” < mala gavan tije zêr e. (29/20)

“Tavêjê çê^m.” < Diavêje çem (29/11)

“Xwedê li wa girt ha!” < Xweda li wan girt ha! (27/38)

“Pi şêv û bi ro” < Bi şev û bi roj (26/23)

“kêreka má: b kalên jî bû” < kêreka me ya bi kalan jî bû (25/11)

“pişta dêrî” < pişta derî (5/32)

“Em î p fecrê rabin û kevine nav geyê de” < Em bi fecrê radibûn û diketin nav geya (1/21)

“ê savêr başqe digirt.” < (me) ê savar başqe digirt. (1/41)

“Sîleḥ berda mêr” < Sîleḥ berda mar. (11/10)

3.1.1.32.Zodengîbûn³⁵³ (diphthongization)

Di hin bikaranînan da dengdêrek cihê xwe dide du dengdêran. Ev bûyer dibe zodengîbûn. Wekî ku li jor jî derbas bû, li vir divê bê zanîn ku dengê /w/yê jî wekî nîvdengdêr tê hesibandin. Ji xwe diftongeka kurmancîya nivîskî heye: xw. Îcar di devoka Torê da sisêyên din jî lê zêde dibin û tenê di serê peyvê da tên bikaranîn:

3.1.1.32.1.Gw

“Me ê gwîza çêtkîr.” < Me gûz çêdikirin. (1/47)

“û má gwêh dayê dá.” < û me guh dayê. (6/3)

“zahf gwih dayiyê.” < zahf guh dayiyê. (6/19)

“Xezûrê yê çûbû gwind.” < Xezûrê wê çûbû gund. (8/7)

“em gwêhdarê wa bûn” < em guhdarê wan bûn (10/34)

3.1.1.32.2.Kw

“Me kwindirê mîranî tçandin.” < Me kundirê mîranî diçandin. (2/3)

“Kuriî kwîşt.” < Kurik kuşt. (11/15)

3.1.1.32.3.Qw

“devê m qwil nebû” < devê min qul nebû (8/14)

3.1.2.Guherîna denga di nedengdêran da

3.1.2.1.Guherîna b>p

• “Di kurdî û zimanên din de jî meyla berbelav ew e ku deng nermtir dibin û dibin bilerz. Mebest bi bilerziyê ew e ku di dema gotina van denga de, perdeyên dengî dilerizin.”³⁵⁴ Di devoka Torê da jî ev meyl xwe dide pêş:

³⁵³ Ev peyv wekî têgeh ji Teza Mahmoud hatiye wergirtin. Bnr. Mahmoud, *Şîrovekirineke Dengsazî û Fonolojî Di Kurdiya Kurmancî de*, r. 152.

“Vêca ma^clum á b der^pkê re neçû xwar” < Vêca malûm e bi der^bekê ra nedîçû xwar. (12/18)

“^pazde tepsî ^paqlewe” < pazdeh tepsî ^baqlewe (5/12)

• Daçeka “bi”yê axleb diguhere:

“em ê ^p hev çin, ^pi Xwedê.” < em dê ^bi hev biçin, ^bi Xwedê. (14/22)

“T ^pi xêr hatî.” < Tu ^bi xêr hatî. (5/3)

“ezê ^p ser” < ez dê ^bi ser (4/6)

3.1.2.2. Guherîna b>v/w

Ev guherîn gelek caran tên dîtin. Ji ber ku cihê cîderka wan wekî hev e ango her sê deng jî bîlebîal in ev guherîn³⁵⁵ pêk tê. Peyvên biyanî hatine guhertin:

“^cEvdilqadil” < ^bEbdulqadir (7/75)

“^cEvdilbarî” < ^bEbdulbarî (18/4)

“^cEvdilbaqî l milê me bû” < ^bEbdulbaqî (20/33)

“^cEvdîlehê Şawîş” < ^bEbdullahê Çawîş (22/11)

3.1.2.3. Guherîna c>d

Di peyvekê da em li rastî vê guherînê hatin ku ev peyv esilerebî bû:

“w ^cadiz bû çû bi çîyê de.” < û ^aaciz bû çû bi çiya da. (11/8)

“^kurkê yî: mezin ^cadiz bû” < kurikê wî yî mezin ^aaciz bû. (11/6)

“ê ^pçûçkê ^cadiz bû” < e piçûk ^aaciz bû (11/26)

³⁵⁴ Muhammed, *Dengnasî di kurdî de*, r. 76.

³⁵⁵ Muhammed ji bo vê guherînê gotiye “betacizm”. Ev terma îngilîzî ji navê tîpa “beta”ya yewnanî tê. Bnr. Muhammed, *Dengnasî di kurdî de*, r. 74.

3.1.2.4. Guherîna c>j

Di peyvêkê da em li rastî vê guherîne hatin ku ev peyv esilerebî bû:

“Tajdîn werā b mi yā.” < Taceddîn were (7/89)

“mi go “Tajdîno” < min got Taceddîne (8/23)

3.1.2.5. Guherîna ç>ş

“Evdilê Şawîş,” < Evdileyê Çawîş (22/27)

3.1.2.6. Guherîna d>t/t

• Di kêşana dema niha da eger lêker bi dengdêrekî dest pê bike /d/ bi dengê /t/yê diguhere:

“tê favêje çem.” < tê diavêje çem. (29/11)

“me fanî banî” < me dianî banî (26/22)

“serê mi fêşe.” < serê min diêşe. (16/11)

• Di kewyanê da ev guherîn tê dîtin:

“fê de ddanîn” < di wê da didanîn (12/14)

• Di pevbestinê da jî bi /t/ an /t/ yê diguhere:

“me fkirne xetik” < me dikirin xetik (1/7)

• Eger daçeka “di” û peyva ku bi /h/yê dest pê dike bikewin, hingî /h/ dikeve û /d/ dibe /t/ an /t/ :

“tevde me txwar” < di hev da me dixwar (10/45)

“Tevde çûbûne hecê.” < Di hev da çûbûn hecê (22/2)

3.1.2.7. Guherîna g>k

“he[́]ke şer e bibe w herá.” < eger şer be bibe û here 7/43)

3.1.2.8. Guherîna h>ê

“dê pazde tepsî” < de^h pazdeh tepsî (5/12)

• Di peyvên ji erebî wergirtî da eger di nav peyvê da /h/ hebe ev guherîn tê dîtin:

“jê fê^m nekîr” < jê fe^hm nekîr. (4/4)

3.1.2.9. Guherîna h>w

• Di devoka Torê da cînavka kesane ya kesê yekem yê pirjimar wekî “win/wûn”ê tê bikaranîn:

“esil wîn in.” < asil ^hûn in. (4/23)

“Wun çime halo” < ^hûn çima halo (5/18)

3.1.2.10. Guherîna h>y

“Het^{ta} sibey” < heta sibe^hî (9/3)

3.1.2.11. Guherîna j>c

Ev guherîn tenê di peyveka biyanî da hat tesbîtkirin:

“çawûş û cindirme” < çawîş û jandarma (18/20)

“Ê cindirma û çawîş wa ha!” < Ê jandarma û çawîş wan ha! (18/7)

3.1.2.12. Guherîna j>ş

• Di kurdî de gava ku dengekî bêlerz tê pey dengekî bilerz, ev dengê bêlerz dengê bilerz li gel xwe bêlerz dike.³⁵⁶ Di devokê da di peyva “tije” da ev guherîn hat tesbîtkirin:

“tişî ka w ce tkê” < tije ka û ce dike (30/36)

• Dengdêra daçeka “ji”yê axleb diguhere dibe /ş/:

“Kêçîkêk şî xwe re anî” < kêçîkek ji xwe ra anî (29/1)

3.1.2.13. Guherîna k>g

Gihaneka “ku”yê di devoka Torê da her “go” ye:

“Go me şîranî kir û çu birne îş.” < Ku me şîranî kir çû birin îş. (5/23)

“Kir go bê l mi xê.” < Kir ku bê li min bixe. (17/7)

3.1.2.14. Guherîna l>r

“Vêca werhasil me jê re l êgir kir” < Vêca wehasil me jê ra li agir kir (6/11)

“Bû qerebalixâ wê.” < Bû qe lebalixâ wê (5/9)

“Bere bê!” < Bi la be! (4/25)

3.1.2.15. Guherîna m>b

“Hin caran jî peydabûna B ji encama guherîna M ye.”³⁵⁷ Di metnan da em rastî mînakekê tenê ya vê guherînê hatin ku ew jî peyveka erebî bû:

“biqambilî wî gundî bû” < muqabilî wî gundî bû. (27/20)

³⁵⁶ Husein Muhammed, “Dengê-J Peydabûn û Ketina Wê”, *Kanîzar*, h. 16, 2018, r. 74. Malper: <https://zimannas.files.wordpress.com/2018/02/hejmar16.pdf> (Pêgehîn: 05.08.2019).

³⁵⁷ Muhammed, *Dengnasî di kurdî de*, r. 77.

3.1.2.16. Guherîna n+g>y

Ev guherîn tenê di peyvekê da hat tesbîtkirin:

“hew dey kîr” < hew deng kir (14/30)

3.1.2.17. Guherîna n>l

“Hema go *limêj* bikin.” < Hema ku *nimêj* bikin. (21/43)

“*livînê* xwe hilênin” < *nivînên* xwe hilênin (3/43)

3.1.2.18. Guherîna n>m

Muhammed sebaba guherîna van herdu dengan (/n/ û /m/) wiha dide: “...awayê gotina *n* û *m* herdu wek hev e (herdu dengên bêvilî ne) lê cihê wan cuda ye (*m* dulêvî ye, *n* pidûyî ye). Lê ji ber ku *b* jî dengekî dulêvî ye anku cihê wê û *myê* eynî ye, di bin tesîra *b* de cihê *nyê* jî ji pidûyan tê veguhastin û *nya* di peyvan de li pey *bjî* cihê xwe diguherîne û dibe dulêvî anku wek encam dibe *m*. Ev diyarde di peyvên hevedudanî (pêkhatî) de jî diyar dibe.”³⁵⁸

“*zembîl* hebûn” < *zenbîl* hebûn (12/35)

3.1.2.19. Guherîna s>z

Me ev guherîn di peyveka biyanî da tesbîtkir:

“*zeleṭe* me çêdikîr” < *Selate* me çêdikîr. (3/32)

3.1.2.20. Guherîna p>b

“*Ba* ne ne yîşê berfê îdî!” < *Pa* ne îşê berfê êdî! (13/6)

3.1.2.21. Guherîna r>l

“*Evdilqadiṭ*” < *Evdilqadir* (7/75)

³⁵⁸ Muhammed, *Dengnasî di Kurdî de*, r. 60.

3.1.2.22. Guherîna t>d

“Ez ê sibeyî xudba xwe kîm” < Ez dê xutbeya xwe bikim (7/32)

3.1.2.23. Guherîna v>f

“erdê go vê gafkê kirîye” < erdê ku vê gavkê kirîye (22/75)

3.1.2.24. Guherîna w>û

Di peyva “efw”a erebî (ء فو) da ev guherîn hat tesbîtkirin. Ev peyv wekî “efû”yê derbasî devokê bûye:

“dîya w wê efû dikê.” < dîtiye û wê efw dike (31/29)

3.1.2.25. Guherîna w>y

Cînavkên kesane yên “wî, wê” eger wekî raveker bê bikaranîn carinan ev guherîn pêk tê:

“go kûrkê yî: mezin” < Kurikê wî yî mezin (11/6)

“Bêhna yî teng bû.” < Bêhna wî teng bû. (11/6)

“tiştûmiştê yê me txwar.” < tiştûmiştên wê me dixwarin. (10/19)

“Bêhna yî teng bû.” < Bêhne wî teng bû. (11/6)

3.1.2.26. Guherîna w>o:

Di peyveka ji erebî wergirtî da ev guherîn hat tesbîtkirin:

“melkemoṭ” < mekulmewt* (7/89)

3.1.2.27. Guherîna x>q

“ez birime qîstexanê.” < ez birim xestexaneyê. (8/73)

* Bi tîpên erebî “م ل ك و ت ا ل م” e û tê wateya melekê mirinê.

“Heyra: miṭbaqa bavê yê” < heyran metbexa bavê wê (8/38)

3.1.2.28. Guherîna y>h

Tenê di peyveka esilerebî da hat dîtin:

“Ez û yekî seḥîd” < Ez û yekî seyid (27/4)

“Seḥîdê m, á!” < Seyidê min, erê! (28/44)

3.1.2.29. Guherîna y>ê

“Heke xêr e dayne” < Heke xêr* e dayne (7/42)

“kêfa jinikê tê” < kêfa* jinikê tê (29/24)

3.1.2.30. Guherîna z>ş

Ev guherîn di peyveka esilerebî da hat dîtin. Wekî ku hat tesbîtkirin ev guherîn bi tesîra /ç/yê pêk hatiye:

“îdî me^ceşçîyê” < êdî meezçîyê (6/2)

“me^ceşçîyê má” < meezçîyê me (7/98)

3.1.2.31. Guherîna /c/ (ع)>a

Ev guherîn di peyveka esilerebî da hat dîtin:

“Bekçîyê îş^a:tê bû.” < Bekçîyê îñş^eatê bû. (7/1)

3.1.2.32. Guherîna /c/ (ع)>h

Ev guherîn di peyveka esilerebî da hat dîtin:

“Sê siḥeta” < Sê sa^cetan (8/88)

* Ev peyv ji erebî wergirtî ye û di eslê xwe da “xeyr (خَيْر)” e.

* Ev peyv ji erebî wergirtî ye û di eslê xwe da “keyf (كَيْف)” e.

3.1.2.33. Guherîna /c/ (Ĝ)>y

Ev guherîn di peyveka esilerebî da hat dîtin:

“Ba ne ne yîşê berfê îdî!” < Pa ne ne ‘îşê berfê êdî (13/6)

3.2. Ketina dengan (dissappearance, segment delation)

Jiholêrabûna yekeyeka dengan e. Ketina dengan wekî “ketina dengê serê peyvê (apheresis), ketina dengê nava peyvê (syncope) û ketina dengê dawîya peyvê (apocope)” dibin sê beş. Di encama ketinê da carinan ev ketin dibin sedema ketina kêteyê. Wî wextî digel ketina deng, “ketina kêteyê (hapology)” jî pêk tê.³⁵⁹

• Ketina dengê serî (apheresis):

Ketina deng an kêteya serê peyvê ye. Mînak:

“em ê p hev çin” < Em dê bi hev *biçin* (14/22) *øbi*

“ema çî ba.” < *hema* çî *bûba* (29/13) *øh, øbû*

• Ketina dengê navîn (syncope)

Ji bilê dengê serî û dawî, ketina dengê peyvê ye.³⁶⁰ Mînak:

“me tişkî wilo me nedî.” < me tişkî wilo nedît. (26/26) *øe*

“Nîro < Nivro (3/31)

• Ketina dengê dawî (apocope):

Ketina dengê dawîya peyvê ye. Mînak:

“keça m ti dibê çî?” < keça *min* tu dibê *ji* çî? (4/23)

“di ro sê ro” < du *roj* sê *roj* (5/1) *øj*

³⁵⁹ Karaağaç, h.b., r. 342.

³⁶⁰ Karaağaç, h.b., r. 343.

“Tê çi kê?” < Tu dê çi bikî? (25/15) øû

“pazde tepsî” < pazdeh tepsî (5/12) øh

• **Ketina kîteyê (haplology):**

Negotina yek ji du kîteyên ku ji dengên wekhev/şibhê hev pêkhatî ne.³⁶¹
Mînak:

“ema çi ba.” < hema çi bûba (29/13) øh, øbû

Li gor agahîyên li jor ketinên dangan yê ku di devoka Torê da pêk tên, digel mînanan li jêr dê bê dayîn. Wekî sîstema bûyerên din yê ku li jor derbas bûn, dê ev ketinên dangan di bin du binbeşan da bînan dayîn: ketina dengdêran û ketina nedengdêran.

3.2.1. Ketina Dengdêran

3.2.1.1. Ketina /a/yê

• Bêjeyên ku bi dengê /a/yê diqedin dema “-a”ya ku veqedandeka ravekê (îzafê) ye digirin, dengê dawîya peyvê carinan dikeve lê wî wextî /a/ya dawîya bêjeyê dirêjtir tê bilêvkin:

“Me *kā*: xwe *tkire* *kādîna* *dá*.” < me *kaya* xwe *kir* *kadînan* (1/24)

• Carinan piştî veqedandeka ravekê ya ku hatiye bejeya ku bi /a/yê qediyaye, /a/yeka din jî tê. Hingî hêj dirêjtir jî tê bilêvkin:

“Me beroşa *xwa*: *yê* jî *dikeland*” < Me beroşa *xwe ya avê* jî *dikeland* (3/3)

“bila” ya kurmancîya nivîskî, di devokê da dibe “bera/bere”. Di axaftinê da carinan dengdêra dawîya peyvê dikeve:

“Mi *go* *ber* *bê*.” < Min got *bera* *be* . (19/43)

³⁶¹ Bnr. Farqînî, *Cihguherîna Dangan û Ketina Kîteyan*, r. 49.

3.2.1.2. Ketina /e/yê

“Ew jî Slîm e” < Ev jî Selîm e (4/6)

“dibirne wê drê” < dibirin wê derê (26/28)

• Eger peyveka bi /e/yê qediyayî, veqedandeka nebinavkirinê “+yek” ê bigire axleb /e/ û /y/ya “yek”ê dikevin.³⁶²

“wê çêlkê dine me ha!” < Dê çêlekê* bidin me. (27/24)

“tê navsera çîyakî.” < tê navsera çiyayekî. (29/23)

“Hema çû teksîk anî.” < Hema çû teksîyek anî (7/78)

“me tişkî wilo me nedî.” < me tiştekî wilo nedît. (26/26)

“ca:rke dî” < careka din (3/33)

“daqena hinik hinka nexin.” < Da hinek li hinekan nexin. (10/33)

“hin bêbextîkê pkin” < hin bêbextîyekê bikin (5/24)

“Herki me çen miştaxe çêtkirin.” < Heryek ji me çend miştaxe çêdikirin. (3/45)

• Bêjeyên ku bi dengê /e/yê diqedin, dema “+a/ê”ya ku veqedandeka ravekê (îzafê) ye digirin, dengê dawîya peyvê carinan dikeve:

“Perê mi” < Pereyên min (18/38)

“Bi îrada Xwedê Te^cala” < Bi îradeya Xwedê Teala (16/18)

“Meşerê de” < Di mehserêyê da (2/12)

“her çar tenekê xwe” < her çar tenekeyên xwe (3/7)

³⁶² Aktuğ, h.b., r. 32.

*Çêl: yekeyeka pîvana giranîyê ye.

•Eger peyvek an qertafeka bi dengdêrê qediyayî, berî peyveka ku bi /e/yê dest pê dike bê, carinan di axaftinê da ev her du peyv bi hev ra tên bilêvkin. Wê demê jî /e/ dikeve.

“go m rabûn” < ku(*go*) *em* rabûn (3/17)

“ewka wê zê kim” < Ewka wê *ez* dê bikim (10/1)

“gotiye wa navêjnâ...” < Gotiye wan *neavêjin* (11/51)

“hema m halo” < hema *em* halo (14/51)

“Bi îrada Xwedê Te‘ala w êş” < Bi îradeya Xwedê Teala *ew* êş (16/18)

•Carinan di bilêvkinê da kîte tê quripandin:

“ka wer em_erne mala má” < ka *were* em herin mala me (11/32)

3.2.1.3.Ketina /i/yê

•Eger piştî peyveka bi dengdêrekî qediyayî, lêkera ku bi “bi-” (qertafa dema bê û raweyên xwestekî) an “di-”yê (qertafa dema niha û raweyên xwestekî) girtiye bê, axleb her du peyv bi hev ra tên bilêvkin û wê demê dengdêra van qertafan dikeve.

“mi dbire banî.” < min *dîbir* banî (22/18)

“me tkirne xetik.” < me *dîkirin* xetik (1/7)

“j ev safî tkî:r” < *ji* hev safî *dikir* (1/12)

“me aya bacana çêdkir.” < me *ava* bacanan *çêdikir* (1/45)

“tovkê me çêdbû” < *tovikê* me *çêdibû* (2/2)

“me ddane” < me *dîdan* (26/3)

“Heçî tçê di be ra tîfkê ddîyê” < Heçî *dîçe* di ber ra tîfekê *dîdiyê* (30/48)

“Mizgînîyê dgihênne yekî.” < Mizgînîyê *digihêjin* yekî. (7/44)

• /i/ya di kîteya dawî da û berî nedengdêrê, dema paşgireka* ku bi dengdêrê destpêkirî bigire, dikeve:³⁶³

“tovkê me” < tovîkê xwe (2/2)

“Mi xeberê pîs gotnê” < min xeberên pîs gotinê (22/43)

“heta esrê” < heta esîrê (9/11)

“aqlê wê” < aqîlê wê (5/5)

“Telefûnî brayê xwe kir.” < Telefonî birayê xwe kir (7/56)

“e hatme malê.” < ez hatim malê (4/21)

“M derîyê xwe şikandîyá” < Min derîyê xwe şikandiye (5/33)

• Eger lêker bi dengdêrê dest pê bike û “bi-” (qertafa dema bê û raweyên xwestekî) an “di-”yê (qertafa dema niha û raweyên xwestekî) bigire, dengdêra qertafê dikeve. Carinan qertaf tevli dengdêrê bi tamamî dikeve:

“pere w me tanî” < pere ew me dianî (2/16)

“J wa rá bênin.” < Ji wan ra biênin (5/20)

• Di pevbestinê da di peyva duyem da ketina dengdêrê rû dide. Daçekên “di, ji, bi”yê di vê rewşê da axleb dengdêra xwe winda dikin:

“ti zanê şxwe ne wlo?” < tu dizanî jixwe ne wilo? (12/6)

“l hespê xwe swar á.” < li hespê xwe siwar e (18/15)

“Û mi d derencê rá” < Û min di derenceyê ra (22/18)

“ji kanîyê, j camîyê.” < ji kanîyê, ji camîyê (3/1)

* Her çiqas Sağniç bi paşgirê sînordar kiribe jî ji bo qertafên din jî ev rêzik derbasdar e.
³⁶³ Sağniç, h.b., r. 27.

3.2.1.4. Ketina /î/yê

Carinan /î/ya di kêteya dawî da û ya berî nedengdêrê, dema ku paşgireka ku bi dengdêrê dest pê dike bigire, dikeve:

“Em î çine paleyya nîska.” < Em diçûn paleyîya nîska (1/9)

“Na lo Xirbêsimaîl va î l ca^{ch}dê yá.” < Na lo Xirbê Îsmaîl va li cadeyê ye.

3.2.1.5. Ketina /o/yê:

/o/ya ku di kêteya dawî da ye û berî nedengdêrê ye dema paşgireka ku bi dengdêrê dest pê dike bigire, dikeve.³⁶⁴ Peyva “zarok”ê ya di kurmancîya nivîskî da, di devoka Torê da wekî “zaro”yê tê bikaranîn û dema ev peyv qertafeka ku bi dengdêrê dest pê dike digire axleb /o/ dikeve:

“zarwê wê dixîyê” < zarokên wê dixiyê (29/10)

3.2.1.6. Ketina /u/yê:

“tu” ya ku cînavka kesane ye, dema piştî xwe amraza dema bê bigire axleb /u/ya xwe winda dike û di navbera /t/ û wê amrazê da pevbestinek çêdibe:

“Ma t̄ ê çê kû?” < Ma tu dê biçî ku? (21/24)

3.2.1.7. Ketina /û/yê

Eger /û/ piştî xwe /w/ya kelijandinê bigire, dikeve:

“xeswa t̄á” < xesûya te (6/9)

Di kewiyana peyvan da gihaneka “û”yê carinan dikeve:

“ji nav destê hevdu reyandin.” < ji nav destên hevûdu revandin. (26/19)

³⁶⁴ Aktuğ, h.b., r. 32.

3.2.1.8. Ketina Kîteyan

Terkkirina kîteyek ji kîteyên peyvê ye.³⁶⁵ Wekî rêzik mirov dikare bibêje ku devera ku dengdêrek ketiye li wir bûyera ketina kîteyê jî pêk hatiye:

“ema çi ba.” < hema çi **bû**ba (29/13)

“Hema çû texsîk anî.” < Hema çû texsî**ye**k anî (7/78)

“win ê biná kû rê.” < hûn dê **bî**bin ku **der**ê (7/95)

“Hebû nebû, zilamek bû.” < hebû **tun**ebû (29/1)

“Mey yanî Xwedê Te’ela” < Mey**zîne** yanî Xwedê Teala (27/36)

“Em î tovîk çênin” < Em dê tovîk **bi**çênin (2/1)

“Em î bê” < Em dê **bî**bêjin (2/1)

“Û e j ku zanim” < Û ez **ji** ku **diz**anim (1/60)

“me aya bacana çêdîkir.” < me ava bacanan çê**dî**kir (1/45)

“M î bacana ve lebîkin.” < Em dê **bi** bacanan ve lebikin (1/43)

“Me j ev digirt.” < Me **ji** hev digirt (1/40)

“Em î bê” < Em dê **bî**bêjin (1/39)

“Ser bana ye w” < **Li** ser banan e û (1/35)

“Serê bana hişk tîkirin” < **Li** serê banan hişk **dî**kirin (3/50)

“Nabê çima tîkinê dá.” < Nabê**je** çima **dî**kin wî (4/9)

“Go keça m tî dibê çi?” < Got keça **min** tu dibê**ji** çi? (4/23)

“Edûla hare bêje wa” < Edûla here **bî**bêje wan (5/1)

³⁶⁵ Karaağaç, h.b., r. 343.

“nizam çi” < nizamim çi (5/7)

“tî wû jinbira m wer” < tu û jinbira min werin (7/9)

“l vê rê ştexilîbûn.” < li vê derê ştexilîbûn (7/21)

“Em nikarin hane gund.” < Em nikarin herin gund. (8/19)

“Tî karê” < Tu dikarî (8/47)

“Bilalo û dîya xwá, go” < Bilalo û dêya xwe gotin (8/72)

“E nizam” < Ez nizamim (9/9)

“E dibê” < Ez dibêjim (9/18)

“P tirkî dibê” < Bi tirkî dibêjin (12/6)

“derman nebûn, îlac nebû.” < derman tunebûn, îlac tunebû. (12/11)

“Neqeba Dîfnê w Şîfêrê de bû.” < Di neqeba Dîfnê û Şîfêrê da bû. (22/13)

“Baş elhemdila.” < Baş, elhemdu'llah (21/24)

“tî wû jinbira m wer” < tu û jinbira min werin (7/9)

3.2.2. Ketina Nedengdêran

3.2.2.1. Ketina /b/yê

• Peyva “xerabkirin”ê di devoka Torê da dibe “xerakirin” û /b/ya peyvê dikeve. Ev rewş di peyva “xerabûn”ê da jî rû dide:

“wilo xera jî kiribû” < wilo xerab jî kiribû (26/6)

“gava çal xera bûyá” < gava çal xerab bûye (11/44)

• Dema ku lêkera “bûn”ê di raweya mercî ya borî da tê kişandin, carinan “bû” dikeve:

“ema çi ba.” < hema çi **bûbûna/bûba** (29/13)

- “bi”ya ku qertafa dem û raweyê ye, di kêşanê da carinan dikeve:

“win ê biná kû rê.” < hûn dê **bibin** ku derê? (7/95)

“Teştê xwá: mezín ênin” < Teştên xwe yên mezin **bînin** (2/9)

“Em î toyík çenin” < Em dê tovîk **biçînin**. (2/1)

“M î bacana ve lebi^kin.” < Em dê bi bacanan ve **bilebikin** (1/43)

“Em î bê em ê bine êş.” < Em dê **bîbêjin** em dê bibin aş (1/39)

“Em ê êvarî dîsa ên.” < Em dê êvarî dîsa **bên**. (3/46)

3.2.2.2. Ketina /c/yê

Di kewyanê da carinan /c/ya peyva yekem dikeve:

“Pê şeş mêşin kirîn” < Pênc şeş mêşin kirîn. (5/29)

3.2.2.3. Ketina /d/yê

- “de/d”ya di peyva “der”ê da di devokê da axleb dikeve:

“me^tka bûkê jî ha^te vê rê” < metika bûkê jî hat vê **derê**. (5/35)

“win ê biná kû rê.” < hûn dê bibin ku **derê**. (7/95)

“l vê rê ş^texilîbûn.” < li vê **derê** ş^texilîbûn (7/21)

- Carinan di encama kewyanê da her çiqas mînaka me peyveka esilbiyanî be jî ev ketin tê dîtin:

“buzolabîkê” < buzdolabîyekê (4/30)

- Qertafa dema niha “di-” dikeve:

“Û e j ku zanim,” < Û ez ji ku *dizanim* (1/60)

“Ti kárê” < tu *dikarî* (8/47)

• “di”ya ku daçek e, carinan di axaftinê da bi tamamî dikeve:

“Neqeba Difnê w Şifêrê de bû.” < *di* neqeba Difnê û Şifêrê da bû. (22/13)

• Di axaftinê da carinan /d/ya dawîya peyvê dikeve:

“Çen miha l^cerdê ma” < Çend mehan li erdê ma (6/18)

“li gun namênê” < li *gund* namîne (21/16)

3.2.2.4. Ketina /g/yê

Di du peyvan da ev ketin hat tesbîtkirin. Di her du peyvan da jî vî dengî berî xwe dengê /n/yê girtiye:

“Qe dey nakê.” < Qet *deng* nake (4/9)

“melê ban dá.” < Melayî bang da (7/11)

3.2.2.5. Ketina /h/yê

“xwáká xwá” < xwe*h*ka xwe (11/54)

“ema çi ba.” < *H*ema çi bûba. (29/13)

• Peyva “rahiştin”ê di devoka Torê da /h/ya xwe winda dike:

“Wî rajiyê” < Dê *rahiştibûna* wê/wî” (12/36)

“Neraşte telefûna xwá.” < Nera*h*şt telefona xwe. (7/57)

• Carinan bi encama kewyanê /h/ya serê peyva dawî dikeve:

“Me j ev digirt.” < Me ji *hev* digirt. (1/40)

“Gotiye heṭa m p̄ ev bişêwirin” < Gotiye heta em bi **hev** bişêvirin (4/19)

“j̄ ev dizîná.” < ji **hev** dizîne (9/24)

• Bi encama pevbestina bi peyva berî xwe, /h/ya serê peyva duyem carinan dikeve:

“M̄ ene mal̄ka xwá” < Em **herin** malka xwe. (8/66)

“ka wer em̄erne mala má” < ka em **herin** mala me (11/32)

• Di hin peyvên ji erebî wergirtî da /h/ya nava peyvê dikeve û /e/ya berî wê jî dibe /ê/:

“Ê me tişîk jê fêm nekîr.” < Ê me tiştekan jê **feh̄m*** nedikir. (4/4)

• Carinan /h/ya dawî dikeve û di encama ketinê da /a/ya berî vî dengî dirêjtir tê bilêvkirin.

“eşhedû e la îlaha îlella:” < eşhedu en la îlahe îllell**ah** (7/5)

3.2.2.6. Ketina /j/yê

• Lêkera “gotin”ê dema li gor rayeka dema niha tê kişandin axleb /j/ya wê dikeve:

“Nabê çima ṭkinê dá.” < nabêje çima dikinê. (4/9)

“keça m̄ ṭi dibê çî?” < keça min tu dibêjî çî? (4/23)

“E dibê” < Ez dibêjim (9/18)

“P̄ tirkî dibê “şîre hûzum” lo!” < Bi tirkî dibêjin şîre uzum lo! (12/6)

“Ṭi harê vêga bê z̄ ê çime Baṭmanê herá” < Tu herî vê gavê bibêjî ez dê biçim Baṭmanê here. (20/8)

* Bi tîpên erebî ev peyv “هه” e.

“w̄ î bê” < dê bibêje (23/21)

• Ji dawiya peyvên din jî carinan dikeve:

“Nagihê şalê xwá l xwe k̄ê” < Nagihêje şalê xwe li xwe bike. (7/88)

• /j/ya peyva “roj”ê eger peyv bê qertaf bê bikaranîn, axleb dikeve:

“heta rô dhila” < heta roj dihilat. (10/28)

• Di pevbestinê da carinan eger peyva yekem bi /ş/yê qediya be û ya duyem jî bi /j/yê dest pê kiribe, ji ber ku cîderka her duyan hevpar e, /j/ dikeve:

“êş i serê mi derket” < êş ji serê min derket. (16/18)

3.2.2.7. Ketina /k/yê

“hina ew dikir.” < hinan ewk dikir. (1/8)

“Wilo mi serê xwe ew t̄ikir.” < Wilo min serê xwe ewk dikir. (15/6)

“Xel siqêfa dikine bavê wê” < xelk sixêfan dikin bavê wê (4/8)

“ne zaro ne kes ji me” < ne zorok ne kes ji me (22/61)

3.2.2.8. Ketina /l/yê

• Carinan daçeka “li”yê bi tamamî dikeve:

“Ser bana ye w” < **Li** ser banan e û (1/35)

“Em ser dirazahan” < Em **li** ser dirazan (1/20)

“Serê bana hişk t̄ikirin” < **Li** serê banan hişk dikirin (3/50)

“E jî ser çiwalkî e rûniştibûm.” < Ez jî **li** ser cewalekî runiştibûm. (19/26)

“Erê lo ewa ba Bêcirman.” < Erê lo ewa **li** bal Bêcirman. (19/37)

- Peyva “bal”ê di devoka Torê da wekî “ba” tê bikaranîn:

“1 ba me bê.” < li *ba* me be. (4/34)

“Erê lo ewa ba Bêcirman.” < Erê lo ewa *li* bal Bêcirman. (19/37)

- Carinan dengê /l/yê eger di peyvekê da ji yekî zêdetir hatibe bikaranîn ji bo sivikkirinê hin ji wan dikevin:

“Baş el^hemdila.” < Baş elhemdu^lillah (21/24)

3.2.2.9. Ketina /m/yê

“Qambilî gundê bavê xwe” < *Mu*qabilî gundê wan e. (30/24)

“E dibê” < Ez dibê^jim (9/18)

- Eger du peyv li dû hev bên bikaranîn û dawîya peyva yekem û serê peyva duyem /m/ be, carinan ev deng ji peyva pêşî dikeve:

“ez rabû mi go” < ez rabû^m min got (9/6)

3.2.2.10. Ketina /n/yê

- /n/ya veqedandeka raveberê ya pirjimar (+ên), di devoka Torê da tim dikeve:

“ji nav destê hevdû reyandin.” < ji nav destêⁿ hevûdû revandin (26/19)

- Qertafa diyarîyê ya pirjimar “+an”, di devoka Torê da tim wekî “+a”yê tê bikaranîn. Yanî dengê /n/yê dikeve:

“aşêfa genima dderket.” < aşêfa genimanⁿ derdiket. (1/3)

“îşê gunda” < îşê gundanⁿ (1/8)

“hina ew dikir.” < hinanⁿ evk dikir. (1/8)

• Cînavkên kesane yê tewandî yê “min, wan” axleb di devoka Torê da wekî “mi, wa” tên bikaranîn. Yanî dengê /n/yê dikeve:

“bere m bi^cezimênin.” < bila *min* biezimînin (30/27)

“Ez gihame wa” < Ez gihaştim *wan* (14/42)

“kürê m Xwedê li wa girî ha!” < kürê *min* Xweda li *wan* girt ha! (27/38)

“Ez ê rabim çime mala wa” < Ez dê rabim biçim mala *wan* (4/7)

“kéça m” < keça *min* (4/23)

• Carinan du peyv bi hev ve tên bilêvkirin. Wî wextî di hin bikaranînan da peyva yekem hin dengên xwe winda dike:

“Pê şeş mêşin kirîn” < Pênc şeş mêşin kirîn (5/29)

• Di hin peyvên esilerebî da carinan ev deng dikeve:

“Bekçiyê îşa:îê bû.” < Bekçiyê *în*şaatê bû. (7/1)

“p Xwedê heyra digrî” < bi Xwedê heyran digirî. (14/26)

• Di hin bikaranînan da kîte bi temamî tê quripandin û /n/ya di nav kîteyê da jî dikeve:

“tî wû jinbira m wer” < tu û jinbira min wer*in* (7/9)

“P tirkî dibê “şîre hûzum” lo!” < Bi tirkî dibê*jin* şîre uzum lo! (12/6)

“nizam çî” < niza*n*im çî (14/6)

“Qurba” < Qurba*n* (28/9)

3.2.2.11. Ketina /r/yê

• Ev ketin axleb di nava peyvê da pêk tê:

“Rajê qubano!” < Rahijê qurbano! (27/3)

“belkî semîyan nîn á” < Belkî sermiyan nîne. (8/23)

“l qeregehê yá” < li qerargehê ye (16/3)

“Em níkarin hane gund.” < Em herin gund (8/19)

•/r/ya nava peyva “der”ê axleb dikeve:

“hate vê dê” < hat vê derê (7/19)

“Em jî l wê dikê rûniştin” < Em jî li wê derkê rûniştin. (7/83)

•Di kewiyanê da eger dawîya peyva yekem û serê peyva duyem /r/ be, ji ya peyva yekem ev deng dikeve:

“Di be re dílok digotin.” < Di ber re digotin. (1/38)

3.2.2.12.Ketina /s/yê

•Di peyva “qas”^{*} a esilerebî da ev ketin hat tesbît kirin:

“me çilo hewqa txwar” < me çilo evqas dixwar (1/63)

“çiqa tê ve çû” < çi qas tê ve çû (11/6)

“ewqa goşt li wê derê” < ewqas goşt li wê derê (24/5)

•Peyva “hezkirin”ê di devokê da dibe “hiskirin” û eger bi daçeka “ji”yê ra bê bikaranîn, di encama kewiyanê da /s/ya peyvê jê dikeve:

“Wilo hî j hev tîkirin.” < Wilo ji hev his dikirin (21/8)

3.2.2.13.Ketina /t/yê

•/t/ya peyva tunebûnê, di devoka Torê da di nav kêşanê da dikeve:

* Bi tîpên erebî ev peyv “قاس” e.

“Hebû nebû, zilamek bû.” < Hebû *tunebû*, zilamek hebû. (29/1)

“derman nebûn, îlac nebû.” < derman *tunebûn*, îlac *tunebû*. (12/11)

• Lêkera “dîtin”ê di nav kêşanê da di devokê da /t/ya xwe winda dike:

“Te dîyá?” < Te *dîtiye*? (21/10)

“Te dî” < Te *dît* (26/28)

“me tiştkî wilo me nedî.” < me *tişteki* wilo *nedît*. (26/26)

• Di hin peyvên da /t/ya nava peyvê dikeve:

“me basîq çêtkîr.” < me *bastîq* çêdikîr. (1/62)

“tişîk nema go me netkîr” < *tişte*k nema ku me *nedikîr*. (1/60)

“Ê me tişîk jê fêm nekîr.” < Ê me *tişte*k jê fêm *nekîr*. (4/4)

• Di pevbestinê da eger peyva yekem bi /t/yê biqede û ya duyem jî pê dest pê bike carinan dengê dawîya peyva yekem dikeve:

“raş tîkîr.” < *rast* dikîr (1/19)

“dîsa des pê kîn” < *dîsa* dest pê *bikin* (3/44)

“Bavê mi coş tîkîr.” < Bavê min *cot* dikîr (10/38)

“Ka ti jî şês weraqa bide.” < Ka tu jî *şêst* wereqeyan bide. (18/9)

• Di dema borî da dengê /t/ya lêkera “gotin”ê dikeve:

“dîya wê jî go” < *dêya* wê jî *got*. (4/12)

“Bilalo û dîya xwá, go” < Bilalo û *dêya* xwe *gotin* (8/72)

“ez rabû mi go” < ez *rabûm* min *got* (9/6)

- Di axaftinê da dibe ku /t/ya dawîya lêkerê bikeve:

“rahiş go p Xwedê” < rahişt got bi Xwedê (19/51)

- Peyva “qet”ê di bilêvkirina bilez da carinan dibe “qe”:

“Qe dey nakê.”: Qet deng nake. (4/9)

3.2.2.14. Ketina /v/yê

“Nîro” < Nîvro (3/31)

“Şikevayê xwe jî bela kîrin” < Şikevayê xwe jî belav kîrin (7/13)

- Di pevbestinê da dengê dawîya peyvê carinan dikeve:

“wilo me l na hev didan” < wilo me li nav hev didan (10/6)

- Bikaranîna “vê gavê” di devokê da wekî “vêga”yê ye û dengê/v/yê jê dikeve:

“vê ga: tiştê go hatiye” < vê gavê tiştê ku hatiye (20/41)

3.2.2.15. Ketina /y/yê

- Peyva “yek”ê carinan /y/ya xwe wînda dike:

“Ma qey her ekî” < Ma qey her yekî (2/14)

“Her kî me” < Her yekî me (3/45)

- Peyva yenî (يٰٓنٰى)ya erebî, /y/ya xwe di devokê da wînda dike:

“Anî xeberîk şexalîk” < Yenî xeberek şexalîyek (5/24)

- Lêkera “qedîn”ê di devoka Torê da di dema borî da wekî “qedan”ê tê bikaranîn:

“mehke ye qeda û qeza kîr.” < meheka wê qedîya û qeza kîr. (6/1)

•Hin peyvên ku esilerebî ne û di nav xwe da dengê /y/yê dihewînin, dema derbasî devokê bûne dengê /y/ya wan ketiye:

“kêfa xwe jê î tanî.” < keyfa xwe jê re dianî. (20/33)

3.2.2.16.Ketina /z/yê

•Di devoka Torê da di axaftinê da axleb /z/ya cînavka kesane ya kesê yekem yê yekjimar dikeve:

“Û e j ku zanim” < Û ez ji ku dizanim (1/60)

“E rabûm e haţme malê.” < Ez rabûm ez hatim malê (4/21)

“E rabûm e çûm.” < Ez rabûm ez çûm (8/21)

Bûyereka ku di encama ketina dangan da rû dide heye. Ji ber ku pêkhatina wê bi ketina dangan ve girêdayî ye divê piştî vê mijarê bê dayîn: Dengdêrbûn.

3.3.Dengdêrbûn (vocalisation)

Bi jiholêrabûna nîvdengdêran an dengdêrên din, du dengdêr dikevin ser hev û wekî dengdêreka ji rêzê dirêjtir tên bilêvkirin. Dirêjbûna dengdêr (lengthing of vowel) jî bûyereka weke vê ye.³⁶⁶ Di devoka Torê da bûyera dirêjbûna dengdêrê, ji ber ku dengdêrên /a/ û /ê/ jixwe dengdêrên dirêj in, wekî “dirêjtirbûna dengdêr” diqewime:

“Kêreke xwá: qenc.” < Kêreka xwe ya qenc (7/40)

“da: m gelik geyayî biçinin.” < da em gelek geyayî biçinin (1/19)

“ká: xwe” < kaya xwe (1/24)

“mi çá:k dda wa” < min çayek dida wan (6/16)

“da: z herim” < da ez herim (4/22)

³⁶⁶ Karaağaç, h.b., r. 835.

“Dolmîşa *wa*: şehîrîçî” < Dolmîşa *wa(n) ya* şehîrîçî (21/4)

“kêreka *má*: b kalên” < kêreka *me ya* bi kalan (25/11)

“*Ma* z ê çilo ênim?” < *Ma ez* dê çilo bînim. (31/3)

“rûvîkê *wa*: yêtin” < rovîkê *wa(n)* avêtin. (25/19)

“Heka *wa* *ça*:k vexwar” < Heke *wa(n)* *çayek* vexwar (21/44)

“me çirâ: xwe dmirand” < Me çiraya xwe dimirand (10/37)

“hezûrê: pere dane min” < hezûrê *wê* pere dan min (5/15)

3.4.Lêzêdebûna dengan (appearance, segment addition, anaptyxis, adventitious sound)

Lêzêdebûna dengê pêşîn (prothesis): Mînak:

“*he*kê şer e bibe w herâ.” < eger şer be bibe û here (7/43)

Lêzêdebûna dengên navîn (epenthesis, anaptyctic, excrescent) :

Ev jî dibin du beş: lêzêdebûna dengdêrên navîn (vowel epenthesis)³⁶⁷ û lêzêdebûna nedengdêrên navîn (consonant epenthesis³⁶⁸).

• Mînaka lêzêdebûna dengdêrê:

“şikîr mi^c aşkê wî derket” < ji erebî: şukr (9/41)

“Rabû şîyande Şfêrê” < Rabû şand Şifêrê (22/55)

• Mînaka lêzêdebûna nedengdêrê:

“nahkê xwá” < nokên xwe (1/4)

“Coh^htîk” < Cotek (1/6)

³⁶⁷ Ji bo vê termê bnr. Karaağaç, h.b., r. 462.

³⁶⁸ Ji bo agahiye berfireh ya vê termê bnr. Karaağaç, h.b., r. 462.

Lêzêdebûna dengê dawî (epithesis, paragodic sound):

“me tkirne xetîk” < me dikirin xetik (1/7)

“ji boy wilo” < ji bo wilo (30/8)

Mînakên lêzêdebûna dengên di devoka Torê da li gor tekstên me yê berhevkirî dê li jêr bînin dayîn:

• Di hin peyvên ku bi /a/yê³⁶⁹ yan /i/ yan /î/yê destpêkirî da carinan /y/yek li pêşîya peyvê zêde dibe:

“yixtîyar in” < ixtiyar in (29/19)

“Mi kiriye çentê yîlaca” < Min kiriye çenteyê îlacan (9/10)

“vî yalî:” < vî alîyî (26/11)

• Dengê /y/ yê dikare di dawîya peyvê da jî zêde bibe:

“ji boy wilo” < ji bo wilo (30/8)

• Dengê /y/ yê dikare di nava peyvê da jî zêde bibe:

“zahf gwih dayiyê” < zahf guh dayê (6/19)

“ji me re şiyandin” < ji me ra şandin (8/20)

“bi wa rá şiyandim.” (ez) bi wan ra şandim (19/5)

“Em ê wî şyênin” < Em dê wî bişînin. (14/33)

• Di dem û raweyan da piştî lêkerê dengdêrek dikare zêde bibe:

“û m haţin malê.” < û em hatin malê (4/35)

³⁶⁹ Celalî ji bo devoka serhedê tesbîtek kiriye. Dibêje ku di hin peyvên bi /a/yê destpêkirî da /y/yek zêde dibe. Mînakên vê tesbîte di devoka Torê da jî hene lê ev bûyer di peyvên ku bi dengê /î/yê destpê dikin da jî xuya dibe. Ji bo tesbîta Celalî bnr. Murad Celalî, “Kurmanciya Serhedê û Devoka Gundê Taxilka” *Nûbihar*, h. 145, 2018, r. 43.

“êş ketê serê mi” < Êş ket serê min (15/7)

“birne j wa rá.” < birin ji wan ra (5/15)

“em ê êne wir.” < Em dê bèn wir (5/2)

“ketne wê navê de.” < Ketin wê navê (5/1)

“wê îşev êne ewkê” < Dê îşev bèn ewkê (4/29)

“Xel siqêfa dikine bavê wê” < Xelk sixêfan dikin bavê wê (4/9)

“Ez ê rabim çime mal” (4/7)

“diná hav û em î êne malê.” < em dê din hev û bèn malê (3/22)

“ew kixş me tkirne xetîk.” < ew kixş me dikirin xetik (1/7)

“Tîkirne kuhara dá.” < Dikirin kuharan. (1/13)

“Em î çine rîsîya.” < Em dê biçin rîsîyan (1/17)

“em î derxine derva raxî:n.” < em dê derxin derve raxin (1/39)

• Di mînakekê da dengdêr ketiye navbera du beşên lêkera hevedudanî:

“ga wî j bîra kîriye” < gava wî ji bîr kîriye (14/37)

• Berî lêkera “xistin”ê dengdêrek zêde bûye:

“û pûş êxistîbûnê dá.” < û pûş xistîbûnê (12/14)

• Di hin peyvan da wekî cewîbûnê jî deng hatiye dubarekirin:

mi hemmi mi dşîşt < min hemû dişûşt (1/14)

• Di peyvekê da lêzêdebûna /m/yê derket pêşberê me:

Qambilî gundê bavê xwe < Muqabilê gundê bavê xwe (30/24)

• Dengê /h/yê carinan li peyva ku bi /e/yê dest pê dike zêde dibe û tê serê peyvê:

“me çilo *hewqa txwar*” < me çilo ewqas dixwar (1/63)

• Dengê /h/yê carinan di nava peyvê da jî zêde dibe:

“Di yek rojê de ha d *helehan*.” < Di yek rojê da ha diheliyan. (25/9)

“li wa komikê me *gerihin*.” < (dê) li wan komikên me bigerin (23/20)

“li mala *dgerihan*” < li malan digeran (23/6)

“Mi *rahişte* xencerê” < min rahişt xencerê (22/33)

“sê *sed* û pênci*h* milyonî” < sê sed û pêncî milyonî (20/39)

“gile*hê* wî” < giliyê wî (17/13)

“ez ê vege*rihim*” < ez dê vegerim (17/12)

“co*h*tîk bazin” < cotek bazin (8/5)

“sîvanoka wî di*şkihê*.” < sîvanoka wî dişikê (7/4)

“na*h*kê xwá < nokên xwe (1/4)

“wextê go *tiresh* digeha.” < wextê ku tirî digihaşt (12/5)

“nêhta mi *heye*” < niyeta min heye (20/5)

“mi dohn anî” < min don anî (6/4)

• Daçeka “da”yê di devoka Torê da bêyî daçeka “di”yê tê bikaranîn. Peywira wê jî ne “têdebûn” e. Li dû kîjan hêmanê bê wê şênbertir dike:

“me kîrne cêra *dá*” < me kirin cêran (25/20)

“Mi *bîr* nebirîyê *dá* wilo” < Min bîr nebirê wilo (27/19)

3.5. Kewîyana nedengdêran (contraction)

Ketina deng an dengan e ku bêhtir di peyvên hevedudanî da,³⁷⁰ lê bi giştî di bihevrebikaranîna peyv an da pêk tê. Di devokê da dema du peyv bi hev ra tên bilêvkirin ji ber nêzîkbûna cîderk an awayê derketina dengan carinan dengê dawîya peyva yekem dikeve:

“sê çar roje dî” < sê çar rojên din (4/17) ør

“hî j hev tîkirin” < hez ji hev dikirin (21/8) øz,

“tema mixaletî” < temam mixaletî (4/23) øm

“Di be re dîlok digotin” Di ber ra dîlok digotin (1/38)

“ça rojê m” < çar rojên min (4/21)

“Pê şeş mêşin < Pênc şeş mêşin” (5/29)

“dîsa des pê kin” < dîsa dest pê bikin (3/44)

“her ekî” < her yekî (2/19) øy

3.6. Dengên kelijandinê (nedengdêrên alîkar/ intervocalic euphonic consonant)

Dema peyv bi dengdêrekê biqede û qertafa ku tê dawîya peyvê bi dengdêrê dest pê bike, dengê dikeve navberê.³⁷¹ Her çiqas ev deng wekî “h, w, y” derbas bibin jî di devoka Torê da tenê /y/ û /w/ bi peywira alîkariyê tên bikaranîn. Ev dengên ku dikevin navbera du dengdêran, wekî nedengdêrên alîkar tên binavkirin û ev bûyer jî wekî bûyereka dengan tê pejirandin. Di devoka Torê da mînakên vê bûyerê tên dîtin:

“xwedîyê yî” < xwedîyê wî (11/12)

³⁷⁰ Sağnıç ev bûyer bi rewşa hevedudanîyê sînardar kiriye. bnr. Sağnıç, h.b., r. 27.

³⁷¹ Aktug, h.b., r. 44.

“^celeqê xwe j wa nayênin.” < eleqeya xwe ji wan nayînin (6/7)

“bidê pêşya xwá.” < bide pêşîya wan (8/63) îø

“Dîya yê vêca.” < Dêya wê vêca (8/63)

“Çî ye?” < çî ye (30/39)

“xwelya dara” < Xwelîya daran (10/2) îø

“rûwê yî” < rûyê wî (23/1)

“zarîwê xwe” < Zaro(k)yên xwe (9/13) kø

“didiwa” < didoyan (14/39)

“sî wû pênc mal bû.” < sî û pênc mal bû (22/6)

“Çî nebuwe?” < Çî nebûye? (9/33)

“ketne stuwê mi dá” < ketine stûyê min (9/39)

“Û çuwe avêtîyê” < Û çûye avêtiye wê (11/53)

“wilo rûwê yî tenî tkirin” < wilo rûyê wî tenî dikirin (23/1)

3.7.Cêwîbûn (geminatîon³⁷²)

Di dengê navîn da dubarekirina hin nedengdêrên ku di navbera du dengdêran da tîn, dibe cêwîbûn. Ji bo cêwîbûnê peyvên “şedde” û “cotbûn”ê jî tîn bikaranîn. Di devoka Torê da hin mînakên vê bûyerê hene:

“mirîşkê mi *hemmi* kuştin” < mirîşkên min *hemû* kuştin (6/9)

“mi *hemmi* mi dîşt” < min *hemû* dîşt (1/14)

“hetta go *xillas* kirin” < heta ku *xelas* kirin 26/16

³⁷² Ji bo vê termê bnr. Karaağaç, h.b., r. 488.

“Heççî ê wa yê dî” < Heçî yên wayên din (30/36)

“miştaxa me xillas dibû” < miştaxeya me xelas dibû. (12/49)

• Carinan di encama ketina dengdêrê da cewîbûn pêk tê:

“em ê şibey şiyê^{ne} Kercosê.” < em dê bişîⁿ Kercosê (14/30) iø

“paley^{ya} nîska.” < paleyîya nîskan (1/9) iø

“hebbi^{kî}” < hebikekî (19/24) eø

3.8. Cihguherîna/veguhêzîya dengan (metathesis)

Cihguherîna dengên cîran an dengên dûr e ku di yekeya ziman da pêk tê.³⁷³ Metatez pevguherîna dengan, bi taybet jî ya nedengdêran³⁷⁴ e. Di devoka Torê da jî ev bûyera dengî pêk tê:

“Yadê werá” < Dayê were. (7/9)

“na^e le l deriwê.” < lenet li derewê. (7/22)

“ez zehf şepirze bûm.” < ez zehf şerpeze bûm. (15/8)

“m î çine nîzêkê” < em dê biçûna nêzîkê (1/17)

“Hêvrist me tîkir.” < Hêvrist me çedikir (13/1)

“timam nahîná” < tamam nehatine (5/17)

“çi hewala wa yá” < çi ehwala we ye (7/55)

³⁷³ Karaağaç, h.b., r. 762.

³⁷⁴ Baran metatezê wekî “guherîna cihên nedengdêrên nava peyvê” pênase dike. bnr. Baran, h.b., r. 30.

3.9. Pevbestin³⁷⁵ (liaison)

Pevbestin di navbera du peyvan da pêk tê. Eger peyva yekem bi dengdêrekê biqede û ya duyem bi nedengdêrekê dest pê bike an jî berevajê wê, ya yekem bi nedengdêrê biqede û ya duyem bi dengdêrê dest pê bike axleb pevbestin çêdibe.³⁷⁶ Yanê dikare bê gotin ku pevbestin bihevrebikaranîna du dengên ku di yekeyên dengî yê ji hev cuda da cî girtine ye ku ev her du dengên di kîteyên cuda da di encama vê bûyerê da êdî di heman kîteyê da cih digirin. Ji ber ku ev bûyer, bi taybetî taybetiyeka axaftinê ye, di devokê da bi gelemperî tê bikaranîn. Axleb di encama pevbestinê da bûyera ketina deng jî rû dide. Ji bo cihê pevbestinê bê diyarkirin nîşaneyê “ ”yê hatiye bikaranîn.

• Peyva “min”ê bi pevbestinê dibe “m” û di heman demê da bûyera ketina kîteyê jî rû dide:

“Brakêm” < Birakê *min* (10/1) iø

• Bi pevbestinê qertafa “di-”yê axleb dibe “d” û di heman demê da bûyera ketina kîteyê jî rû dide:

“medgo” < me *digot* (2/8) iø

“Me paledxwestin.” < Me pale *dixwestin* (1/6) iø

“Me tkirne av” < Me *dikirin* av (3/52) iø

• Bi pevbestinê daçekên “bi, di, ji, li”yê dengdêra xwe winda dikin:

“Em î p fecrê rabin” < Em dê *bi* fecrê (ra) rabûbûna (1/21) iø

“heta go b destâ” < heta ku *bi* destan (2/9) iø

“Em î j xwe rê” < Em dê *ji* xwe ra (3/48) iø

³⁷⁵ Ev peyva ji bo bûyera “ulama”ya tirkî hatiye bikaranîn. Açar ji bo vê bûyerê peyva “biservekirin”ê bi kar aniye. bnr. Açar, *h.b.* r. 30.

³⁷⁶ Karaağaç, *h.b.*, r. 813.

“em ê ş xwe rê” < em dê *ji* xwe ra (4/11) iø

“wa jî l tihêla wa deynim” < wan jî *li* tihêla wan daynim (4/33) iø

“Go b dilê herîka bê” < Ku *bi* dilê herduyan be (4/19)

“Di dar á d bin çengê wî de bûn” < Du dar *di* bin çengên wî da bûn (6/21) iø

3.10.Lêkdana dengdêran (hiatus)

Di nav peyvê da an jî di navbera peyvan da hatina cem hev ya du dengdêran e.³⁷⁷ Ji ber ku kurmancî ji bo pêkhatina hîatusê ne guncaw e, ji bo rê li ber vê bûyerê bê girtin, di devokê da bi rêya ketina dengdêrê û hatina dengê kelijandinê axleb ev rewş ji holê radibe:

“tî xwelîyê *na*:vêjê vê çalê” < tu xwelîyê *naav*vêjî vê çalê (11/41)

“gotiye wa *nav*vêjnâ...” < Gotiye wan *neav*vêjin (11/51)

• Di mînaka li jor da ji bo ku hîatus pêk neyê dengdêra /a/ ji serê peyva “av”ê dikeve û /a/ya qertafa neyînîyê dirêjtir tê bilêvkirin.

• Di mînakên li jêr da jî ji bo ku du dengdêr neyên ser hev, dengê kelijandinê hatiye navbera wan:

“çîyayê Gêrê” < çiyayê Gêrê (1/17)

- (35) Na'. Ozerlî ye d neqeba... Di neqeba Dor̄tyolê û Peyasê de bû. (Kurê wî dipirse: "Ozerlî bi Dor̄tyolê ve girêdayî ye, ne wilo?") Pê ve girêdayî yá, wilo. Á l ber hev in hema wilo... Ji Peyasê hebíkkî dûr á. Êdî werhasî:l... (Kur jê dipirse: "Li wir jî hûn çend sala man?") Çar sala em man. Mi xanî firoş. Mi rabû da p sê sed û pêncih milyonî. Ê, sê sed û pêncih hezarî. Û êdî em rabûn.
- (40) Hey Hecî Eħmed "Yabo filan." (Çayê vedixwe.) Elħemdulillah, Xwedê zêde p̄kê rebî. Êdî em hañin. Gelík... Ma ew dibê qey vê ga: tiştê go hañiye... Li 'emela, 'emrê mi d 'emela dá... Pi Qur'ana te xwendî ez tiçûmá paleyîyê. Li Bişerîyê mi paleyî dkir. Mehkî heka çil rojî. Bi das û qınaxa. Ji şeveqê heşa mixurbê. Go dibû vêca wextê p̄ayizî vêca z î çime 'emelê. Zarokê mi hebûn
- (45) raş... Û tişt vêca êdî nebûn. Û rezne má hebûn. Ma'lum á rez ma te go... Ez sê meha carna çar meha jî e l 'emela dimam. Werhasil... Heşa go... Yanî 'emrê mi d wilo de çû xwarzê ha. Erê sehîdê m ez qurbano! Werhasil.

21

- (1) Vêca qismet... Me keçikne xwe li gwind dan. Me dane exlebe ê... Yek me da kurê xweha wê w me yek da kurê brayê wê. Ew vêga w î l Elmanya yá. Ya go me da kurê birayê wê. Ew jî Xwedê 'emrê wê dirêj kê Qur'anxwên á. Dersa zarokê xwá tev de didê wa. Û hal û wextê wa yî xweş á. Dolmîşa wa: şehiriçi
- (5) heya l vê drê w vilayê wa hená w werhasil başqa perê wa hená, zahf. Liqunta, vêga l wê derê liqunta ew tîkin. Werhasil êdî em çûne wê derê. Keçikê me jî á piçûk bû. Me ev... Em çûne wê dirê. Hine Dalînî hebûn. Hemşerîyê kurê me bûn. Wilo hi j hev tîkirin. Hañin go "Ka bidine má, wela kurîk..." Me go "Em nadin." Werhasil filan bêvan. Werhasil go "Bera kurîk bê." Kurîk jî l Dalînê
- (10) bû. Gundê Dalînê. Te navê Dalînê bihîştiye, ne wilo? Te dîyá? (Ji nivîskarê tezê dipirse.) Hañin, werhasil axir kurîk anîn. Êdî me fihêt. Me go wela ji waqa dera hañiyá filan û bêvan û me goş werhasil... Kufletê me go "Kesinliklá em nadin. Kurê me jî... Mi go heyra wellah go Xwedê kiribê em ê ew kin. Werhasil go heyra hema me go "Tewekkelna e'lellah. Tişt go Xwedê qismet

- (15) bikê... Yanî hine dî jî hañin hê l ba me filan û bêvan. Ev... Me rabû me dayê. Vêca me goşá wa, me qewlê xwá kir. Me go “Illeh kúrik li gun namênê, illeh... Go neyê vir...” Go “Temam, ser ça^{ch}va.” Amê wî hebûn. Bavê wî jî nebû, kúrik. Werhasil em dirêj nakin. Êdî ev keçka xwe jî me da wî kúrikî w, kúrikîki zahf qenc á. Vêca rabû, me dayê dá w îdî werhasil axir ew jî hatne wê derê lo!
- (20) Hatne wê dirkê ev çend şala. Ev çiqas çêbû keça m? (Keça wî bersiv dide: “Sih û heft heşt sal çêbû.”) Maşella:h! E d bê qey diho yá. Vêca rabû hañin û werhasil mala xwá anîne wê derkê w dikanke xwá vekirin û vêga xanî çêkirine ş xwe re w kurekî wa jî vê ga mi^celm á w yek jî axir filan bêvan. Baş elhemdila. Yek jî gişt hema w ê bê mi^celm. Vêca ez çûm. Go “Ma t ê çê kû?”
- (25) Mi go “Weļa ez ê çimá Peyasê.” Go “T ê çê çi?” Mi go “Weļa keça min á l wê drê bû.” Go ma “Pîreka kê yá? Mi go “Pîreka yekî Dalînî yá.” Go “Malnexerabo ma kes nebû go te keça xwá da, te da Dalînî yá!” Ê ne, ná: wilo ewkî ne. Bê ka diz in, axir ne á ewk in, nizam çi axir filan bêvan. Ná: wilo ewkî na. Îca go “De ka bêje ka bê ...” Mi go “Tî j ku wa naş tkê.” Go “Ka
- (30) bêjâ!” Mi go “Weļa mi daye, navê kúrikî, navê wî Zenawer á.” Navê wî kirina “Evdurihman. Bavê wî kiribû Zinawer. Tîçû Binxeşê dihaş. Vêca axir wilo go tî çi dbêjê? Mi go “Weļa...” Go “Vêca diyecexa m go hiç nîná.” Go “P Qur’ana te xwendî go kúrkê weke wî nînin di va dra dá.” Go “Ê weke wî qenc û helim û şereflî û qenc û xweşik û, go ê wilo nînin.” Go “Vêca te kir go ez... Ez... Dilê
- (35) mi rûnişt. Werhasil î camêr á.” Ew... Ez î çimá Peyasê, vêca di rê dá em á d ‘erebê dá bûn. Á, yekî wilo j mi re got. Go “Ma t ê çê kû?” Mi go “Hal û mesele ev á.” Mi go “Dalînî yá.” Go “Ma kes nebû go t bidê hiná Dalînî.” Mi go “Halo.” Wextê mi behsa vî kúrikî kir, go “Temam.” Erê yîdî vêca mesele... Vêca kúrik heqqet ji me w bavê me çêtir á. Ê l ber dikanka xwá yá, dayîma
- (40) Qur’ana wî d destê wî de ye txwênê w. Elhemdê Xwedê şikir. Keçka me jî Qur’anxwên e elhemdila w Xwedê jê razî bê. Vêca ê go me keçê xwa ddane wa mi dgo... Me yek da yekî Xerabenî ew jî pismamê me bû. Hecî Xelîl bû. Mir,

rehma Xwedê lê bê axir. Mi go “Hema go limêj bikin...” Şertnâ xwá... Heka wa ça:k vexwar ew jî, keça mi jî wê ça:kê vexwê. Li wê derê l^cerdê raza ewê

- (45) jî razê. Hema yałaniz go Îslameî hebê w xilas. Hema go limêj bikê w xilas. Başqe mesele nîná. Herê emîn bá! Ha vê ga, vê ga xelk didê hema dibê go... Erê: herê’!

22

- (1) Em á l Xerabê Bena, l gundê Xerabê Bena bûn. Rehmaîyê Hecî Oşman, bavê Muhibedîn, ew û apê min î Hecî ‘Elî tevde çûbûne hecê. Á! Tevde çûbûne hecê. Di qirk dorê dá, hecîyê qirk dorê bûn. Qirk ikîyê xelá bû. Qirk dorê dá çûne hecê. Vêca mirhovê hev bûn. Ha go “Wela p Xwedê me zadê xwe safî
- (5) kirîyá, ce w genim, û ker nînin li gundê Şfêrê.” Î Şfêrî bû á Hacı Oşman. Go “Wela p Xwedê ker nînin.” Ê Xerabê Bena sed û sî wû pênc mal bû. Ma^clum á ker á zahf bûn. (?00:42) mala Hecî Naşir. Go “Wela z hañime kera.” Werhasil “Go hin jî b mi re bên û em herin zadê xwe j benderê em bibine ma:l.” Á ker, li gundê má her kes bi benderê xwe vá meşxûl á, axir kes nadê kesî kera lo! Me
- (10) rabû em êvarî em gerehan, me pazdeh ker û qantirek, ê mala Hecî Xelîl bû, me dane hev. Sibehî ez û ‘Evdilehê Şawîş em p Hecî Oşman rá û wa kera re doxrî û em hañin, em hañne Xanoq. Ew devera go benderê wa lê bûn ew mowqû^c navê wî Xanoq bû. Ji Difnê w wê de bû. Neqeba Difnê w Şifêrê de bû. Em çûne bendera, má her pazdeh şazdeh heywan me barê... Têrê wa me dagirtin ji
- (15) genim û ce û me biriná Şifêrê. Me biriná Şfêrê, ê ma^clum á ‘Evdile jî hewqasî xwe wilo xwe ne ddayê dá, ez mecbûr bûm. Diqulibandine ser milê mi ew ewkê wilo ma^clum á sed kîlo bû ha! Sed kîlo, noç kîlo yanî hebû pi xwá. Ê mi d derencê rá mi d bire banî. Me vala tkirin, derhal hema me vala tkir û dîsa me tanî axir... Her pazdeh şazdeh heywan me barê wa danîn, me vala kîrin û dîsa
- (20) em vegerehan em çûne benderê. Em dîse çûne Xanoq. Ca:reká dîtirê me wilo ew heywan me barê wa bar kîrî:n, me dagirtin têrê wa, me dîsa bar kîrin, careke dî em çûne gund. Ma^clum á qûnaşa sê çarîka hebû, zêdá... Qûnaşa sê

çarîka hebû, rê. Me dîsa ewqa bar me vala kîrin û careke dî em vegeřane benderê. Zadê wa yî zahf bû, ma^llum á, wilo zengîn bûn camêra. Werħasil cara

- (25) sisîya heřa go em çûn û mexreb. Go “Şîv bixûn.” Me go “Na weļa p Xwedê m şîv naxwin.” Û me rabû me heywanê xwe dane ber xwe, her şazdeh heywanê xwe. Min û wî, ^lEvdîlê Şawîş, û me lêxist û em hařne mal. Em hařin, bi rê dá ma^llum á piřtî ^leşayê wa yá, em diçin, mi dî carekê ser me re wilo kaş á, ma^llum á wilo. Á! Û devî ná, ormanlık á, mi dî carekê kevirekî go “Vir:!” û di
- (30) ber guhê mi ĩre. Mi nekire tiřtik. Ez î siwar bûm. Mi dî carekê dîsa kevirekî ddiwa go “Vir:, vir:!” di ber guhê mi ĩrá. Heķ! Kuro mi go “Bê ew kî yá ti...” Ez peya bûm, xencer jî á b mi ĩre bû. Erê bawer pka. Şixwe ez xelfî nabêjim. Mi rahiřte xencerê û bawer ka mi kevirik ddo jî dane ber sînga xwe vá, ev cihê go te dî kevîr dihařne má. Ez çûm, mi wilo ew kîr. ^lEvdîle go “De werá kirîvo,
- (35) werá yawo, tiřtik nabê.” filan bêvan. Mi go “Eleqê te jê nîne, ti kera bajo, ^leleqê te jê nîná.” Ez çûm weļa axir ez çûm û hařim mi go “Bê ti kî yá ti xwe eşkere nekê ez ha w ha l te bikim.” Mi xeberê pîs jî gořin. Û p Xwedê ti kesî xwîya nekîr û careke dî ez çûm. E çûm. Ez çûme wî yalî, careke dî kevirkî dduwa dîsa go “Virr, virr!” dîsa di ber guhê me rá. Heķ li vê ^lecêbê! Go de
- (40) were kirîvo tiřik nabê, were lo wera, xem nîn á. Mi go “Kuro çi tiřik nabê yaw?” Heyra mi go “Bê ti kî yá eva ez têm jî, ti ewk nakê, ti deng nabê xwá. Û belkî ez di ber te ĩ jî diçim, ez te nabînim, reş á. Heķe go ti axir xwe l mi eşkere nekê ez ê ha...” Mi xeberê pîs gořnê de dîsa. Werħasil cihek, tiřtekî xwîya nekîr û weļa dîsa ez gihame ^lEvdîla, em çûn. Em çûn, me digo Derîkê Gewrik,
- (45) řaserî Dêrdîlê yá, werħasil neqebke wilo ewk á. Mi go “^lEvdîle!” Go “Çi ye?” Mi deřtê xwá danî ser xencera xwá û weļa e l pêşîya heywana ez çû mi go belkî hema vê gafkê li wê derê bin jî ketîbine pêşîya me dá. Á! Erê emîn bá! Ez ketme pêşîya heywana de weļa û ez çûm di neqepkê de weļa m deřtê xwe danî ser xencera xwá û ez derketime piřta ewkê. Weļa ez çûm, e dmeyzênim tiřtek

- (50) xwîya nekîr. Ma^clum á neqebke halo teng e ha! Wilo weke ^ceyn weke boxaza Çeneqela yá. Rábûm ser xwá tiştekî xwîya nekîr û weła em hañne mal. Em hañne mal û rabû sibehî mi go “Evdîle mey tiş kesî rá nebêjê. Şixwe me tiştik ew nekiriya. Tiş kesî re bêjê wê bê weła tîrsaná.” Axir hal û mesele, go “Na nabêjim.” Çû j bavê xwe re got. Rábû bavê wî jî ji apê mi re got, Hecî ^cElî.
- (55) Hecî ^cElî jî mezinê gund bû ma^clum á. Rábû şiyande Şfêrê go “Ha:lûmesele ev á. Bê w kî ne ewê Şfêrî hañne ketine pêşîya wa dá, kesinliklá ez qebûl nakim.” Rábû wî Hecî Oşmanî jî rabû vêca gundî... Ê ma^clum á mezinê gund á: camêr. Axir xel jê tîrsîn, Mala ^cElo jî, mala Pîso jî w mala ^cEmer jî axir nikarin xwe bidne ser, tev bidin camêr. Muxtarê gund á w axayê gund á werhasil axir kes
- (60) nikarê xwe jê ew pikê. Mala Mûso jî á qewetli ná. Rábû timmama rabû p Qur'anê dane sundê. Go “Ev tiştê ha ne em çûne w ne zarî ne kes ji me jî... Heyra çi heqê me heye çi em... Û zavayê me ya, çima mê çin heyra weke mesela ewê.” Ma^clum á e jî zavayê Şfêriya má axir. Bavikkî dî yá. Rábû ser xwá axir wilo çû. Saî tê ve çû, ew hingî ma^clum á havîn á, bû behar. Rezê mi jî,
- (70) mi mala xwe anîye Şfêrê, ez çûme Xerabê Bena. Apê min î Derwêş hebû, meţka min e l balê bû. Mi go “Weła hingî...” Mi go “Weła zê ha wi ha...” Mi ev mesele mi got. Em á l ber sobê ná. Mi ev mesele got, mi go “Weła zê ha w ha bi namûsa te kîm bê t kî yá...” Go “Hiş birazî, hiş e meştexilá!” Mi go “Çi yá, çi yá kuro ma ti... Amo pok! Ma ti çima ti dxeyidê, ma tû yî?” Go “Na
- (75) birazî weła go hingî pîz anîbûn dabûne mexe:l, li wî ^cerdê go vê gafkê kîriye rez, Hiseynê Mala Mişefa, ê mala Hamid wa bû.” Go “Pîz dabûne mexe:l, go rabûyá goñîye hêdî emê çin wî ceribênin, Si^cid û Emîn her dû. Dev şî pîz berdane î d mexel de yá û hañne ser we rá. Ew wa ew kevîr avêtîbûne tá. Hal û mesele ev á:” Wextê go hingî em... “Emrê me axir... Ha vêca, vêca rabû wî
- (85) apê mi, mêrê meţka mi go “Hiş!” Mi go “Çi yá?” Go “Weła herdû birayê mi bûn. Emîn û Si^cid.” Go “Hêdî emê wî ceribênin. Hêdî, bê ma ka wê, bê ma ka wê bazdê a wê tîrsêhê, ka bê ma çawa yá.” Go “Weła camêr axir xeberê

pîs...” Go “Me níkarîbû em bê weļa hema níkarîbû em bê em jî, werḥasil.” Go “Herdû brayê mi bûn û ḥalûmesele ev á:.” Werḥasil vêca wextê go em hingî

(90) genc bûn lo! ‘Emrê me diwazdeh e sêzdeh e û axir di wê arayê dá.

23

(1) Serşalê vê carê em î yekî kine qirdîk. Qirdîk, wilo ruwê yî tenî tkirin. (Dikene.) Weke dèlkewkî jî tkirne nav paqê wî dá, weka, weka ewkê kerê lo! Weļa Xwedê wikîl á, ‘eyn wilo Mihemed Emînê Remê rehma Xwedê lê bê. Ha vêca tçû. Wextê ew tkir digo “R:eq!” Ha wilo drabû, wilo d nav paqê wî dá. Nizam

(5) bi miqamkî çêkiribûn lo! Á! Ê ruwê wî jî á reş tkirin, ruwê Mihemed Emîn, axir wilo û vêca em neh dehek em pê rá. Em diçûn em li mala dgerêhan vêca. Me dgo

“Serê salê binê salê,

Xwedê kurkî bidê

(10) Kêbanîya malê.”

Vêca dirabû benî ye hejîr e ddane me, ev xarûs, ê hejîra, te dî ê hejîra qut çêkiribûn. (Kurê wî dipirse: Navê wa çi bû?) Benî. Me dgo benî, ê Pişêrî dibê xarûs. Á! Werḥasilî kelim û ḥelîl û mewj û gwîz û werḥasil axir. Didane me lo! Heṭṭa nivê şevê vî qasî em digerehan li nava gund. Ma lum á şev á dirêj

(15) bûn werḥasil. Ê em digerehan û em î yên êdî em î leva kin wa ewka. Ma ê má: zahf jî bûn lê hema wilo... Me wilo, tişkê wilo, kelevajîkê wilo me tkirin. Vêca em, em î çin bi ro em î vêca çin me dgo “Qaqilkê mişko gû rişko!” Má komikê axê li hundirûwa çêdkirin. Li koxa t tewļa de ha, komikê axê. Ha wilko (Bi her du destan nişan dîke.) belkî sed komik me çêtkirin. Em yek ddo... Ê vêca em î

(20) çêkin, yekî dî vêca w î li wa komikê me gerihin. Em jî l ê wa dgeran ew jî. Ha kelevajîkê wilo. Vêca m tiçûn w î bê “Xera mera!” W î vêca lingê xwe l wa xê,

w̄ î xera k̄in. Me dgo “Qaqilkê mişko gû: rişko, qaqilkê mişko gû rişko!” Ha kelevajîkê wilo lawo, tiştê beredayî. Mesele yanî á wilo.

24

- (1) Wextê go roja ‘eydê dihat vêca em̄ î rabin em̄ î goşt kirin. Herkesî netkirî. Á! Em̄ î goşt kirin, ez û diya tá. (Li kurê xwe dinêre.) Em̄ î di kîlo sê kîlo goşt em̄ î kirin. Ê w̄ em̄ î teşîk birinc çêkin. Ê em̄ î sibehî vêca em̄ î rabin û e nedgerêham jî. Kerê me jî hebû. Vêca me digo... Ê Ehed jî hebû, Hecî:
- (5) Hmedê kurê má. Em̄ ê vêca rabin çine Şifêrê. Ê vêca ewqa goşt li wê derê w ewqa birinc. Rabû vêca em̄ î deynine mala mixaletîyê me yî Birahîmê Seyit Xelîl. Nûrê jî hem kêçama wî bû w sehîd bû ew jî û te dî bavê wî w bavê m mixaletîyê hev bûn. Diya wa xwehê hev bûn. Em̄ î wê teştâ birinc tevlû wî goştî ez î bim li mala wa deynim û ez û ew vêca em̄ î êne Şfêrê. Me dirâştâ
- (10) Ehed, me l ber xwe t̄kir. Ew siwarî dibû, mi l ber t̄kir û em̄ î êne Şifêrê. Vêca go em hatîne Şifêrê, werhasilî kelam, em̄ î sê ça roja mênin. Digo we la vê ga jî digo “Bere neyên. Ew û Ehed bera l vir bin. Ti herê mal hema.” E drabûm, ez î em̄. Wextê go ez dihatim vêca mirîşkê má hebûn. Mirîşk lo! Belkî deh pazde mirîşkê má hebûn. Ez dihatim, wextê go mi derî divekir, ma lum á mala má: l
- (15) ‘erdê bû dîse lo! Á! Mi derî divekir ji hêka nedvebû. Hingî hêk kiribûn lo! Belkî sed lib hêk (?11:06) axir wilo. Vêca he ta mi derî hê:dîka mi d vekir ewqa hêk, vêca ewqa me ddane xelkê ha! Me ewqa ddane xelkê. Me ddane metka xwá, me ddane cîrana wû filan û bêvana xwá ewqa.

25

- (1) Ê rojekê vêca êş ke te mirîşkê gund dá. Belkî sih mirîşkê má hebû, axleba ferûc bûn û dîk bûn. E j dara hatim, ji êzinga. Me dgo Gelîyê Zirne, em diçûne êzinga. Di ker bûn axir mi di bar anîn û ez hatim. Êş hatîbû, ê cîranê me jî nemabûn ha! W ê me tenê hê êşê li wa ew nekiribû. Go te li wa dimeyizand

- (5) hingî mirîşkne wilo spēhî... Mi_{go} “Hácî Zekîya em_u gurêni:n, meyzêna bi Xwedê ê me jî...” Go “Na, ê me namirin filan bêvan.” Mi_{go} “Kêçê pi Xwedê kesîk... Mirîşkîk di gund de nemaye w ê cîranê me jî... Û va yá p Xwedê dor giha má.” Vêce dibûná aha aha hestîkê wilo ha! (Tilîya xwe ya şehdê nîşan dide.) Di yek rojê de ha d helehan. Êşa mirîşka... Râbû çû kaniyê. Kaniya má jî
- (10) kaş bû wilo dûr bû. Râhişte kedûnê xwá, cêrê xwá û xwe berda kaniyê w hêdîka carekê mi derpêkurt li xwe hişt û kêreka má: b kalên jî bû mi j kurtanker kirîbû. Û hêdîka carekê mi_{go} “Tû tû tû tû tu!” Weļa hañne hundirû. Mi_{genim} avête ber wa û mi_{derî} girî û z ketme nav wa dá. Ewqa mirîşk û dîk mi_{tîmam} gurandin. Mi_{avêtne} wê derê û e rabûm e derketim. Mi_{destê} xwá şîşt, e
- (15) derketim û weļa ez leqayî bûm. Kedûnê cêr li ser milê yê bû, go “Tê çi kê?” Mi_{go} z ê çime camîyê. (Dikene.) Go hañbana şxwe îdî ew mehel î l me ferîcê lo! Werhasil ez çûm, mi_{limêja} xwe kir û ez hañim. Ez hañim ga: xir vêca digirî w filan û bêvan û mirîşk e li wê rê w cîran hañiná b me vá. Hañne b me vá, timmamê wa pirtîkandin û me timmamê wa me rûvîkê wa: yêtin, me j ev kir
- (20) axir, me kirne cêra dá vêca me kesidandin. Wextê gurana dermala ye jî ha! Dermalê me jî di hevûrîyê qenc hene, di nêrî. Amê m Derwêş her dû jî gurandin, mi nizanîbû z heywana bigurênim. Her di jî gurandin û ew mirîşkê me ew kirin û werhesilî kelam axir û kûrê hazira sax. Tişkî te yî dî ma kûrê m?

26

- (1) Êdî vêca behara hela go bû payiz em î vêca mewuja em î ênine Pşêrîyê. Em î dine bi genim. Vêca má ^celbîk mewîj me_{dda} bi di ^celb genim. Á! Me_{dda} bi di ^celb genim. Ma^clum á wilo ne heram e jî. Ya ce bana me_{ddane}... Axir me_{ddane} bi genim. Vêca rabû e carekî vêca re... Beraz ketê miştaxa me dá.
- (5) Miştaxa mewuja, te dî go rez... Me nizanîbû beraz e lêbelê go cihê simika wî wilo xuya t kir û wilo xera jî kirîbû hebbîkî. Vêca rabû apê mi_{go} “Weļa p Xwedê ji me rá çênabin. Em ê çilo kin?” Râbû ew mewuj dane hevdû û ez pi

xelkê re dişandim ma^clum á. Ez b Hemoyê Miradê Sofî wa rá. Em çûne Zercelê. Zercelê ha va yá w î l dera ha yá Zercel. Belê wa ha yá lo, gunde kî

- (10) mezin á. Á! Vêca taxekê Îzîdîya hebû. Vêca gund î xilbe bû, mişîlman bûn. Taxa Êzîdîya á l aliyê vî yalî: qesrê bû axir. Vêca rabû m mewîj dan. Go “Ka çima win vî barî jî navekî bavo?” Vêca hingî á spêhî bûn mewîjê me jî. Bawerká ha halo bûn, hingî wilo zer (Rengê mîndera zer nîşan dide.). Go “Na ew ne ê ewkî ye, j mirhovê xwe re anîye, na! Navekê! Ê vî kurîkî yá j mirhovê
- (15) xwe rá anîyá.” Halbikî w î bine taxa Êzîdîya, w î dine Êzîdîya, ji bo go be^raz ketiyê. Hima ha wilo. Erê bawer biká. We^la he^tta go xillas kîrin wella me rabû... Têra mi bar kîrin, hevalê mi û me bire, bire aliyê taxa Êzîdîya. “Werne mewîja!” w we^la ha^tinê de. Wextê ç^hv li mewuja kîri:n û carekê ji nav destê hevdû reyandin. Di ser bi genimê qenc me da. Me têra xwa da: girt û axir me
- (20) ewk kîr. Ê êdî em ha^tin. Em ê yanî em diha^tin vêca l Hes^kîfê kop^rî nebû. Ev pira ha nebû. Vêca qeyîk hebûn ha. Ew kelek hebûn. Vêca m î çin rajinâ hefsarê wê. Em ê rajinâ îpê wê. Em î şyênin he^tta me taⁿî baⁿî û em tîketnê de û em derbas dibûn û tçûn. Vêca carina nivê şevê em digihane... Pi şêv û bi ro yanî “îşê me kîrwan bûn ha! Herê, ê mi p xwe mi wilo dî. (Pirsek ji civatê
- (25) derheqê hebûn û nebûna şelandinê ya wê demê de tê.) Ê ma pa ne me tiş^tkî wilo me nedî. Ew zemanê berîya má ew digo “Mala He^cî ‘Evdîla, Mala Emînê E^hmed wa, te dî li Şikefta...” Á! Te dî á qesreke wa yî l serê ewkê yá, digo xulamê wa xwe dişandin dketne pêşya wa dá. Te dî wilo dibirne wê drê, digo helîl û melîl ji wa tşi^tandin û mewîj û axir filan û bêvan ha wilo. Herê we^la
- (30) wilo.

- (1) Erdne me hebûn û ayîne má hebûn û filan, zad hindîk bû ha, te dî hindîk bû lo! Á, ma^clum á! Herê p Xwedê. De bixûn yabo bixûn, rajê bavê xalê xwe. Rajê qubano! (Mêwe anîne orteyê.) Erê we^la kuro. Em çûn, em tçûne paleyîyê. Ez û yekî sehîd, mixaletîyê bavê mi bû. Dîyê wa xwehê hev bûn. Mercî bû. Mercîya

- (5) û Xirbeh hene şxwe. Vêca rabû em çûnâ Xerza. E çûme malekî weļa. Axayê wa bû. Wilo lingê wî yâ şaht bûn. Mi go “Ma paleyî l ba we nîná? Em dido ná: m haşine paleyîyê.” Wî go “Mixaletî ti herá hema.” Ez derketime banî. Go “Belê weļa heyá, lê palekî má, palekî me heyá.” Go “Ne avê txo û ne nên tixo û ne tiştekî, ne tişt, ebeden, naçê tiwaletê w ne tiştekî û axir û nizam rojê çiqasî
- (10) didirûyê.” Go “Win wilo bibin ser ça^{ch}va em ê we girin.” Pek li vê! Mi go “Heyra weļa em feqîrê Xwedê, heyra em reben, çawa go t ê dibê weļa halo? Û nizam çi.” Ê go “Ev á, heká win wilo didi:n em ê we girin, te w hevalê te her dûk. Heke naxwe em we nagrin.” Weļa aqlê m... Ez rabûm, ez rabûmá ser xwá. Ez rabûmá ser xwá, mi xwe berda. Go “Ma ne go çi, mixaletî?” Mi go
- (15) “Mixaletî heyra p Xwedê go palekî me heyá ha:lûmesele ev á.” Mi dî kenî, kenî. Mi go “Çima tkenê?” Go “Kuro çê li biçerê kirinâ.” Biçer jî á d nav zêd de bû ha. Biçar jî á d nav zêd de... Zad dirût. Á! Go “Kuro mixaletî ha: biçer...” Go “Çêl i biçerê kirine malnexerab ma ti...” Ê Xwedê wekîl á mi go “Mi bîr nebirîyê dá wilo.” Em derbas bûn. Digo Zêwîka Şêxa, vêca á l wî yalyê
- (20) ca^{ch}dê bû. Werhasil biqambilî wî gundî bû ew jî. Em çûn weļa l wê derkê navê yekî ‘Erebê bû û navê yekî Mûhyedîn bûn, birayê hev bûn. Ê paleyî... Go “Weļa paleya me heyá û werhasil go win ew bikin em ê dine wá.” Me l ev kir axî:r. Em... Go “Toy pí toy á.” Yanî bê çiqas mesela toyê çêlkê yá em ê wê çêlê dirûn w ê çêlkê dine me ha! Çêlik bîst ‘elbê Pşerîyê ná. Á! Werhasil wilo.
- (25) ‘Elba wa jî pênc kilo yá. Á! Rabû me go “Bere bê!” Axir weļa me ew kir. Bawerîya te bê hîvdeh roja me paleyîya wa kir. Em dido bûn, ez û ew mixaletîyê xwe, me kir. Vêca roja ‘ewil me kir me meyizand ew biçer w î sekînyá. Ew biçer w î sekînyá di nav zêd de ha wilo, wilo li wê dirê sekînyá. Roja dî sekîni, me go “Bavo ev... Çima ev naşixulê, ev biçer?” Mi dî ew ê
- (30) ‘Erebê ye bê çi yá, Xwedîyê go m paleyîya wî tkin go “Xera bûyá.” Go “xera bûyá. Çûnâ w ê parçê wê, w ê bine ‘Intabê.” Go “Birine ‘Intabê. W ê bin. Go ne l ‘Intabê bê l va dera çenabê. Heyra w ê bin w ê l ‘Intabê wê çêkin, vêca d

çend roja dá wê çêbê l ‘Entabê, wê ênin. Êdî ha wê parçê wê lêxin, heşa bişixulê.” Pî Qur’ana go te xwendî em li wê derê man, li wî qasî em şazdeh

(35) hîvdeh roja em man me paleyî kirîyâ hê bîçerê yî şxwe wilo, hê parçê wê nehatîbû, hê wilo bû. Mey yanî Xwedê Te’ela carina tiştina l hina... Goşe mi, go, go “Heka win weke wî paleyê me bên, ne ayê txwo ne nizam çi...” Meyzê kurê m Xwedê li wa girt ha! Hê? Bêhenek jî yanî wilo, tiştne wilo, wilo xwe qure kir, nego “Wela ev feqîrkê ha û ev...” Mesele lo! Ê ez î wilo beîlî, reben

(40) û ez î tî, mi nego “Ka ayî m werênin.” wilo go wilo ew kirin. Heyra wela mi go “Em nikarin wilo pkin.” Mesela m li ser yanî... Ê em hatin êdî hê bîçer á l wê bû.

28

(1) Vêca qurban wela hema werhasil zanê kubir yanî insan wilo nefis ji insanî re çenebê xwarzê ha. Go nefis çêbû, mala insan bir. Çunkî ‘alimê me dbêjin, wilo dibê “Nefs û şeytan birayê hev in.” Bêhenek jî nefis û şeytan yek in ha! Ê kubir jî ş xwá Xwedê kubarî ş xwe re girtîyâ ne wlo? Goşîye “Mi kubir şî xwe re

(5) girtîyâ.” Binêre insanê go xwe kubar bikê goşîyâ ew cinetê nabinê. Ha vê carê go ‘ulemayê welaşê jor go hatne ba Hîzretê. Belkî te navê Hîzretê bihîştîye, nebihîştîye... Hîzretê, navê yî Mihemed Dîyadîn á. Ê go te dî terîq da Şêx Ehmedê Xiznewî w... Te navê Şêx Ehmed jî bihîştîye ne wlo? (Ji nivîskarê tezê dipirse.) Á! Li Norşîn in. Vêca go hatine Norşîn go “Qurba em hatine ba

(10) tá.” Go “Ka ma yek pi çi digihê Xwedê. Yek pi çi digihê Xwedê?” Ê go “Zanê çi ye?” Go ê... ‘Ulemayê xurt in, ê go wî ders daye wa mesela, ‘alim in. Go “Ha bera ew sofîkê má yî ha” Sofîkê wa yî nav malê, te dî ê go xizmetê dikê, feqîrkî weka min á. Go “Ha bera ew ji we rá bêjê bê p çi digihê Xwedê.” Go “Qurba em hatine ba te Xwedê ş te razî. Feqîrkê sofî ş ku zanê bê çî yâ? Em

(15) ‘alim in em niza... Em hatine ba te, ti dbê bere sofîkê ha j we re bêjê.” Ê go “Heyra go wî j we re negot ez mecbûr im ez ê j we re bêjim.” Ê mane sekîni. Mane sekîni, Hîzretê go, Mihemed Dîyadîn, go “Sofi!” Go: “Libê qurba!” Go

“Ka were ev ‘alimê me da^{ch}wkê l me tkin.” Go “Çî yá?” Go “Dbê ma yek bi çi digihê Xwedê?” Dibê sofî beşîşî. Sofîkkî feqîrokî yá. Dibê beşîşî, hat, î ş pîya

- (20) yá. Ew jî lê dmeyzênin ka wê çi kê. Go “Bismillahirreḥmanîrreḥîm!” Dibê eha ev pîyê çepê, ev pîyê çepê ha halo kîr. (Bi pîyê xwe yê çepê gavekê davêje û pîyê çepê datîne erdê, wekî ku tiştêkî biperçiqîne.) Go “Iha mi nefş mi kîre bin pîyê xwe de, mi perçiqand, mi rezîl kîr. Mi kîre netiştî û bismillahirreḥmanîrreḥîm, iha z b vê gavê ez gihamá Xwedê (Pîyê xwe yê rastê
- (25) avêt pêş.). Bi vê gavê mi rezîl kîr, mi nefş pîş kîr, mi kîre netiştî û aha b vê gavê ez gihamá Xwedê.” Dibê êdî ew ‘alim mane ‘ecêbmayî. Ha: ha! Dibê êdî wilo şêx hema wilo destê xwe da ber devê xwe, tebesûm kîr û ew ‘alim mane ‘ecêbmayî. Ê go “Qurba ma vilqa... Me evqa ‘ilm xwend, go yanî em tefekkur... Yanî em ferqinde nedibûn ha, go me dgo bê ka, ka çawa yá.” De
- (30) meyzê ‘alim bûn û nizanibûn bê mesela ha wilo. Ê te dî ma‘lum á wî sofîkî bihîstîbû qey çend cara wilo goṭine mesele, wilo goṭine mesela. Dibê go yek nefsa xwá pîş bikê, bikê bin pîyê xwe dá. Ev gelîk cara xelk dibêjê, ne wlo yá lo? ‘Alim jî dibêjin û xelk jî dbêjê. Á! Dibê “Nefş û şeytan birayê hevdû ná.” Ha vêca qurba weḷa wilo yá. Ê vêca t çend ciha de jî mey dibê “Şeytan we
- (40) dtîrsênê j feqîrîyê.” Dibê “Eşşeytanu ye‘idukumulfeqra.” Herfa Qur’anê ye lo! Dibê “Şeytan we tîrsênê j feqîrîyê.” Weke go vêga ti bê “Ez ê deh milyona dime yekî, weḷa yê perê mi kêm bê.” Mesele lo! “Sedaqekî ez ê dim.” Nahêlê yanî illeh şeytan hema l ber á. Ma‘lum á bûye weswese jî, te dît “Fî şedûrînnas.” Ser sînga yekî de yá. Sehîdê m, á! Ji yekî hiç xafil nabê yanî ha!
- (45) Á! Hiç şeytan... Erê weḷa wilo yá. Erê: herê’!

- (1) Hebû nebû, zilamek bû. Zarokê wî nebûn. Keçîkekî şî xwe re anî. Anî, bihemle bû. Go bihemle bû: hewîya wê hebû. Pîrikêkî di gund de hebû. Tiçû ba pîreka. Vêca wê nedixwest go hewîya wê bihemil bibê, zaroka bîne. Ê Xwedê dayê. Ê îca bakîrîyê, ya pîrikê, go. “Were.” Go “Were.” “Go zaroka bîne wê zilamê

- (5) mi berdê mi: Wê berdê mi. Hêdîka pîrikê çi kir? Bekçî jî, zilamê wê, wêxtê wê çê, wê çêbin çû, çû bajar, çû bajarekî. Rêbû bekçî jî, yek zilamek jî danî ber derî. Goşta daqena kes neçê hundirû. Destûra kesî neda. Zilam jî l devê derî ye, pîrikê haş gotî. “Ezê çim. Goşta neçim wê xerap çêbê. Wê zarokê ye mirin.” Zilam wilo xapand û çû hindirû. Go çû hindirû di cewrikê şa jî bi xwe re dibê.
- (10) Cewrikê şa dibê, dixê qaşê w dibê. Dibê ddeynê ber, herdû zarwê wê dixîyê, tê tavêjê çem. Tavêjê çem. Ê zilam hê nehaşîyâ. Tavêjê çem. Ew jî l gundekî, çem tê ve diçê. Yek gavan a, yî l ber dewêr a. Zarokê wa nînin. Dibê hema wilo toşa xwe tavêtî maşîya, darîka, ema çi ba. Gavan a. Tavêjê dimeyzênê toşa yî giran dibê. Têne malê dibê “Jinikê weşa min ev pakêt anîyâ nizam çi ne
- (15) tê dâ.” Divekin, dimeyzênin keçîkê û kurîkê a. Keçîkê û kurîkê a. Jinikê dibê. “Weşa heyra ez îxtiyar im. Emê çilo xwedî kin? Ez... Ne şîrê mi heya w ne çêlekê mi hena.” Dibê. “Yê Xwedê qîşmetê wa şîyênê.” Zilam wilo dibêjê. Ê ew jî dibê “De bere bê!” Hêdîka wêxtê go vêca pîrekê wa xwedî dikê: û ewê zlamê xwe ne, yixtîyar in! Vêca serê wa dişoyê. Hewş hebûn, şixwe hewş bûn. Ayê
- (20) dirjênê hewşê. Ê cîranê wa dderkevin. Dibê, “Weşa mala, hevşîyê mala gavên tişî zêr a. Ev kê zêr avêtîne dâ?” Dibakî, “Keçê gidî çima win zêrê xwe nadnâ hev? Dibê, “Win henekê xwe b me şkin, zêrê çi?” Dibê “Weşa...” Tçê dimeyzênê gava aya go rijandîyâ, ya keçîkê zêr a, yê kurîkê jî zîv a. Navê wî Mihemed Yeman a, navê yê jî Pelîkman a. Wilo kêfa jinikê tê, dibêjê vêca
- (25) weşa... He ro wa tşoyê. He ro wa tşoyê û halê wê w zilamê wê xweş dibê. Gavan a û jînkê wî jî feqîr, îxtiyar a. Halê wa tqedê. Dimeyzênê, diçê tenûrê. Zarokê mezin dibin, tiçîne nav zarokê. Ew jî çuwe tenûrê go nê çêkê. Vêca hinek wilo xebera dibêjine wa. Bi kurmancî digotne wa dibê sqêfa şkinê wa. Sqêfa şkinê wa. Dibê “Win ji kû haşîna û win zaruwê me dxin. Zarokê jî bîra
- (30) dinyayê dibin. Têne dibêjine jina gavên. Dibê “Tî ne dîya me yî. Were bêje bê te... We em şî kû anîne.” “Lawo dîya we me, bavê we ye...” Dibê, “Na! A vêya hanê, cîrana şa wilo gotîyâ. Gotîyâ win ji ber çem anînâ.” Dirabê, ma yê

bê çî vêca? Dibê weļa lawo ھاlumesele ev á, raşt á. Bavê we çû ber dewêr û qefû avêt... Ew k avêtá qefûkê û win ketne ewka wî, tora wî. Win anî... Me

(35) meyza wun zarok in. Û me guh da we, we mezin kirîyá. Mihemed Yeman û Pelikman. Ya kurik aya yî dibê zîv, ya keçikê jî dibê zêr. Dirabê, dibê, “Na, em ê çin vêca. Pi xatîrê tá!”

30

(1) Herdû, keçik û kurik dikevîne rê w diçin. Dibê “Heta m herin, em cihê xwe nas kin û diya xwe w bavê xwe bbînin.” Diçin diçin, leqayî gundekî dibi:n. Tî dibi:n, ewk dibin. Diçine mala yeke pîr á, zarokê wê nînin. Zarwê yê nînin û á p tenê yá. Dibê “Yadê Pîrê weļa m tî ná.” Dibê “Lawo weļa aya má nîná,

(5) şayê mara t serê kaniya me de yá, nahêlê ay werê. Her serê rojê keçikekê dixemilênin, dibine ber wê, wî marî û wextê go tcuripênê ay di be re tê. Îca yê go hazir bû w ê j xwe re ênê êdî w ê bê ay mênê.” Dirabê ya pîr dibêjê. Dibê “Ez, ê m ne keçkê m hene ne kurkê m hene. Ha wilo, ji boy wilo aya m nîná.” Dirabê, dibê... Mihemed Yeman jî dibêjê “Weļa em ê çin, ez ê wî marî kujim.”

(10) Ew keçik dibê “Birayê mi w ê te xwê, halo...” Dibê “Na, şûrê mi heyá. Şûrekî î pê re yá. W ê... Ez ê halo kîm. Wextê mi dirêj kir, devê xwe vekir, ez ê hema xime devê wî, w ê mirê.” Weļa wî tkujê. Diçê wilo tkê. Şûrê xwe dibê û wî zehayî tkujê. Destê xwe jî vêca... Keça mezinê... Ya meznê wir á. Dora keçka mezna gund á. Bavê yê mezinê gund á. Destê xwe jî l wê ayê txê wû li nav

(15) milê yê txê. Û cilê wê lê ná. Daqena xel nebê em in. Ew keçik diçe malê. Û vêca ew dibê, halo ew dibê, halo dibêjê “Weļa ھاlumesele ev a yabo!” Kurikekî ھاlumeselê yî ev á. Haţ kwişt û aha nîşana mi jî heye. Ne ev in, ne gundî ná.” Dibakîyê, dibakîyê: dibê “Weļa ھاlumeselê vî yá ev á. Vî zeha kuştîyá. Mihemed Yeman kuştîyá.” Hêdîka dibê “Lawo, ti helal bê jê rá. Z ê te

(20) dimê. Sed hespî, sed qantîrî, sed mêşînî, sed bizînî, her yekî sedesed dide kurik û dibêjê vêca ti l ba mi bimênê: t kurê min î, zavayê min î û t kurê min î jî. Ti l ba m nemênê, herê memlaketê xwe jî oxir bê ş te rá, herê weļa tê xwá.” Dibê

“Wela z ê çime welaṭê xwá. Dirabê keçîkê tênê. Keçîkê tênê: tê navsera çiyakî. Tê navsera çiyê. Tê navsera çiyê: li ser... Qambilî gundê bavê xwe xanî çêtkê,

- (25) qesrekê. Qesrekê çêtkê û dibêjê... Ew zilam diçê wir, nizanê bavê yî ye pêşî. Nizanê bavê yî ye, xanî çêtkê. Û de çêtkê îca dirabê dibê ez ê çime vî gundî. Şevêkê bere m bi^cezimênin. Diçê gund. Diçê gund, dibê bere m bi^cezimênin. Diçê, her xwarin û çî tiştê heye jê re dibê û pisîka xwe jî... Jina wî dibê “Pisîkê jî p xwe ra bba. Xelkê îlac tkîn û halo dikin... Tê mirê, halo.” Pisîkê dibê.
- (30) Nabê jinîk, ya go şixwe jinbava wî, wî nas dikê. Diçê xwarina yî zehirlemîş... xwarinê txîyê, îlacê, û ddeynê ber. Dideynê ber kûrik. Ya timmama îlacê naxîyê, ya wî tenê txîyê. Dirabê didê pisîkê, pisîk dimrê. Piştî go dimirê, dirabê vêca dibêjê “Ez ê te^cezimênim.” Tê malê. Tê malê, wî di^cezimênê. Ew tê. Ew tê, piştî go tê, ew çî tkê? Ew jî sed zilamî w sed hespî p xwe re tênê, tê mala wî
- (35) w ew kûrik wî d^cezimênê. Kûrê wî yá, Mihemed Yeman. Dirabê ew jî... Jina wî diçê. Heççî ê wa yê dî tişi ka w ce tkê, ewkê wî, yê wî, yê hespê wî. Ceherê wî, digotinê ceher. Bi kûrmancî ceher bû. Tîjî ka tkê, kevîr tîkê wû bi serê wî ddaçê, hespê wî... Hespe wî dixê hîrehîr. Dibê “Çî yá? Dibê “Î tê á!” Dîsa jinîk dibê naxwazê harê wî bbînê. Piştî go dibê “Çî ye?” dibê “Ma xel kevira
- (40) didê hespa? Jinîk jî dibêjê “Ma pîrek cewrikê şa ténin? Dibê “Ma pisîk... Ma xel îlacê txê xwarina kûrê xwá. Meyzêne pisîk peqî.” Yanî ewk... Zilam hişê wî tê serê wî vêca. Dibêjê “Dêmekî ev kûrê min á û ev jî wilo... Dibê “Ez bûka te má, ev kûrê te ya, ev jî keça te yá.” Wilo dibêjê, tê, dibakê, dibê “Hê: heçî serê malê wê barîk çilo û avê wê ênê wê!” Wê pîra sêhr û jina xwá dibê
- (45) dideynê ser dişewitênê. Wa herdûka tkujê û dibêjê “E txwazim.” Dibê “Ma ka dîya min? Dîya mi j mi rá bêjá.” Dibê “Wella dîya te lawo, mi birîyá, xistîyá^ceyarekî berêz, danîye serê sê rîya. Sê rê jê tçin. Ji gund, ê go ji wir tê, ji wir tê, ji wir tê. Sê rê ná. Mi danîya wir. Heçî tçê di be ra tîfkê ddîyê wu dahfkî lê txê. Mi ha halo l dîya te kirîyá.” Dibê “Temam.” Dibê “Temam.” Ew car diçê.

- (1) Dirabê tçê ba pîra sêhr. Ew jî tixwazê go telef bibê, yeke dî yá. Tixwazê dibê “Halumeselê m ev a.” Dibê “Tê çê... Hare kêça mîrê cina bêne ş xwe rá.” Ew jî dibê “Ma z ê çilo ênim?” Dibê “Zanê t ê çilo ênê? Di nêrî yê l ev xin. Yeke î sor e yeke î spî yá. Ew ê sor w ê: spî bê û ê sipî jî w ê: sohr bê ş xwînê, hingî w ê l ev xin. Hema xwe bavêje ser pişta ê sor. Çinku ê spî yá. Go ti harê xwe bavêjê ser pişta ê spî, w ê te avêjê ser dêh tebeqê azmên. Ti xwe bavêjê ser pişta ê spî w ê te avêjê ser dêh tebeqê binê ^cerdê. Tê hingî kevoka mîrê cina ş xwe re ênê.” Dibê “Temam.” Hey kêçik dibêjê “Birayê m neça: m tenê ná, w pîreka te w... Zarokke wî jî heyá.” Dibê “Na, ez ê çim, weke Xwedê yá.” Diçê.
- (10) Diçê u yca ev kevok jî kevokê mîrê cina ne. Dikevine çem. Xwe dixine avê. Lê txin, lê txin, lê txin, tikevine çem. Ew nayê bi wa rá. Ew tenê tê. Naxwazê p kesî re pkevê avê. Wextê go ew dirabin dahfikê xwe dirajinê, jê re jî wilo gotîyá yanî heya wî jê heyá, ew tê dahfikê xwe ddeynê wir. Wî jî tabî kolayá, ^cerd kolayá. Weke ewkê, tirbê xwe xistîyê. Tenê ç^hvê wî wilo, qirka wî ve
- (15) xwîya tkê û dûr á, dibînê hema. Dirabê, wextê go ew hemi dirabin difirin ew tê xwe go bixiyê, hêdîka diçê ewkê wê dikşênê ba xwá, dafkê wê. Wilo mesele ewkê wê dikşênê ba xwe û yîca wextê go tê go dbê ez ê li xwe kim nîná. Dibakê, vêca sê: cara dibê “Ti ins î, ti cins î? Ez kêça mîrê cina má, ti ewkê m bènê, dahfkê mi, e ş te rá.” Ewk nakê. Heça cara çara, sozê ddê. Dibê “Ez... Pi
- (20) soza mêrê berê...” Dibê “Ez kevoka mîrê cina má. Ti ins î, ti cins î, ti Hiseynî yî e ş te re...” Hêdîka kuçik dideynê jê rá. Dibê “Ti çi txwazê? Ti heft tebeqê ^cerdê txwazê, ti yê azmên tixwazê? ” Dibê “Ez yê ^cerdê txwazim.” Ê dibê “Ne sê birayê m hená. Gava go bêhna Hiseynîya werê w ê te kujin. Ez naxwazim te bibim. Ê ez te bibim w ê te kujin.” Dibê “Qedera m de hebê ez ê bînim, nebû
- (25) ez ê êm.” Dirabê wê dibê. Wî dibê. Dibê tixê odekê, dibêjê dîya xwe, dibê “Yadê halumeselê min ev á.” Dibê “Birayê te kujin, w ê kujin.” Dibê “Qedera me de hebê bera me pkujin.” Ê wextê go dibê halumeselê m ev á, j dîya xwe re dibêjê, dibê “Mi soz dabû go z pê re werim. Ê l ber çem bû w halo haîye serê mi.” Ewka xwe dibêjê, mesela xwá. Hêdîka dîya w wê ^cefû dikê. Wextê birayê

- (30) wê tèn, her sê, dibê “Bêhna Hiseynîya tê.” Dibêjine dîya xwe “Yadê, bêhna Hiseynîya tê.” Dibê “Lawo tiştêkî wilo nîne.” Dibê “Halo halo.” Dibê “Hêdî yadê ez ê j birayê xwe re bêjim.” Dibê “Birayê min, halumeselê mi ev á!” Dibê “Ha ez çûme ber çem, ez bi tenê má û haîye dafîkê m birîye w xwe veşartîye w halo yá û soz ji mi standîyá, mi anîyá. Wextê win pêşî mi nekujin e nahêlim
- (35) win wî bikujin. Pêşî m bikujin, wî jî p̄ey mi bikujin.” Wextê wilo dibêjê, birayê wê dibê “We!a m ê wî dine xatîrê tá.” Dibê “Temam. Hema ti l ba me namênê.” Ew ij dibê “Bere bê.” Dirabê, wî ser peîê xwe t̄kê w wî dîsa t̄nê cihê wî. Ew jî dibê jina wî. Hêdîka dîse dbakê bavê xwá. Dibê “Werá!” Dibê... Nizanê. Yanî nabê ez kuîê te má. Dibê “Werá mi şîva te çêkirîyá.” Ew jî tê.
- (40) Şîvê çêtkê. Tê, dîse t̄çê kevira txê ewkê wî, ciharê hespê wî. Ê vayê dî jî ce w káyê dixîyê. Ew kevoka mîrê cina wilo t̄kê. Wextê dibêjê dbê “Ha halo ye.” dibê “Ma... Ma insan cewrikê sa t̄nin? Te çuye jina xwe...” Vêca zanê, jê ve ‘eyan á. Dibê “Te wî xistiye çermê berêz û te danîye sêrêkê: serê sê rîya û heçî t̄çê tîfkê ddîyê w darkî lê txê. Ma ev mişilmanî ye ti t̄kê, ti mişilman î?”
- (45) Werhasî:l, dibê “Jina tá û pîra sêhr e gund halo l jina te kîrná. Ê a: v kêça te ye v kuîê te ye, e bûka te má.” Hêdîka dibê “Hê: gundîno, werin!” T̄çê pîra sêhr û jina xwe t̄şewitênê û t̄ê digihê wa û aha vêca Luqman (Birazîyê axêverê ye.) xilas. Serê te sax. Halo ye vêca.

PÊVEK 16: FERHENGOK

A

ahl *n.* xizm, eqreba, ehl

am *n.* ap, mam

arîhevkin *l.* Alîhevkin

ava bacana *n.* salçe

B

bakîrin *l.* bangkirin

bandân *l.* bangdan

bavîk *n.* famîle, sulale

bêbexî *n.* nebûyî, îftîra

belitîn *l.* berê pêşî dan

bên *n.* ban (rewşa tewandî)

benî *n.* benî

bênin *l.* bînin

berá *ho.* bila

beranok *n.* Pêlîstokeka ku di şiklê beran da ye û di nav hewdelê da hatiye dakirin.

bêreh *rd.* bêreh

beroş *n.* beroş, quşxane

binêtafi *rd.* cûreyekî hejîran

binxeş *n.* ji bo Sûriyeyê tê bikaranîn)

Bişêrî *n.* navçeyeka Batmanê

bişîr *rd.* serxweveçûyî

C

ceban *n.* goristan

cembî *n.* amûreka ku li pişt ajele bargir dikan

ceher *n.* kîsê emê ajelan

cêzî *n.* hejik û çilo hwd. yê komkirî

cihar *n.* kîsê em

cîrn *n.* cihê dankutanê

cizok *n.* beşên Quranê

coht *rd.* cot

Ç

çal *n.* çal

çêle *n.* zivistan

çêl *n.* yekeyeka pîvanê

çilo *n.* çawa

çilo *n.* çiqî û pelên darên berû û mazîyê

D

daḥfîk *n.* xefik

Dalîn *n.* gundekî Torê

daqena *ho.* ji bo ku

dardarok *n.* cûreyekî gîya

darîk *n.* darê piçûk

dêlkewk *n.* parçeyekî darîn yê meşka dew

derbîk *n.* kibrît, niftik

Dêrdîl *n.* gundekî Torê

Dêrizbîn *n.* gundekî Torê

Derîkê Gewrîk *n.* mewqîek li herêmê

derpêkurî *n.* kîlot

Deşîk *n.* mewqîek li herêmê

dibuwêrin *n.* derbas dibin

Difnê *n.* gundekî Torê

diho *ho.* duh

dîlok *n.* stranên şahîyê

dînan *n.* diran

dirûm *n.* rewş, hal

nîjinandin *l.* li ser hev danîn

dohn *n.* 1. Avdonk 2. Rûnê çirayê

E

ewk cî. tişt

Ê

Êgir *n.:* rewşa tewandî ya agir

Ênin *l.* (ew ê) bînin (lêkera kişandî)

êş *n.:* rewşa tewandî ya aş

F

fecr *n.* şeveqa kûr

ferş *n.* kevirê pan û mezin

ferûc *n.* mirîşka ciwan

firaş *n.* firaq

fîrûn *n.* firin

G

vê gafkê *ho.* gavekê

geliş *rd.* pir, zaf

Gelîyê Zîrne *n.* mewqîek li herêmê

gêre *n.* karekî cotkarîyê

geya *n.* gîya

geziş *n.* gezek

gileh *n.* gilî

girîş *n.* girê piçûk

gwêh *n.* guh

gwêhdar *n.* guhdar

gwihdar *n.* guhdar

gwind *n.* gund

gwîz *n.* gûz

H

halko *rd.* wihakî

halo *ho.* wiha

hama *ho.* hima

hará *l.* biçe

hare *l.* biçe

harne *l.* biçin ...

haşmá *l.* hatim ...

hawîr *n.* serûbin

hê hayê *n.* melodîyeka xebatê

hebana *l.* hebûna

hebbikkî *ho.* hinekî

hejek *n.* hejikek

hek li vê ecêbê *b.* li vê ecebê binêre

heka *ho.* heke

helîl *n.* cûyeyekî şîranîyê

hema *ho.* hima

hemawî *n.* cûreyekî serpûşan

hemmi *rd.* tev

herêkirin *n.* pesendkirin

hermeş *n.* xatûn

herçka her duyan

hêrvist *n.* hêvrist

hevşî *n.* bexçeyê li ber malê yê
ajelan

hewal *n.* ehwal

hewdel *n.* cûreyekî şîranîyê

hewqa *rd./ho.* ewqas

heyá *l.* heyê

hilanîn *l.* rakirin, veşartin

hîrehîr *n.* 1. kenê bi dengê
bilind 2. dengê hespan

hogic *n.* beranê herî kêr çar sal
kirî

hûriq *rd.* pir hûr

I

illeh *ho.* hemin

ilyaf *n.* elyaf

Î

Îsan *n.* însan

Îzîdî *rd.* êzîdî

K

kaxetk *n.* kaxeta piçûk

keçam *n.* dotmam

kêferat *n.* lebat, lebigîn

keftik *n.* kefik

kelevajik *n.* gotinên pûç û vala

kemça *n.* çemçe

kerkûş *rd.* cûreyekî tirî

kesirandin *l.* salamurakirin

kewitandin *l.* di ava kelandî da
nermkirin

kils *n.* kirêc

Kiraxil *n.* gundekî Torê

kîroşk *n.* kîvroşk, kerguh

kizin *n.* cûreyekî gîya, êmê
ajelan

kox *n.* xanîkên ajalên kedî

koxer *rd.* cûreyekî tirî

Koxika *n.* taxeka li Batmanê

kubir *n.* kibir

kuhar *n.* kewar

kuhark *n.* kewara piçûk

kûrik *n.* cihê agir

kurmîrok *n.* hêlîna morîyan

kwindir *n.* kundir

kwindirê mîranî *n.* cûreyekî
kundiran

kwişt *l.* kuşt

L

lebikî:n *l.* xebitîn, têkoşîn

li halkî bûn *l.* bihemlbûn

libê *b.* fermo

lîs *n.* cêrê ku tê de ava zeyatê,
mewûjan amade dikin

M

maliştî *rd.* bi melkes paqijkirî

me^c eşçî *n.* meezi, tezîye û kesên
ku diçin meezîyê

mehamih *ho.* bi mehan

mehke *ho.* bi qasî mehekê

meşer *n.* cihê esirandina tirî

Mercî *n.* gundekî Torê

mêşin *n.* mih

meştel *n.* cihê şitilan

meşk *n.* met

mezrûne *n.* cûreyekî tirî

mişhov *n.* mirov, xizm

misîwa *ho.* bênavber, tije

mişar *n.* xetên zevîyan yên
sebze

mixalefî *n.* keç û kûrê xaltîyê

mizîr *rd.* mizawir

N

na^cle *n.* lanet

nahk *n.* nok

nahîin *l.* nehatin

nên *n.* rewşa tewandî ya nan

neqepk *n.* neqeba piçûk

neqriq *n.* kortik, qenal

neçû *l.* nediçû

nihaq *rd.* neheq

nîro *ho.* nîvro

nizam *l.* nizanim

nûka *ho.* hêj nû ve

P

paçik *n.* potik

parzinîn *n.* lipaçikxistina tiştên
avî

pelq *n.* teqlîdeka deng

pêxistin *l.* vêxistin, biagirxistin

piçûçk *rd.* pir piçûk

pîrek *rd.* jin

pîrkanî *n.* pîrikayî

pisimila *b.* bismillah

piştderî *n.* edeteka bûkanînê

piçpiç *n.* pelepel

poq *b.* bangkirineka şaşmayîn û
bertekdayînê

Q

Qamişlo *n.* bajarekî li binxetê

qefû *n.* tiştên ku li ber avê tên

qelemsiltan *rd.* cûreyekî qumaş

qemeçir *n.* berstûk

qetîtk *n.:* qetê/ parçeyê piçûk

qevzîk *n.* gavek

qîm *n.* riza, qayîlbûn

qinyaq *n.* qeneet

qirdik *n.* palyaço

qışexane *n.* nexweşxane,
xestexane

qompîle *ho.* bi tamamî

qubano *b.* qurbano
(bangkirinek)

qufir *n.* kolana ber daran

qûnik *n.* dûvik

qwil *rd.* qul

R

raser d. bi ser ra

rêsî n. giyayên hişkirî û bi hev
ve badayî

ringênî n. dengê tiştên hesinî

rîsî n. rêsî

S

salîmidîşal ho. ji salê heta salê
(di salekê da)

sapa n. sehpa

savêr n. rewşa tewandî ya savar

sebl n. haleta barkirina cêr û
metereyên avê

sehw n. tirs

semîyan n. mezinê malê

Serdêf n. gundekî Torê

serxetbûn l. biserxetêketin,
jisînorderbasbûn

sîlih n. sîleh

sincêrî rd. cûreyekî tirî

siqêf n. dijûn

sqêf n. dijûn

S

şalik n. şala piçûk

şehidandin l. “Eşhedu” xwendin

şepirze rd. şerpeze

şeveder rd. bi şev liderbûn

şibrîk n. teştta ku ji şaxên bîyan
tê çêkirin.

Şifêrê n. gundekî Torê

Şikefta n. gundekî Rema

şikêva rd. cûreyekî nan

şiq n. alî

şîş n. cûreyekî savar

şîştî rd. şûştî

şivist n.: şaxên mêwan yên
kesixandî

şixul n.: xebat

şixwá ho.: jixwe

şexalîk n.: xebardanek

T

ṭá, cî. te (kesê duyem)	V
ṭe^c zîk n. meezîyek	vê neqlê ho.: vê carê
tekûtoók n. hûremûr	vêca ho. îcar
tevde d. bi hev ra	vî yalî rd.-n.: vî alîyî
tevlû ... d. pê (ra)	vîqasî ho.: ev qasî
ṭeyrîk n. karê xepara şitilan	
ava têz n. ava mewîjan	W
ṭiçin l. diçin	waweylê b. baneşaneka
tiḥêl n. alî, ji bo însanan kêlek	matmayînê
timmama cî. hemûyan	û yşela b. û înşela
ṭireh n. tirî	wela b. wele
ṭirih n. tirî	wêna cî. wêya
tirozî n. ecûr	weraqa n. lîre
ṭişîk cî. tiştîk	werá l. were
tişt û mişt n. hûremûr	Wezrîn l. gundekî Torê
ṭkî:r l. dikir	Win cî. hûn
ṭkin l. dîkin	
Torê banî n. Deverên bilind yên Torê (derdora Kerboran)	X
ṭxûn l. dixwin	xalṭîk n. xaltî
	Xanoq n. mewqîeka li herêmê
	xarûs n. benî

xasûm rd. bêoxir, bêqidoş,
bêyom

xel n. xelk

xêlfî n.: şaş, derew

xêlî n. koma ku diçe pey bûkê

xelîtkî n. cizdan

xênî n. rewşa xanî ya tewandî

xênîm n. yên ji me çêtir, kesên
metafizîk

xepar n. kolana ji ser ve

xerzîk n. rezê nû

xetîk n. xeta piçûk

xweh n. xwişk

xwelîşîr n. cûreyekî gîyayan

Xirbeh n. gundekî Torê

Xirbê Mercîya n. gundekî Torê

Xirbê Simaîl n. gundekî Torê

Y

yabo b. bavo

yîlac n. îlac, derman

Z

zahf rd. pir, gelek

zarîw n. zarok

Zêlîyê n.: gundekî Torê

Zercel n. gundekî Torê

Zêwîka Şêxa n. gundek

zirîcîn l. şînhatina gîya

zlam n. zilam

c (E'a erebî)

elb n. amûreka pîvanê

emela n. emele

esirandin l. perçiqandin û
avjêderanîn

evciqandin l. perçiqandina
tiştên biav